

the journal of mesopotamian studies

Türkiye'de
Yaşayan Diller
Enstitüsü

JMS

ISSN: 2147-6659
e-ISSN: 2687-6388

Özel Sayı · Special Issue
Yıl/Year: 2023



the journal of mesopotam mesopotamian studies



The
Journal of
MESOPOTAMIAN STUDIES (JMS)

Periodical Journal for Kurdish, Arabic and Syriac Studies
Special Issue of the Classical Kurdish Literature
October 2023

ISSN: 2147-6659
e-ISSN: 2687-6388



MARDİN ARTUKLU
ÜNİVERSİTESİ
TÜRYİYE'DE YAŞAYAN DİLLER
ENSTİTÜSÜ

The Journal of Mesopotamian Studies (JMS)

Periodical Journal for Kurdish, Arabic and Syriac Studies

ISSN: 2147-6659

e-ISSN: 2687-6388

Mardin Artuklu Üniversitesi Adına Sahibi:
Owner on Behalf of Mardin Artuklu University, The Institute of Living Languages in Turkey:
Prof. Dr. İbrahim ÖZCOŞAR
(Rektör)

Editör | Editor in Chief
Doç. Dr. Ahmet KIRKAN

Sayı Editörü | Special Issue Editor
Doç. Dr. Yakup AYKAÇ

Editör Yardımcısı | Assistant Editor
Dr. Şehmus KURT

Editörler Kurulu | Editorial Board
Prof. Dr. Abdurrahman ADAK (Mardin Artuklu Üni.)
Prof. Dr. Mehmet Zahir ERTEKİN (Mardin Artuklu.)
Prof. Dr. Hayreddin KIZIL (Dicle Üni.)
Doç. Dr. Salih AKIN (Rouen Uni.)
Doç. Dr. Mustafa ASLAN (Mardin Artuklu Üni.)
Doç. Dr. Ahmet GEMİ (Mardin Artuklu Üni.)
Dr. Shahab VALI (Mardin Artuklu Üni.)
Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK (Mardin Artuklu Üni.)
Doç. Dr. Zafer KUTLU (Dokuz Eylül Üni.)
Doç. Dr. Necat KESKİN (Mardin Artuklu Üni.)
Dr. Hewa Selam KHALID (Indiana Uni.)
Dr. Kutlu AKALIN (İstanbul Medeniyet Üni.)
Doç. Dr. Bakhtiar SADJADI (Iran Kurdistan Uni.)

Alan Editörleri | Field Editors
Doç. Dr. Ahmet GEMİ (Arap Dili ve Kültürü)
Dr. Öğr. Üyesi Sebahattin ÇELİK (Süryani Dili ve Kültürü)
Doç. Dr. Salih AKIN (Kürt Dil ve Kültürü)
Doç. Dr. Necat KESKİN

Dil Editörleri | Language Editors
Dr. Amar ALJARAHA (Arapça)
Dr. Pınar YILDIZ (Kürtçe/Zazakî)
Dr. Ziyattin YILDIRIMÇAKAR (İngilizce)
Arş. Gör. Dr. Güneş KAN (Türkçe)
Arş. Gör. Dr. Ümran ALTINKILIÇ (Kürtçe/Kurmancî)

Redaksiyon | Redaction
Arş. Gör. Dr. Sevdâ ORAK REŞİTOĞLU

Yönetim Yeri | Head Office
Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü
Mardin Artuklu Üniversitesi Merkez Kampüs Yerleşkesi
Artuklu/Mardin
Tlf: +90 482 212 98 84 20 Fax: +90 482 212 98 85
e-mail: jms@artuklu.edu.tr • web: http://jms.artuklu.edu.tr
Dizgi ve Tasarım: Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü
Ekim 2023 • Cotmeh 2023 • October 2023

The Journal of Mesopotamian Studies (JMS) aşağıdaki indeksler tarafından taranmaktadır:



© Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü'nün bilimsel bir yayım organı olan The Mesopotamian Studies Dergisi, uluslararası hakemli bir dergi olup yılda iki sayı (Mart- Eylül) olarak yayımlanır. Dergide Kürt, Arap ve Süryani kültürü, dili ve edebiyatı alanlarında akademik nitelik taşıyan ve Türkçe, Kürtçe, Arapça, İngilizce ve Süryanice dillerinde yazılan bilimsel çalışmalara yer verilir. JMS'de yayımlanan makalelerin içeriğinden yazarları sorumludur. © The Journal of Mesopotamian Studies is publication of The Institute of Living Language of Mardin Artuklu University. The Journal of Mesopotamian Studies is an international peer-reviewed journal published semi-annually (March-September). The scientific research on Kurdish, Arabic and Syriac culture, language and literature written in Turkish, Kurdish, Arabic and Syriac languages are published in The Journal of Mesopotamian Studies (JMS). Authors are responsible for the content of articles published in JMS.

Danışma Kurulu | Advisory Board

Prof. Dr. Abdülhalim AYDIN (Fırat Üni.)	Doç. Dr. Jean François PEROUSE (St. Anad. Arş. Enst.)
Prof. Dr. Farouk ISMAEL (Unv. Hamburg Almanya)	Prof. Dr. M. Nesim DORU (Ankara Sosyal Bilimler Üni.)
Prof. Dr. Eleanor COGHILL (Uppsala Üni. İsveç)	Prof. Dr. M. Sait TOPRAK (Mardin Artuklu Üni.)
Prof. Dr. Carina JAHANI (Uppsala Üni. İsveç)	Prof. Dr. Vahap ÖZPOLAT (Mardin Artuklu Üni.)
Prof. Dr. Gülşat AYGEN (Illinois Üni. ABD)	Dr. Amr TAHER (Harvard Üni. ABD)
Prof. Dr. Arda ARIKAN (Akdeniz Üniv.)	Dr. Barzoo ELIASI (Oxford Üni. İngiltere)
Prof. Dr. İbrahim ÖZCOŞAR (Mardin Artuklu Üni.)	Dr. Kaveh DASTOOREH (Koye Üni. Irak)
Prof. Dr. Mesut ERGİN (Dicle Üni.)	Dr. Khaled KHAYATI (London Üni. İngiltere)
Prof. Dr. M. Faruk TOPRAK (Ankara Üni.)	Prof. Dr. M. Zahir ERTEKİN (Mardin Artuklu Üni.)
Prof. Dr. Abdulwahab K. MOUSA (Nawroz Üni. Irak)	Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ (Van Yüzüncü Yıl Üni.)
Prof. Dr. Abdurrahman ADAK (Mardin Artuklu Üni.)	Dr. Yavuz AYKAN (Boğaziçi Üni.)
Doç. Dr. Hazem Said MONTASIR (El-Ezher Üni. Mısır)	Dr. Michael CHYET (Washington Library ABD)
Prof. Dr. Hayrullah ACAR (Mardin Artuklu Üni.)	Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK (Mardin Artuklu Üni.)

The Journal of Mesopotamian Studies (JMS)

Periodical Journal for Kurdish, Arabic and Syriac Studies

ISSN: 2147-6659

e-ISSN: 2687-6388

JMS KLASİK KÜRT EDEBİYATI ÖZEL SAYISI HAKEMLERİ
REVIEWERS OF SPECIAL THE ISSUE OF CLASSICAL KURDISH LITERATURE

Prof. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ (Van YYÜ)	Dr. Ayhan YILDIZ (Mardin Artuklu Üni)
Prof. Dr. M. Zahir ERTEKİN (Mardin Artuklu Üni)	Dr. İlyas SUVAĞCI (Hakkari Üni)
Doç. Dr. Ali TENİK (Harran Üni)	Dr. M. Şirin FİLİZ (Mardin Artuklu Üni)
Doç. Dr. Hacı ÖNEN (Dicle Üni)	Dr. Nevzat EMİNOĞLU (Muş Alparslan Üni) (2)
Doç. Dr. Hayrullah ACAR (Mardin Artuklu Üni)	Dr. Semih GEZER (Muş Alparslan Üni)
Doç. Dr. Kenan SUBAŞI (Mardin Artuklu Üni)	Dr. Sinan ÇAKAR (Van YYÜ)
Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ (Van YYÜ)	Dr. Şeyhmus ORKİN (Muş Alparslan Üni) (2)
Doç. Dr. Nurettin BELTEKİN (Mardin Artuklu Üni)	Dr. Tekin ÇİFÇİ (Mardin, MEB)
Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU (Dicle Üni) (2)	Dr. Veysel BAŞÇI (Batman Üni)
Doç. Dr. Ruhullah ÖZ (Şırnak Üni)	Dr. Ziyattin YILDIRIMÇAKAR (Mardin Artuklu)

Vekolîna Naverokî û Hêmanên Binyadî yên 'Iqdê Durfamê Numan YURT	13-50
Prototîpên Cıwanîyê di Estetîka Şî'ra Melayê Cızîrî de Nevzat EMİNOĞLU	51-62
Mela Nûrullahê Godişkî û Dîwana Wî Nesim SÖNMEZ	63-84
Mewlûda Netemam ya Şêx Qutbedînê Korîkî: Awirvedanek li Ser Taybetmendiyên Zimanî yên Metnê Zafer AÇAR	85-113
Analîza Dîwana Mela Ebdulezîzê Bedlîsî Ji Layê Şiklî û Naverokê Ve Nurettin ERTEKİN	114-132
Feqiyê Teyran: Danêrê Çîrokeşî'ra Kurdî Şiyar LEVENT	132-145
Hermenotîk û Edebiyata Kurdî ya Klasîk Serdar YILMAZ	146-159
Tema û Hêmanên Felsefî Di "Ey Av û Av" A Feqiyê Teyran De Halil AKGÜL	160-172
Aheng û Mûsîqî Di Helbestên Feqiyê Teyran De Mazhar ÇİFTÇİ	173-188

KİTAP DEĞERLENDİRME

BOOK REVIEW

Melayê Cızîrî Hin Tişt Derbarê Jîyan û Berhema Wî de İlyas SUVAĞCI	189-193
Kürtçe Siyer Yazıcılığı Zafer AÇAR	194-197

EDİTÖRDEN

Kürt edebiyatı, zengin kültürel mirası ve tarihsel derinliği ile öne çıkan büyüleyici bir edebi geleneğe sahiptir. Kürt halkının dili ve kültürü, yüzyıllar boyunca yazılı ve sözlü eserlerle ifade edilmiştir ki Klasik Kürt Edebiyatı bunun yazılı kısmını oluşturmuştur. Klasik Kürt edebiyatı, Kürt topluluğunun tarihini ve kimliğini anlamamıza yardımcı olurken, aynı zamanda bu önemli edebi geleneğin özgünlüğünü de vurgulamaktadır. Denilebilir ki Klasik Kürt edebiyatı, yüzyıllar içinde farklı coğrafyalarda ve kültürel etkileşimlerin ortasında gelişmiş bir edebi gelenektir. Günümüze kadar Klasik Kürt Edebiyatı sahasına giren eserler üzerinde pek çok çalışma yapılmıştır. Özellikle son birkaç on yılda Klasik Kürt Edebiyatı'nın temsilcileri ve onların eserleri üzerinde yapılan akademik çalışmalar dikkat çekmektedir. Ayrıca Klasik Kürt Edebiyatı'nın var olduğu düşünülen fakat keşfedilmemiş temsilcilerinin ve eserlerinin olması, bu edebiyatın özellikle de medrese ve tasavvuf erbabınca günümüzde de icra ediliyor oluşu araştırmacıların bu alana yönelmelerine veya bu alanda olan araştırmacıların arayışlarının canlı olmasına neden olmaktadır.

İşte bu verimli sahanın çalışmalarına bir katkı olarak, *The Journal of Mesopotamian Studies (JMS)* dergisi bu özel sayı aracılığıyla Klasik Kürt Edebiyatı'nın benzersiz bir penceresini aralamaya çalıştı. Bu özel sayı, Klasik Kürt Edebiyatı'nın güzelliklerini, derinliklerini ve tarihsel bağlamını daha iyi anlamamıza yardımcı olmayı amaçlamaktadır. Kürt edebiyatının incelenmesi sadece edebiyatın kendisiyle değil, aynı zamanda Kürt halkının tarih ve kimliğiyle de yakından bağlantılıdır. Edebiyatseverler, akademisyenler ve araştırmacılar için bu sayı, Klasik Kürt Edebiyatı hakkında daha fazla bilgi edinmek, derinlemesine analizler yapmak ve yeni araştırma fırsatlarına ilham almak için önemli bir kaynak olmayı amaçlamaktadır. Klasik Kürt Edebiyatı Özel Sayısı'nda bir araya getirilen makaleler, Kürt klasiklerinin bilim dünyasını anlamaya çalışan birbirinden değerli incelemelerden bazılarıdır. Bu özel sayıda yer alan makale ve kitap değerlendirmeleri şu şekildedir:

Numan Yurt, “*Iqdê Durfam'ın İçerik ve Yapı Unsurlarının İncelenmesi*” başlıklı makalesinde anlatıbilim yöntem ve teknikleriyle Şeyh Askerî'nin *Iqdê Durfam* adlı eserini inlemiş, eserin tematik yapısını ve temel öğelerini detaylı bir şekilde ele almıştır.

Nevzat Eminoğlu, “*Melayê Cizîrî'nin Şiir Estetiğinde Güzellik Prototipleri*” başlıklı makalesiyle özel sayıya katkıda bulundu. Eminoğlu, klasik edebiyatın temel konularından olan estetik ve güzellik temaları üzerinde durmuş, bu konuları Melayê Cizîrî'nin *Dîwan*'ına uygulamaya çalışmıştır.

Bu sayının üçüncü sırasında Nesim Sönmez'in “*Molla Nurullah Godişki ve Divanı*” adlı makalesi yer almıştır. Sönmez, söz konusu makalesinde son dönem Klasik Kürt Edebiyatının önemli şairlerinden biri olan Molla Nurullah Godişki'nin hayatı ve hala elyazma olarak duran şiir *Divanı* üzerinde durmuştur.

Zafer Açar, “*Şeyh Kutbeddin Koriki'nin Tamamlanmamış Mevlidi: Metnin Dil Özelliklerine Genel Bir Bakış*” adlı makalesinde Klasik Kürt Edebiyatının son döneminde yazılmış ve tamamı günümüze ulaşmamış bir mevlidi dilbilimsel olarak ele almıştır. Açar, söz konusu eserin edebi yönüyle ilgili bazı genel bilgiler dışında dil özelliklerine odaklanmıştır. Yine bu çalışmada ele alınan klasik metnin ses bilgisi ile ilgili olarak ses olayları mercek altına alınmış, şairin dil seviyesi ve kabiliyetini ortaya koyabilecek önemli morfosentaktik konular da incelenmiştir.

Derginin beşinci makalesi Nurettin Ertekin'in "*Molla Abdülaziz Bitlisî Divan'ının Şekil ve Muhteva Yönünden Analizi*" adlı makalesi yer almıştır. Molla Abdülaziz Bitlisî, Osmanlı'nın son döneminde yaşamış ve ardında bir divan bırakmış Klasik Kürt Edebiyatının önemli şairlerindedir. Ertekin de bu çalışmasında mezkûr şairin hayatı ve şiir divanı üzerinde incelemelerde bulunmuştur.

Şiyar Levent, "*Kürtçe Manzum Hikayeciliğin Kurucusu: Feqiyê Teyran*" adlı makalesinde Feqiyê Teyran'ın manzumeleri üzerinde durmuş ve bunları hikaye yönüyle ele almıştır. Levent, sözkonusu çalışmasının neticesinde Feqiyê Teyran'ın Kürtçe manzum hikayeciliğin kurucusu olduğunu tezine ulaştırmıştır.

Feqiyê Teyran hakkındaki ikinci makale ise Halil Akgül tarafından yazılmıştır. Akgül, "*Feqiyê Teyran'ın 'Ey Av û Av' Şiirinde Tema ve Felsefî Unsurlar*" başlığıyla ele aldığı makalesinde Feqiyê Teyran'ın ünlü kasidesinde öne çıkan temaları ve felsefî unsurları tespit etmiş ve incelemiştir.

Dergide Feqiyê Teyran ile ilgili üçüncü makale ise "*Feqiyê Teyran'ın Şiirlerinde Aheng ve Musiki*" başlığıyla Mazhar Çiftçi'ye aittir. Çiftçi makalesinde klasik edebiyatın iki temel unsuru olan aheng ve musiki yönlerini ele almış ve bunları Feqiyê Teyran'ın gazel ve kasidelerine uygulamıştır.

Serdar Yılmaz, "*Hermenötik ve Kürt Klasik Edebiyatı*" başlıklı makalesinde Klasik Kürt Edebiyatında hermenötik kavramı üzerinde durmuş, Klasik Kürt Edebiyatı açısından henüz başlangıç seviyesinde olan bu çalışmalara dikkat çekmiş ve bu alanla ilgili birtakım önerilerde bulunmuştur.

Yukarıda belirtmiş olduğumuz makalelerin yanı sıra, bu özel sayıda akademik dünyada önem arz eden kitap değerlendirmesi bölümünde ise Klasik Kürt Edebiyatı sahasına ait iki eser incelemesi yer almıştır. Bu değerlendirmelerden ilki İlyas Suvağci'nin İzzeddîn Mustafa Resûl'un kaleme aldığı "*Melayê Cizîrî Hin Tîşt derbarê Jîyan û Berhema Wî de*" [Molla Ahmed-i Cezîrî'nin Yaşamı ve Eserleri Hakkında Birkaç Şey] (2020) eseri incelemiş ve söz konusu eser hakkında önemli mülâhazalarda bulunmuştur.

Kitap kritiği kısmında ikinci değerlendirme ise Zafer Açar tarafından kaleme alınmıştır. Açar, 2022'de M. Zahir Ertekin tarafından kaleme alınan "*Kürtçe Siyer Yazıcılığı*" adlı eseri incelemiştir. Mezkur eser kendi alanında yegâne kitap olup Kürtçe siyer sahasında geniş bir yelpazede araştırma yapmış bir inceleme-araştırma niteliğine sahiptir. Açar'ın değerlendirmesine göre bibliyografik bir özelliğe de sahip olan bu kitap, araştırmacılara bu alanla ilgili birçok elyazma, kitap ve çeşitli çalışmalara ulaşma konusunda yol gösterici bir vasfa haizdir.

Dergimizin bu özel sayısının yayımlanma sürecinde büyük bir sabır ve çalışmayla katkıda bulunan değerli yazar ve araştırmacılara teşekkür ederiz. Her ne kadar dergi hakemliği akademisyenliğin bir parçası olsa da dergideki makalelerin değerlendirilmesi için değerli zamanlarını ayırıp söz konusu makaleleri değerlendirip eleştirileriyle her bir çalışmaya katkıda buldukları için hepsine ayrı ayrı şükranlarımızı belirtmek isteriz. Son olarak bu özel sayının çıkmasında büyük katkıda bulunan Doç. Dr. Ahmet Kırkan ve Dr. Şehmus Kurt'a teşekkür ederiz.

Umarız ki Klasik Kürt Edebiyatı alanındaki yapılan bu çalışma yeni araştırmalara öncülük eder, bu sahanın gelişmesine katkıda bulunur ve gelecek nesillere yol gösterici olur.

Doç. Dr. Yakup AYKAÇ

Klasik Kürt Edebiyatı Özel Sayısı Editörü

JI EDÎTOR

Edebiyata kurdî xwedî nerîteke edebî ya bandorker e ku bi mîrateya xwe ya çandî ya dewlemend û kûrahiya dîrokî îro derdikeve pêşberî me. Ziman û çanda gelê kurd bi sedsalan bi berhemên nivîskî û devkî hatiye îfadekirin ku edebiyata kurdî ya klasîk bi tenê beşa nivîskî pêk tîne. Edebiyata kurdî ya klasîk ji aliyekî ve ji me re dibe alîkar ku em dîrok û nasnava civaka kurd fam bikin, ji aliyê din ve jî reseniya vê nerîta edebî ya giring radixe ber çavên me. Dikare bê gotin ku edebiyata kurdî ya klasîk kevneşopîyeke edebî ye ku bi sedsalan di nav erdnîgariyên cihê û hevbandoriyên kulturî de pêş ketiye û kemiliye.

Heta îro li ser xebatên di biwarê edebiyata kurdî ya klasîk de gelek lêkolîn hatine kirin. Nemaze di wan çend dehsalên dawî de xebatên akademîk ên li ser nûnerên edebiyata kurdî ya klasîk û berhemên wan balê dikêşin. Herwiha, wisa tê zanîn û texmînkirin ku gelek şair û berhemên edebiyata kurdî ya klasîk hene ku hê jî nehatine keşfkirin. Digel vê yekê ev edebiyat, îro jî xasma ji aliyê ehlê medrese û tekyayê ve tê îcrakirin, dibe sedem ku lêkolîner bi kelecaneke coş berê xwe bidin vî biwarî û li ser vê yekê bisekinin û lêkolînên kûrtir bikin.

Wekî tevkariyek ji bo lêkolîn û xebatên vî biwarê berhemdar, Kovara *The Journal of Mesopotamian Studies (JMS)*, bi vê hejmara taybet hewl da ku derê edebiyata kurdî ya klasîk hinekî din veke. Armanca vê hejmara taybet ew e ku ji me re bibe alîkar da ku em bedewî, kûrahî û çarçoveya dîrokî ya edebiyata kurdî ya klasîk baştir fam bikin. Ji ber ku lêkolînên edebiyata kurdî ne tenê bi edebiyatê re, herwiha bi dîrok û nasnava gelê kurd re jî têkildar in. Ev hejmara taybet dike armanc ku bibe çavkaniyeke giring ji bo dildarên klasîkan, akademîsyen û lêkolîneran di hînbûna agahiyên zêdetir li ser edebiyata kurdî ya klasîk û lêkolînên kûr û îlhama xebatên nû de. Gotarên ku di vê hejmara taybet a edebiyata kurdî ya klasîk de hatine berhevkirin, çend ji wan lêkolînên hêja ne ku hewl didin cîhana zanistî ya klasîkên kurdî kûrtir têbigihjin. Gotar û nirxandina pirtûkan yên di vê hejmara taybet de bi rêzê wiha ne:

Numan Yurt di gotara xwe ya bi sernavê “*Vekolîna Naverokî û Hêmanên Binyadî yên ‘Iqdê Durfamê’*” de ji aliyê rêbaz û teknîkên vegêrannasiyê li ser berhema “*Iqdê Durfamê* ya Şêx Eskerî yê Axtepî sekiniye û avahiya tematîk û hêmanên binyadî yên vê berhemê bi hûrgilî analîz kiriye.

Nevzat Eminoğlu, bi sernavê “*Prototîpên Ciwanîyê di Estetîka Şi‘ra Melayê Cizîrî de*” gotarek pêşkêşî me kiriye. Eminoğlu, bi vê gotarê yek ji mijarên sereke yên edebiyat klasîk rawestiyaye û mijara estetîk û prototîpên ciwanîyê di *Dîwana Melayê Cizîrî* de sepandiye.

Gotara sêyan a vê hejmarê bi sernavê “*Mela Nûrullahê Godîşkî û Dîwana Wî*” ya Nesim Sönmez e. Sönmez, di gotara xwe de li ser şair û alim Mela Nûrullahê Godîşkî sekiniye, dîwana wî bi berfirehî daye nasandin ku hê jî di halê destnivîsê de ye.

Zafer Açar, di gotara xwe de li ser mewlûdeke kurdî ya nivîşkan lêkolîneke zimanî kiriye ku sernavê xebata wî wiha ye: “*Mewlûda Netemam ya Şêx Qutbedînê Korîkî: Awirvedanek li ser Taybetmendiyên Zimanî ya Metnê*”. Açar, ji aliyê zimên ve nirxandinek li ser mewlûda Şêx Qutbedînê Korîkî kiriye û di vê lêkolîna xwe de xwestiye ku wêneyeke giştî ya şiyana şairî ya li ser ziman û devoka wî û zanîna wî ya devokên kurmancî diyar bike.

Gotara pêncan a vê hejmarê ya Nurettin Ertekin e bi sernavê “*Analîza Dîwana Mela Ebdulezîzê Bedlîsî ji layê Şikl û Naverokê ve*”. Mela Ebdulezîzê Bedlîsî yek ji şairên edebiyata kurdî ya tesewîfî ye ku di dawîya serdema Osmanî de jiyaye û li pey xwe diwaneke şî‘rê hiştiye. Ertekin di vê gotarê de jiyana û *Dîwana Mela Ebdulezîzê Bedlîsî* kiriye mijara lêkolîna xwe.

Şiyar Levent, di gotara xwe ya bi sernavê “*Feqiyê Teyran: Danêrê Çîrokeşi'ra Kurdî*” de li ser menzûmeyên Feqiyê Teyran sekiniye û bi çavê çîrokan ew nixandine û di encamê de gihîştîye vê tezê ku Feqî, danerê çîroke-şi'ra kurdî ye.

Gotara duyan a li ser Feqiyê Teyran hatiye nivîsîn a Halil Akgül e ku bi sernavê “*Tema û Hêmanên Felsefî di “Ey Av û Av” a Feqiyê Teyran de*” di vê hejmarê de cih girtiye. Akgül, di vê lêkolîna xwe de tema û hêmayên ku di qesîdeya navdar a Feqî de derketine pêş peyda kirine û nixandinek li ser wan kiriye.

Gotara sêyan a li ser Feqiyê Teyran jî ya Mazhar Çiftçi ye. Çiftçi bi sernavê “*Aheng û Musîqî di Helbestên Feqiyê Teyran de*” tevkari li hejmara taybet kiriye û di lêkolîna xwe de ji aliyê ahengê ve li ser xezel, qesîde û menzûmeyên Feqî nixandinek kiriye.

Serdar Yılmaz, bi gotara xwe ya “*Hermenotîk û Edebiyata Kurdî ya Klasîk*” xwestiye ku bala lêkolerên klasîk bide li ser hermenotîk û te'wîlê. Herwiha wî di gotarê de hin pêşniyaz kirine ji bo xebatên ku di vî biwarê de hatine kirin.

Ji bilî van gotarên akademîk, di vê hejmarê de du heb nixandina pirtûkên klasîk hene ku nivîsarên bi vî rengî di akademiye de cihekî giring digirin. Ji wan nivîsaran, ya ewil a Îlyas Suvağci ye ku wî berhema “*Melayê Cizîrî Hin Tîşt derbarê Jîyan û Berhema Wî de*” ya Izedîn Mistefa Resûl nixandiye û bala lêkolerên klasîk kêşaye li ser wê kitêbê ku ji aliyê Ziya Avcî ve di sala 2020an de ji soranî hatiye kurmancîkirin.

Nivîsara duyan a nixandine ya Zafer Açar e. Açar, lêkolîna M. Zahir Ertekin a bi navê “*Kürtçe Sîyer Yazıcılığı*” (2022) jî xwe re kiriye mijar û nixandineke akademîk li ser kiriye. Ev berhem di sehaya xwe de tekane kitêb e ku berhemên sîreta Hz. Pêxember ên kurdî (digel kurmacî, soranî, zazakî, hewramî) vekolaye û wekî xebateke berfireh ketiye lîteraturê. Herwiha ji aliyê bîbliyografîk ve jî ev kitêba ku danasîna sîretan dike, dihêle lêkolîner xwe bigihînin gelek xebat, berhem û destnivîsên kurdî yê di biwarê siyeran de.

Em spasdarê wan nivîskar û lêkoleran in, ji bo ku ev xebat derkeve meydana rahiştine qelema xwe û di pêvajoya fermî ya çûnûhatina gotaran de bi sebreke mezin xebitîn û di encamê de tevkariyeke giring li lîteratûra edebiyata kurdî ya klasîk kirin. Herçiqas hekemtî perçeyeke ji karê akademiye be jî em spasiyeke taybet ji bo hekemên vê hejmarê dikin ku dilê me nehiştin û bi fedakariyeke mezin demê xwe ji bo nixandina gotaran veqetandin. Spasiyeke taybet ji Doç. Dr. Ahmet Kırcan û Dr. Şehmus Kurt dikin ku ev hejmara taybet a klasîkên kurdî bi alîkarî û hevkarîya wan pêk hat.

Bi hêviya ku ev xebat bi lêkolînên nû pêş bikeve, mezintir bibe û ji bo nifşên paşerojê bê veguheztin.

Doç. Dr. Yakup AYKAÇ

Edîtorê Hejmara Taybet a Edebiyata Kurdî ya Klasîk

EDITORIAL

Kurdish literature has a fascinating literary tradition characterised by its rich cultural heritage and historical depth. The language and culture of the Kurdish people have been reflected over the centuries in written and oral works, of which classical Kurdish literature is the written part. Classical Kurdish literature helps us understand the history and identity of the Kurdish community, while highlighting the uniqueness of this important literary tradition. It can be said that classical Kurdish literature is a literary tradition that has developed over centuries in different areas and in the midst of cultural interactions. To date, many studies have been conducted on the works of classical Kurdish literature. Especially in the last decades, academic studies on the representatives of classical Kurdish literature and their works have attracted attention. Add to this the fact that there are representatives and works of classical Kurdish literature that are believed to exist but have not yet been discovered, and the fact that this literature is still performed today, especially by members of madrasas and Sufi lodges, prompts researchers to turn to this field or to make the search of researchers in this field alive.

As a contribution to the study of this fertile field, the Journal of Mesopotamian Studies (JMS) has endeavoured to open a unique window on classical Kurdish literature with this special issue. This special issue is intended to help us better understand the beauty, depth, and historical context of classical Kurdish literature. The study of Kurdish literature is closely linked not only to the literature itself, but also to the history and identity of the Kurdish people. For literature lovers, academics and researchers, this issue aims to be an important resource for learning more about Classical Kurdish Literature, conducting in-depth analyses and inspiring new research opportunities. The articles brought together in the Special Issue on Classical Kurdish Literature are some of the valuable analyses that seek to understand the scholarly world of Kurdish classics. The articles and book reviews in this special issue are as follows:

Numan Yurt, in his article titled “Analysis of Thematic and Structural Elements of Iqdê Durfam”, analysed Şeyh Askerî’s ‘Iqdê Durfam with the methods and techniques of narratology, and discussed the thematic structure and basic elements of the work in detail.

Nevzat Eminoğlu contributed to the special issue with his article titled “Beauty Prototypes of Melayê Cizîrî’s Poetry Aesthetics”. Eminoğlu focused on the themes of aesthetics and beauty, which are among the basic subjects of classical literature, and tried to apply these subjects to Melayê Cizîrî’s Dîwan.

The third article in this issue is “Molla Nurullah Godişki and his Divan” by Nesim Sönmez. In his article, Sönmez focuses on the life of Molla Nurullah Godiski, one of the most important poets of the last period of Classical Kurdish Literature, and his poetry Divan, which still exists in manuscript.

Zafer Açar, “Sheikh Kutbeddin Koriki’s Incomplete Mawlid: An Overview of the Linguistic Features of the Text”, he linguistically analyses an unfinished mawlid written in the last period of Classical Kurdish Literature. Apart from some general information about the literary aspects of the work, Açar focuses on its linguistic features. The phonology of the classical text is also analysed in this study, and important morphosyntactic issues that can reveal the linguistic level and ability of the poet are also examined.

The fifth article of the journal is Nurettin Ertekin's article titled "Analysis of Mullah Abdulaziz Bedlisî Divan in terms of Form and Content". Mullah Abdülaziz Bitlisî is one of the important poets of Classical Kurdish Literature who lived in the last period of the Ottoman Empire and left behind a divan. In this study, Ertekin analysed the life and poetry divan of this poet.

Şiyar Levent, in his article titled "Feqîyê Teyran: The Founder of Kurdish Verse Storytelling", focuses on Feqiyê Teyran's verses and analyses them in terms of stotyelling. Levent reached the thesis that Feqiyê Teyran is the founder of Kurdish verse storytelling.

The second article on Feqiyê Teyran was written by Halil Akgül. In his article titled "Theme and Philosophical Elements in Feqiyê Teyran's Poem 'Ey Av û Av'", Akgül identified and analysed the prominent themes and philosophical elements in Feqiyê Teyran's famous ode.

The third article on Feqiyê Teyran in the journal belongs to Mazhar Çiftçi with the title "Harmony and Music in Feqiyê Teyran's Poems". In his article, Çiftçi discussed the two basic elements of classical literature, harmony and music, and applied them to Feqiyê Teyran's ghazals and qasida.

Serdar Yılmaz, in his article titled "Hermeneutics and Classical Kurdish Literature", focused on the concept of hermeneutics in Classical Kurdish Literature, drew attention to these studies, which are still at the beginning level in terms of Classical Kurdish Literature, and made some suggestions about this field.

In addition to the articles mentioned above, the book review section of this special issue, which is important in the academic world, includes two reviews of works belonging to the field of Classical Kurdish Literature. The first of these reviews is İlyas Suvağci's "Melayê Cizîrî Hin Tişt derbarê Jiyan û Berhema Wî de" [A Few Things About the Life and Works of Mullah Ahmad-i Jazîrî] (2020), written by Izzeddîn Mustafa Resûl, and made important remarks about the work in question.

The second review in the book review section was written by Zafer Açar. Açar examined the work titled "Kurdish Siyar Writing" written by M. Zahir Ertekin in 2022. The aforementioned work is the only book in its field and has the quality of a review-research that has conducted a wide range of research in the field of Kurdish siyar. According to Açar's evaluation, this book, which also has a bibliographic feature, has a guiding quality for researchers to access many manuscripts, books and various studies related to this field.

We would like to thank the valuable authors and researchers who contributed to the publication process of this special issue of our journal with great patience and hard work. Although journal reviewing is a part of academics, we would like to express our gratitude to all of them separately for taking their valuable time to evaluate the articles in the journal and contributing to each study with their criticisms. Finally, we would like to thank Assoc. Prof. Dr Ahmet Kırkan and Dr. Şehmus Kurt for their great contribution to the publication of this special issue.

We hope that this study in the field of Classical Kurdish Literature will pioneer new research, contribute to the development of this field and guide future generations.

Assoc. Prof. Dr. Yakup AYKAÇ

Special Issue Editor

Numan YURT,

Xwendekarê Doktorayê, Zaningeha Mardin
Artukluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî yên li
Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda
Kurdî, Mardin-Türkiye.

numanyurt1@gmail.com,
ORCID: 0000-0002-8921-3939

Article Type/Makale Türü:

Research Article/Araştırma Makalesi

Received / Makale Geliş Tarihi: 22.07.2023

Accepted / Makale Kabul Tarihi: 01.10.2023

Published / Makale Yayın Tarihi: 20.10.2023

DOI: 10.35859/jms.2023.1328385

**Değerlendirme ve İntihal/Reviewing and
Plagiarism:**

Bu makale iki taraflı kör hakem sistemine göre
en az iki hakem tarafından değerlendirilmiştir.
Makale intihal.net adlı intihal sitesinde
taranmıştır. / This article has been reviewed
by at least two anonym reviewers and scanned
by intihal.net plagiarism website.

Citation/Atf:

Yurt, N. (2023). Vekolîna Naverokî û Hêmanên
Binyadî yên 'Iqdê Durfamê, The Journal of
Mesopotamian Studies, Jimara Taybet a
Edebiyata Kurdî ya Klasîk, rr. 13-50, DOI:
10.35859/jms.2023.1328385.

VEKOLÎNA NAVEROKÎ Û HÊMANÊN BINYADÎ YÊN 'IQDÊ DURFAMÊ

Numan YURT

KURTE

Di vê gotarê de fabla bi navê 'Iqdê Durfamê ya Şêx Eskerî ji aliyê rêbaz û teknîkên vegêrannasiyê ve tê vekolîn. Berhem di qada edebiyata Kurdî a klasîk de yekem mînaka fablê ya serbixwe û guncandî ye. Çîroka bingehîn a berhemê fabla *Rovî û Qijikê* li seranserê dinyayê berbelav e û nîspetî Ezop tê kirin. Şêx Eskerî jî vê fablê tevî çîroksaziyeke dînî, tesewîfî û çandî pêşkêş kiriye. Eskerî bi rêya vê mesnewîya alegorîk a ku li ser bingeha vegêranê hatiye avakirin rexneya civakê kiriye. Di destpêka xebatê de behsa pênase, taybetî û hin mînakên çanda Rojhilatê yên cureya fablê, pêwendîya mesnewî-vegêranê hatiye kirin. Piştî wek jêdera 'Iqdê Durfamê behsa Ezop û fablên wî hatiye kirin û fabla Eskerî hatiye nasandin. Di dawîya xebatê de jî avahiya tematîk û hêmanên binyadî yên berhemê bi hûrgilî li gorî rêbaz û teknîkên vegêrannasiyê hatiye analîzkirin. Wek encam dikare bê gotin ku Şêx Eskerî van rêbaz û teknîkan bi serkeftinî bi kar anîye.

Peyvên Sereke: Şêx Eskerî, 'Iqdê Durfam, Fabl, Naverok, Hêmanên Binyadî.

'Iqdê Durfam'ın İçerik ve Yapı Unsurlarının İncelenmesi

ÖZ

Bu makalede Şeyh Eskeri'nin '*Iqdê Durfam* adlı eseri anlatıbilim yöntem ve teknikleri bakımından incelenmiştir. Eser Klasik Kürt Edebiyatı alanında ilk müstakil ve adaptasyon fabl örneğidir. Eserin ana hikâyesi *Tilki ile Karga* dünya çapında yaygındır ve Ezop'a nispet edilir. Şeyh Eskeri de bu fablı dini, tasavvufi ve kültürel bir kurguyla sunmaktadır. Eskeri anlatım esasına dayalı bu alegorik mesnevi vasıtasıyla toplumsal eleştiri yapmaktadır. Çalışmanın giriş bölümünde fabl türünün tanımı, özellikleri ve Doğu kültürü örnekleri ile mesnevî-anlatı ilişkinden söz edilmiştir. Sonra '*Iqdê Durfam*'ın kaynağı olarak Ezop ve fabllarından bahsedilmiş ve Eskeri'nin fablı tanıtılmıştır. Çalışmanın sonunda da eserin tematik yapısı ve yapısal unsurları anlatıbilim yöntem ve teknikleri bakımından ayrıntılı bir şekilde tahlil edilmiştir. Sonuç olarak Şeyh Eskeri'nin bu yöntem ve teknikleri başarılı bir şekilde kullandığı söylenebilir.

Anahtar Kelimeler: Şeyh Eskeri, 'Iqdê Durfam, Fabl, İçerik, Yapısal Unsurlar.

Analysis of Thematic and Structural Elements of *Iqdê Durfam*

ABSTRACT

In this article, the fable called '*Iqdê Durfam* by Sheikh Eskeri is analyzed by the methods and techniques of narratology. The work is the first example of an independent and adaptation fable in the field of classical Kurdish literature. The main story of the work is the fable of the *The Fox and The Raven*, which is popular all over the world and is attributed to Aesop. Sheikh Eskeri also presented this fable with a religious, mystical and cultural fiction. Eskeri has criticized the society through this allegorical masnavi which is built on the basis of narrative. At the beginning of the work, the definition, specifics and some examples of the Eastern culture of the fable genre, the mesnevi-narrative relationship have been mentioned. Then Aesop and his fables were mentioned as the source of '*Iqdê Durfam*'s and Esker's fable was introduced. At the end of the study, the thematic structure and structural elements of the work have been analyzed in detail according to the methods and techniques of narratology. As a result, it can be said that Sheikh Eskeri successfully used these methods and techniques.

Keywords: Sheikh Eskeri, 'Iqdê Durfam, Fable, Content, Structural Elements.

EXTENDED ABSTRACT

Mesnevi is one of the verse forms and literary genres of classical literature based on narrative style. Like the narrative texts of the modern period, mesnevi met the narrative needs of the classical period. The study of classical texts/poems has been and is being done with classical methods. Today's narrative genres are analyzed with modern sciences and their methods. With modernism, a new perspective has emerged and literary works have begun to be evaluated and positioned in this light. Narratology is one of the modern sciences that systematically analyzes a narrative and endeavors to reveal the narrative technique of the work. The reason that led us to this study: Could a work of classical Kurdish literature based on narrative be analyzed and its value be revealed according to narratology? What is the narrative style of a Kurdish masnavi author and what methods and techniques did the author utilize? When the work is analyzed in terms of narratology, the background of the work and the culture of classical literature are not ignored.

The study was conducted on Sheikh Muhammad Eskeri Aqtepi's *'Iqdê Durfam*. Written in masnavi verse and narrative style, this work is the first independent allegorical fable in classical Kurdish literature. The main purpose of the article is to analyze the thematic structure and structural elements of the work, as well as to reveal its source and the reason for its writing. With this study, an attempt has been made to identify the characteristics of a Kurdish masnavi in the context of narratology. If other masnavis are also analyzed with the methodology of narratology, the characteristics of other masnavis of classical Kurdish literature and the literary styles of their authors can be revealed.

In order to explain the characteristics of *'Iqdê Durfam*'s terms of narratology, the theories of narratology were applied; the thematic structure and structural elements of the work were analyzed according to the methods and techniques of narratology. The research consists of four general headings and subheadings. In the first heading, some opinions about the source of fables are presented, and findings about the source of the fable of the Fox and the Crow are given. In the second heading, the work is introduced in detail and the reason for its writing and its background are discussed in detail. The theme and metaphors of *'Iqdê Durfam*'s are discussed in the third section. In the last section, the structural elements of the work in terms of narrative theory; plot, character, place, time and narrator are analyzed, and the narrative methods and techniques used are identified.

In addition to the fable of the Fox and the Raven attributed to Aesop, Sheikh Eskeri made local and original additions to the chain of events of the work. With these additions, Eskeri tried to dress his work in a mystical and cultural dress. Apart from the main story of Aesop's fable, Eskeri added events such as the journey of the dervishes and their arrival in the garden, the journey of the dervish, the dervish's encounter with the orphan boy, the crow taking the cheese from the boy, the fox taking the cheese from the crow, and the fox being caught in a trap and slaughtered by the hunter. The journey of the dervish is the frame event of the plot and the other links are narratives attached to this general frame. The fable consists of three narrative levels: Non-narrative level R D G B, narrative level Ç D J B and metanarrative level D û Z, Z û Q, Q û R, R û N. The characters of the fable are typical and do not change until the end of the fable. The characteristics of the characters reflect the personalities in the society and some of the concepts in the work are used with their metaphorical meanings. Sheikh Eskeri did not give special names to his characters, but they are reflected with their verbs and adjectives in a way that corresponds to their genus names.

The setting of the fable is unlimited and imaginary; it is determined according to the events and characters. The events take place in nature from the beginning to the end of the fable. The ambiguous expression "ji ehwalê zeman" is used as the time of the events. The purpose of the author of the masnavi in using this expression is to provide continuity and permanence to his work. The duration of the beginning and the end of the events is short; the events progress in a chronological order. Within the chronology of the military plot, the narrator uses the technique of flashback. The narrator did not go into the details of events and situations with expressions such as "for a time" and "a little"; in this way, he applied the "skipping" technique. The narrator shows himself in two ways in the fable. At the non-narrative level, Sheikh Eskeri, as an omniscient and non-narrative narrator, and at the narrative level, the dervish, as a narrative character, takes on the role of narrator. Both narrators are open/obvious narrators who do not hesitate to express their thoughts and feelings. In the narrative sections, the events are narrated through the mouth of the dervish. The author of the masnavi, on the other hand, is involved in the narrative as someone who knows what is going on in many chapters with his comments and advice about the events and with the sovereignty of being sovereign.

Eskeri utilized some narrative methods and techniques in conveying the events and situations in this classic work; he achieved a literary style by applying these narrative methods and techniques in his work. Since fable is a work based on narrative, narrative narration was naturally used. In the chapters

and couplets with military narrative, he conveyed the plot very fluently and successfully established the relationship between the rings of events. However, the couplets written at the beginning of each chapter in the form of sakiname break this fluency to some extent. However, this should be considered normal as a feature of the masnavi tradition. Eskeri compensated for this deficiency with summarizing and flashback techniques: he managed to connect the broken links with these techniques. Another narrative method employed is description. The descriptions of the work are skillfully and in detail; a successful visuality is presented. Dialogues have a long and important place in the work. Apart from these methods, Eskeri also used techniques such as internal dialog, internal monologue, internal analysis and montage. Eskeri has demonstrated his productivity and distinctiveness with both the fiction of his work and his literary style.

Destpêk

Fabl yek ji cureyên edebî yê herî kevin ê derbirîna mirovahiyê ye ku ji çîrokên kurt û alegorîk pêk tên. Di zincîreya rûdanê ya fablan de wek karakter ajel, mirov, xweda/îlah û heyberên bêgiyan cih digirin û ev leheng di heqê rewş û tevgerên mirovî de rastiyeke exlaqî ronî dikin (Duggan û yên din, 2016: 315). Fabl berhemên didaktîk in û mebesta wan şîret û rênîşandan e. Dahênerê fablan di van berhemên alegorîk de dixwazin ku bi şîret û dersên exlaqî kesekî, rêvebirî yan jî civaka xwe hişyar bikin. Fabl ji vî aliyê ve rexneyeke veşarî ya takekesî, civakî û polîtîk a xurt jî dihewînin. Mirovan di serdemên berê de ji ber tirsê yan jî ji ber ku nikaribûn rêvebirî/revêbiran rexne bikin bi awayekî nerasterast û çîrokên temsîlî ji wan daxwaza dadî û pakkirina civakê dixwestin. Tê dîtin ku rêya herî baş a pêkanîna vê armancê jî bi navgîniya fablan û zimanê ajelan şîretdana tevgerên bifezîlet e (Îpek, 2012). Çavkaniya van berhemên rexneyî û şîretî ku kemilîn û fezîletdariya civak û rêvebiriyê jixwe re kirine armanc mîtolojiya Yewnanî û Îranî, Îslam, tesewîf û çanda neteweyî ye (Canım, 2020: 225). Ev rexne, şîret û ders carinan di destpêkê de carinan jî di dawiyê de cih digirin. Di fablan de tevgerên erênî yên mîna dirustî, xweşbînî, nefsbîçûkî tê pêşniyazkirin û yên neyînî wek derew, çavbirçîtî, quretî hwd. tê rexnekirin. Fabl bi vê taybetmendiya xwe dibe navgîneke perwerdeyê û hêla wê ya pedagojîk jî derdikeve pêş. Ev cure bi peywira xwe ya rênîşandanê ji biçûk heta mezinan ji her çînên civakê re dibe sûdmend û guncav.

Fabl herçend di binemaya xwe de ji bo mirovan hatibin nivîsîn jî serlehangên wan ajel in û di hin fablan de jî riwek in. Wek lehengên fablê ajel, bi taybetmendiya xwe tîp/karakterên di nav civakê de dinimînin. Nivîskarên fablê taybetmendiya mirovan li ajelan bar dikin û ajel wekî mirovan tevdigerin, diaxivin, difikirin û hîs dikin (Keskin, 2019: 218). Barkirina kesayetekî li ajelan, bi xeyalkirina wan a wekî mirovekî/ê ku hîs dike, difikire û diaxive; bi gotin û tevgerên mirovan rexnekirin û berçavkirina wan ji berhemên herî kevin ên Yewnan û Hindê yên edebiyatên dinyayê û herwiha ji huner û çareseriyên serlêdanê ne (Banarlı, 2001: 458). Nivîskar bi vê şeweyê hunerên întaq û teşxîsê pêk tînin. Lêbelê taybetmendiya sereke ya cureya fablê axaftina/axifandina ajelan e. Nivîskar wek leheng di hîljartina ajelan de armanc dike ku mijarên razber raxe ber çavê xwîneran û di hişê wan de şênber bike. Piraniya fablan ji bûyerên kurt, ji zimanekî sade û peyameke eşkere pêk tên. Di nav fablan de gelek caran em rastî gotineke pêşiyê, biwejek an jî gotineke wecîz tên.

Fabl di edebiyatên dinyayê de berbelav in; mijar û peyamên wan li seranserê cîhanê hevpar an jî kêr zêde nêzî hev in. *Fablên Ezopî* (BZ. ss. 6) li nav alema Rojavayê berhema sereke ya cureya fablê ye. Çîrvanokên La Fontaine (ss. 17em) jî bi bandora fablên Ezopî hatine nivîsîn. Li alema Rojhilatê di nav erdnîgariya Hindî-Îranî de bi Sanskirîti çîroka *Karata û Damanaka* cara yekem bi navê *Pançatantra* bi Pehlevîkî, piştê bi Suryanîkî û bi wergera Erebi ya Îbn Muqeffa bi navê *Kelîle û Dîmneyê* belav bûye (Canım, 2020: 225). Li Îranê *Mantiqû'l-Teyra* Ferîduddîn Ettar, *Tûtînameya Ziyaeddîn Nahşebî û Mûş û Gurbeya Ubeyd Zakanî*, li nav Usmaniyan *Harnameya Şeyhî nimûneyên sereke yên vê cureyê* ne. Ji bilî van berhemên serbixwe hin fabl jî di nav berhemên curbicur de hatine nivîsîn. Fablên di nav *Mesnewîya* Mewlana de dikevin vê kategoriyê.

Minakên cureya fablê wekî edebiyatên neteweyên din di edebiyata Kurdî de jî tê dîtin. Hin ji van berheman menzûm hin jî pexşan in. Li gorî zanyariyên li ber dest û lêkolîna me di edebiyata Kurdî ya Kurmancî de ji bilî *'Iqdê Durfama Şêx Eskerî* pêve berhemeke serbixwe tune. Şêweya fablê û wek taybetiyeke wê teşxîs û axifîn /axifandin di berhemên klasîk ên Kurdî de tenê wek hunerên edebî cih digirin. Feqiyê Teyran di helbesta xwe ya *Feqe û Bilbilê* (Sadinî, 2010: 147) de digel xwe bilbilê bi rêya guftûgoyê axifandiyê. Fablên *Şêr*, *Quling û Rovî*, *Serxwebûna Mirîşkan* (Cegerxwîn, 2012: 335) ên Cegerxwîn, fablên Osman Sebrî yên mîna *Welatê Tirîvirîyan*, *Şivan û Beran* (Sebrî, 2012: 469) û gelek fablên menzûm û pexşanî ji aliyê gelek helbestvan û nivîskarên kurd ve di kovara *Hawarê* de hatine weşandin. Em di pirtûk, kovar û rojnameyên Kurdî de hem rastî wergerên menzûm û pexşan ên fabla *Rovî û Qijikê* hem jî fablên dîtir tên. Biqasî ku tê zanîn di tarîxa edebiyata Kurdî ya klasîk de yekem berhema fablê ya serbixwe *'Iqdê Durfama Şêx Eskerî* ye. Şêx Eskerî gazinek xwe yên ji dem, dewran û mirovan herwiha şîretên xwe yên di vê çarçoveyê de bi rêya fableke Ezopî tevli dahênanekî pêşkêş dike. Mehmûd Lewendî (Pertev, 2008: 139) û Perwîz Cîhanî jî vê fablê bi awayê menzûm bal bi Kurdî ve wergerandine.

Fabl hem bi awayê menzûm hem jî pexşan hatine nivîsîn. Teşeya mesnewiyê di serdema klasîk de ketiye şûna pexşanê û ji vegêranê re teşeya herî guncav e. Mesnewî li Rojhilatê wek terza vegotinê "qalibê romanê" bû, îhtiyaca romanê dabîn dikir û terza wê ya qalib-kin dîsa derfeteke guncav e ji bo teswîra şexs, mekan û bûyerê (Alan, 2019: 197). Ji ber vê fablûsên Îslamê/Rojhilatê yên serdema klasîk ji bo mijarên dîdaktîk, exlaqî, dîrokî yên çîrokî/tehkîyeyî ev cure hilbijartine. Mesnewî li nav Kurdan jî valahiya pexşanê û mijarên ku bi pexşanê tên nivîsîn tije kiriye. Dîsa ev teşe di rewşenbîriya Kurdan de roleke giring lîstiyê û ji ber ku tekane belgeyên tarîxî yên hizra Kurdî ne nîşaneyê herî xurt a peywendiya edebiyata Kurdî ya klasîk û hizra Kurdî ye (Adak, 2019: 325).

Mesnewî di serdema klasîk de herçend pêdiviya vegêranê ya civakê pêk anîbe jî ji vegêranên serdema nûjen cudatir in. Menzûmbûn, qalibê erûzê, dabeşkirin û navên beşan (tewhîd, na't, medhîye, sebebê te'lîfê) cihêtiyên forma mesnewiyên e. Wek du formên cuda yên vegêranê di heqê pêwendiya mesnewî û romanê de nêrinên cuda (Kekeç, 2017) hebin jî di lêkolînên berê de em dibînin ku di navbera van her du formên vegêranî de gelek hevparî jî hene. Hêmanên wek zincîreya rûdanê, qadroya kesan, dem, cih, vegêr û rêbazên vegêranê di mesnewî û roman/çîrokê de xalên hevpar in. Fabl jî wek çîrok û romanê cureyeke edebî ye lêbelê ji rûdanekê yan çendîn rûdanên biçûk û kurt pêk tê. Ji ber ku fabl cureyeke çîrokî/tehkîyeyî ye di plansaziya wê de bi giştî sê beş hene: Beşa destpêkê/raxistinê (**exposition**), beşa girêkê/girêbûyer (**rising action**) û beşa çareseriyê/encamê (**resolution**). Îcar di mesnewiyên klasîk de ev beş bi rêzê dibin dîbace, mijara sereke û xatîme. Herçend mesnewî ji aliyê şiklê vegêranê (narrative form) ve dişibin çîrok an romanên modern jî di beşa dîbace û xatîmeyê ya mesnewiyên çîrokî de vegêran tune. Vegêran ji ber ku bingeh û rêbaza sereke ya mesnewiyên çîrokî ye me di xebata xwe de ji teknîkên vekolînê yên vegêrannasiyê sûdwergirtiye. Dema ku rêbazên vekolînê yên nûjen bîn sepandin divê lêkolîn li gorî binemaya mesnewiyê be ne ku berhemên klasîk nêzî cure û teşeyên modern bîn kirin (Ece, 2002: 99). Herwiha divê alema hizrî ya edebiyata klasîk neyê jibîrkirin û nixrandin jî li gorî vê paşxaneyê bê kirin. Fabla *'Iqdê Durfamê* me bi vî çavî xwendiyê û rêbazên vegêrannasiyê li ser berhemê sepandiyê.

Qada xebatê ya bingehîn beşa/mijara sereke ya *'Iqdê Durfamê* ye ku li ser vegêranê hatiye saz kirin. Di vê gotarê de wek çavkaniya *'Iqdê Durfamê* behsa Ezop û fabla wî ya "Rovî û Qijik"ê hatiye kirin û berhema Şêx Eskerî hatiye danasîn. Behsa sebebê telîfê" jî ber giringî û pêwistiya wê –sedema nivîsînê, poetîka hwd.- bi hûrgilî hatiye kirin. Avahiya tematîk di çarçoveya tema, mijar û metaforên fablê de; hêmanên binyadî jî di çarçoveya vegêrannasiyê (zincîreya rûdanê, karakter, cih, dem û vegêr) û rêbazên vegêranê de hatiye vekolîn.

1. Jêdera Fablan û Fabla Ezopî: Rovî û Qijik

Nêrinên cuda di heqê derketin, pêkhatin û jêdera dîrokî ya fablê de hene û lêkolîna wê jî dikeve qada folklor û teoriyên wê. Ji ber vê em ê di vê beşê de behsa hin nêrinên sereke yê di vê qadê de bikin û vê mijarê hewaleyî lêkolerên qadê bikin. Piştî behsa Ezop û fablên wî herwiha wek çavkaniyeke akademîk behsa jêdera fabla “Rovî û Qijik/Qijik û Rovî”yê bikin.

Theodor Benfey di vî warî de balê dikişîne ser nêzikahiya çîrokên Hindûyî, Ewropayî û deverên din. Li gorî wî di navbera van şaristaniyan de ev pêwendîya çandî û dîrokî bi rêya deynwergirtinê pêk hatiye. Benfey bi “Teoriya Deynwergirtina Çandî û Koçkirina Çîrokan” îddîa dike ku jêdera bingehîn Hindistan bû û çîrokên Hindûyan bi rêya devkî û nivîskî derbasî Îran, Erebaştan û Filistinê, ji vir jî bi rêya bazirganiyê di ser Deryaya Spî re gihastine Ewropayê. Rojhilat bi vê veguhestina çandî bandoreke bihêz li Rojavayê kiriye (Yıldırım, Pertev û Aslan, 2013: 42). Benfey tenê binyada çîrokên Ezopî bi Yewnana Kevin ve girêdide (Keskin, 2019: 210). Zanyarên “Teoriya Geşedanê” jî li ser pêkhatina berhemên folklorî û edebî rawestiyane û li gorî wan ji ber ku rih û têgihîştina mirovan li her derî yek û wekhev e bêtir ku hay ji hevûdû hebin dikarin berhemê nêz an wekî hev biafirînin (Yıldırım, Pertev û Aslan, 2013: 44). Hilal di heqê jêdera fablan de behsa sê çavkaniyan dike û dibêje:

Çîrokên yekem ên bi zimanê ajelan li gorî hin lêkoleran ji hêla Yewnanan ve hatine nivîsîn û tê îddiakirin ku hin mînakên fablê di berhemên Ezopî (BZ. VI) yan jî di yê Hesîod (BZ. VII) de hene. Li gorî hinan ev cure çîrok peşîn Hindûyan vegotine û dîroka wê ji sedsala VIIem a BZ. kevintir e û beşek ji van di pirtûka bi navê *Jataka* de cih digirin. Li gorî hin lêkolerên din jî jêdera bingehîn a vê cure çîrokê Misira kevin e û ji wir derbasî edebiyatên Yewnan û Hindê bûye. Lewra dîroka çîroka Papîros (Şêr û Mişk) a ku aîdê Misirê ye heta sedsala XIIem a BZ. diçe paş. Rastiya van angaştan ew e ku herçend di destê her sê şaristaniyan de metneke nivîskî tunebe jî di pêkhatina vê cureyê de behra van gelan heye (Hilal, 1373/veg. Çiftçi, 1999).

Dema ku em bala xwe didin van nîqaş û boçûnan bersiveke zelal û qanîker ku berê me bide jêdera van çîrokan hêjî peyda nebûye. Jêder kîjan şaristanî dibe bila bibe tenê em dikarin bêjin ku danûstandineke çandî pêk hatiye û xalên hevpar di nav van şaristaniyan de peyda bûne.

Hin lêkoler di edebiyata dinyayê de mînakên pêşîn ên cureya fablê herçend îsnadê Ezopî dikin jî di vê mijarê de palîşteke pêbawer tune. Berhevoka çîrvanokan a herî kevin ku îsnadê Ezopî tê kirin BZ. di sedsala VIem de ji aliyê Demetrîosê Palerosî ve hatiye amadekirin. Ev berhevok piştî di sedsala Iem de bi Latîni û Yewnanî careke din tînin nivîsîn. Çîrvanokên Ezopî di sedsala 15em de bûye pirtûk (Sakaoğlu, 2011: 31). Gibbs di heqê bandor û belavbûna fablên Ezopî wiha dibêje:

Ezop çîrokbêjekî efsanewî ye Yewnanî û Romaya kevnar bû û “Fablên Ezopî” bûne yek ji kevneşopiyên herî mayînde yê çanda Ewropî. Fablên Ezopî yê ku li seranserê wêjeya Yewnanî û Romayî belav bûne bi Latîni û Yewnanî tevî koleksiyonên berfireh hatine berhev kirin. Gava ku çîrokên Ezopî li seranserê Deryaya Spî ya kevnar belav bûn, efsaneyên li ser Ezopî bi xwe jî belav bûn. Demeke dirêj piştî ku Yewnanistan û Roma wêran bûn çîrokan hem li Rojavayê Latîni û hem jî li Rojhilatê Yewnanistanê berdewam kirin heta ku ew careke din di sedsala panzdehem de yekem car di nav weşanên çapkirî yê nûjen ên Ezopî de hatin berhev kirin. (Gibbs, 2002: 7)

Çîrokên Ezopî yê Yewnanistan û Romaya kevnar ji hêla mezinan ve û ji bo mezinan hatine gotin ne ji bo zarokan. Lêbelê ev nayê wê wateyê ku fablên kevnar ji armanceke didaktîk re xizmet nekirine. Digel ku pênasîyeyeke tam a fableke Ezopîk tune ye, taybetmendîya sereke ya van fablan aliyê exlaqî ye çîrokê ye. Bi gelemperî, dersa çîrokê di gotinên dawîn ên çîrokê de ji hêla karakterekî ve tê diyarkirin (Gibbs, 2002: 16). Fablên Ezopîk di pir rewşan de hin mînakên neyînî, darazên şaş û tevgerên ehmeqane dide ku pewist e em xwe ji wan dûr bixin. Ezopî bi vê mebestê li ser heywanan bi rêya axifandinê henek û çîrokan bi kar dianî da ku mirovên ehmeq bi zimanekî tund rexne bike (Gibbs, 2002: 25).

Çîrokên ajelan berî fablnûsiyê teqez hebûne û ev çîrok bi devkî belav bûne. Piştî ev çîrok bi forma nivîskî bûne keresteyê edebiyatê û cureyeke edebî jî. Fabla "Rovî û Qijik"ê yek ji van çîrokên ajelan e û hem bi awayê menzûm hem jî pexşan digel hin cudahiyên biçûk li seranserê cihanê navdar û berbelav e. Herçend nîqaş li ser jêdera vê fablê hebe jî ev fabl li gorî agahiyên li ber dest û yekdengiya lêkolêr û edebiyatnasan nîspetî Ezop tê kirin. Dîsa wek jêdera fabla "Rovî û Qijik"ê di werger û adaptasyonên gelek edebiyatên dinyayê de fablên Ezopî esas hatiye girtin. Fabla "Rovî û Qijik"ê ya ku nîspetî Ezop tê kirin di nav Pêrista/Índexa Perry 124an de cih digire (<http://mythfolklore.net/aesopica/perry/124.htm>). Pêrista Perry jî bo fablên ku nîspetî Ezop tên kirin bi awayekî berbelav tê bikaranîn. Ev index ji hêla Ben Edwin Perry ve hatiye sazîkirin û ji gelek guhertoyên bi Grekî/Yewnanî, Latîni û Îngilîzî pêk tê. Perry di indexa xwe de van fablan li gorî ziman (pêşî yewnanî piştî latîni), kronolojî, jêder û paşî jî rêza alfabetîk liiste kiriye. Ji ber vê me jî di xebata xwe de wek çavkaniya 'Iqdê Durfamê' fabla Ezopî bingeh qebûl kiriye. Ev fabl di pêristê de bi agahiya "Ev çîroka rovî û qijikê şîret li me dike ku em ji tu kesê ku bixwaze me bixapîne bawer nekin." dest pê dike. Ezop bi hişyariyekê dest bi fablê kiriye û bi şîretê jî dawî lê aniyê. Çîroka fablê ya ku di pêristê de derbas dibe bi vî şiklî ye:

"Qijik parçeyekî penîr revand û li ser şaxeke darê venişt. Rovîyek hat û bi çûnûhatina li dor qijikê çav li xapekê bû. Rovî bang kir go: Ev çi ye? Hey qijikê! Bejna te ya lihevhatî balkêş e û reng û rûyekî te yê hejayî qralbûnê heye. Heke pêşbaziyê dengî bihata lidarxistin wê demê tu yê di nav ajelên permalî/qinikî de bibûya yekem. Rovî jî bo xapandina qijikê van gotiye û qijik jî pê xapiyaye. Qijeqijê bilind kiriye û penîrê xwe xistiye erdê. Qijikê bi derxistina dengê xwe re xenîmeta xwe berdaye. Rovî piştî radîje penîr û dibêje: Hey qijikê, dengê te heye lê mejîyekî li gorî wî tune. Heke tu guhdariya şîretên dijminê xwe bikî tu yê biêşî (Gibbs, 2002: 133-134)."

2. Danasîna 'Iqdê Durfamê

Fabla 'Iqdê Durfamê' berhemeke rexneyî, alegorîk û guncandî/adapteyî (adaptation) ye. Xala hevpar a fabla Ezopî ya "Rovî û Qijik"ê û fabla Şêx Eskerî "Qijik û Rovî"yê çîroka bingehîn e. Ji bilî hevpariya çîroka bingehîn Eskerî mijarên civakî û çandî bi kincê tesewifê (Sağrıç, 2002: 533) tevî zincîreya rûdanê kiriye. Ev taybetiyên ciyawaz ên fabla Eskerî dahênerî û xweseriya wî nîşan didin. Dikare bê gotin ku fabla Eskerî ji ber ku hem mijarên tesewifî û hem jî rexneya civakî di hewîne berhemeke pirqat (multi-ply) e. Çîroka "Qijik û Rovî"yê ya ku di 'Iqdê Durfama Şêx Eskerî' de derbas dibe di hin çavkaniyan de wek çîrokeke gelêrî/folklorîk hatiye destnîşankirin (Sağrıç, 2002: 533; Adak, 2017). Em di nav berhemên klasîk a Kurdiya Kurmancî de rastî fableke serbixwe nehatin ku Şêx Eskerî mînak girtibe û wek kevneşopî domandibe. Helbestvanên me di nav berhemên xwe de tenê ajel bi hunera întaqê axifandine. Heke ji çavkaniyê devkî ya Kurdî wergirtibe jî em ne xwedî agahî ne. Şêx Eskerî fabla "Qijik û Rovî"yê wek jêder yan jî berhemên ku bi rêya wergerê ketine nav çîrokên me yê gelêrî û yan jî ji *Fablên Ezopî* wergirtiye. Dîsa em dizanin ku rewşenbîrî taybetiyêke malbata Aqtepiyan e û ev malbat ji bilî berhemên klasîk û çanda rojhilatê/şerqê mimkun e ku jî berhemên rojavayê jî haydar bin.¹ Taybetiyêke malbat û ekola Aqtepiyan jî danêriya wan e ku em li gorî zanyariyên li ber dest Şêx Eskerî wek fablnûsê yekem û berhema 'Iqdê Durfamê' jî wek fabla yekem û serbixwe pênase dikin.

Navê fablê di fablên Ezopî de bi şiklê "Rovî û Qijik"ê di 'Iqdê Durfamê' de wek sernav bi şiklê "... Qijik û Rovî"yê derbas dibe. Çîroka bingehîn a fabla Ezopî di nav fabla Şêx Eskerî de -ji bidestxistina qijikê ya penîrî heta bi standina rovî penîr jî qijikê- cih digire. Eskerî di berhema xwe de bi rewîtiya hin derwêşan dest bi fablê kiriye. Bi rastlêhatina derwêş li zarokê, standina qijikê penîr jî zarokî, standina rovî penîr jî qijikê û ketina faqê ya rovî û serjêkirina rovî jî hêla neçîrvanekî ve bûyerê qedandiye.

¹ Tê gotin ku dema Ziya Gökalp li Diyarbekirê bûye tîkiliya wî û ya Şêx Evdîrehman hebûye û bi rêya cerîdeyan jî rewşa alemê haydar bûye.

Şêx Muhemmed Eskerî Aqtepeî texmînî di sala 1918an de dest bi nivîsîna fabla xwe dike lê ji ber hin sedeman nîvco dimîne. Eskerî careke din di sala 1938an de li gundê Birsînê yê girêdayî Egilê nivîsîna berhemê domandiye û di navbera 70-80 rojan di îda ekber/heciyan a heman salî de qedandiye. Zeynelabidînê Amedî di sala 1980yî de berhemê îstînsax kiriye (Ekici, 2014: 95) û Zeynelabidîn Zinarî jî îstînsaxa Amedî latînîze (1989) kiriye. Hejmara malikên fablê li gorî tetîmmeya Eskerî ji 2579 malikan pêk tê.

'Iqd, peyveke erebî ye ku tê wateya girêdan, girêklêdanê û gotineke pexşanî bi awayê kêşî ber bi nezmê ve veguherandin e (Pala, 2014: 14). Dur tê wateya morî, mircanê û libekî bi nîrx e ku di nav îstîrîdyeyên di bin behrê de tê peydakirin. Fam, qertafeke Farisî ye ku tê dawîya peyvan û rengdêrên hevedudanî çêdike. Ev qertaf di wateya "di ...rengî de, rengîn"ê de tê bikaranîn.² Li gorî van agahiyan dikare bê gotin ku 'Iqdê Durfamê tê wateya "gerdenbenda rengmircanî, gerdeniya rengmircanî"yê. Şêx Eskerî bi vî navî berhema/gotinên xwe şibandîye mircanên bêhempa û giranbuha yên ku di bin behrê de veşarî ne. Eskerî bi navgîniya vî fablê xwestiye ku rewşa exlaqî ya serdema xwe raxe ber çavan; ji ber vî rexne û şîretan li mirovan kiriye. Bi vî şiklî civak û xwînerên xwe hişyar dike û dixwaze ku tu kes bi xiraban nexape. Loma jî gotinên xwe yên şîretamîz şibandîye gerdeniyeke mircanî ku bi gerdenê ve bîndalîqandin û neyên jibîrkirin. Navê berhemê di gelek cihên mesnewiyê de derbas dibe. Ji bo mînak:

Ji nav cumle hikayat û serencam
Wiha bû întixab bû ev '**Iqdê Durfam** (Eskerî, 1989: 71)

Ji îşê hikmet û ehwalê 'ibret
Bi hev xim '**Iqdê Durfamek** hikayet (Eskerî, 1989: 70)

Şêx Eskerî fabla 'Iqdê Durfamê bi teşeya mesnewiyê nivîsiye. Teşeya mesnewiyê ji bo mijarên çîrokî/tehkîyeyî yên dirêj teşeya herî libar e. Ji ber ku mijarên bi vî rengî gelekî dirêj in û ji bo ku xwîner zehmetiyê nekişînin mesnewînûs vî teşeyê hildibijêrin û piranî qalibên kurt û sivik bi kar tînin. Ev mesnewî bi qalibê "mefa'îlun mefa'îlun fe'îlun"ê hatiye nivîsîn.

1. Plansazî û Beşên 'Iqdê Durfamê

Plansaziya Mesnewiyê		Sernavên Mesnewiyê
Dîbace	Tewhîd	Der Mebhesê Tewhîdê Xuda we Ezmihi
	Ne't	Der Mebhesa Selat û Selam û Îbtîdaya Nûra Muhemmed
	Saqîname	Saqîname
	Sebebê Telifê	Sebebê Nezma Kîtab/ Ev Zeyla Sebebê Nezma Kîtab
Beşa Sereke		Ferq û Temîza Xeberdana Qenc û Xerab û Fezîleta Sebrê
		Gotina Hinek Hikayeyê Pir 'Eqîl û Bijartina Çîroka Qijik û Rovî
		Berayê Meslehet Çûna Derwêşekî ji Bexçe
		Vegera Derwêş Cem Hevalan û Behskirina Ehwalê Yetimî ji Wan re
		Sitendina Qijakê Penîr ji Yetimî
		Sitendina Rovî Penîr ji Qijakê
	Çûna Rovî û Ketina Wî ya Faqê	
Xatîme	Xatîma Kîtab	

² <http://www.lugatim.com/s/fam> Bo mînak: **Gul-fam**: renggul. **Zêr-fam**: rengzêr, zer.

2.1. Sedem û Pêvajoya Nivîsîna 'Iqdê Durfamê

Sebebê telifê wek binbeşeke dibaceyê di tradîsyona mesnewînûsî û plansaziya wê de xaleke bingehîn û jênegere. Mesnewînûsan carinan bi bandora kesekî ku di xewna xwe de dîtine, bi bihîstina dengêkî di xewnê de yan jî bi dengêkî hundurîn (hatif), li ser daxwaz û piştgirîya rêvebiran, mijareke ku di ziman û çandên din de li ser hatibe rawestan lê di yên mesnewînûs de tunebe, li ser daxwaza hevalan, rewşên ku wan teşwîqê nivîsîna berhemê kirine (Gibb, 1900: 77), bi mebesta ku navê xwe li pey xwe bihêlin û mifaya ji bo civakê berhem nivîsîna (Ünver, 1986: 430-562; Önal, 2007: 105-127). Mesnewînûs di beşa sebebê telifê de bi yek an çendîn xalên ku li jorîn amaje pê hatiye kirin behsa paşxaneyî nivîsîna xwe dikin, mijarê tînin ser şexsê xwe û vê binbeşê ji bo derbirîna hizrên xwe yên curbicur wek zemîneke guncav dinirxînin (Adak, 2019: 296). Bi giştî dikare bê gotin ku mesnewînûs armanc û saikên ku berê wan daye nivîsîna berhemê di beşa "sebebê telifê" de tînin zimên. Ji vê beşa berhemê di heqê helbestvan an berhema wî de agahiyên giring û taybet herwiha poetîkaya helbestvan jî dikare bê derxistin.

Cureyên edebî yên ku pala xwe didin bûyerê kompozîsyonekê ava dikin û alman û ûris ji vê kompozîsyonê re dibêjin motîvasyon (sedemên tevgerê, tiştên ku motîve dikin). Ev têgeh berê xwe dide du çavkaniyan: Yek jê "avahî yan kompozîsyona çîrokê" ye ya din jî "avahiya hundirîn" e ku sedemên tevgerên mirovan ji hêla derûnî, felsefî û civakî ve rave dike (Wellek û Warren, 1949: 225) û karakteran ji aliyê wan ê herî psîşik ve yan bi rewşa wan a civakî re derdixe pêş (Alan, 2015: 124). Motîvasyona/sedema ku berê Şêx Eskerî daye nivîsîna wê fablê hesûdî, çavnebarî, durûtî û zexeliya di nav civakê de ye ku ew van taybetmendiyên neyînî rexne dike; wekî dijminê mirovahiyê dibîne û têkçûna kurdan bi van ve girêdide (Işık, 2007: 227). Berhemên rexneyî/hicwî armanc dikin ku bi şiklê "teşrîha rezaîl û teşhîra erazîl" (Mevlevî, 1994: 53) ango bi "ravekirina riswatî û aşkerakirina riswayan" tevgerên mirovan rast bikin. Berhem rastgele û ji ber xwe ve dernakevin holê; ji hêla dahênerên xwe ve li gorî atmosfera welatê xwe, mercên politîk û civakî tînin diyarkirin (Moran, 2020: 84). Şêx bi berhema xwe pêwendîya di navbera mirovan, başî û xirabiya wan radixe ber çavan.

Şêx Eskerî sedema nivîsîna berhema xwe di beşa "*Sebebê Nezma Kitab*"ê de vegotîye. Ji ber hin sedeman berhem nivco maye û piştî ku Şêx Eskerî nivîsîna berhemê domandiye wek pêvekekê jî bi navê "*Ev Zeyla Sebebê Nezma Kitab*" binbeşek li vê beşê zêde kiriye. Em di beşa "sebebê telifê" de dibînin ku Şêx Eskerî ji ber du sedeman berhema xwe nivîsiye. Sedema yekem li ser daxwaza/teşwîqa kurmamê xwe Behcet bilêvkirina rewşa civakê, xirabiya zeman û mirovan e. Li gorî Behcet zeman yeman û tijî derd e, kuştin û fitne berbelav e; mirovên ku di hundirê xwe de gur in xwe bi postê mêşinan veşartine. Hin mirov nefsmezin, pozbilind, bifêl û finaz in. Şêx Behcet dibêje "Ji bo ku em vî zemanê xirab ji bîr bikin û dilê me rehet be ji me re çîrokekê binivîse." Şêx Eskerî jî xwestiye ku vê rewşê bi alegorî/temsîlekê bîne zimên. Behcetê kurmamê Şêx Eskerî ji zemanî wiha gazinan dike û dibêje:

Ku îro zemanek pur yeman e
Ji qetl û fitneyê pertewfeşan e (Eskerî, 1989: 37)

Zemanê me hemî derd e seraser
Dil û can perçe bûn tê de birader (Eskerî, 1989: 39)

Vegêraneke pevběstî, çîrokeke xeyalî ye ku li alemeke xeyalî pêk tê. Ji ber nirxa xwe ya fêrkarî/dîdaktîk belku ji ber bûyerên ku rûdane yan ê rûbidin û karakterên ku dijîn an mimkun e ku bijîn tabloyekê xêz dike ev cure vegêran tê teqdîrkirin (Jahn, 2020: 50). Şêx Behcet di beşa "sebebê telifê" de daxwaz ji kurmamê xwe Şêx Eskerî dike ku çîrokekê binivîse û em ji vê teklîfê fêm dikin ku *Iqdê Durfam* berhemeke pevběstî/çîroksazî (fiction) ye:

Xulase yek hikayeya serencam
Tu menzûm çêke bo me rind û gulfam

Ji bîra kin hinik em vî zemanî
Ji wê rahê bide vî rûh û canî (Eskerî, 1989: 40)

Helbestvan di beşa sebebê telifê de piştî teklîfa nivîsîna berhemê behsa zehmetiya biserketin, li hember israra teklîfê bi neçarî qebûlkirin û destpêkirina vî karî dikin (Îpekten, 2014: 61). Helbestvan bi bikaranîna hêza xwe ya çîroksaziyê/pevbestinê armanc dikin ku li pey xwe nav bihêlin, hêza xwe ya vegotinê biçespînin, gencîneya xwe ya hizrî derxin holê, ji qedirzanên hunerê qedrê bibînin (Tezcan, 2010). Şêx Eskerî daxwaza kurmamê xwe Şêx Behcet wek barekî giran, bizehmet, buha, ji heddê xwe zêde dibîne û lêbelê qebûl dike:

Me gotê ey 'emûcezadeyê qenc
Mede hinde ji bo me zehmet û renc (Eskerî, 1989: 40)

Ziyade her dikî teklîfê bo min
Hezaran kûhê xem tezîfê bo min

Nezimgotin wekî durrê buha ye
Ji heddê min gelek zêde xuya ye (Eskerî, 1989: 42)

Hikayeçêkirin ba nezm û eş'ar
Gelek zor e me xame nade îş'ar (Eskerî, 1989: 44)

Xelasî min nedî emrê bira bû
Belê min go welê zehmet xuyabû

Me bismîllahî got xame hilanî
Me da ber destê xwe name 'eyanî (Eskerî, 1989: 45)

Şêx Eskerî li ser daxwaza kurmamê xwe Behcet dest bi nivîsîna 'Iqdê Durfamê dike û ji vî aliyê ve dikare bê gotin ku 'Iqdê Durfamê berhemeke diyarî/îthafî ye. Behcetê kurmamê wî teklîfa nivîsîna vî berhemê cara pêşî texmînî di sala 1918an de dike û Eskerî hingê di bîst saliya xwe de ye. Eskerî ji ber sedemên ku me berê behs kiribû berhemê nivco û miswede dihêle. Cara duyem jî piştî 20 salên din di sala 1938an de dest bi nivîsîna dike. Em van agahiyan ji malikên jêrîn derdixin:

Berî enha bi huvdeh hijdeh salan
Me dil pur bû huba keşfê xezalan

Gihabûm bîstî salê terhegeh tam
Li me xweş meywe dabû ew qed û qam (Eskerî, 1989: 47)

Di wê wextê de bû îbni 'emmê min
Cuwanê rehmetî şekkerfemê min

Li min teklîfê kiribû wî hikayek
Welêkin rengletîf e bêbuhayek

Di nav re musweda sê çarî bendan
Ji hemd û teslîye hindek ji bendan (Eskerî, 1989: 48)

Sedema din a nivîsîna berhemê bêxwedîtiya Kurdî ye ku Şêx Eskerî xwestiye xwedî li zimanê xwe derkeve. Em di mesnewiya Eskerî de bandora Xanî bi awayekî eşkere dibînin. Lewra Xanî

hem pêşektîya edebiyata Kurdî kiriye hem jî rê li ber mesnewînûsên peyrewên xwe vekiriye ku ew poetîkayeke edebî ya guncav û bi xemeke estetîkî ya li gorî Xanî berhemên xwe hilberînin (Tek, 2018: 79). Şêx Eskerî hem bi reseniya mijarê hem jî bi nêrînen xwe yên ku di beşa sebebê telifê de aniyê ziman bûye peyrewê Xanî. Şêx Eskerî di heqê ziman de gazinan ji dem, dewran û mirovan kiriye. Lewra di maweya nivîsîna vê berhemê de rewşa sosyopolîtîk (herba cihanê ya yekem û tengezariyên wê, serhildana Şêx Seîd û Seyît Riza bandora wan) a Kurdan herçend ji bo nivîsîna berhemeke bi vî rengî pir ne guncav bû jî Şêx Eskerî hewl daye ku bi zimanê xwe binivîse. Li gorî Eskerî ev ziman bêxwedî, bêiltifat, bêniix û bêalîkar maye. Ev gazin û tespîtên Şêx Eskerî gotinên Ehmedê Xanî tîne bîrê. Çawa ku Xanî di *Mem û Zînê* de gazina bêotorîtebûna kurdan û bêxwedîtîya zimanê Kurdî, qedirnezanîna ilm û hunerê ya civakê radixe ber çavan (Cihanî, 2010: 230) Şêx Eskerî jî bi şêweyeke wek wî nêrînen xwe tîne zimên:

Ne şah û sermiyanek rexbetê kit
Ku qedrê wê bizane mehbêtê kit

Dizanim îltifatê nadinê kes
Ji ber ehlê huner kê mî in mededres

Dizanim vî zemanî pare nake
Ji vî derdê mî re kes çare nake

Di vî wextî de şem'a ilmê Kurdî
Qe natîse nema tê zeytê min dî

Gelek şêrîn e ev ezmanê kurda
Dirîxa me ji dest yek carî berda (Eskerî, 1989: 44)

Eskerî bi awayekî îronîk bêqîmetîya Kurdî tîne zimên û dibêje axaftina bi zimanê Kurdî ne cihê şanaziyê ye; ji hunerê dûr e, negihaştî û tal e.

Pesendîde nîne kurmançî ye saf
Xuya ye ne huner tev gotin û laf (Eskerî, 1989: 45)

Ne puxtemeywe ye xam e ne e'la
Wuha tal e ne şêrîn e ne helwa (Eskerî, 1989: 46)

Şêx Eskerî loma dixwaze bi zimanê xwe binivîse ku ev ziman ji dê û bav maye û wekî qîzeke xweşik, bixeml û şêrîn e. Digel vê Eskerî nivîsîne zor dibîne û li gorî wî heke bi Kurdî be zortir e:

Xusûsa ev zimanê Kurdîya me
Ku maye hedyê ez bav û diya me

Pere nake dizanim ev ezîyyet
Wiha qîzek bi husn û xeml û qîmet

Evê qîza bi zêr û zînet û genc
Ber û sîne qed û qamet wekî genc (Eskerî, 1989: 44)

Li gorî van agahiyan em dibînin ku meyl û terciha "berhemnûsiya bi Kurdî" ji Xanî vir de bûye kevneşopiyek û gelek peyrewên Xanî û nêrînen wî di edebiyata Kurdî ya klasîk de peyda bûne. Dîsa dikare bê gotin ku şopînerên ramanî yên Xanî di beşên sebebê telifê yên berhemên xwe de bi şêwazeke nêzî Xanî vê mijarê wek armanca sereke ya berhemnûsiya xwe îfade kirine.

Şêx Eskerî piştî bîst salan careke din dest bi nivîsîna berhememê dike û dibêje ku min fablê ji destpêkê heta beşa “Vegeza Derwêş Cem Hevalan û Behskirina Ehwalê Yetîmî ji Wan re” nivîsiye û nivco maye. Eskerî ji ber ku berhem nivco maye wek pêvekekê bi navê “Ev Zeyla Sebebê Nezma Kîtab” li ser beşa “Sebebê Nezma Kîtab”ê zêde kiriye. Nivîsîna berhememê ji ber du sedeman nivco dimîne. Yek ji van sedeman Şerê Cîhanê yê Yekem (1914-1918) e. Di wê heyamê de bi gotina Şêx Eskerî gelek tengezariyên wekî ceng û seferberî, tirseke pir mezin, tadeyî, fitne, xela û birçîbûn derdikevin holê.

Sebeb nezma kîtab û halê derwêş
Ji bexçe nivco ew hatibûn pêş

Ji asîb û belayê asîmanî
Ji herb û ceng û fitna vî zemanî

Ji ber vê ev şecer lew bê semer ma
Hîkaye bê xeber bû lal û ker ma (Eskerî, 1989: 49)

Sedema din jî wefata kurmamê wî ye. Ji ber her du bobeletan Şêx Eskerî nivîsîna radiwestîna û berhem wek muswede dimîne.

We hem jî nûra dîde îbni ‘emm im
Ziyade kirye û huzn û kerb û xemm im (Eskerî, 1989: 49)

Ku ew derdê firaqê jî bi ser ket
Ji fikra me hîkaye çû bi der ket

Ji bîra bû tamamî ev serencam
Wuha bêhasil û meqsûd û encam (Eskerî, 1989: 50)

Piştî demekê dost û hevalên Şêx Eskerî jî daxwaza qedandina çîrokê jê dikin û dibêjin:

Dikirne lewm û gazin vê hîkayê
Çira nakî tamam da bê nihayê

Temamî çêke da bête xîtamê
Ku da em jî ji wê bigrin meramê (Eskerî, 1989: 50)

Xuya ye ku Şêx Eskerî hem ji ber wefata kurmamê xwe hem jî ji ber Şerê Cîhanê yê Yekem û derdên dinyayê naxwaze binivîse û vê meseleyê davêje pişt guhê xwe:

Li alîkî firaqa dilberê zor
Li alê dî xemê dunya şer û şor

Dikir pişt guh me sersarî digirtî
Bi hawa perdeya ‘uzrî digirtî (Eskerî, 1989: 51)

Piştî ku demek dirêj bi ser de derbas dibe birayê Şêx Eskerî Şêx Muhemmed Kerbelayî û hinek dostên malbata wan diçin cem û daxwaza qedandina çîrokê dikin (Zinar, 1991: 172). Kerbelayî hem ji bo xatirê kurmamê xwe Behcet hem jî ji bo hevalên vê civatê bi şewazeke fermanî daxwaza qedandina çîrokê ji Şêx Eskerî dike:

Birayê muhterem muşfiq wekî bav
Muhemmed Kerbelayî wî j’ dil û saf

Min zanî meyla yaran kir di ev car
Wuha go çêke çîrokê bike 'ar

Bes e sarî bike xîret di ev îş
Temam bike qissetê bes wan bike rîş (Eskerî, 1989: 52)

Ku piştî bo me ev pend û nesîhet
Kir û hem emri kir da bikme xîret

Nebî berdî tu vî emrê birayî
Di zulmatê de dimînî bê çirayî (Eskerî, 1989: 56)

Kerbelayî ji bo Şêx Eskerî çîroka xwe biqedîne serdestiya 'Iqdê Durfamê û helbestvaniya birayê xwe bi berhem û kesayetên dîrokî û efsaneyî re berawird dike. Kerbelayî bi vî şiklî motivasyoneke xurt dide Şêx Eskerî û ew tîne xîretê:

Neqîş ke jê xetan Erjeng û Manî
Bibin heyran xeta wan bête zanîn (Eskerî, 1989: 54)

Xuya ke da di wan zulfanê mensûr
Ku bin heyranî hem Mecnûn û Mensûr

Xwe û Mensûr û Mecnûnan fena ke
Ene'l-heq layiqê kî bit xwiya ke (Eskerî, 1989: 55)

Şêx Eskerî ji ber ku rêzeke zêde dide Kerbelayî şîreta wî wek fermanekê dibîne û bi neçarî qebûl dike:

Li min ferz e bikim namûs û xîret
Mutî'ê emre bim nedmê tu muhlet

Cewabê "Na" mi dî nabe bibêjim
Eger çenda ji dil xwînê birêjim

Nema çare me îlla biyîme dav
Me gotê min qebûl e ser ser û çav (Eskerî, 1989: 57)

3. Avahiya Temafîk a 'Iqdê Durfamê

Heta niha gelek dabeşkirinên cuda yên mesnewiyê ji aliyê tema û mijarê ve hatine kirin. Ünver, mesnewiyên ku bi rêya temsîlê şîretê didin wek mesnewiyên exlaqî (Ünver, 1986) û Levend ji çîrokên temsîlî wek kategoriyeke serbixwe dabeş dike û mînakên wê dide (Levend, 1967). Hevpariyeye van her du kategoriyan mesnewiyên ew e ku xala didaktîk û şîretawer in. Fabl jî dikevin helbest/nezma didaktîk û erka wan ya rênîşandanê heye. Dema mirov balê dikişîne ser potansiyela fablê dibîne ku di navbera dengê ajelên bêdeng û endamên civakê yên ku dengê wan hatiye çewisandin de fabl hevterîbiyekê çêdike û meyla ajelan bi mijarên sosyopolîtîk re heye (Lefkowitz, 2014). Helbestvan/nivîskarên fablan bi karakterên qenc-xirab û tevgerên erênî-neyînî rewşa kes û civakê li ser vê dijberiyê ava dikin û bi vê rêya temsîlî şîretan dikin. Wek berhemeke alegorîk/temsîlî 'Iqdê Durfam jî vegêraneke çîroksazî ye ku bi mebesta durustkirin û bilindkirina asta exlaqî, çaksaziya civakê, ji bo bextewariya dinya û axretê hatiye nivîsîn.

Şêx Eskerî li ser daxwaz/teklîfa kurmame xwe Şêx Behcet rewşa xirab a civakê raxistiye ber çavê xwîner û vê armanca xwe bi navgîniya fableke pevbestî pêk aniye. Sedema sereke ya rewşa

xirab a civakê li gorî Eskerî “hezjêkirina dinyayê” ye. Mirov dema ku bi dunya û berjewendiyên wê digirin xwe winda dikin û ev berê wan dide xirabiyê. Penîr wek metaforekê “berjewendiya dinyayê” dinimîne ku piştî em ê behs bikin. Eskerî di ‘*Iqdê Durfamê*’ de li ser temaya “xirabiya dem û dinyayê” rawestiyaye. Bingeha xirabiya dem û dinyayê helwest û tevgerên mirovan in. Tevgerên mirovan jî nîşaneyên rewşa exlaqî ya civakê ne. Eskerî di bin temaya xirabiya dem û dinyayê de mijarên wek nediyarbûna kesayetê, bêrewîştî, zilm, azwerî, xwemezindîtî, jixwerazîbûn, çavbirçîtî, kesba heram, fêlbazî û xapînokîya mirovan anîye zimên. Mirov di encama van exlaq û kiryanan de rastî rewşên xirab tê. Eskerî di bin sernavê vê temayê de têkilîyên mirovan bi alegoriya/fabla “Qijik û Rovî”yê raxistiye ber çavan. Hizr û kiryarên mirovan bi berçavka dînî û bi şîroveyên tesewîfî nixandîye. Eskerî van têgehên razber bi têgehên şênber digel bi şênberkirina zincîreya rûdanekê û qadroya kesan pêşkêşî xwîneran kiriye. Em ê avahiya tematîk di çarçoveya temayê û mijarên girêdayî temayê herwiha metaforên ku beramberî van têgehên tînan de binirxînin. Şêx Eskerî ji ber xirabî, kuştin, fitne, derd û bêkesayetîya mirovên demê gelek bi gazin e:

Ku îro zemanek pur yeman e
Ji qetl û fitneyê pertewfeşan e (Eskerî, 1989: 37)

Nizanim ev çi dewran û zeman e
Çi kan e muxtelîf tî da ciwane

Zemanê me hemî derd e seraser
Dil û can perçe bûn tî de birader (Eskerî, 1989: 39)

Zeman mislê wekî rovî bizane
Hinik mislê qijakê pur hewa ne (Eskerî, 1989: 66)

Şêx Eskerî di gelek cihên mesnewiyê de behsa taybetmendiyên dinyayê dike. Ji bo mînak li gorî Eskerî ev dinya wek nêçîrvan, xefk, kêzika gerîne ya pîs, se/seg û pîrebûk e; bi hîle, xapînok, bêwefa, qehb, durû, neyar û qeşmer e.

Gelek qencî’w xerabî fî’lê dijwar
Di alem de hene bê hedd û hijmar (Eskerî, 1989: 67)

Evê dunya ku seyyad e bîla şek
Di rê da faqê danî nê tenê yek

Ku madem saxîya dunya wuha bit
Di bit qelbê me jî pê muhtela bit (Eskerî, 1989: 167)

Şev û rojan dixebtin bê ser û pa
Bi hubba vê denî dunya wekî sa

Wekî wê kêzika pîs a gerîne
Me der hambêz e dunya lewitîne

Ji bo me qet ne ca yû mesken e ev
Ne yarek ba wefa ye xapîk e tev

Neyarek pur cefa ye ev cihana
Wuha qeşmer evê pîra zemana

Gelek qehp û durû mislê şev û ro
Binê îro çî ye ka çû çewa do!

Ji dil derxe huba vê pîrebûkê
Medara pê bike der qelbê tu kê (Eskerî, 1989: 168)

Mebe bawer bi vê dunya ku faq e
Heme fenn û hiyel mekr û nîfaq e (Eskerî, 1989: 169)

Divê mirov ji her gotinê bawer neke, li ser baş bifikire û binêre ka ev gotin bi dilxwazî ne yan ji bo berjewendiyê (penîr) ne.

Xeberdanê ku gotin guh bidêre
Hela dilxwazî ye yan bo penîr e

Tesewwur ke xebordanê bibîne
Teemmul ke xeta da tê nemîne (Eskerî, 1989: 66)

Mirov dikare wek ramana bingehîn a fablê bibêje ku “mirov çî bike bixwe dike yan çî bike ew tê pêşiya wî/wê”. Fabla navdar “Qijik û Rovî”yê û encama wê tê zanîn lê di serê fabla Eskerî de ji beşa *Sitendina Qijakê Penîr ji Yetîmî* pêve ku zarokê sêwî tevli zincîreya rûdanê dibe mesnewînûs bi xwîner re mereqê çêdike. Her lehengek ji vê beşê bi awayê xelekî heta beşa dawî li gorî karaktera xwe neheqiyê li lehenge din dike. Em ramana bingehîn di beşa *Sitendina Rovî Penîr ji Qijakê* bi awayekî eşkere dibînin. Ev mereq û encama zincîreya rûdanê di beşa *Çûna Rovî û Ketina Wî ya Faqê* de diqede. Bikurtasî xelesa bûyerê bi vî şiklî ye: Qijik penîrî ji zarokê sêwî distîne, rovî penîrî ji qijikê distîne û nêçîrvan jî rêvî ser jê dike. Şêx Eskerî bi vê rêzkirinê xwestiye ku encama kiryar û cezaya mirovan nîşan bide. Şêx Eskerî loma her xirabiyekê bi ceza kiriye û poşmaniya ji ber kiryarên xirab ên qijik û roviyê wiha aniye zimên:

Li dil daxê peşîmanî kişandin
Di sîne der û xem zêde civandin

Ji ber ku ew yetîmê bêkes î jar
Wuha bêçare hiştî ked û par

Çî kiribû tevde hate pêşiya wê
Perîşan ma û dil pir pê êşiya (Eskerî, 1989: 148)

Di faqê dil bi kul ma pa birîne
Çî çare b'xwekîra derman tunîne (Eskerî, 1989: 159)

Heq pir musteheqqê te bikêşî
Ji ber cerh û birînan dilbiêşî (Eskerî, 1989: 160)

3.1. Alegorî û Metaforên Fablê

Alegorî peyveke hevedudanî ya grekî ye ku ji du peyvên cuda pêk tê. Peyva “allos”ê tê wateya “a/ê din” û “agoreuein” tê wateya “li nav civakê axaftin”ê. Her du peyv bi hev re wateya “gotinên nepenî” û “tiştê ku ji bo gel ne guncav” dide. Wateyên wekî “bi awayekî din axaftin, gotina tiştêkî din û gotina tiştêkî bi mebesteke din” ên alegorîyê ji hene (Whitman, 1987/veg. Açıl, 2018). Berhemên alegorîk piranî behsa kêşeyên civakî, exlaqî û polîtîk ên li dinyaya rasteqîn dikin lêbelê li ser van kêşeyan bi navgîniya çîroksazî û karakterên bîpêwendî radiwestin. Wextê ku tenê li çîroksaziya berhemeke alegorîk bê nihêrtin rasterast wateya rastîn û şênber tê hişê me. Lê em dizanin ku ji mêj ve berhemên bi vî şeweyî ji bo armancên curbicur hatine nivîsîn û xwedî peyam in.

Metafor, barkirina wateyê derveyî wateya taybet a peyvekî ye (Aristoteles, 1987: 60). Peyva metaforê (métaphore) ji du parçeyan pêk tê. Peyva meta tê wateya "piştire" û "wek"; peyva phore jî tê wateya "vegühestin"ê. Metafor, hunera vegotina mijarekê bi şiklekî din û dabînkirina xweşikahiya vegotin û şeweyê ye. Armanca metaforê xweşikkirina şeweyê, derbirîna fikran û hêsankirina têgihiştana fikran e û bi vî şiklî dabînkirina mayindeyî ye (Keklik, 1990: 12). Berhemek seranser dibe ku alegorîk be lê nabe ku metaforîk an sembolîk be. Metafor di nav berhema alegorîk de ji bo têgeh an heyberan tê bikaranîn. Hunermend di berhemên edebî yên alegorîk de bi rêya têgeh û karakterên metaforîk hest, raman û peyamên xwe vediguhêzin bo xwîner. Ev jî tê wê wateyê ku berhem ji vegotina çîrokekê wîrdetir xwedî armançê ne. Pirtûka bi navê *Theory of Literature* di heqê metaforê de nîrxandineke wiha dike: Nêrîna me metafor û mîtan di wate û fonksiyona wêjeyê de wek navendî dibîne û di nav sêwirîn û vegêrana helbestkî de bi navgîniya metaforan ramaneke ku em dikarin bibêjin mîtk û metaforîk heye (Wellek û Warren, 1949: 198). Dema em li tîkiliya di navbera alegorî û metaforê binêrin dikare bê gotin ku alegorî metaforeke berfirehkirî ye. Lewra metaforek bi giştî di navbera bûyer an tiştên bêpewendî de tîkiliyekê datîne, alegorî şibandineke kûrtir dabîn dike ku li tevahiya berhemê belav dibe (Eke, 2017: 37).

Açil di temamê berhemên alegorîk de behsa hebûna sê taybetmendiyên bingehîn dike ku ev jî teşxîs, pevçûna navxweyî û lêgerînê pêk tînin (Açil, 2018: 134-139). Li gorî vê pîvanê di 'Iqdê Durfamê de serdestiya her sê hêmanan jî xuya dike. Têgehên mîna dinya, zeman, mirov, baxçe, penîr û heyberên wekî qijik û rovî mînakên "teşxîsê"; rêwîtiya derwêşî ya "lêgerînê" û dijberiya tevgerên qenc-xirab û erênî-neyinî yên karakterên fablê jî mînakên "pevçûna navxweyî" ne. Mesnewînûs bi van têgeh û heyberên ku di çarçoveyê metaforîk de pevbestiye kinçekî alegorîk li berhema xwe kiriye. Eserê bi van metaforan rexneya civaka xwe dike ku ev civat ji nîrxên xwe dûr ketiye. Eserê taybetmendiyên têgeh û karakterên ajelan jî li ber çavan girtiye û bi navgîniya van têgeh û ajelên metaforîk rexne, hişyarî û şîretên xwe kiriye ku bertekê nebîne. Em ê ji van hêmanên metaforîk hin mînakên giring bidin.

3.1.1. Zeman

Metaforeke fablê zeman e. Peyvên wek "dem, heyam, serdem, wext, çax"ê jî ji bo zemanê tînin bikaranîn. Şêx Eserê zemanê di wateya serdema ku lê dijî de bi kar anîye. Xirabiya zemanê yek ji sedemên nivîsîna berhemê ye. Şêx Eserê ji zemanê gelek gazinan kiriye (Eserê, 1989: 37-39) û taybetmendiyên zemanê rêz kiriye (Eserê, 1989: 64-66). Eserê zemanê şibandiye pîreke ecûze, rovî, dîza qelban, sêhîrbaz û aşekî ku fitneyê dihêre. Ji bo mînak:

Wuha ye asîyayê vî zemanî
Hebê fitne dihêrit her 'eyanî (Eserê, 1989: 64)

Dîza qelban e ev pîra sihîrbaz
Eva pur mekr û hîle şîwe û naz (Eserê, 1989: 65)

Zeman mislê wekî rovî bizane
Hinik mislê qijakê pur hewa ne (Eserê, 1989: 66)

3.1.2. Dinya/Cîhan

Dunya bi peyvên cîhan, alem û kaînatê re jî tê bikaranîn. Ev dinya mêvanxane, demdemî, cihê geştê û warê ibretê ye. Dema ku mirov li alemê binêrin divê Xwedê bê bîra wan. Dinya jinepîrek e ku kalbûna xwe vedişêre û xwe wek bûkeke taze nîşan dide (Pala, 2014: 17). Şêx Eserê wek metaforekê wateyên nêçîrvan, faq, se/kûçik, neyar, qeşmer, qehb, durû, yareke bêwefa, kîzika pîs a gerîne, pîrebûk, fen û hîle, mekr û nîfak, xwînxwir, xeddar, dijmin li dinyayê bar kiriye. Ji bo mînak:

Cîhana qehbe pir dami hemî jar
Di rahê bêkesan xef aniye bar (Eskerî, 1989: 152)

Evê dunya ku seyyad e bilaşek
Di rê de faqê danî ne tenê yek (Eskerî, 1989: 165)

Neyarek pur cefa ye ev cîhana
Wuha qeşmer evê pîrê zemana (Eskerî, 1989: 166)

Ji dil derxe huba vê pîrebûkê
Medara pê bike der qelbê tu kê (Eskerî, 1989: 168)

3.1.3. Mirov/Însan

Şêx Eskerî mirov şibandiye gelek heyberên wek gurê devbixwîn, rovî, qijik, bilbil, ba, diz û taybetmendiyên wan wiha rêz kiriye:

Temamê wan bi xwe gurg in di bendî
Xefî ne ew bi libsê kûsifendî

Qijak in ew bi bulbul têne meydanê
Qe nanêrin xwe û payê di qeydan

Ji kibra xwe dibêjin bulbul in em
Bi hawa û seda û xulxul in em (Eskerî, 1989: 38)

Dibînim exlebê ehlê zeman e
Bifexr in hin hinik tedbîrê dane

Hinik şubhê qijakê pir bi fexr in
Wekî rovî hinik pir fennîsexr in (Eskerî, 1989: 39)

Ji xulqê ve denî dunya ye tev xelq
Belakêş û perîşan in cîgerşeq

Wekî ekkû hinek duzdê di pîs in
Hinik jî mislê rovî pur xebîs in (Eskerî, 1989: 118)

3.1.4. Rêwîtî/Sefer/Silûk

Mebest ji seferê ew e ku mirov li ayetên Xwedê yên li ser rûyê erdê nezerê bike û xwe bigihîne şêxekî (Cebecioğlu, 2005: 295), bi îbret li tiştên ku ji tefekurê re bibin mijar binêre, bi awayekî baş li ser rûyê erdê, çiya û deverên ku mirov lê digerin hûr bibe, guhdêriya tesbîhên bêgîyanan bike û ji gotinên heyberên li derdorên ku bi lîsanê halê diaxifin fêhm bike (Erginli, 2006: 879). Mebesteke rêwîtiyê jî zehmet kişandin û standina îbretê bi rêya dîtina tiştên cihêreng e ku nîşaneyên mezinahiya Xwedê ne (Yazıcı, 1994). Sedema bingehîn a seferên/rêwîtiyên Rojhilatê lêgerîn e û rêwîtiya çanda klasîk a Rojhilatê lêgerîneke aktîf e. Mebesta vê lêgerînê kemilîna mirovî ye û tesewîf raza kamilbûna mirovî (însanê kamil) di temamkirina “çerx”ekê de dibîne ku ew jî ji têngiştina kozmogonî (çêbûna gerdûnê) ya Îslamê sûdwerdigire (Yalçinkaya, 2007: 5). Şêx Eskerî wek leheng û vegêrê fablê behsa derwêşekî rêbiwar dixe. Rêwîtiya bingehîn a vî derwêşî ye ku ji beşa *Berayê Meslehet Çûna Derwêşekî ji Bexçe* dest pê dixe û di seranserê fablê de didome. Eskerî bi vî awayî dixe ku derwêş hem şahidî û vegêriya hemû bûyeran bike hem jî vê çerxê bi derwêş dide temamkirin. Eskerî ji bo fêmkirina hikmeta rewş û bûyerên ku di vê serpehatiyê de diqewimin li ser navê xwe derwêşî xeyalên dixêrê. Rêwîtî ji bo gihaştina hikmet, raz û tecelliyên nav û sifetên Xwedê dibe metaforeke giring. Ji bo mînak:

Wuha îcabi kir îşê nihani
Berayê meslihet yek pîrê fanî

Muheyra bû ji bo rahê sefer ew
Ji hîcranê dibû zêr û zeber ew (Eskerî, 1989: 80)

Ji wan re bexşi kirne durrê esrar
Di dil wan de zêde bûne esrar û enwar (Eskerî, 1989: 163)

Şêx Eskerî behsa hin derwêşan dike ku piştî rêwîtiyê li baxçeyekî wek bihuştê radiwestin. Ev derwêş hem di rêwîtiya xwe de digihîn hin razan, tecelliyên, xelat û qenciyan heta ku digihîjin vî baxçeyî hem jî ji serpêhatiya derwêşê rêbiwar/vegêr gelek dersan werdigirin.

Ji ehwalê zeman çend merdê derwêş
Seyahat bû li dunya wan her û îş (Eskerî, 1989: 71)

Fuyûzatê Îlahî wan li dil hat
Hediyye lutf û îhsan û fezil hat (Eskerî, 1989: 72)

3.1.5. Baxçe/Bax/Bostan

Bax, alema rûhanî ya şendar e (Cebecioğlu, 2005: 39). Bax, baxçe û bostan piranî bi bihuştê re tê zikirkirin û baxçeyên bihuştê dixê bîrê. Bi bax re behsa bihuştê Îremê jî tê kirin. Bi taybetmendiyên xwe dibe menzûmeya xweşikahiyê. Bi van xweşikahiyên xwe cihê geştê ye û helbestvan bi baxçeyê dilşad dibe (Pala, 2014: 53). Baxçe û ekosîstema ku Şêx Eskerî dişayêse ne mimkun e ku li dinyayê be. Lewra riwek û ajalên tê de ji ber taybetmendiyên xwe yên ciyawaz ne pêkan e ku di heman ekosîstemê de bijîn. Ev dever tenê dikare li alemeke derasayî bê xeyalkirin ku ew jî bihuştê dixê bîra mirovî. Ev baxçeyê xeyalî cihê hevdiîna dost û yaran, şêx û murîdan e. Derwêş li vî baxçeyî tevli xelesa suhbeta pîrê mûxan, zikr û îbadetê dibin. Ji bo mînak:

Wekî baxê Îrem bexçayekî xweş
Temaşa kî tu lê dê bî tu serxweş (Eskerî, 1989: 73)

Di vî cayê ferehefza wekî mah
Di nav wan şah û tevde bendeyê şah

Ewan xelqe bi goşanê derê pîr
Ewî pîrê moxan kole şeh û mîr

Di nav wî bexçeyê teşbihê cennet
Girêdan helqeyek tê ferz û sunnet (Eskerî, 1989: 75)

3.1.6. Penîr

Penîr pêşî di xelesa çarem a beşa *Sitendina Qijakê Penîr ji Yetîmî* de ji bo teselliya zarokê sêwî û piştê jî di xelesa pêncem a beşa *Sitendina Rovî Penîr ji Qijakê* de wek xurekeke şênber derdikeve pêşberî me ku qijik û rovî ji bo bidestxistina wî têdikoşin. Şêx Eskerî penîr herçend di vî pêwendê de bi kar anîbe jî wî wateyê mecazî û metaforîk lê bar kiriye. Penîr, metafora herî giring a fablê ye û her cure "berjewendî"yên dinyayê dinimîne. Jixwe penîr di xelesa bûyerê de peywira girêdanê dibîne û zincîreya rûdanê pê didome. Heke ev xurek/amraz tunebûna gelo zincîreya rûdanê dê çawa bidomiya? Diviya ku mesnewînûs bi navgîniya tiştêkî din vî tîkiliyê daniya û hingê berê zincîreya rûdanê dê biguheriya. Aliyekî çandî yê penîr jî heye û ne tesaduf e ku Eskerî di zincîreya rûdanê de penîr û nan

“xistiye” tûrikê derwêş. Ewî van her du qûtên ku di çanda kurdan de binirx in tevî vegêranê kiriye. Eskerî bi bikaranîna penîrî di zincîreya rûdanê de rengê xwemalî daye fablê û bi awayekî hostatî bi fabla Ezopî ve girêdaye. Gelo dev û dilê ku gotin jê derdikeve bi dilxwazî ye yan ji bo penîr/berjewendî ye, tarî yan ronahî ye, bişîfa ye yan biderd e, henek e yan hewa ye. Bikurtasî li gor wî penîr ji bo fêmkirina niyeta xirab û qenc wek pîvanekê ye:

Xeberdanê ku gotin guh bidêre
Hela dilxwazî ye yan bo penîr e

Di mîzana eqil bîne nîzamê
Di fikrê de biweznîne kelimê (Eskerî, 1989: 66)

3.1.7. Rovî/Rûbeh/Suleb

Metafora roviyê ji bo mirovan hatiye bikaranîn. Ev ajel bi şiyarbûn, fêlbazî, xapînokiyê tê zanîn û di fêmkirina aliyên lawaz ên heyberên din de serkeftî ye; xwedî qabiliyeteke qanîkirinê ya bilind e û mirovên niyetxirab dinimîne. Bikurtasî sembola wan kesan e ku jîrî, qabiliyet û dema xwe ji bo berjewendî û azweriya xwe ya şexsî serf dikin (Avci, 2012). Rovî mirovên çavsor, fêlbaz, qure, di xirabiyê de xwedî qabiliyet, ji bidestxistina berjewendiyên re çavbirçî ye.

Nebit wek rûbeh hirs û tem‘ê serdeng
Li me bişkînitin pa û ser û çeng (Eskerî, 1989: 153)

Ji ‘ucbê geh li xwe heyran dimîne
Geh waqîwaq e ew keyfa xwe tîne (Eskerî, 1989: 157)

3.1.8. Qijik/Zax/Ekkû

Metafora qijikê ji bo mirovan hatiye bikaranîn. Tîpa “qijik”ê wan mirovên ehmeq temsîl dike ku ji pesindanê, gotinên xweş û pozbilindiyê hez dikin (Avci, 2012). Qijik ji exlaqê xwe yê xirab û kirêtiya şikl û dengê xwe ne haydar û li pey nefsa xwe ye (Nur, 2017).

Qijika fasiq a pîsteb‘ î ebleq
Firaz geh nişîbe ba teq û req (Eskerî, 1989: 118)

Ji ber kibr û xurur û xefleta wê
Ji ‘ucb û ehmeqî hem qebheta wê (Eskerî, 1989: 128)

4. Hêmanên Binyadî

Vekolîna berhemeke edebî, peyitandina taybetmendiyên hêmanên naverokî û derekî ye. Di cureyên çîrokî/tehkîyeyî de pênc hêmanên binyadî hene ku berhemekê ava dikin: Zincîreya rûdanê, karakter, cih, dem û vegêr. Hunermend ji vê alema ku em li ser dijîn bi gotineke din ji alema derveyî/xaricî hin hêmanan verdigire û bi van hêmanan alemeke nû û xeyalî ava dike. Ji vê alemê re “alema îtîbarî/pevbestî” tê gotin. Hunermend li gorî armanca xwe di vê alema pevbestî de zincîreyeke rûdanê saz dike. Bûyerên ku di vê alemê de dê biqewimin dibin îtîbarî, mirovên ku tevî bûyerê dibin û mekan jî dibe îtîbarî. Bikurtasî alema îtîbarî ew alem e ku bi şîrovekirina hunermend a di nav pergala ramanekê de derdikeve holê (Aktaş, 1991: 15) û bi vî şiklî hunermend metneke edebî ava dike. Metna edebî çîroksazî/pevbestiyek e û ne heqîqet bixwe be jî parçeyek heqîqetê ye. Ji ber ku destê însanekî ketiyê ew rastiyeke çêkirî ye (Alan, 2015: 97). Hunermend vê alema çêkirî li ser van hêmanên binyadî yên navborî saz dike. Em ê di vê beşê de hêmanên binyadî yên fablê raxin ber çavan.

4.1. Zincîreya Rûdanê

Zincîreya rûdanê (plot) rêveçûn, herikîn, tevî an jî avahiya çîrokê ye û ji honaka rûdanên biçûk pêk tê. Ev rûdanên biçûk dema li pey hev tîrêzîkirin tevahiya bûyerekê derdixe holê û zincîreya rûdanê çê dibe. Zincîreya rûdanê, binyada sebebî ya çîrokê ye û di heman demê de bi tîkiliya sedem-encamê vegotina bûyeran e (Forster, 2001: 128). Divê di navbera bûyerên zincîreya rûdanê de pêwendiyek hebe û ev pêwendî berê me bide mebesteke ku razekê vedişêre û piştî wê eşkere dibe, mereqê radike pêdarê û piştî wê vedimirîne (Alan, 2015: 124). Em ê piştî kurte û zincîreya rûdanê ya fablê behsa cureyên vegêranê û di nav vê dabeşkirinê de behsa cihê 'Iqdê Durfamê' bikin.

Kurteya fablê wiha ye: Hin derwêşên rêbiwar di rêwîtiya xwe de rastî baxçeyekî wek bihuştê dibin, rûdînin û kom dibin. Koma derwêşan jî pencî kesî pêk tê û li dor pîrekî muxan/murşidekî dicivin û dikevin zîkr û tefekurê. Ji vê koma derwêşan derwêşek hin nan û penîr dixê xurcika xwe û ji bo karekî nepenî, keşîkirina hin razan û mifayekê derdikeve rêwîtiyê. Ev derwêş jî ber veqetîna ji hevalên xwe pir xemgîn dibe. Derwêşê rebîwar qederekî diçe, digere û bi matmayî tefekur û çavdêriya alemê dibe. Di geştê xwe de rastî hin bûyeran tê û paşî vedigere cem hevalên xwe yên li wî baxçeyî rûniştî. Derwêş û hevalên xwe bi hevdiîna hev kêfxweş dibin. Hevalên wî pîrsa rêwîtiyê û serpêhatiyên derwêşî dikin da ku ew jî ji van bûyer û karên hikmetamîz ên ku derwêşê rebîwar dîtiye para xwe bistînin. Derwêş dest bi vegotina serpêhatiya xwe ya rêwîtiyê dibe: Derwêş jî piştî girekî û di nav daran de girîna zarokêkî dibihîse û berê xwe dide bal vî dengî. Dema ku derwêş vî zarokî dibîne dilê wî pê dişewite û sedema girîna wî dipirse. Ev zarokêkî sewî ye ku xizmên wî neheqiyê lê kirine. Zarok gazinan jî xizmên xwe dibe û ji ber vê zordariya wan jî halê xwe re digirî. Derwêş dema ku rewşa zarokî dibîne, van gazinan dibihîse ew jî ji halê wî re digirî; serê wî mizdide, hembez dibe, dilê wî xweş dibe û ji xurcika xwe nan û penîr derdixe û didê. Paşî derwêş jî zarok vediqete lê hişê wî li ser dimîne. Mereqa halê wî dibe ka gelo ev zarokê bêkesê dê çî bike û halê wî çawa be. Derwêş vedigere temaşaya zarokî dibe û dibîne ku qijîkek li ser şaxên dara ku zarok li bin rûniştiye fir dide, diçe û tê. Derwêş jî ber mereqê çavdêriya vê dîmenê dibe. Wexta ku zarok nan û penîrê xwe datîne ser kevir û ser û çavê xwe dişo ji nişka ve ev qijîk penîrê zarokî direvîne û li ser dareke din vedinişe. Mereqa derwêş jî ber vê bûyerê zêdetir dibe û ji bo fêmkirina hikmeta van rûdanan qijîkê dişopîne. Roviyeke pîr bêhna penîrê di devê qijîkê de digere û li bin dara ku qijîkê li ser daniye diçe û tê. Rovi xwe wek pîrekî mirîd dide nasîn û bi pesindarî behsa deng û rengê qijîkê dibe ku penîrî jê bistîne. Qijîk bi rovi dixape û dema dibe qijîq penîr jî devê wê dibe. Rovi bi xap û lêpên xwe dipesine, henekên xwe bi qijîkê dibe, digihîje mirada xwe û penîr dixwe. Qijîk jî ber xwemezindîtin, xweecibandî, nezandî û ehmeqîya xwe poşman dibe. Derwêş matmayî dimîne û dide pey rovi da ku encama vê serencamê bibîne. Roviyeke pozbilind û çavbirçî dîsa natebite meger bêhna parçeyekê dûv standiye. Ev pariyê dûvî bêxwedî li erdê ye lê rovi jî vê rewşê guman dibe ku ev kemînek be. Rovi nikare bi nefsa xwe, devê davêje dûvî û dikeve xefka neçîrvanekî. Rovi li xwe dide, diperpîte, dûvê wî qut dibe lê nikare xwe ji xefkê xilas bike. Neçîrvan xwe digihîne rovi, çend derb li serê wî dixê, dikeve, dixê tûrikê xwe û dibe malê. Ew derwêşên ku li baxçe rawestiyabûn bi dawîlêhatina çîrokê jî baxçe radibin û careke din dikevin rê.

Zincîreya rûdanê bi rêwîtiya derwêşan dest pê dibe û bi dewamkirina rêwîtiya wan derwêşan diqede. Bûyera rastlêhatina derwêş li zarokê sêwî, standina qijîkê penîr jî yetîmî, ketina faqê ya rovi û serjêkirina wî jî ber ku di jêderên din (Yewnanî, Latînî, Frensî, Îngilîzî...) de cih nagirin di vê fablê de ristinên xwemal û resen in. Şêx Eskerî di nav fablê de bi cîbicîkirina van ristinên resen armanc dibe ku reng û rûyekî xwemalî (dînî û çandî) bide mesnewiya xwe. Lewra taybetiyeke berhemên adaptekirî ew e ku hunermend jî alema xwe û civaka xwe ya hizrî-hestî taybetmendiyên li berhemê bar dikin. Vegêrana 'Iqdê Durfamê' li gorî dabeşkirinê û sernavên mesnewiyê jî şeş xelekên bûyeran pêk tê:

A. Xeleka yekem beşa bi sernavê *Gotina Hinek Hikayeyê Pir 'Eqil û Bijartina Çîroka Qijîk û Rovi* ye. Di vê beşê de çend derwêş dikevin rê û digihîjin baxçeyekî ku tevî şahêkî pencî derwêşê de rûniştine.

B. Xeleka duyem beşa *Berayê Meslehet Çûna Derwêşekî ji Bexçe* ye û bi rêwîtiya derwêşekî dest pê dike. Xelekên din di nav vê rêwîtiyê de rûdidin û mesnewînûsî xeleka duyem wek bûyera çarçoveker hilbijartiye.

1. Xeleka sêyem beşa *Vegera Derwêş Cem Hevalan û Behskirina Ehwalê Yetîmî ji Wan re* ye ku behsa rastlêhatina derwêşî li zarokê yetîmî tê kirin. Ev rastlêhatin aksîyona/bûyera sereke ya fablê ye û serpêhatiya derwêşî bi vê bûyerê dest pê dike.

2. Xeleka çarem beşa *Sitendina Qijakê Penîr ji Yetîmî* ye. Qijikek penîrê zarokê sêwî jê distîne û diçe li ser darekî datîne.


3. Xeleka pêncem beşa *Sitendina Rovî Penîr ji Qijakê* ye. Rovîyek penîrê di devê qijikê de werdigire.

4. Xeleka şeşem beşa *Çûna Rovî û Ketina Wî ya Faqê* ye. Zincîreya rûdanê di vê xelekê bi serjêkirina rovî ji hêla neçîrvanekî ve û bi dewamkirina rêwîtiya derwêşên rêbiwar diqede.

Genette dahûrîna vegêranê li ser sê astan dabeş dike: Asta derekî/derçîrokî (extradiegetic) li derveyî çîroka sereke dimîne û di vê astê de vegêrek heye ku tevî çîrokê nabe. Asta navekî/navçîrokî (diegetic/intradiegetic) dikeve bin banê asta derekî, çîrok bixwe ye û di vê astê de bûyer diqewimin. Asta jor-çîrokî (metadiegetic) ew ast e ku tê de hin çîrokên din diqewimin û di nav asta navekî de ye (Genette, 2020: 226).

Hunermend dikare vegêranê di astên cihê de veguhêze. Ev bi şiklê “çîrok di nav çîrokê yan vegêran di nav vegêranê de” derdikeve holê. Vegêrana bingeîn dibe vegêrana çarçoveker (matrix) û vegêranên din ên ku ji aliyê karakterên çîrokê ve tînin vegotin jî dibin jêr-vegêran/vegêrana zeliqandî (hypo narrative/embedded narrative). *Iqdê Durfam* ji vegêraneke çarçoveker pêk tê û zincîreya rûdanê ya wê jî dibe vegêrana zeliqandî. Mesnewînûsê vê fablê di navbera bûyera çarçoveker û bûyerên din de tîkiliyeye organîk/binyadî ava kiriye. Ev bûyera çarçoveker bûyerên din ên li pey hev dorpêç dike. Ango çîrok di nav çîrokê de tînin vegotin lê ev ne bi şiklekî tevlihev; bi rêzî û dabeşkirinê di nav metnê de hatiye bicîhkirin. Vegêranên zeliqandî hunera vegêranê ya hunermend xurtir dike û dahêneriya wî nîşan dide. Heke çîrok yek astî be di hingê zûrbûna xwîner û tîgihîştina çîrokê dê hêsantir be. Çîrok bi vegêranên zeliqandî hatibin vegêran pewist e ku xwîner hem li ser matrîksa giştî (bûyera çarçoveker) hem jî li ser çîrokên zeliqandî hûr bibe (Subaşı, 2019: 743). Matrîksa fablê beşa *Gotina Hinek Hikayeyê Pir 'Eqil û Bijartina Çîroka Qijik û Rovîyê* ye. Bûyerên din di bin banê vê bûyera çarçoveker de rûdidin.

Em dikarin zincîreya rûdanê ya fablê wiha formulîze bikin. Di şemayê de rêwîtiya derwêşan heta ku digihîjin baxçeyê bi “R D û G B”yê, çûna ji baxçe û rêwîtiya derwêşî bi “Ç D J B”yê, rastlêhatina derwêş li zarokî bi “D û Z”yê, bûyera zarok û qijikî bi “Z û Q”yê, bûyera qijik û rêvî bi “Q û R”yê, bûyera rovî û neçîrvanî bi “R û N”yê hatiye nîşandan. Bûyera çarçoveker “rêwîtiya derwêşan û gihaştina wan a baxçeyê” ye ku di dawiya fablê de ev rêwîti diqede. Lê bûyerên din bi awayekî xelekî/zincîrî didomin. Heke em vegêrana fablê bi şikl nîşan bidin şemayeke wiha dertê holê:



2. Şemaya Vegêranê

Em dikarin şemaya vegevanê ya fablê wiha rave bikin. Asta derekî xala destpêkê ye û ne girêdayî tiştêkî ye. Asta navekî girêdayî asta derekî ye û asta jor-çîrokî jî girêdayî asta navekî ye. Li gorî dabeşkirina Geneteyî şemaya vegêranê ya 'Iqdê Durfamê' bi sê astan derdikeve pêşberî me:

1. Asta derekî/derçîrokî: R D û G B
2. Asta navekî/navçîrokî: Ç D J B
3. Asta jor-çîrokî: D û Z, Z û Q, Q û R, R û N

4.2. Karakter/Tîpên Fablê

Karakter di berhemê de yan mirov an jî heyberên ji bilî mirovan in. Forster kesên çîrokê -mîrov û ajal- wek lîstikvan bi nav dike û dibêje ku ew lîstikvan ew afîrede ne ku xwe li mirovayetiye girêdidin (Forster, 2001: 82-83). Hunermend van karakterên berhema xwe carinan bi kesayet/taybetmendiya wan a rasteqîn hildibijêre carinan jî li gorî mebesta xwe di berhemê de tîpan diafirîne, dixemlîne û hin taybetmendiyan li wan bar dike. Taybetmendiyan karakter û tîpên berhemê rengvedana alema hunermend a bîrî û sehekî ye jî. Karakter ew heyberên karakterîstîk in ku bi peyvan hatine çêkirin û aliyên mirovan ên sergirtî û daxwazên wan didin der (Subaşı, 2019: 71). Peyva "karakter"ê îro li kêleka figurekî edebî tê wateya sembol, herf û nîşaneyê jî. Ev têgeh jî peyveke Yewnana kevnar tê û wateya amûreke deximandinê dide ku nîşaneke ciyaker e. Îcar ciyakeriya nîşaneyê bûye takekesiya kesekî/ê û îro kes bi îmza, yektabûn an jî taybetmendiyan xwe yên xweser tê pênasekirin herwiha tê wateya taybetmendiyan bîrî û exlaqî jî (Eagleton, 2013: 48). Karakter bi taybetmendiyan xwe yên fizîkî, exlaqî û derûnî di berhemê de tîpên tehlîlîkirin û şayesandin. Şêx Eskerî karakterên fablê (derwêş, zarokê sêwî, qijik, rovî û nêçîrvan) hem taybetiyên wan ên exlaqî û derûnî hem jî bi yên fizîkî nasandiye. Ji bo mînak Eskerî taybetiyên derwêş û qijikê yên fizîkî û derûnî rave kiriye:

Di zahir hin gulî berdane ser mil
We lê batin pur in durdane der dil (Eskerî, 1989: 80)

Wekî wan merdomê dilpare û çak
Li xakê bû rewan û ew bixwe xak (Eskerî, 1989: 84)

'Ecêb darek bilind e ser li esman
Qijik wa ye li ser teşbîhê şeytan

Xebîsu'l-menzerê der jora darê
Kerîhhu's-sewt e wek sewta hîmarê (Eskerî, 1989: 132)

Em ê di vê beşê cih bidin hin dahûranên qadê û li gorî wan, karakterên fablê binirxînin. Wek hêmaneke bingehîn a vegêrannasiyê li ser karakterîzekirinê (characterisation) gelek teorîsyenan analîzan kirine. Forster behsa du cure karakteran dike: Karakterên yeknesak (flat character) û karakterên girover (round character). Karakterên yeknesak xwedî taybetî û nêrînekê ne. Ev karakter li ku derkevin pêşîya xwîner tên nasîn. Dema ku ji yekê zêdetir taybetî di karakterekê de peyda bû ew karakter girover dibe (Forster, 2001: 108). Pêwendiyek di navbera cure û karakterê heye ku ev di rengvedana karakteran de xwe dide der. Karakterên yeknesak zêdetir di berhemên pevbestî de tên dîtin û ne karakter, fikrên ku karakter temsîl dikin giring e. Tevgerên piraniya karakteran heta astekê dikare bê texmînkirin. Hin taybetmendiyên wan ên wekî pişe, zayend, hêmanên derveyî û cureya peywira wan di heqê helwest û tevgerên wan de fikrekê dide me (Talib, 2021). Karakterên fablê ji ber ku sade û tîpên jirêzê ne ango tîpîk in xwîner dikarin hizir bikin ku ew ê çawa tevbigerin.

Hevgiriya kiryarên karakteran jî di karakterîzekirinê de xwedî rol e. Heke karakter di seranserê berhemê de kiryarên xwe dubare bike, carinan kiryarên mînanî hev carinan jî kiryarên dijber nîşan bide ev kiryar dibin karakterîstîk. Heke guherîneke bingehîn di karakter de pêk nehatibe ew dibe karaktereke tîpîk û tîp nîşaneyê yekalîbûnê ye. Ev taybetî piranî di karakterên yeknesak de dixuye ku di seranserê vegêranê de bi wan re guherîn û geşedanek pêk nayê. Ji bo mînak ajelên wekî rovî, şêr, çûk (kevok, dîk, qijik, legleg), gur û her yek ji yê din tîp û kesayetekê dinimîne û kiryarên wan di vegêranê cuda de dişibin hev (Subaşî, 2019: 76). Li gorî dabeşkirina Forster em dikarin bêjin ku karakterên 'Iqdê Durfamê yeknesak in. Derwêş heta dawîya vegêranê bi çavekî tesewifî li bûyeran dinêre û rêwitiyê didomîne, qijik kirêt e; li pey nefsa xwe û rovî fêlbaz e; li pey berjewendiyên xwe ye.

Navlêkirin awayê herî sade yê danasîn an afirandina kesekî/ê ye û her navlêkirin cureyeke zindîkirin û takekeskirinê ye. (Wellek û Warren, 1949: 256). Hevterîbiya nav û taybetiyên karakteran di hîlbijartina wan de giring e. Eskerî digel ku navekî taybet li derwêş, zarok, qijik, rovî û nêçîrvan nekiribe jî sifetên wekî derwêşê rêbiwar, zarokê sêwî, qijika pîs, roviyê fêlbaz û nêçîrvan bixwe jî di heqê xweseriyên van karakterên tîpîk de fikrekê dide xwîner.

Di fablan de her heyber xwedî nîrxekî alegorîk e û peyameke sembolîk a di heqê mirov û mirovahiyê de dihewîne (Avcı, 2012). Karakterên fablê ji sê mirov (derwêş, zarokê sêwî, nêçîrvan) û ji du ajelên temsîlî (qijik, rovî) pêk tê. Şêx Eskerî karakterên berhema xwe çî yê mirov çî jî yê ji alema ajelan bin li gorî rola wan a rasteqîn an jî taybetmendiyên wan ên xweser hîlbijartiye. Karakter (derwêş, zarokê sêwî, nêçîrvan) bi rolên xwe yê jiyana civakî di fablê de cih digirin û heyberên din (qijik, rovî) jî di çarçoveya temsîliyetê de rola mirovên ji civakê dilîzin. Em ê van karakteran û tîpolojîya wan di çarçoveya pozîsyona wan a civakî û taybetmendiyên wan ên temsîlî de rave bikin.

4.2.1. Derwêş

Derwêş ew kes e ku pêgirtiyê terîqet an şêxekî ye û bi sofitiyê dijî. Taybetmendiyeke derwêşan ew e ku rêbiwar in. Hin derwêş dema dikevin rêya tesewifê hin jî di heyama kamîlbûnê de derdikevin rêwitiya manewî (Yazıcı, 1994). Karakterê herî giring jî nav qadroya kesan derwêş e. Lewra ji bo pêkanîna armanca mesnewînûs derwêş bûye kirde û navgîna sereke. Şêx Eskerî peywira vegêriyê daye wî, hest û ramanên xwe, şîret û dersên xwe bi wî derbiriye. Derwêşê rêbiwar di beşa *Berayê Meslehet Çûna Derwêşekî ji Bexçe* de ji baxçeyê vediqete û dest bi rêwitiyê dike. Ji vê beşê şûnde wek çavdêrê bûyeran û şîretkarekî heta beşa dawî em rûdanên fablê jê dibihîzin. Derwêş rastî dîmenên ku tê bi sosretî û çavekî tesewifî temaşe dike, li ser van bûyeran diponije û bi nêrîneke hikmetamîz encaman derdixe; (Sağnıç, 2002: 533) çavdêrî, hest û fikrên xwe, raz û hikmetên ku ji wan bûyeran fêm dike bi hevalên xwe re parve dike. Derwêş bi temaşeya alemê, tefekura li ser bûyeran û di encama van merheleyan de bi gihaştinê hikmetê dixwaze ku giyanê xwe bikemilîne. Lewra derwêş berî rêwitiya xwe di nav baxçeyekî wek bihuştê de bi hevalbend û murşidê xwe re aram e:

Bi sidqê safî di dil da dîlbera xwe
Fida kirbû di rê de wî serê xwe

Koşad e daîma çeşmê dilê wî
Hemî guhdari bûn cuz û kulê wî (Eskerî, 1989: 85)

Wezîfe ger çî bû heqqî eda kir
Di rahê heq de bê mozd û seda kir (Eskerî, 1989: 86)

Derwêş mirovên bihikmet, dinyatî, birehm, sûdmend, kesên ku ji bo kemilîna giyanê di lêgerînê de bin, xêrxwazên civakê, kesên rênîşandêr dinimîne. Hin derwêşên din hene ku di beşên *Gotina Hinek Hikayeyê Pir 'Eqîl û Bijartina Çîroka Qijik û Rovî, Vegera Derwêş Cem Hevalan û Behskirina Ehwalê Yetîmî ji Wan û Çûna Rovî û Ketina Wî ya Faqê* de tenê wek fîgur li nav baxçe rûdinin û guhdêriya çîrokê/çîrokan dikin. Peywira wan a fablê di beşa dawî de diqede û rewîtiya xwe didomînin. Ew ji ber ku tevî bûyeran nebûne, rasterast bandorê li fablê nakin û pasîf in ne hewce ye ku bi hûrgilî behsa wan bê kirin. Em wisa hizir dikin ku ev derwêş Şêx Eskerî bixwe ye. Eskerî bi xeyalî lehengê xwe derdixê rewîtiyê û bi çavê wî çavdêriya bûyeran dike û fikr û hestên xwe tîne zimên.

4.2.2. Zarokê Sêwî

Karaktereke din zarokêkî sêwî ye ku di xelesa sêyem de derwêş rastî zarîn û girîna wî tê. Ev zarok li bin darekî rûniştiye û ji halê xwe re digirî. Em hem ji şayesa ku derwêşî dike hem jî ji guftûgoya navbera her duyan gelek agahiyan di heqê vî zarokî û serpêhatiya wî de bi dest dixin. Zarokê sêwî bê dê û bav maye û ji xizmên xwe gazinan dike. Zarok dibêje ku xizmên min bêîman in, çavbirçî ne, malhebîn in û wekî dûpişkan e. Dilê derwêş pê dişewite, rehmê lê dike, dilê wî xweş dike û penîr û nanê di xurcika xwe de derdixê û didê. Paşî jî di heqê sêwiyan de şîret li xwîneran dike.

Heta wur çûm bi sed fikr û xiyalê
Gedayek dî me teşbîhê hîlalê (Eskerî, 1989: 97)

Ewî tîflê yefîmê bê dê yû bê bab
Tenê narê zemîr ê yar û ehbab

Ewê zulma ku mislê marê dîn e
Vedabû pê te go bîmar û dîn e (Eskerî, 1989: 98)

Xulase min di berda ta ku geş bû
Me ramûsa û ser mizda ku xweş bû

Me rabû hin penîr û nan dayê
Dilê wî xweş kir û îhsani dayê

Dikim şîret bi can hûn qelb û guh bin
Hifîz kin vê defîna bêser û bin (Eskerî, 1989: 101)

Li wan kin ger heye îhsanê rehmet
Di dil de sari kin wî narê hesret (Eskerî, 1989: 102)

Zarokê sêwî bi rola xwe ya fablê di nav civakê de rewşa çîn an mirovên bindest ên wek sêwî, ketî, mezlûm û hewceyê alîkariyê dinimîne ku tûşî zilm û neheqiyê dibin.

4.2.3. Qijik

Qijik di fablê de karaktera yekem a ajel e. Ev ajel di xelesa çarem de derdikevê pêşberî me. Dikare bê gotin ku di nexşeya çîrokê/fablê de rola herî giring a qijikê ye. Lewra bi derketina sehneyê ya qijikê berê zincîreya rûdanê dikeve aliyekî din, girêk li serpêhatiya derwêşî dikeve û fabla navdar a Ezopî dest pê dike. Qijik ji niyeta Şêx Eskerî re dibe navgîn û vegêran dibe vegêraneke irfanî. Eskerî dixwaze bi temsîla “Qijik û Rovî”yê rewşa civaka xwe nîşan bide û di beşa sebebê telîfê de vê niyeta xwe eşkere dike û dibêje:

Hinik şubhê qijakê pir bi fexr in
Wekî rovî hinik pir fennîsexr in (Eskerî, 1989: 39)

Qijik wextê ku çav bi penîrê zarokê sêwî dikeve di dor de fir dide heta ku fersendekî dibîne û penîr direvîne. Îcar piştî vê bûyerê muxatabê derwêş dibe ajelek. Piştî ku qijik penîr direvîne îcar rovî bi xap û lêpan penîr ji qijikê distîne. Qijik fêhm dike ku hatiye xapandin û poşman dibe. Ev qijik ji aliyê fizîkî ve belek, qirêj, mirara wek leş, dengxirab, dengker, şeytan û pîsrewîşt e:

Di wê navê me di yek qijika pîs
Li ser yek darê wa ye girtiye lîs

Qijika fasiq pîsteb' î ebleq
Fîraz û geh nişîbe teq û req

Mi di fir da û çû dara yetîmî
Li wê der jî çû hate mûqîmî (Eskerî, 1989: 118)

Heman ew fasiqa pak a nepaqij
Wuha çû hat neseknî kir qijeqij (Eskerî, 1989: 117)

4.2.4. Rovî

Rovî karaktereke din a fablê ku bi fêlbaziya xwe tê nasîn û xwîner kêm zêde dikare pê derxe ku ew ê çî bike. Ev ajel di xelesa pêncem a fablê de bi bêhngirtina penîrî derdikeve sehneyê. Rovî lehengê duyem ê fablê ye ku ji ve vegêrana tesewîfî re bûye navgîn. Rovî dema di devê qijikê de penîrî dibîne ji bo bidestxistina wî difikire û xwe wek pîrekî salik dide nasîn. Rovî bi fêlan pesnê qijikê dide, wî dixapîne, penîrî jê distîne û dixwe. Paşî di rê de bêhna dûv/donbeyekî digire û dixwaze wî jî bixwe. Digel ku bi guman û tevdfîr nêzî dûvî dibe jî nikare bi nefsa xwe, dev davêje dûv û dikeve xefkê. Paşî neçîrvanek tê, wî dikuje, ser jê dike û dibe malê.

Ewî rûbahê pur mekrê cihanê
Evî casûsê huqqebazê hanê

Bide saqî bibêjin rûbehê pîr
Çewa xapand qijik jê girtî pennîr (Eskerî, 1989: 127)

Tu mekr û sihr û fenn û hîlekarî
Neda feyde ne efxan û ne zarî (Eskerî, 1989: 162)

4.2.5. Neçîrvan

Nêçîrvan di xelesa şeşem de tevî bûyerê dibe. Neçîrvan karaktera dawî ya qadroya kesane û temamkerê çerxa bûyerê ye. Rovî dikeve xefka vî nêçîrvanî, nêçîrvan serê rovî jê dike û dibe malê. Nêçîrvan bi xefka xwe tenê dawî ne li jiyana roviyî tîne herwiha dawî li taybetmendiyên wek xirabî, hîle, xwemezindîtîn, hirsê jî tîne ku ev taybetmendî di kesayeta rêvî de civiyane.

Mi dî nagahi yek merdê çû seyyad
Bi wî re hem tufek têtin dîkit cad (Eskerî, 1989: 162)

Wusan lê da heta rûbeh kire sist
Di damê de serî jê kir bi derxist

Hilanî xiste tûrê xwe bire mal
Temam bû çisseta pir şan û ehwal (Eskerî, 1989: 163)

4.3. Cih

Cih di mesnewiyan de bi giştî qadên wek bajar, qesr, baxçe û cihê nêçîrê ne. Leheng di çolan, çiyên û behran de derbas dibin. Cihên bûyeran pir kêmtên zanîn û piranî xeyalî ne. Mekan li gorî taybetmendiyên bûyeran tê sazîkirin û şayesandin (Ûnver, 1986: 455). Mekanê fablê yê yekem ku derwêşan rêbiwar xwe digihîninê cihêkî îtibarî/pevbestî ye û di berhemeke pevbestî de asayî ye ku mekan jî pevbestî be (Aktaş, 1991: 141). Derwêşan rêbiwar di rêwîtiya xwe de di cihên wek çol, daristan, derya, çiya û newal, bax û baxçe, bajar, Medîne, Ke'be, Wadî'ul-Eymen û Çiyayê Tûrê de derbas dibin û paşî li baxçeyekî rûdinin. Ne diyar e ku ev baxçeyê wek "Bihuştê Îremê" xweş li ku ye. Şayesandina vî baxçeyî bi hûrgilî û berfireh hatiye kirin. Di vî baxçeyî de çem û kaniyên wek ava heyatê zelal û paqij diherikin, gelek ajalên dirinde û kedî tê de digerin, gelek cureyên daran, fêkiyan û kulîlkan bi xweşikî û bêhnxweşiya xwe derdor dixemilînin, balinde ref bi ref difirin û bi dengê xwe yê xweş dixwînin. Helbestvan şayesa wî baxçeyî wisa xweşik kiriye ku wek wêneyekî yan dîmenekî jî bihuştê li ber çavan şênber dibe:

Wuha geşt û gozar e wan şeb û rûz
Heta çûn cayekî xedra dilefrûz

Wekî baxê Îrem bexçayekî xweş
Temaşa kî tu lê dê bî tu serxweş

Ji engûr û ruteb enwa'e eşcar
Gelek tê da hene bê hedd û hejmar (Eskerî, 1989: 73)

Heta beşa *Berayê Meslehet Çûna Derwêşekî ji Bexçeyê* cih ev baxçe ye lê piştî vê beşê cih diguhere û bûyer di nav siruştê de rûdinin. Ji ber ku vegêr û karaktereke fablê derwêş e û taybetiyeke derwêşan jî rêbiwarî ye cihê fablê jî nesînorkirî ye û li gorî atmosfera vî rêwîtiyê ye:

Çiya û deşt û wadî baxçe û bax
Gelek dîn şer û rovî qijik û zax (Eskerî, 1989: 85)

Cih di beşa *Vegera Derwêş Cem Hevalan û Behskirina Ehwalê Yetîmî ji Wan re* de careke din diguhere. Derwêş di rêwîtiya xwe yê di vî beşê de nêzî girekî li nav daran û li ser kaniyekê rastî zarokê sêwî tê:

Min dî nageh di reh tilmek xuya bû
Wuha pejmorde bê reng û giya bû (Eskerî, 1989: 95)

Ku elhasil mi dî nê dûr e nezdîk
Ji nav çend dari tê ev dengê pur çîk

Li bin darê li ser çeşm e perîşan
Diherkin çeşmeyê xwûnabê çeşman (Eskerî, 1989: 97)

Taybetiyên karakteran jî bandor li cihê çîrokê dike û di atmosfera wî de diyarker e. Piştî ku derwêş rastî zarokê sêwî tê îcar ajelên wek qijik, rovî û piştî jî nêçîrvanek tevli bûyerê dibin. Qada jiyanê ya van ajelan siruşt e û nêçîrvan jî di vê qadê de li pey neçîrê ye. Şêx Eskerî xwestiye ku di mekanê fablê de yekrengiyek dabîn bike. Lewra hem cihê ku derwêş lê rûdinin (baxçe) û cihê ku derwêş rastî zarokê sêwî tê (daristan) her wiha bûyerên ku di navbera qijik, rovî û nêçîrvan de diqewimin dîsa li siruştê ne.

4.4. Dem

Dem ji bo pêkhatin û vegotina bûyerekê pêwîst e û hêmaneke bingehîn a vegêranê ye. Dem ji destpêka zincîreya rûdanê heta dawiyê di mesnewiyan de nediyar e. Têgehên demê yên wek demsal, meh, hefte û roj di mesnewiyan de tînan bikaranîn. Di van berheman de tînkiliya bûyer û demê bêhevgerî û derasayî ye. Rêwîtiyeke dirêj dikare bi çend rojan biqede (Ûnver, 1986: 455). Karaktera demê di berhemên pevbestî de asayî ye ku kronolojîk be û em xelesa bûyerê di nav rêza kronolojîk de fêhm dikin. Dem di fablê de piranî bi awayekî kronolojîk diherike.

Chatman di çarçoveya dahûrîna demê de behsa du cure deman dike: Dema çîrokê (story time) û dema rabêjê (discourse time). Dema çîrokê, maweya rûdanên vegêranê ye û dema rabêjê, ew mawe ye ku ji bo tîngihîştina rabêjê pêwîstî pê heye (Chatman, 1980: 62). Dem di cureyên mîna çîrok, çîrvanok, fabl, efsane û destanan de piranî nesînorkirî ye ango dema çîrokê xumam e. Mesnewînûs di destpêka rêwîtiya derwêşan de ji bo destpêka çîrokê îfadeya “ji ehwalê zeman” bi kar tîne. Qalibên bi vî rengî herçend xumamiyekê ji bo demê çêbikin jî ji bo berhemê domdarî û mayindetiyekekê dabîn dikin (Subaşî, 2019: 139). Ev şêwe dike ku fableke mîna “Rovî û Qijik”ê deng û peyama xwe ji serdemên berê ve bigihîne îro û bibe malê her demê. Derwêş di demeke nediyar de rêwîtiya xwe bi şev û roj didomînin heta ku digihîjin baxçeyekî wek bihustê:

Ji ehwalê zeman çend merdê derwêş
Seyahat bû li dunya wan her û îş (Eskerî, 1989: 71)

Wuha geşt û gozar ewan şeb û rûz
Heta çûn cayekî xedra dilefrûz (Eskerî, 1989: 73)

Maweya fablê ji rêwîtiya derwêşî heta ku xelesa bûyeran diqede bînavber didome. Vegêr/derwêş di beşên *Berayê Meslehet Çûna Derwêşekî ji Bexçe* û *Vegera Derwêş Cem Hevalan, Behskirina Ehwalê Yetîmî ji Wan re û Çûna Rovî û Ketina Wî ya Faqê* de ji bo demê peyva “mîqdarekî, qederkî” bi kar tîne ku maweya wê nediyar e. Vegêr bi bikaranîna van qaliban nakeve hûrgiliyan û xwe di ser demê de diqevêze:

Meşî mîqdarekî ew zatê pur pak
Welê hîcrana yaran dîl kirî çak (Eskerî, 1989: 85)

Di vî halî meşîm mîqdarekî çûm
Di halî me dîn perwane û mûm (Eskerî, 1989: 95)

Bi vî halî qederkî çûn bi rê de
Gelek hawê ‘ecêb jê tene pêde (Eskerî, 1989: 157)

Em ji vegotina vegêr û bûyerên ku li pey hev diqewimin fêhm dikin ku di navbera van bûyeran de mawe pir ne dirêj e. Lewra rastlêhatina derwêş li zarokê sêwî, vegera derwêş cem hevalan û behskirina ehwalê sêwî ji wan re, standina qijikê penîr ji sêwî, standina rovî penîr ji qijakê, *çûna rovî û ketina wî ya faqê*, serjêkirina rovî ji hêla nêçîrvanî ve bi awayê xelekî û bênavber didome.

Genette di dahûrîna demê de behsa sê xalan dike ku ev ji sazûman/rêzik (order), mawe (duration) û frekansê (frequency) pêk tê (Genette, 2020: 21-151). Ji rêzikê mebest rêza bûyeran a kronolojîk e ku em dikarin ji bo vê têgehê bersiva pîrsa “Gelo pêşkêşîya bûyeran li gorî rêzkirineke asayî ye yan na?” bidin. Heke bûyerên vegêranê li gorî kronolojîyêkê rûdabin dikare behsa rêzeke kronolojîk bê kirin. Heke bûyer ne kronolojîk bin hingê ladan/averêbûn (anakronî) pêk tê. Du şeweyên ladanê hene: Paşdevegeran (flashback/analepsis) û pêşdeçûn (flashforward/prolepsis). Heke dem çûbe berê û ji kes, bûyer an rewşên berê hatibe qisetkirin paşdevegeran pêk tê. Dem di vegêranan de ji hêla çîroksaziyê ve giring e û bi mebesta ravekirina sedem-encamê ev rêbaz tê bikaranîn. Herçend dem pîranî kronolojîk be jî em dibînin ku Şêx Eskerî di hin beşan de wek teknîkeke vegotinê serî li paşdevegeranê xistiye lê serî li pêşdeçûnê nedaye. Vegêr wexta ku derbasî beşeke din dibe ji bo bibîrxistinê tenê bi du yan sê malikan îfadeyên wek “me pêş de gotibû / me pêşin behsa.....kir/berî enha me go....” bi kar tîne û behsa rûdanên berê dike:

Berî anha me go derwêşê dildax
Vegerya cem hevalan salim û sax (Eskerî, 1989: 90)

Ji bo mînak Eskerî di beşa *Vegera Derwêş Cem Hevalan û Behskirina Ehwalê Yetîmî ji Wan re de rastî zarokê sêwî hatibû û zarokî bi nan û penîr teselî kiribû. Vegêr di beşa *Stendina Qijakê Penîr ji Yetîmî* de bi teknîka paşdevegeranê careke din behsa vê rewşê dike:*

Me paqij kir ji çavan hêstirê xwûn
Penîr û nani dayê geş kire gûn (Eskerî, 1989: 117)

4.5. Vegêr

Vegêr, hêmaneke vegêranê ye ku bûyer, diyarde an rewşekê vediguhêze xwîneran û di navbera hunermend û xwîner de têkiliyekê datîne (Alan, 2015: 117). Hunermend, vegêrî bi derfetên fireh ên vegotinê araste/bitehîz dike û jixwe re wek berdevk hildibijêre. Ev vegêrê biaraste derfeteke vegotinê ya wisa dide helbestvan ku dilê wî çî dixwaze bibêje dibêje û ji pêkanîna armanca xwe ya taybet re bingehekê amade dike. Hunermend di nav demê de dibe serdestê hest û tevgerên hemû qadroya kesan û bi şiklê ku dixwaze mekanê dekore û şîrove dike (Ece, 2002: 101). Vegêr li gorî kevneşopîya mesnewînûsiyê di beşa dîbace û xafîmeyê de rasterast tê dîtin. Lêbelê di beşa mijara sereke de serbest e; dikare taserûfê bike û wek berdevkê xwe vegêrekî/vegêran hilbijêre û vegêranê pê/bi wan bide gotin. Hunermend vegêranê yan bi karaktereke çîrokê yan jî bi vegêrekî ji derve dide vegotin (Jahn, 2020: 143). Hêmana vegêriyê di *'Iqdê Durfamê* de bi du kesan derdikeve pêşberî me: Şêx Eskerî ku vegêrekî derveyî çîrokê ye û derwêşê rêbiwar ku karaktereke çîrokê ye. Em ê di nirxandina vê sernavê de ji bo nazim/Şêx Eskerî “mesnewînûs” ji bo derwêşê rêbiwar jî îfadeya “vegêr” bi kar bînin.

Vegêr di metnekî de ji hêla nîşandana hebûna xwe ve bi vegêrê eşkere/vekirî (overt) û vegêrê veşartî/sergirtî (covert) derdikeve pêşberî me. Vegêrê vekirî bi kesê yekem (ez, em) bangî xwîner an guhdêr dike û di heqê rewş û bûyeran de nirxandin, şîrove û darazên xwe dide hîskirin; bi mebesta ku mudaxeleya çîrokê bike li hember karakter û bûyeran şîroveyên felsefî û jorrabêjî (metanarrative) dike. Vegêrê veşartî xwe dernaxe pêş, bangî tu kesî nake, nêtar e, şîroveyan û mudaxeleyan çîrokê nake (Jahn, 2020: 63). Li gorî vê dabeşkirinê em dibînin ku Şêx Eskerî û derwêşê rêbiwar vegêrê eşkere ne. Wek kes/vegêrê yekem Şêx Eskerî tevî vegêranê dibe; nêrîn û şîretên xwe li ser bingeha dinê Îslamê û nêrîneke tesewîfî vedibêje. Derwêş jî wek kes/vegêrê sêyem bi çavekî hikmetamîz li

bûyeran dinêre û wan vediguhêze. Hunermend ne mecbûr e ku di seranserê berhemê de bi heman forma vegêriyê vegêranê pêşkêş bike. Ji kesê yekem derbasbûna kesê sêyem nîşaneyê berhemeke serkeftî ye (Aytaç, 2003: 106). Şêx Eskerî di destpêk û dawiya beşên vegêranî de hest û nêrînên xwe yên di heqê rewş û bûyeran de ew bixwe; bûyerên fablê jî bi devê derwêşê rêbiwar vediguhêze. Ji bo mînak di beşa *Stendina Qijakê Penîr ji Yetîmî* de mesnewînûs piştî ku dibêje “Bi sermetî beyan kim qîsseta pêş/Ji bo wan ka çi go wî pakê derwêş” rola vegêriyê dide derwêş. Derwêş wek vegêrekî vekirî çavderî û hestên xwe pêşkêş dike. Paşî jî derwêş jî bo tiştên ku rastî wan hatiye şîretan dike:

Bi sermetî beyan kim qîsseta pêş
Ji bo wan ka çi go wî pakê derwêş (Eskerî, 1989: 116)

Diçûm û her fikir min lê nezer pur
Diket qelbê me jê dax û keser pur (Eskerî, 1989: 117)

Heta karî bike xîret şîyar be
Di her bezmê bi dil godarê yar be (Eskerî, 1989: 120)

Genette li gorî tevlihbûn/têkiliya vegêr a çîrokê behsa du astên vegêran/vegêriyê dike. Heke vegêr karaktereke ji nav çîrokê be ew dibe vegêrana nav-çîrokî (homodiegetic narrative) û vegêrê wê jî dibe vegêrê nav-çîrokî (homodiegetic narrator); ne karaktereke ji nav çîrokê be ew jî dibe vegêrana der-çîrokî (heterodiegetic) û vegêrê wê jî bi navê vegêrê der-çîrokî (heterodiegetic narrator) tê penasekirin (Genette, 2020: 226-229). Vegêrê *Iqdê Durfamê* di asta derekî (extradiegetic) de mesnewînûs (heterodiegetic), di asta navekî (intradiegetic) û asta jor-çîrokî (metadiegetic) de derwêş (homodiegetic) e. Mesnewînûs di beşa dîbace û xatîmeyê de; ji mijara sereke jî di seranserê beşa *Ferq û Temîza Xeberdana Qenc û Xerab û Fezîleta Sebrê* de, di destpêka hemû beşên vegêranî de erka vegêriyê dide ser milê xwe (kesê yekem). Mesnewînûs piştî çûna nav baxçeyê rola vegêriyê dide derwêşê rêbiwar û ji vir pêve bûyeran jî devê vî derwêşî (kesê sêyem) vediguhêze. Derwêş di asta navekî de wek karakterekî vegêranê tenê bi beşa *Vegera Derwêş Cem Hevalan û Behskirina Ehwalê Yetîmî ji Wan re* derdikeve sehneyê û dibe vegêrê nav-çîrokî (homodiegetic narrator). Derwêş jî bilî vê beşê di hemû beşên asta jor-çîrokî de dibe vegêrê der-çîrokî; wek çavdêrekî bûyeran dişopîne û vediguhêze. Eskerî jî bo ku armanca xwe bi referansên dîmî pêk bîne derwêşekî/karaktereke mutesewif hilbijartîye û nêrînên xwe bi bergêha (perspective) vê karakterê derbiriye. Ev jî nîşan dide ku mesnewînûs xetên stûr nexistiye navbera vegêr/an. Heke berhem bi baldarî neyê xwendin dibe ku serê xwîner tevlihev bibe. Ji bo ev alozî çênebe divê bi xwendineke baldar hêmana vegêriyê beş bi beş û bi berawirdî bê çavdêrîkirin û mantiqa mesnewînûs a vegêranê bê fêmkirin. Ji bo mînak di malikên beşa *Vegera Derwêş Cem Hevalan û Behskirina Ehwalê Yetîmî ji Wan re* de pêşî mesnewînûs bi forma kesê yekem (me) diaxîfe piştî rola vegêriyê dide derwêş û vî vegêrî bi forma kesê yekem diaxîfine:

Berî enha me go derwêşê dildax
Vegerya cem hevalan salim û sax (Eskerî, 1989: 90)

Ewî derwêşê sahibraz ê dilcû
Hikayet kir ji bo yaran weha go (Eskerî, 1989: 93)

Heta wir çûm bi sed fikr û xiyalê
Gedayek dî me teşbihê hîlalê (Eskerî, 1989: 97)

Dikim şîret bi can hûn qelb û guh bin
Hifîz kin vê defîna bêser û bin (Eskerî, 1989: 101)

Mesnewînûs di hin malikên berhemê de piştî ku dibêje “Ez ê beyan kim bi zimanê derwêş” xwe jî tevli vegotinê dike hest û ramanên xwe eşkere dike. Ev jî dikare wek qelsiyê berhemê ya vegotinê

bê nîrxandin. Şêx Eskerî dema bûyeran radigihîne di hemû beşan de bûyera ku berê qewimiye di beşa domahî de bi kurtasî bi çend malikan dixe bîra xwîner û derbasî xelesa din dibe. Mesnewînûs di beşên vegêranî de heta ku peywira vegêriyê dihinêre bo derwêş vegêrê fablê ew bixwe (kesê yekem) ye. Ji bo mînak:

Bi vî halê me go derwêşê dilnûr
Ji ehabê xwe ew bû dîr û mehcûr (Eskerî, 1989: 85)

Hîkayet kir ji bo wan pakê derwêş
Yetîmê bêkes ê dilçakî derwêş (Eskerî, 1989: 98)

Ji bo yaranê sadiq re wuha go
Ji ehwalê yetîmê bênewa go (Eskerî, 1989: 116)

Mesnewînûs piştî van gotinan rola vegêriyê dide derwêş; vegêr dibe kesê yekem (derwêş) û dest bi veguestina bûyeran dike. Ji bo mînak:

Me paqij kir ji çavan hêstirê xwûn
Penîr û nani dayê geş kire gûn (Eskerî, 1989: 117)

Ew ê zulma ku mislê marê dîn e
Veda bû pê te go bîmar û dîn e (Eskerî, 1989: 98)


Mesnewînûs di dawiya beşên vegêranî de bi şeweyeke dîdaktîk xwe nîşan dide. Ji bo mînak:

Di heqqê wan de hûn bin pêstirê wan
Ji çavî hûn bimalin hêstirê wan (Eskerî, 1989: 101)

Binêre Eskerî xafil mebe tu
Tu menşîn xafil û cahil mebe (Eskerî, 1989: 120)

Kesê kibr û xurûrê ke di her dem
Dibit lê keyf û şahî şîn û matem (Eskerî, 1989: 149)

Rewşa vegêriyê ya fablê me li jêr bi şemayê nîşan daye. Wek vegêrê yekem ê berhemê mesnewînûs bi tîpa "M"yê, vegêrê duyem derwêş bi "D"yê hatiye nîşandan. Wek lehengên fablê ji bo guftûgoya derwêş û zarokê sêwî derwêş bi "D"yê û zarokê sêwî bi "Z"yê, ji bo guftûgoya qijik û roviyê, qijik bi "Q"yê û rovi jî bi "R"yê hatiye nîşandan. Li gorî şemayê "M" di seranserê berhemê de vegêrê sereke û kesê yekem e. Lewra di her beşê de xwe dide hîskirin. Vegêrê duyem "D" di beşên vegêranî de derdikeve sehneyê; rewş û bûyeran vediguhêze. Ew jî rewşa zarokê sêwî, qijik, rovi û nêçîrvanî bi kesê sêyem (ew) vediguhêze. Guftûgoyên di navbera "D" û "Z"yê û "Q" û "R"yê de ji ber ku ne di asta vegêriyê de ne di bin banê vegêriya "D"yê de hatine nîrxandin.



2. Şemaya Rewşa Vegêrê ya Fablê û Guftûgoyên Lehengan

4.5.1. Rêbaz û Teknîkên Vegêranê

Hunermend di berhemên ku pala xwe didin vegêranê de hin teşe, teknîk û rêbazên vegêranê bi kar tînin. Dahênerî, estetik û hunera edebî ya hunermend bi van rêbaz û teknîkan dertê holê û ev dibin amrazên şeweya hunermend jî. Wek hunermendekî mesnewînûs jî ji ber sînardariya teşeya mesnewiyê di qadeke teng de manewra dike; di nav vê bêmkaniyê de bi bikaranîna van rêbazan şeweyekê pêk tîne, bi vê şeweyê derdikeve pêş û cihêrengiya xwe nîşan dide. Bikaranîna van rêbaz û teknîkan şeweya edebî ya mesnewînûs diyar dike û mesnewînûsî bi navgîniya vegêr ev rêbaz û teknîk sepandine. Em ê di çarçoveya bikaranîna rêbaz û teknîkên vegêranê de li ser *'Iqdê Durfamê* rawestin.

4.5.1.1. Vegotina Çîrokî:

Hunermend di vê teşeya vegêranê de hin bûyer û mirovên ku li derdora van bûyeran in di çarçoveya demekê û cihê de vediguhêze xwîner. Mesnewînûs bi vê rêbazê bal dikişîne ser xwe û bi vî şiklî dikeve navbera berhem û xwîner. Xwîner her tiştî bi navgîniya vegêr dibîne û fêr dibe. Ev teşe piranî di berhemên ku pala xwe didin vegêranê de tê bikaranîn. Fabl ji ber ku cureyeke bûyerî ye berhem li ser bingeha vegêranê hatiye sazkirin. Şêx Eskerî ji xelesa yekem (Gotina Hinek Hikayeyê Pir 'Eqîl û Bijartina Çîroka Qijik û Rovî) heta xelesa şeşem (*Çûna Rovî û Ketina Wî ya Faqê*) zincîreya rûdanê bi vegotina çîrokî vediguhêze. Mînakek ji bo vê rêbazê:

Ku elhasil mi dî nê dûr e nezdîk
Ji nav çend dari tê ev dengê pur çîk

Heta wir çûm bi sed fikr û xiyalê
Gedayek dî me teşbihê hîlalê

Li bin darê li ser çeşm e perîşan
Diherkin çeşmeyê xwûnabê çeşman (Eskerî, 1989: 97)

4.5.1.2. Vegotina Şayesandinî:

Vegotina şayesî dekora naverokê û bi peyvên çêkirina wênayekî ye. Dema ku şayesa kes an cihêkî tê xwendin dîmeneke şênber tê ber çavê mirovî. Şayes bi pêşkêşkirina taybetmendiyan hundirîn û

derveyî aliyê dîtbarî yê alema pevbestî vediguhêze. Hunermend ji bo balkişandina taybetmendiyên di heqê kes û mekanê de ji şayesê sûd werdigire (Aktaş, 1991: 12). Şayes ne mebesta sereke ya hunermend e, xwîner ji bo bûyeran amade dîke û li kêleka rêbazên din tê bikaranîn. Şayesên vegêr ên di nav rûdanên fablê de livdar in ne westar in. Vegêr şayesên xwe di nav herikîna bûyerê de bi hostatî bi cih kiriye û mirov di nav herikîna bûyerê de pê dihise ku wî şayeseke serkeftî kiriye. Vegêr bi hûrgilî şayesa baxçe (Eskerî, 1989: 73-75), rewşa zarokê sêwî (Eskerî, 1989: 97-98), qijik (Eskerî, 1989: 117-118) û roviyê (Eskerî, 1989: 132-136) kiriye. Vegêr bi vê rêbazê taybetmendiyên cih (baxçe) û heyberan (rewşa zarokê sêwî, qijik û rovi) li ber çavê xwîner şênber kiriye. Herî zêde û bi hûrgilî şayesa rovi û tevgerên wî hatiye kirin. Nimûne ji hin malikên şayesa rovi û baxçeyî:

Xwe rakêşa ji hev geh kir du sê qat
Gelek gîrrêz û devşotik ji dev hat

Guhê xwe miç kir û çavê xwe zûzand
Xwe danî rabû û dîse xwe telland

Ditellîne xwe dev datîne ser penc
Bi sûskî xwe dibe tîne neyî qenc (Eskerî, 1989: 134)

Spîdarê ku tê de sîmê endam
Çinar û bîde mişk û cewz û badam

Di nav de pur xezal û şêr û xergûş
Gur û gûr û rûbahê positên pûş (Eskerî, 1989: 73-74)

4.5.1.3. Kurtেকirin

Kurtekirin bêyî hûrgiliyan bi xetên giştî û kurtasî dubarekirina rewş an bûyerên berê ne. Vegêr bûyer, kes û hêmanên din ên vegêranê yên ku berê derbas bûbin bi şiklê kurtekirina maweyê pêşkêş dîke. Ev teknîk xaleke dahûrîna zemanî ye û frekansa vegêranê zêde dîke. Mesnewînûs ji bo bibîrxistin û balkişandîna kurteya beşa borî di beşa pey re bi çend malikan dide, rewş û bûyera berê dixê bîra xwîner. Vegêr di beşa *Vegera Derwêş Cem Hevalan û Behskirina Ehwalê Yetîmî ji Wan re* de rastî zarokê sêwî tê û di navbera wan de guftûgoyek derbas dibe. Vegêr piştî di beşa *Stendina Qijakê Penîr ji Yetîmî* de vê bûyerê/guftûgoyê careke din dubare kiriye:

Di wî halî de bû ez çûme balê
Me ser mizda fereh da qelb û balê

Me paqij kir ji çavan hêstirê xwûn
Penîr û nani dayê geş kire gûn (Eskerî, 1989: 117)

4.5.1.4. Paşdevegeran (Flashback)

Paşdevegeran, di berhemên vegêranî de rawestandina herikîna bûyerê û vegerîna bûyer an rewşeke berê ya di heqê mijarê de ye. Vegêr piştî ku bûyerê dibire behsa rûdanên berê dîke û dîsa rêzebûyêrê didomîne. Mesnewînûs di beşa *Gotîna Hinek Hikayeyê Pir 'Eqîl û Bijartîna Çîroka Qijik û Rovî* de behsa rewşa derwêşan û baxçeyê wek bihuştê kiribû. Mesnewînûs piştî çar beşan di beşa *Stendina Rovî Penîr ji Qijakê* de vedigere beşa yekem û bi sê malikan vê beşê dubare dîke:

Di benda pêşiyê halê seyahan
Di nêva werd û reyhan û tuhafan

Me hin kirbû beyan anî mezadê
Durê derwêşê dil her der cîhadê

Di nav wî beçeyê cennetmîsalî
Ji ber wan bulbul û qumrî dinalî (Eskerî, 1989: 128)

Vegêr wek ku ji navê wê jî diyar e di beşa *Stendina Qijakê Penîr ji Yetîmî* de behsa diziya qijik û rewşa zarokê sêwî kiribû. Piştî di beşa *Stendina Rovî Penîr ji Qijakê* de vedigere ser serpêhatiya qijik û zarokê sêwî:

Ji wî bêçareyî ku qijika pîs
Penîr dizzî xebîsa pîs î telbîs

Yetîm ma dilperîşan û cîgerxwûn
Ekû jî bir penîrê şubhetê rûn (Eskerî, 1989: 132)

4.5.1.5. Guftûgo (Dialog)

Teknîka guftûgoyê axaftin an axifandina rûbirû/beramberî ya karakteran e. Guftûgo hem di navbera mirovan hem jî di navbera heyberên din de dikare pêk bê. Guftûgo rêbazê teqlîd/nîşandanê (mîmetîk) ye û zêdetir di dramayê de tê bikaranîn. Ev rêbaz demê yeksan û fêmkirinê hêsan dike. Guftûgo zincîreyê rûdanê didomîne û ji bo diyarkirina şeweya axaftinê ya karakteran dibe alîkar. Ev erka guftûgoyê di nav civakê de rûyê karakteran ê rasteqîn derdixe holê. Lewra her yek tîpeke çîrokên ajelan kesayeteke jiyana resteqîn dinimîne (Subaşı, 2019: 64-65). Ev rêbaz bi du şeweyan tê bikaranîn: Guftûgoya rasterast û ya nerasterast. Vegêr di fablê de guftûgoya nerasterast pir caran bi hunera axifandinê pêk tîne. Ev rêbaz di beşên *Vegera Derwêş Cem Hevalan û Behskirina Ehwalê Yetîmî ji Wan re* û *Sitendina Rovî Penîr ji Qijakê* de hatiye bikaranîn. Ji bo nimûne derwêş dema ku rastî zarokê sêwî tê û halê wî dibîne pê re dikeve gotûbêjê:

Me jê pûrsî: Bibêje ey weled qenc
Çira hinde dixwî derd û xem û renc

Wuha go: Ey 'emê pur 'izzet û qenc
Ji keyfa kes dixwit ev ezyet û renc (Eskerî, 1989: 99)

Taybetiyê sereke ya fablan axaftin an axifandina heyberên ji bilî mirovan e. Ev teknîka ji bo bikaranîna hunera "întaq/axifandin"ê guncav e û herî zêde di fablan de tê dîtin. Vegêr di beşa *Sitendina Rovî Penîr ji Qijakê* de bi berfirehî guftûgoya rovî û qijik dide. Rovî bi zimanekî nerm û xweş pesnê qijikê dide da ku penîr bi dest bixe. Qijik jî bi van gotinên bixeml dixape:

Bi sed şîwe eda û lefzê dilco
Di ewwel qalê bo ekkû wiha go:

Ela ey bulbulê xweşxwan û xweşdeng
Hela ey tawusê xweşbîn û xweşreng (Eskerî, 1989: 140)

Bi xeylayî sualek kir ji rêvî
Kî: Ey pîrê ji min daîm bi hêvî

Evê sewta xweş û awazê serkêş
Wekî dermanê deynî ser dilê kul (Eskerî, 1989: 146)

4.5.1.6. Guftûgoya Hundirîn

Kes di vê teknîkê de wekî ku li hember wî kesekî/ê din hebe diaxife û nîqaşê dike. Ji vî aliyê ve dişibe yekbêjî/monologa hundirîn. Nêçîrvan di beşa *Çûna Rovî û Ketina Wî ya Faqê* de piştî ku rovî dikeve xefka wî bang li rovî dike û pê re guftûgoyeke yekalî dike:

Digo: Ka hîle û mekrê te yê pir
Eya qeşmer sihirbazê şekaldir

Kuda çûne hemî keydê xebîsî
Li ku mane wan fennê xebîsî

Ji hirsî zêde zanim pur hewes bûy
Di faqê de perîşan û teres bûy (Eskerî, 1989: 162)

4.5.1.7. Axaftina/Dengê Hundirîn

Axaftina karakteran a bi awayê bêdeng û hundirîn e. Vegêr di van pasajan/malîkan de xwe dide jibîrkirin û bi vê teknîkê armanc dike ku alema hundirîn a kesan bê navgîn bi xwîner bide hîskirin. Xwîner bi vê teknîkê ji alema hundirîn û bîrê herwiha ji hestên karakteran haydar dibe. Ev teknîk bi du awayan tê bikaranîn: Axaftina hundirîn a rasterast û nerasterast. Berî destpêkirina monologê qalibên wekî “go, digo” tên bikaranîn. Di monologa rasterast de vegêr tevî axaftinê nabe û karakter bi cînava kesê yekem (ez, min) diaxife. Ji bo mînak Eskerî di beşa *Stendina Rovî Penîr ji Qijakê* de dengê hundirîn ê rêvî bi me dide sehkirin:

Xwe wenda kir go: Aya ev çî hal e
Gelo xewn e dibînim yan xiyal e (Eskerî, 1989: 134)

Çuqa ku şukrê kir rûbeh bi zahir
Digo: Da min Xuda ev rizqê zahir (Eskerî, 1989: 145)

4.5.1.8. Dahûrîna Hundirîn

Dahûrîna hundirîn ji hêla vegêr ve vegûhestina alema hundirîn (hest, raman, derûnî û alema jiyani) a kesan e. Vegêr tiştên ku di hişê lehengan de derbas dibin wek ku zanibe vediguhêze. Ji bo nimûne vegêr di beşa *Vegera Derwêş Cem Hevalan û Behskirina Ehwalê Yetîmî ji Wan re* de wekî ku ji serpêhatiya zarokê sêwî haydar be di heqê hestên wî de şîroveyan kiriye.

Digo ew bê newa ye dil tijî xwûn
Ji marê Leylê dewra şubhê Mecnûn

Di dil wî ateşê zulma zeman e
Ewî qesmet heman eşkîrewan e (Eskerî, 1989: 98)

Dîsa di beşên *Sitendina Qijakê Penîr ji Yetîmî* û *Sitendina Rovî Penîr ji Qijakê* bi mebesta bidestxistina penîrî alema hundirîn û hestên qijik û rêvî wiha şîrove dike:

Wekî ku ew li tiştê bîte aşiq
Diçî tê ta ku ew pê bîte lahiq

Heraret girtibû ekkû gelek pur
Ji derdê wî penîrê şubhetê dur (Eskerî, 1989: 118)

Ji kêfa re wuha avek bi dev ket

Ji hesret agirek der dil bi hev ket

Ji keyfan re geh pence datîne ser
Ji kerban gahî dûvi radikir şer (Eskerî, 1989: 135)

4.5.1.9. Montaj

Hunermend di teknîka montajê de bi veguheştina gotineke wecîz an gelêrî armanc dike ku kûrahî bixe berhema xwe, dewlemendiya bibîrxistinê (association) û curbicuriya şêweyê dabîn bike. Vegêr gotineke pêşiyana a Kurdan ku tê wateya “her kes ji jiyana xwe berpirsiyar e; kî çi bike dê berdêlê wê bide.” (Oncu, 2009: 87) bi kar aniye:

Heye dêrîn xebirdanek bihikmet
Negirtî jê gelo hindêk te ‘îbret (Eskerî, 1989: 81)

Bizin û mêşin bi lingê xwe bi dar de
Dibin ey rind û qellaşê di kar de (Eskerî, 1989: 82)

Şêx Eskerî di beşa *Çûna Rovî û Ketina Wî ya Faqê* de gotineke pêşiyana a Tirkan bi kar aniye. Ev gotina pêşiyana bi şiklê “Ûyilik et denize at, balık bilmezse Halik bilir.” e û tê wateya “kirina qenciye bêbergîdank û qenciya ku te kiriye neyê zanîn ji Xwedê qenciya te dizane.” (Aksoy, 1993: 153).

Eyîlik eyleyîn deryaye atsez
Bîlîr Xaliq eger baliq bilemez (Eskerî, 1989: 166)

Encam

Fabl cureyeke edebî ye ku helbestvan/nivîskarê wê hişyarî, şîret û derbirînên xwe yê rexneyî yê di heqê kes, civak, rêvebirî, dem û hwd. de bi rêya çîroksazi/pevbestiyekê îfade dike. Helbestvan/nivîskarên fablan bi navgîniya karakterên wek ajal û riwekan civaka xwe hişyar dikin û rê nîşanî wan didin. Mînakên vê cureyê ji serdemên dêrîn heta bi roja me li seranserê cîhanê berbelav in. Hem li şaristaniya Rojhilatê hem jî li ya Rojavayê gelek mînakên vê cureyê hene û bi rêya danûstandina çandî van şaristaniyan bandor li hev kirine. Loma jî piraniya van fablan ji aliyê mijar û peyamên xwe ve nêzî hev in. Berhema alegorîk a Şêx Eskerî *'Iqdê Durfam* jî di encama vê danûstandina çandî de derbasî edebiyata Kurdî ya klasîk bûye. Herçend di heqê jêdera wê de gengeşeyek hebe jî piraniya wergernas û edebiyatnasan vê fablê nîspetî Ezop dikin. Mînakên vê cureya edebî hem bi awayê menzûm hem jî pexşan hene. Hin helbestvanên edebiyata klasîk bi teşeya mesnewiyê fablan nivîsîne û ev teşe ji hêla pergalê ve ji vegêranên modern cuda ye. Digel vê ji hêla vegêrannasiyê ve hevbeşiyên van berheman bi yê modern re hene. Eskerî jî fabla xwe bi teşeya mesnewiyê û şêwaza vegêranê nivîsiye û van hevbeşiyana dihewîne. *'Iqdê Durfam* ji ber vê taybetmendiya xwe ji hêla vegêrannasiyê ve hatiye vekolîn.

Di encama vê nixandîna de em têgihîjin ku beşa fablê ya “Qijik û Rovî”yê ya Eskerî dişibe fabla Ezopî ya bi navê *Rovî* û *Qijikê*. Şêx Eskerî ji bilî çîroka sereke ya fabla Ezopî hin çîrokên din ên xwemalî herwiha mijar û têgehên dînî, çandî û civakî ji tevli berhema xwe kiriye û dahêneriya xwe nîşan daye. Wek sedema nivîsînê em dibînin ku Eskerî li ser daxwaza kurmamê xwe Şêx Behcet berhemê nivîsiye û diyari/îthafî wî kiriye. Eskerî ji ber wefata kurmamê xwe û Herba Cîhanê ya Yekem fablê nivîsîye. Piştê li ser daxwaza birayê xwe Şêx Muhemmed Kerbelayî û hevalên xwe nivîsînê domandiye heta ku berhemê qedandiye. Beşa sebebê telifê ya berhemê ji bo hizrên Eskerî û rewşa civakê zanyariyên baş dide xwîner. Em ji malikên vê beşê fêhm dikin ku Eskerî di Kurdîniyê de daye pey şopa Xanî.

Şêx Eskerî di berhemê de li ser temaya “xirabiya zeman û dinyayê “rawestiyaye. Mijarên wek neheqîya li ketiyan, keda haram, xapandin, xwemezindîtin û azweriyê bi bûyer û karakterên fablê bi awayekî şênber berçav kiriye. Ev exlaqên kirêt rewşa civakê ya xirab nîşan didin ku ji rexneya civakî re bûye mijar û armanca nivîsîna berhemê. Wek hizra bingehîn a fablê jî dikare bê gotin ku “mirov çî bike ew tê pêşîya wî.” Şêx Eskerî ji hêla rengvedana kesayetên civakê ve di berhemê de taybetmendiyên karakterên berhemê daye ber çavê xwe û li gorî vê, tîpên berhemê hîlbijartîye. *Iqdê Durfam* ji ber ku alegorîk e gelek têgeh û heyberên berhemê yên wek zeman, dinya, mirov, rêwîti, baxçe, penîr, rovî û qjjikê bi wateyên metaforîk hatine bikaranîn.

Bûyerên ji bilî tîkiliya “qjjik û rovî”yê di nav zincîreya rûdanê de ristinên resen û xwemalî ne. Zincîreya rûdanê ya fablê ji bûyereke çarçoveker û ji şeş xelean pêk tê. Bûyera çarçoveker rêwîtiya derwêşan e û xelekên din di nav vê çarçoveya giştî de rûdidin û vegêranên zeliqandî ne. Honandina vegêranên zeliqandî ji bo mesnewînûs nîşaneyê şeweyeke serkeftî ya vegêranê ye. Fabl ji sê astan pêk tê: Asta derekî/derçîrokî: R D û G B, asta navekî/navçîrokî: Ç D J B, asta jor-çîrokî: D û Z, Z û Q, Q û R, R û N. Karakterên fablê yeknesak û tîpîk in. Têvgerên wan tê texmînkirin û heta dawîya zincîreya rûdanê yekalî ne. Karakter hem bi taybetmendiyên xwe yên xweser hem jî bi yên metaforîk hatine bikaranîn û aliyê wan ê metaforîk beramberî kesayetên civakê tê. Eskerî herçend navên taybet li karakterên xwe nekiribe jî hevterîbiyek di navbera karakter û taybetmendiyên wan de heye. Cihê fablê xeyalî, nesînorkirî ye û li gorî rewş, bûyer û karakteran e. Bûyer di seranserê fablê de li sirûştê diqewimin. Dema berhemê pevbestî ye û ne diyar. Mesnewînûs wek pêkhatina dema bûyerê îfadeyeke xumam ku dibêje “ji ehwalê zeman” bi kar anîye. Ev taybetî ji bo domdarî û mayîndetiya berhemê rêbazeke mifadar e. Maweya destpêk û dawîlêhatina bûyeran ne dirêj û bûyer bi awayekî kronolojîk rûdidin. Mesnewînûs di nav kronolojiya zincîreya rûdanê de serî li teknîka paşdevegeranê daye. Vegêr bi îfadeyên wekî “mîqdarekî, qederkî” neketiyê hûrgiliyên rewş û bûyeran; bi vî şiklî xwe di ser demê de qevaztiye. Vegêr bi du şiklan xwe di fablê de xwe nîşan dide. Vegêrê yekem di asta vegêrana derekî de wek hertiştzan û vegêrê derçîrokî mesnewînûs/Şêx Eskerî û di asta navekî de jî wek karaktereke navçîrokî derwêş erka vegêriyê dane ser milê xwe. Her du jî vegêrên eşkere/vekirî ne û xwe ji derbirîna hest û ramanên xwe nadin paş. Beşên vegêranî bi devê derwêş tîp veguhestin lê di gelek beşan de wek hertiştazanê bûyeran û bi teserûfa zalbûnê mesnewînûs di heqê bûyeran de bi şîrove û şîretên xwe tevli vegêranê dibe.

Şêx Eskerî di veguhestina rewş û bûyerên vê berhema xwe ya klasîk de ji rêbaz û teknîkên vegêranê sîd wergirtiye; van rêbaz û teknîkan di berhemê de sepandîye û şeweyekî vegêranê bi dest xistiye. Fabl ji ber ku berhemeke vegêranî ye bi awayekî siruştî rêbaza vegotina çîrokî hatiye bikaranîn. Eskerî di beş û malikên vegêranî de zincîreya rûdanê gelekî herikbar honaye û di navbera xelean de pêwendiyê bi serkeftinî saz kiriye. Tenê di serê her beşê de malikên ku bi forma saqînameyê hatine nivîsîn vê herikbariyê hinek şikandîye. Lê ev xal jî divê wek taybetiyeke kevneşopîya mesnewiyê asayî bê dîtin. Mesnewînûs vê kêmasiyê bi rêya kurtkirin û paşdevegeranê telafî kiriye û careke din xelesa ku qut bûye pev girêdaye. Rêbazeke din a vegotinê ku hatiye bikaranîn şayesandin e. Şayesandinên berhemê bihostatî û bihûrgilî hatine kirin û dîtbariyeke baş pêşkêş kiriye. Guftûgoyên di fablê de dirêj in û cihekî giring girtiye. Eskerî ji bilî van rêbazan guftûgoya hundirîn, dengê hundirîn, dahûrîna hundirîn û montajê jî bi kar anîye. Şêx Eskerî hem bi pevbestiya berhemê hem jî bi şeweya xwe ya vegotinê dahênerî û ciyawaziya xwe nîşan daye.

Çavkanî

- Açıl, B. (2018). *Klasik Türk Edebiyatında Alegori*. İstanbul: Küre Yayınları.
- Adak, A. (2017). "Serdema Xalidîtiyê di Tarîxa Edebiyata Kurdî ya Klasîk de". *Kürt Tarihi*, h. 30, rr.59-64.
- Adak, A. (2019). *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*. Stenbol: Weşanên Nûbiharê.
- Aksoy, Ö. A. (1993). *Atasözleri ve Deyimler Sözlüğü*. İstanbul: İnkılâp Kitabevi.
- Aktaş, Ş. (1991). *Roman Sanatı ve Roman İncelemesine Giriş*. Ankara: Akçağ Yayınları.
- Alan, R. (2015). *Destpêkek ji bo Zanista Edebiyata Modern*. Stenbol: Weşanên Peywend.
- Alan, R. (2019). *Keşkûl*. Stenbol: Weşanên Peywend.
- Aristoteles. (1987). *Poetika*. İstanbul: Remzi Kitabevi.
- Avcı, Y. Y. (2012). La Fontaine'in Fabllarında Alegorik Ögeler ve Bunların Temsil Ettiği Değerler. c.7, h.2, r. 39-53.
- Aytaç, G. (2003). *Genel Edebiyat Bilimi*. İstanbul: Say Yayınları.
- Banarlı, N. S. (2001). *Resimli Türk Edebiyatı Tarihi 1*. İstanbul: Milli Eğitim Basımevi.
- Canım, R. (2020). *Divan Edebiyatında Türler*. Ankara: Grafiker Yayınları.
- Cebecioglu, E. (2005). *Tasavvuf Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü*. Ankara: Anka Yayınları.
- Cegerxwîn. (2012). "Serxwebûna Mirîşkan". Diyarbekir: Weşanên Belkî. *Hawar*. 20. r. 335-337.
- Chatman, S. (1980). *Story and Discourse Narrative Structure in Fiction and Film*. Ithaca and London: Cornell University Press.
- Çifçi, H. (1999). Bir Fabl Olarak Fare ile Kedi Hikâyesinin Arkasındaki Mesaj. Ragihanî: 25.08.2023, <https://www.bingol.edu.tr/documents/Farekedi.pdf>
- Duggan, A. E., Haase, D. û Callow, H. J. (2016). *Folktales and Fairy Tales Traditions and Texts from Around the World*. California: ABC-CLIO. LLC.
- Eagleton, T. (2013). *How to Read Literature*. USA: Yale University Press.
- Ece, S. (2002). "Modern Öyküleme Teorileri Açısından Mesnevi". *A. Ü. Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi*, h. 20, Erzurum, r. 99-105.
- Eke, N. U. (2017). *Klâsik Türk Edebiyatında Metaforik Üslup*. Ankara: Akçağ Yayınları.
- Ekici, A. (2014). *Zeynelabidîne Amidî: Jiyan Berhem û Xebatên Wî yên Destnivîsî*. Teza Mastirê ya Çapnebûyî. Mêrdîn: Zanîngeha Mardin Artukluyê. Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.
- Erginli, Z. (2006). *Metinlerle Tasavvuf Terimleri Sözlüğü*. Trabzon: Kalem Yayınevi.
- Eskerî, Ş. (1989). *'Iqdê Durfam (wer: Zeynelabidîn Zinar)*. Stockholm: Weşanên Apec-tryck & Förlag.
- Forster, E. M. (2001). *Roman Sanatı (wer: Ünal Aytur)*. İstanbul: Adam Yayınları.
- Genette, G. (2020). *Anlatının Söylemi (wer: Ferit Burak Aydar)*. İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Gibb, E. J. W. (1900). *A History of Ottoman Poetry*. London: Lusa & Co.
- Gibbs, L. (2002). *Aesop's Fables*. New York: Oxford University Press.
- Hilal, M. G. (1373). *Edebiyat-ı Tatbîkî, (werger ji bo Farişî: Seyyîd Murtaza Ayetullah Şîrazî)*. Tehran.
- Işık, F. (2007). "Hostayê Peyvan: Şêx Eskeriyê Axtepî". *Bîr*. 7. r. 223-227.
- İpek, M. S. (2012). "Arap Edebiyatında Fabl Türü". Ragihanî: 12.03.2023, 2012_35_IPEKMS.pdf (isamveri.org)
- İpekten, H. (2014). *Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz*. İstanbul: Dergâh Yayınları.
- Jahn, M. (2020). *Anlatıbilim (wer: Bahar Dervişcemaloğlu)*. İstanbul: Dergâh Yayınları.
- Kekeç, İ. (2017). Türk Edebiyatında Mesnevi ve Roman İlişkisine Dair Görüşler Üzerine Bir Değerlendirme. *Hikmet-Akademik Edebiyat Dergisi (Geleneğin ve Postmodernizm Özel Sayısı)*, s. 3. r. 186-194.

- Keklik, N. (1990). *Felsefede Metafor*. İstanbul: Edebiyat Fakültesi Basımevi.
- Keskin, N. (2019). *Folklor û Edebiyata Gelêri*. Stenbol: Avesta.
- Lefkowitz, J. B. (2014). Aesop And Animal Fable. *The Oxford Handbook of Animals in Classical Thought and Life*. r. 1-23. Ragihanî: 09.07.2023, works.swarthmore.edu/cgi/viewcontent.cgi?article=1035&context=fac-classics
- Levend, A. S. (1967) . Divan Edebiyatında Hikâye I. *Türk Dili Araştırmaları Yıllığı (TDAY)*. r. 71-115.
- Mevlevî, T. (1994). *Edebiyat Lügati*. İstanbul: Enderun Kitabevi.
- Moran, B. (2020). *Edebiyat Kuramları ve Eleştiri*. İstanbul: İletişim Yayınları.
- Nur, İ. H. (2017). Mesnevide Hayvan Karakterleri (Metaforları). *Uluslararası Türk Kültür Coğrafyasında Sosyal Bilimler Dergisi (TURKSOSBİLDER)* c. 2, h. 1, r. 29-47.
- Oncu, M. (2009). *Gotinên Pêşyan*. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Önal, S. (2007). “Sebeb-i Teliflerdeki Ortak ve Farklı Temalar”. *A. Ü. Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi*, h. 35, Erzurum, r. 105-124
- Pala, İ. (2014). *Ansiklopedik Divân Şiiri Sözlüğü*. İstanbul: Kapı Yayınları.
- Pertev, R. (2008). *Zarok û Çîrok*. Stenbol: Weşanên Dozê.
- Sadini, M. X. (2010). *Feqiyê Teyran Jiyan Berhem û Helbestên Wî*. Stenbol: Nûbihar.
- Sağmıç, F. H. (2002). *Dîroka Wêjeya Kurdî*. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Sakaoglu, S. (2011). Motif, Söz Kalıpları ve Masal Kitapları. A. B. Alptekin ve Ç. Kara (Ed.). *Halk Masalları*. (22-51). Eskişehir: Anadolu Üniversitesi Yayınları.
- Sebrî, O. (2012). “Welatê Tirivîriyan, Şivan û Beran”. Diyarbakir: Weşanên Belkî. *Hawar*. h. 28. 469.
- Subaşı, K. (2019). Tîpolojîya Vegêri ya Çirvanokên Kurdî. Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler Sempozyum Bildirileri (r. 737-771). Şırnak: Şırnak Üniversitesi Yayınları.
- Subaşı, K. (2019). *Kürtçe (Kurmançî) Masalların Anlatı Tipolojisi*. Teza Doktorayê ya Çapnekiri. Diyarbakir: Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı.
- Talib, I. S. (2021). Chapter 4: Characters, Narrative Theory: A Brief Introduction. (Ragihanî: 19.09.2023), Narrative Theory, by Ismail S Talib -- Chapter 4: Characters (nus.edu.sg)
- Tek, A. (2018). *Hâmîsiz Şâir Babasız Metin: Mem û Zîn ve Osmanlıca Çevirileri Üzerine Bir İnceleme*. Stenbol: Nûbihar.
- Tezcan, N. (2010). Sebeb-i Teliflere Göre Mesnevi Edebiyatının Tarihsel Dönüşümü. *Doğu Batı*. h. 52, r. 49-75.
- Ünver, İ. (1986). Mesnevi. *Türk Dili*. c. 52. r. 430-562.
- Wellek, R. û Warren, A. (1949). *Theory of Literature*. New York: Harcourt, Brace And Company Inc.
- Whitman, J. (1987). *Allegory*. Massachusetts: Harvard University Press.
- Xanî, E. (2010). *Mem û Zîn (şîrovekar: Perwîz Cihani)*. Stenbol: Nûbihar.
- Yalçinkaya, Ş. (2007). Yol Metaforu ve Klâsik Türk Edebiyatında Arayış Yolculukları. *Türk Dili ve Edebiyatı Araştırmaları Dergisi* c. 13 h.1, r. 251-260.
- Yazıcı, T. (1994). Dervîş (c. 9, 188-190). İstanbul: TDVİA.
- Yıldırım, K., Pertev, R. û Aslan, M. (2013). *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*. Stenbol: Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları.
- Zinar, Z. (1991). *Nimûne ji Gencîneya Çanda Qedexekiri*. Stockholm: Pencînar.
- <http://mythfolklore.net/aesopica/perry/124.htm>
- Kubbealti Lugati - akit kelimesi anlamı, akit nedir? (lugatim.com)

PROTOTÎPÊN CIWANIYÊ DI ESTETÎKA ŞÎ'RA MELAYÊ CIZÎRÎ DE

Nevzat EMİNOĞLU

KURTE

Estetik wek mijareke helbesta klasîk, di dirêjahiya sedsalên çerxa navîn de edîb û şair li ser sekinîne. Qada bingehîn a estetîkê husn û cemal e, yanî ciwanî ye. Edebiyatnasan li dor vê babetê nêrîn û hestên xwe anîne ziman. Ev babet ji hêla gelek şairên çerxa navîn ve li ser unsûrên muşterek û bi heman awayî di helbestê de hatiye honandin. Melayê Cizîrî jî yek ji wan şairê Kurd yê serdema klasîk e ku babeta estetîkê û prototîpên ciwaniyê di helbestên xwe de bikaraniye. Ew ciwaniya ku bi şewazeke standart ve tê ziman, bi saya vegotinên alegorîk û pîrwate ya her helbestvanekî ve rewş û rehendekê xweser wergirtiye. Şair û edîb ciwaniyê bi gelemperî li ser prototîpên wê yên herî têtûz vedibêjin. Ev prototîpên ciwaniyê jî objeyên dîtbarî yan jî ferdên xwedî ciwaniya destanwarî ne. Her çiqas di edebiyata klasîk de û her wiha di poetîkaya helbesta Melayê Cizîrî de ev mijareke bingehîn be jî heta niha xebatên bi rêk û pêk li ser vê qadê nehatine kirin. Lewma me hêvî ew e ku ev xebat di vê babetê de bibite sedem û destpêka lêkolînên nû ji bo tijîkirin û bîrsivdana valahiya vê hêlê. Armanca vê rmanca xebata me ew e ku em di ronahiya helbestên Melayê Cizîrî de li hizra wî ya estetîk binihêrin û prototîpên ciwaniyê ku wî ji bo ciwaniyê bikaranîne, lêbikolin. Di vê çarçoveyê de ev xebat ji destpêkakê û sê beşan pêk tê. Piştî çarçoveya teorîk ya di destpêkê de, me hewl da ku em di bin sê sernavan de li ser hizra estetîk a Cizîrî bisekinin, bikaranîna wî ya prototîpan binirxînin û cureyên wan bisenifînin.

Peyvên Sereke: Edebiyat, Edebiyata klasîk, Helbest, Ciwanî, Prototîp, Melayê Cizîrî.

Nevzat EMİNOĞLU,

Dr, Zanîngeha Mûş Alparslanê,
Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî,
nevzat.eminoglu@hotmail.com,
ORCID: 0000-0002-4980-7556.

Article Type/Makale Türü:

Research Article/Araştırma Makalesi

Received / Makale Geliş Tarihi: 11.07.2023

Accepted / Makale Kabul Tarihi: 19.08.2023

Published / Makale Yayın Tarihi: 20.10.2023

DOI: 10.35859/jms.2023.1326078

Değerlendirme ve İntihal/Reviewing and Plagiarism:

Bu makale iki taraflı kör hakem sistemine göre en az iki hakem tarafından değerlendirilmiştir. Makale intihal.net adlı intihal sitesinde taranmıştır. / This article has been reviewed by at least two anonym reviewers and scanned by intihal.net plagiarism website.

Citation/Atf:

Eminoğlu, N. (2023). Prototîpên Ciwaniyê di Estetîka Şî'ra Melayê Cizîrî de, The Journal of Mesopotamian Studies, Jimara Taybet a Edebiyata Kurdî ya Klasîk, rr. 51-62, DOI: 10.35859/jms.2023.1326078.

Melayê Cizîrî'nin Şiir Estetiğinde Güzellik Prototipleri

ÖZ

Estetik, klasik şiirin bir konusu olarak, ortaçağ boyunca yüzyıllarca yazar ve şairlerin üzerinde durduğu bir konu olmuştur. Estetiğin ana alanı güzel ve güzelliştir. Hukema, udeba ve yazarlar bu konudaki görüş ve duygularını dile getirmişlerdir. Bu konu birçok ortaçağ şairi tarafından ortak mazmunlar ve aynı üslup ve formlarla şiirlerinde işlenmiştir. Güzel ve mutlak güzellik tanımlanamaz olduğundan ve sınırı olmayan bir mutlakiyet özelliği gösterdiğinden dolayı şairlerce somut güzellik örnekleriyle ifade edilmiştir. Bu nedenle şairler ve yazarlar, güzelliği genellikle en mükemmel prototiplerinde göstermeye çalışırlar. Böylece güzelliğin bireyselliği, zihin ve dil arasındaki arayüzde en işlevsel ve dinamik unsur haline gelir. Melayê Ciziri, güzelliği en uç ve ilginç şekilde, en canlı ve renkli üslupla ifade eden klasik dönem Kürt şairlerinden biridir. Bu çalışmamızda amacımız Mela Ciziri'nin estetik düşüncesine şiirleri ışığında bakmak ve güzellik için kullandığı güzellik prototiplerini inceleyip değerlendirmektir. Bu bağlamda bu çalışma bir başlangıç ve üç bölümden oluşmaktadır. Teorik çerçeveyi sunma amacındaki girişten sonra Ciziri'nin estetik anlayışını üç başlık altında inceleyerek, şiirinde kullandığı prototipleri değerlendirmeye ve sınıflandırmaya çalıştık.

Anahtar Kelimeler: Edebiyat, Klasik edebiyat, Şiir, Estetik, Prototip, Melayê Cizîrî.

Beauty Prototypes of Melayê Cizîrî's Poetry Aesthetics

ABSTRACT

Aesthetics, as a subject of classical poetry, has been a subject that writers and poets focused on for centuries throughout the medieval period. The main area of aesthetics is beauty and beauty. The authors expressed their views and feelings on this subject. This subject has been handled by many medieval poets on a common element and in poetry alike. This beauty, which is expressed in a standard style, has gained an independent status and direction thanks to the allegorical and multi-meaning expressions of each poet. Beauty and absolute beauty are expressed with concrete examples of beauty as they are not tangible, have no definition and no limit. This is why poets and writers often describe beauty in its most perfect prototypes. These beauty prototypes are also visual objects or individuals of epic beauty. So it becomes the beauty itself. In this way, the poet shows the human consciousness while showing the beauty vividly thanks to its prototype feature. Melaye Ciziri is one of the Kurdish poets of the classical period who expresses beauty in the most extreme and interesting way, with the most vivid and colorful style. In this study, our aim is to look at Mela Ciziri's aesthetic thought in the light of her poems and to examine and evaluate the beauty prototypes she used for beauty. In this context, this study consists of a beginning and three parts. After the introduction with the aim of presenting the theoretical framework, we examined Ciziri's aesthetic understanding under three headings and tried to evaluate and classify the prototypes he used in his poetry.

Keywords: Literature, Classic literature, Poetry, Aesthetics, Prototype, Melayê Cizîrî.

EXTENDED ABSTRACT

One of the three basic areas in the philosophy of the ancient Greek period is aesthetics. Over time, this area has also become a theme of literature. Thus, aesthetics, as a subject of classical poetry, has been the subject of writers and poets for centuries throughout the Middle Ages. The main field of aesthetics is beauty and beauty. The authors expressed their views and feelings on this issue. This subject has been handled by many medieval poets both on a common element and in their poems. Beauty and absolute beauty are expressed with tangible examples of beauty that are intangible and have no definition and limit.

Aesthetics is one of the most important subject that poets and writers focus on in classical literature. Beauty, which is the subject of aesthetics, is expressed with various representations, similes and metaphors, colorful expressions and rich allegories. This classical poetry tradition, which deals with beauty, continued to develop in a continuous interaction and cumulative way for centuries.

Aesthetics has a special and important place in Mela Ahmed-i Cizîrî's artistic conception as well as being one of the main themes in the poetry of the classical period. Mela is a man of letters who lived in the 16th century and was the court poet of the ruler of the Cizîra Botan (Cizre) government. This period is a historical, political and literary golden age for the Kurds. Therefore, Cizîrî and his contemporaries represent the most productive and peak period in the history of Kurdish literature. For this reason, spiritual elements such as magnificence, bravery, self-confidence, pride and beauty come to the fore in Cizîrî's lyrical and exuberant poetry.

Cizîrî, like the ancient and medieval philosophers and scholars before him, interpreted beauty as a divine manifestation reflected in the universe, that is, as the representation of Allah in existence and in the universe. Cizîrî interpreted beauty as a concept of divine origin within the framework of his artistic approach. He saw beauty as a divine attribute. According to him, God gave man the light of beauty so that he could know God and made it manifest in the universe. Therefore, according to Cizîrî, beauty is not a feature originating from the world. According to him, beauty also has an ontological dimension as a way of reaching the truth. It also has an epistemological aspect as a method of knowledge that leads to knowing God.

This is why poets and writers often describe beauty in its most perfect prototypes. These beauty prototypes are also visual objects or individuals of epic beauty. So it becomes the beauty itself. In this way, the poet shows the human consciousness while showing the beauty vividly thanks to its prototype feature. Melaye Cizîrî is one of the Kurdish poets of the classical period who expresses beauty in the most extreme and interesting way, with the most vivid and colorful style. In this study, our aim is to look at Mela Cizîrî's aesthetic thought in the light of her poems and to examine and evaluate the beauty prototypes she used for beauty. In this context, this study consists of a beginning and three parts. After the introduction with the aim of presenting the theoretical framework, we examined Cizîrî's aesthetic understanding under three headings and tried to evaluate and classify the prototypes he used in his poetry.

Destpêk

Mijara estetîkê mijareke qedîm e. Agahiyên herî kevn ên di derbarê qada estetîkê de yên bi nivîskî yên wek metin ji dewra antîkîteyê mane. Di serdema Yûnan a antîk de îlaheyeke bi navê Afrodît heye ku temsîla ciwaniyê dike (Towensend, 2002: 168). Lêbelê di serê wê serdema tarîxî de û di dewrana ewil a felsefeya Yûnan de ciwanî wek qadeke serbixwe û xas, nehatiye dîtin û lêkolînkirin. Zanyar û filozofên wek Eflatun, Aristo û Plotinos cara ewil bi awayekî zanistî li ser vê babetê sekinîne û mijara estetîkê nixandine. Ev tahlîl û lêkolîn, wek destpêk û bingeha qada estetîkê, bûne xwedî bandoreke berdewam.

Nêrîn û boçûnên Eflatun yên di vê qadê bû sedem ku filozofên dewra dêrîn yên wek Aristo, Plotinos, zanyarên çerxa navîn ên Ewrûpayê yên wek Augustinus, Aziz Thomasê Aquinoyî jî li ser vê mijarê hûr bibin (Tunalı, 2011: 90). Her wiha nîqaşên estetîk li gor nêrîna filozofan ya ontolojîk û metafîzîk bûne du qîsim. Yek, estetîka alemê dispêre maddeye û wek wesfekî zatî dibîne di maddeyê de. Di derveyî eşyayan de li çavkaniya ciwaniyê nagere û girîngiyê nade ciwaniyeke îdeal. Ya din ciwaniyê wek îdeayeke xarîcî, teceliyeke dervayî û şewq û şemaldaneke li ser objeyê dibîne. Her wiha li çavkaniyeke raser û idea û membayeke mutleq digere (Bozkurt, 2016: 95).

Fêmdariya hizra estetîk a dewra antîk bandor li alema Ewrûpaya Xirîstiyaniyê û her wisa li alema Îslamê jî kiriye. Wihareng hûkema û ehlê îrfanê yên serdema klasîk a Îslamî yên wek Farabî, Îbnî Sîna, Eynu'l-Qudatê Hemedanî, Îbnî Erebi jî li ser vê babetê sekinîne. Di derbarê çavkaniya ciwaniyê, cureyên ciwanî û eşqa li hemberî ciwaniyê de nêrînên xwe anîne ziman (Taşkent, 2013: 43-46). Di heman demê de ev mijara estetîkê kete nav qada edebiyatê û şairên çerxa navîn ê alema Îslamî jî ev babet di berhemên xwe de terenum kirin.

Di dîroka fikrî ya Kurdî de estetîk wek babeteke îrfanî û edebî li gor hizr û nêrîna klasîk ji hêla zanyar û mutesewufên Kurd ve him bi hizra hîkemî û îrfanî him jî bi nêrîna edebî di berhemên wan de hatiye behs kirin (Cîhanî, 2013: 96). Navên wek Suhrewerdî, Aynul Qudatul Hemedanî, Baba Tahirê Uryan, Şêx Şemseddînê Exlatî, Eliyê Herîrî, Feqiyê Teyran, Mela Huseynê Bateyî, Ahmedê Xanî, Suwadî, Sîyahpoş, Pertew Begê Hekkarî, Mehwî û hwd. beşek şîrên xwe bi babeta estetîkê honandine (Izady, 2005: 104). Van şairên Kurd ên berî û piştî Melayê Cizîrî di edebiyata Kurdî ya klasîk de dab û nêrîteke hizra estetîk saz kirine û li dû xwe hîştine.

Di serdema modern de estetîk cara ewil li gor perspektîfa modern bi Kurdiya Soranî ketiye nav dîroka edebiyata Kurdî. Estetîk bi Kurdiya Soranî wek “Ciwani”, “Ciwaniyasî”, “Êstatîka” hatiye îfadekirin. Her wiha navê zanista estetîkê di zimanê Erebi de wek “ilmê cemal”, di Osmaniyan de wek “bedîîyat”, di Fransizan de wek “esthétique”, di Almanî de wek “aesthetik”, di Îngilîzî de wek “aesthetics”, di Farisî de wek “cemalşinasî/zîbayî şinasî”, di Tirkî de jî wek “estetik/güzellik bilimi” derbas dibe (Eminoğlu, 2022: 56).

Estetîk, di bêjara poetîk a Melayê Cizîrî de babeteke sereke ye. Cizîrî bi uslûba xwe ya lîrik û coşîş, dîrok û çîroka estetîkê ji gelek hêlan ve terenum kiriye. Bi qewlê Mela “qîseya eşqa cemal û dasitana husnê” sermeşk û sertaca qelema wî ye (Cizîrî, 2013: 204). Wî ev mijar bi şêweyê hêzdar û bi terzeke rewneqdar honandiye. Helbestên di dîwana wî ya mureteb de, çend hebên wan ne tê de, bi temaya estetîkê dagirtîne ku em dê di beşên bê de mînakên wan nişan bidin. Lewma meriv bi rihetî dikare Mela wek “Şairê eşq û estetîkê” bi nav bike.

Di dîroka edebiyata Kurdî de Melayê Cizîrî jî yek ji wan şairên Kurd ê serdema klasîk e ku ciwanî di helbesta xwe de bi awayekî herî bala û balkêş, bi tehrekî herî rewnaq û rengîn aniye ziman. Digel vî aliyê wî yê bala û balkêş, rengîn û zengîn, heta niha di vî warî de xebatên bi rêk û pêk çênebûne li vî welatê me. Armanca me ya di vê xebatê de ew e ku em di ronahiya helbestên Melayê Cizîrî de

li nêrîna wî ya li ciwan û ciwaniyê binihêrin û prototîpên ciwaniyê ku wî ji bo ciwaniyê bikaranîne, lêbikolin û binirxînin. Wihareng me qest kir ku em di bin sê sernavan de li ser hizra estetîk a Cizîrî bisekinin, prototîpên ciwaniyê ku di helbesta xwe de emilandiye binirxînin û cureyên wan dabeş û kategorize bikin.

1. Kurtenêrînek li Hizra Estetîk a Melayê Cizîrî

Binaxeya ku Melayê Cizîrî huwîyeta şî'ra xwe li ser ava kiriye, xwe dispêre paşxaneya hizra dînî, edebî û tesewufî ya hevpar. Mela jî şairekî Kurd ê vê serdemê ye ku ji vê çavkaniyê behremend bûye, ciwan û ciwaniyê di tesewira vê muktesebatê de dinirxîne û di helbestên xwe de tîne ziman. Her wisa li gor hêza xwe ya îfadeyê û qabiliyeta ziman û qerihya xwe bi form û awayekî xweser dihûne (Hartman, 2012: 45). Di şairên edebiyata klasîk de tiştê giring a ku divê em jibîr nekin ew e ku helwesta şair ya li hember ciwan û ciwaniyê ye. Di vê tradîsyonê de şair yan jî hunermend ne afirînerê ciwaniyê ye, keşşafê wê ye, raveker e (Ayvazoglu, 2016: 79). Lewma Mela di vê çarçoveyê de tîkiliya xwe ya li hember ciwaniyê di form û dirûvê aşîq û maşûqiyê de bicih dike. Ew aşîqekî heyîrî ye li hemberî husna bêmîsal.

Dema Mela ciwaniya ku bi tîgehên husn û cemalê îfade dike, teswîr dike, digihêje terîfeke ji terîfên herî kûr a hizra sofîgeriyê û husn û cemalê wek sifetek ji sifetê Xwedê Teala diwesifîne. Li gor wî husn sifetek e ku di zatê Xwedê Teala de exleb bi muşahedeya bi awayekî îlmî tê dîtin. Lewra Xwedê Teala xwestiya ku cemala xwe bi muşahedeyê eynî bibîne. Lewma alem wek neynik afirandiye û cemala xwe temaşe kiriye (Cizîrî, 2013: 32). Noqteya hereketa Cizîrî li ser vê fikra sofîgeriyê peyda bûye. Ew tîkiliya rastiya husnê ya bi celal, lezet û seadetê re, li ser vê xalê vedihûne (Muhammed, 2008: 157). Lewra ciwaniya heqîqî bêsêbeb û bêmenfîet tê hekkirin û ecibandin. Her wiha ciwanî çavkaniya eşq û evîne ye. Eşq û evîn jî membaya hereket û hebûnê ye. Wihareng ev ciwan û evîn lezzet û seadetê diwelidînin û serçeşmê cemal û mewcûdatê ne. Lewma Mela dibêje:

Di istîwayê ku ji husna te veda lamiekê

Nezeruş şemsî mineş şerqî îlel xerbî delek (berê rojê tê girtin li şerqê hem di xerbê da)

Afîtabê ku ne teswîrê ji husna te bitin

Nûruha fî nezerî zulmetu dacin we helek (tava wê digeriya şeva tarî di nezera min da) Cizîrî, 2013: 352).

Tête xuyanê ku Cizîrî ciwaniyê ne ku di huwîyeteke erzî û maddî de bilakis wek teceliyêke îlahî dibîne ku husn û cemala li alemê jî wek şewq û şemaleke piçûk a ji wê pertewê diwesifîne. Lewma dibêje ku çirûskeke wê husna îlahî roj û ronahiya alemê digerîne tarîfî û şevreşiyê. Yanî roj û ronahiya alemê li hember wê cemala sermedî wek çirûsk û tarîtiyekê ye. Li gor Mela ciwaniya ku li alemê hatiye parvekirin û li ser wan ciwanên alemê ye ku hûr û perî û îns û wildan in û bûne tîmsala husnê, hemû cîlweya wê cemala mutleq in (Turgat, 2011: 124). Yanî ew ciwanî ye ku siya wan daye ciwanên li rû erdê û ew cemala heqîqî ye ku li ser her ferd û heyet û murekebatên alemê tecelli kiriye. Her hebûneke ciwan cîlweya cemala mutleq nişan dide. Lewma Mela dibêje:

Ew latê husn û eynê nûr suret bi suret tîn zuhûr

Îns û perî wildan û hûr cî cî di wan da cîlwe da (Cizîrî, 2012: 132).

Hemû hebûn, mukewenat û mewcûdat li gor Cizîrî ji Xweda ne, eserê sen'etê wî ne, teceliya îsmê wî ne, ciwanî bi tena serê xwe hebûn û qîmetêke wê tune. Lewma ew wek ehlê hîkmet û tesewufê yê beriya xwe ciwaniyê wek diyarde û mefhûmeke ser bixwe nabîne û wek zuhura sifet û esmayê îlahî û nişane û îcaba kemala îlahî diwxîne (Öz, 2022: 166). Li gor wî çavkaniya her hebûnekê xwe dispêre esmayekî wî. Esmayên cemalî û celalî maden û maneya mewcûdat in. Lewma Mela dibêje:

*Her heyet û her cîsmekî her ferd û new û qismekî
Ruh wî di destê îsmekî mayî di qebze û pençe da* (Cizîrî, 2012: 102).

Di nêrîna Cizîrî de armanca şair ew e ku ji husna li alemê binhêre, temaşe bike û ji wê sûretê derbas bibe û li husna heqîqî û mutleq bigere, keşf bike. Sebebê lêbarkirina mane û wezîfeyêke bi vî rengî ya li ciwaniyê ev e ku ciwanî ne xwedî wesfêkî objektîf e. Husna di alemê de tê xuyan bi tena serê xwe tiştêkî îfade nake, yan jî dîtîna û teswîra wê, meriv nagihîne husnê. Şair bes dikare bi îşareta husna vê alema zahir xwe bighîne çavkaniya husna heqîqî. Li gor Mela însan ger bixwaze bigihêje heqîqetê, divê meriv ji husna mecazî destpê bike:

*Ev hûr û perîçehre bût û latê cemalê
Der sûretê tehqîqî Mela eynê mecaz in*

*Lamia husn û cemale dê ji îlmê bête eyn
Işqi da jê hilbitin kî di heqîqet bêmeceaz* (Cizîrî, 2012: 142).

2. Prototîpên Ciwaniyê di Şî'ra Melayê Cizîrî de

Li gor hizra estetîk a Melayê Cizîrî ciwanî bi xwe nayête vegotin. Her wiha wesfên ciwaniyê jî rasterast nabe mijara gotinê. Mela vê yeke di beyteke helbesta xwe de awha tîne ziman:

*Wesfên evîn û işqehê husn û cemala wê şehê
Nayête şerh û medehê ehzen ji neqşê beşerê* (Cizîrî, 2013: 245).

Husn û cemala mutleq nayête pênasekirin. Lewma edebiyatnas vê ciwaniyê bi gelemperî li ser prototîpên wê yên herî tîkûz vedibêjin. Ev tîmsal jî tiştên dîtbarî yan jî takekesên xwedî ciwaniya destanwarî ne (Timuçin, 2009: 243). Wihareng ew objeya ku tîmsala ciwaniyê dike, dibite hêmanekî herî girîng di navbera hiş û ziman de. Her wiha objeya di rola tîmsalê de, dikeve dewsa ciwaniyê (Coşkun, 2004: 26). Yanî dibite ciwanî bi xwe. Bi vî awayî şair bi saya taybetiya prototîpê, ciwaniyê bi tehreki şênber li ber çavan radixe û nîşanî hişmendîya însan dide.

Şair ew prototîpên ku emilandine, di encama bikaranînên hevpar ên helbesta klasîk de derketine holê ku temsîla ciwaniyê dikin. Bi dirêjahiya demê re ev tradîsyona berfireh li gor xwe zimanekî alegorîk pêk aniye (Todorow, 2001: 86). Her wiha ev tîp û tîmsal, beş û cuzên terakum û tecrubeyên teamulek e edebî ne. Taybetiyên hevpar ên unsûran hatiye mulehezekirin û li ser tesnîf û kategorizasyonên kifşe derketine holê (Bozkurt, 2016: 120).

Estetîka helbesta Mela de prototîp hebûnên şênber ên li sirûstê yên wek roj, hîv, gul, xunçe, lale, simbil, sosin, serwî, kulîlk û hwd. nin. Her wiha însan û uzwen însan jî di vê hêlê de wek tîmsalên ciwaniyê xwedî rol in. Cizîrî wek şairekî pisporê estetîk û ciwaniyê, van prototîpên han bikartîne ji bo ciwaniya razber bîne ziman. Xasma ji bo îfadekirina ciwaniya mutleq a îlahî van mezmûnan wek unwan diemilîne. Lewma Mela dibêje:

*Eksa ji husna meyfiroş avête fîncanên bi poş
Nageh di caman hate coş fûrî di nêva kûze da*

*Saqî ji dengê bulbul e avête çerxê xulxul e
Rûhan li dorê silsil e govend û reqs û helqe da*

*Eynê tebîet cîsme kul bişkift di wî baxê du gul
Eşqê gerandî camê mul husnê di wan da pence da* (Cizîrî, 2013: 42).

Lewra di hizr û ramana sofîgeriyê de hemû mewcûd, çi jîndar û camid çi şênber û razber, sûretên

Xweda nîşan didin, tecelliya cemala wî ne (Erebî, 1975: 71). Ev sûret, xuyang û eksa cemala mutleq in. Lewma mane, mesaj û îmajê heqîqî ya van prototîpan, di esasê xwe de îşaretî yek wucûdeke mutleq dike; yek cemal û ciwaneke mutleq nîşan dide

Prototîpên şîra klasik ji bo şerh û şîroveya ciwaniya raser û serdest, xwedî roleke sereke ne. Li gor Mela ev hemû ciwaniyên ku li alemê belavbûne, şewq û şemala ji wê ciwaniya mutleq in. Lewma esas prototîpa eslî Xweda ye. Mela lewma dibêje:

*Dilbere serdarê xûban ez nizam ageh heyê
Arif e bi halê qulûban alim e bi halê me ye* (Cizîrî, 2013: 126).

Lêbelê ji ber ku temaşe û dîtina bi çavan a ciwaniya îlahî ne mumkun e, lewma teswîra wê jî ne mumkun e (Çam, 2013: 78). Lewma ev ciwaniya bê hudûd û mutleq, bes tenê bi wan obje û ferdên mezherî wê ciwaniyê ve, tê îfadekirin. Wihareng ew hebûnên mezherî tecelliya wê ciwaniya mutleq, digerin prototîpên wê ciwaniyê. Lewra Xweda ciwaniya herî bala ye. Lewma ciwaniyeke herî mukemmel dikare bibe tîmsala wê mukemmeliyeta wê.

Li gor Cizîrî hemû ciwanî ji Xweda ne. Heçî Xweda ye ji cism û maddeyê berî û munezzeh e. Her wiha di baweriya Îslamî de tecsîm û tersîma Xweda heram e, gunahekî mezin e (Öz, 2022: 55). Yanî xêzkirina resmê Xweda, yan jî nîşandan Xweda ya bi awayekî şeklî, guneh e. Lewma ev yek bûye asteng ku Xweda wek prototîpeke ciwaniyê bête vegotinê di berhemên edebî de (Cizîrî, 2013: 245). Husna munezzeh yanî ciwaniya mutleq a îlahî xwe di sûretên mukemmel de dide ravekirin, tezahurkirinê. Lewma prototîpên kamil ên ciwaniya îlahî, wucûdên bi awayekî ciwan hatine afirandin ên wek nûra muhemmedî, milyaket, roj, hîv, însan in. Lewra ev cure prototîpên ciwaniyê di hîyerarşîya hebûnê ya Xweda de herî berbiçav in.

Meriv prototîpên ciwaniyê yê sereke ku şair ji bo anîna ziman a ciwaniya mutleq bikartîne dinhêre, çendîn prototîp bi zêdehî li ber çavan dikevin. Gava ev prototîp bêtin senifandin û di bin çendîn kategoriyan de bêne nîşandan, dê prototîpên wek lehengên efsanewî yê eşqê, hêmanên razber, hêmanên sirûştî, hêmanên hunerî yê maddî, hêmanên kozmik derdikevin pêş. Em dê di ronahiya helbestên şair de li ser van prototîpan bisekinin û lê hûr bibin.

2.1. Lehengên Efsanewî yê Eşqê

Ji ber ku di dirêjayîya dirokê de kesayetiyan efsanewî, bûne simbol û di derheq wan de di hişmendiya însan a subjektîf û objektîf de hudûdekî kifşe nemane, bi xweberê bune malê simbolîzmê. Bi gotineke din, tarîxê ew leheng, bi saya tesewura mîtolojîk gerandine tîmsal. Melayê Cizîrî di estetîka şîra xwe de kesên efsanewî yê wek Şîrîn, Zîn, Zuleyxa, Leyla, Yûsuf, Mem, Ferhad û hwd. bi piranî wek tîmsala ciwaniyê û eşqê bikaraniye (Çelikaş, 2021: 263; Aykaş, 2022: 205). Ev nav bi gelemperî wek abîdeya ciwaniyê tene pejirandin. Lewma Mela ji vê îmkanê sîd wergirtiye. Wek mînak meriv vê beyta Mela ya li jêr dikare nîşan bide:

*Lew herifim ez ji meylê şubhetê sehlê we seylê
Muhbet û işqa di Leylê ez kirim yekser pilox* (Cizîrî, 2013: 274).

Şair ji bo ku hêz û heşmeta işqa xwe û bandor û texrîbata zêde ya evîna xwe bîne ziman, prototîpên işq û ciwaniyê yê wek “Leyla” bikaraniye. Wihareng çawa işqa Leylayê Mecnûn har û dîn kiriye û bi çolan xistiye, işq û evîna şair, muhbeta di dilê wî de jî ew gerandiye wek kozekî agir. Ew kiriye agir û pêt.

2.2. Hêmanên Razber

Di dab û nêrîta fikriyata Îslamî de û her wiha di baweriya gel de lehengên tîmsala ciwanî û bedewbûnê yên wek perî, hûrî, milyaket, wildan û hwd. hene. Ev hebûnên razber xwedî taybetiyên ciwan û payebilind in. Ev cure mewcûd di fikriyata estetîk a Îbnî Sîna de jî wek hebûnên herî bêqusûr in (Taşkent 2013:137). Lewma ev hebûn, bi wucûda xwe, bi navên xwe û bi îmajên xwe hizra ciwaniyê di hiş û xeyalan de disêwirînin.

Li gor Îbnî Sîna ev hebûnên razber mewcûdên ji alema fewqeqemer yanî ehlê alema li jor hîvê ne. Wihareng di hîyerarşiya mewcûdat de ev hebûnên navborî, ciwaniya mutleq herî zêde di xwe de didin nişandan û temsîla wê dikin. Lewra di vê hiyerarşiya hebûnan de ji hîvê berjortir ciwanî zêde dibe. Hey ku ji hîvê berjêrtir dibe ciwanî kêmtir dibe û kêmasî zêdetir dibin (Taşkent, 2013: 140). Melayê Cizîrî jî lehengên tîmsala ciwanî û bedewbûnê yên wek perî, hûrî, milyaket, wildan û hwd. di helbestên xwe de diemilîne. Li gor peywenda naverok û weznê di honaka helbestên xwe de bi cih dike. Wek mînak:

*Hin esmer in hin dêmzerî mehpeyker in surmuşterî
Wildan û hûr û ew perî hatin libas û came da* (Cizîrî, 2013: 30).

*Wildan û hûr û ger perî şîrîn û mehbûbên berî
Hemyan ji husna Xawerî nûrê di wan yek zerre da* (Cizîrî, 2013: 36).

Prototîpên ku şairên serdemê bi gelemperî bikaranîne yên ji bo remza ciwaniyê, di destê Cizîrî de digerin tabloyên estetîk yên here ciwan û xweser. Lewra Mela digel temamul, terakum û tecrubeya edebî ya dem û dewrana xwe, zewq, qabiliyet, qerîhe û dehaya xwe ya şairiyê jî bi awayekî hunermendane tevî dikiyê. Wihareng şair ji hêla hizra estetîk û hunerê ciwankariyê de berhemên xweser û helbestên orjînal derxistine holê. Her wiha bûne cewher û malê edebiyateke xwedî ziravbîhîstiyariyeke payebilind û zewqeke estetîk.

2.3. Hêmanên Sirûştî

Di estetîka helbesta Cizîrî de hêmanên sirûştî yên wek sosin, simbil, lale, binevş, gulzar, gulşen, buxçe, xunçe, gul, selwî, çiçek, nihal, gulistan, av, kanî, co, cobar, ber, behr, deşt, çol, çemen, sî, qaz, weşek, şêr, piling, roj û hîv, ber û behr, felek, sema, Çiyayên Tûr, Qendîl, Çemên Dicle, Firat, Nîl û hwd. cihekî girîng digrin. Wek mînak:

*Feyza me şubhê Nîl e em dicle û Firat in
Ger şeyx û wer îmam e vê ra ye min keşakeş* (Cizîrî, 2013: 320).

Yan jî

*Mahîrûyê miskibûyê surpilingê şêrixûyê
Wê bi zulfa şbihê goyê dil ji min bir dil ji min* (Cizîrî, 2013: 388).

Yan jî

*Binêr li mahê nû û destê qezayê hey û hey
Ne li zer'ê felekê belkê li umre me ye das* (Cizîrî, 2013: 312).

Şair van hêmanên ku ji tebîetê deyn digre, ji rastiye diqetîne û wan di nav formeke edebî de wek uslûb û şêwe diemilîne. Wan digerîne objeyeke razber a vegotin û tedayiyê. Wihareng dibe simbol û tîmsal ku ciwaniya mutleq a îlahî yan jî ciwaniya dilberê tîne ziman, vedibêje.

Wek mînak:

*Sed co û sed cobar e tê sed û guşen û gulzar e tê
Çendan ji eşqê nar e tê safî nezer dî nûr e dil* (Cizîrî, 2013: 364).

Edîb û arif ciwaniya îlahî di rû û sûretê ciwaniya sirûştî de temaşê dike. Lewra di tradîsyona îrfanî û hîkemî ya îslamî de her tiştê li alemê û ciwaniya li ser wan, tezahura îlahî ne (Uludağ, 1999: 332). Mela vê hêmanê bi reng û şeweyên cuda ên xayet estetîk û tabloyên xayet zinde û rewnaq di helbestên xwe de bikartîne. Wek mînak:

*Her seher cewlan didit bayê sebayê rast û çep
Sosin û simbil bi mestî tîn semayê rast û çep*

*Sunbulê ter ya binevş ya sosin û gulçîçek û
Zulfi ya muşkê xeten ya sûretê tuxrastî in* (Cizîrî, 2013: 372).

Ev hêmanên sirûştî yên wek sosin, simbil, gulçîçek di vegotina şair a estetîk de xasma di helbestên wî yên xwedî temaya lîrik de bêhtir derdikevin pêş. Lewra ev helbestên bi van prototîpên sirûştî dagirtî, bi gelemperî di tema û şeweyên xezel, xezelê musemmet de hatine ristin.

2.4. Hêmanên Hunerî yên Maddî

Melayê Cizîrî objeyên wek hunerê beşerî jî di vegotina ciwaniyê de bikarîname ku bi destê însan hatine çêkirin. Ev huner wek hêmanên maddî li dunyayê hene û navdar in. Her wiha ev hêman, li hemû cîhanê di nav civatên mirovahiya de wek tîmsal û mînaka estetîk û ciwaniyê tîne zanîn û nasîn. Lewma şair ji vê binhişa wek tîmsala ciwaniyê ya kes û civatan sûd werdigre. Ew qebûla amme ya di derheq ciwaniya wî berhemê hunerî de, di helbestê de bi xwe berê îmajêke estetîk û tesewireke ciwanî ya bala û rewnaq pêk tîne. Wek mînak:

*Şeraba nabê numanî şefeq da iqdê perwînê
Muselsel mabû reyhanê xetê nazik li nîsrînê
Xerez şiklê te bû Manî ji neqşên Çîn û Maçînê* (Cizîrî, 2013: 478).

Di estetîka helbesta Cizîrî de hêmanên wek mabedên dînî yên baweriyên cuda û tiştên hunerî ku li wan mabedan cih digrin ên wek bût, senem, peyker, laleş, zunnar û hwd. hatine emilandin. Lewra ev hêman her çiqas ji aliyê hin civatan ve wek îlah û mabed hatibin pejirandin jî di esasê xwe de îşaretî hebûna Xwedayekî Ehed dikin (Turan, 2010: 231). Lewra di rastiyê de xwediyê her ciwanî û îbadetê Xweda ye. Lewma Mela wek piraniya wan şair û arifên serdema klasîk, van hêmanên hunerî yên maddî jî di helbesta xwe de bi awayekî pisporane bikaraniye. Wek mînak:

*Ev hûr û perîçehre bût û latê cemalê
Der sûretê tehqîqî Mela eynê mecaz in* (Cizîrî, 2013: 375).

Yan jî

*Min dil geşte ji dêrê naçim kenîştêyê qet
Mîhrabi wî bi min ra wer da biçîne Laleş* (Cizîrî, 2013: 318).

Cizîrî van hêmanên hunerî yên maddî ku di hafîzeyê hevpar a beşeriyetê de wek hêmanên pîroz û bala bi cih girtine, digerin îmaj û sîmgeyên ciwaniyê. Wihareng wê prototîpê ji maneya wê ya xas û teng, herêmî û taybet derdixe û digerin semboleke estetîk di helbestên xwe de.

2.5. Hêmanên Kozmîk

Şair hêmanên kozmîk jî wek prototîp di helbesta xwe de bikaraniye. Da ku ciwan û ciwaniyê bi wan hêmanên kozmîk ve simbolîze bike. Lewra ev hêman jî ber ku mezin in, rewneqdar in, tîkûz in, paqij in, bi heybet in û hwd. xwedî bandoreke mezin in. Lewma ev hêman di însan de hest û hestiyariyên estetîk ên wek bengîbûn û ecibandî, tirs û xof, beht û heyranî, îhtîşam û ûlwiyet, bêhudûdî û ezamet û hwd hişyar dike. Lewra ev hestên navborî her yeke wî kategoriyeke estetîk e di zanista ciwannasiyê de. Wek mînak:

*Serçeşmeya husnê ew e Xurşîd e alem pertew e
Ger bedr e wer mahê new e wer Muşterî yan Zuhre da* (Cizîrî, 2013: 34).

Mela prototîpên ciwaniyên yê kozmîk yê wek roj, hîv, brûsk, berq, merîx, kewkeb, stêr, zuhre, zuhel, xurşîd, şefeq, şîpêde, seher, suheyl, muşterî, dewran, mahê new, kêywan, peyk, mîhr, şems, qemer, mahê taban, hîva çardeh, felek, gumbedê mîna, gerdûn, çerxê dewran, afirab, mahîtab, xerçeng û hwd. bikaranîne.

Mela her yek jî van hêmanan li gor mijar û mebesta helbestê di peywend û konteksên cuda de emilandine. Lêbelê meriv dikare bibêje ku armanca bikaranîna van hemû hêmanan di xaleke hevpar de temerkuz dike û digihêje hev. Ew xal jî anîna ziman a ciwaniyê ye. Xasma vegotina ciwaniya îlahî ye (Cizîrî, 2018: 89). Wek mînak:

*Min dî seba bayê seher madarê bedrê kir du ker
Qews û qezej jê hate der dîsa bi zulfan ra teba* (Cizîrî, 2013: 23).

Yan jî

*Hin gulên bo enber in hin di şîrîn esmer in
Hin gewher in dane yinmislê Suheylê sema* (Cizîrî, 2013: 29).

Di van malikan de şair wan temsil û îmajên ku di fêmdariya serdemê û raya giştî ya wê deme de hukumferma ye, hildide ber çavan. Her wiha wan simbolên kozmîk li gor mebest û hizra xwe ya estetîk di berhemên xwe de bikartîne.

Encam

Babeta estetîkê piştî ku wek qadeke felsefeya hebûnê kete nav zanistên beşerî, digel hûkema û zanayên dînî, edîb û şair jî li ser vê mijarê sekinîn. Li dor vê babetê nêrîn û hestên xwe anîna ziman. Wihareng estetîk geriya qadeke rengîn a edebiyatê jî.

Ciwanî ku mijara estetîkê ye, jî hêla piraniya şairên serdema klasîk ve li ser unsurên muşterek, bi prototîpên kifşe û bi heman uslûbê hatiye sêwirandin. Ew ciwaniya ku bi şêweyê yekreng û yekawa dihate ziman, bi rêya îfade û gotinên alegorîk, girîft û pirmane ya edîb û şairan, rewş û rehendekê nuwaze û orjînal wergirtiye. Edîb û şairan diyardeya ciwaniyê bi temsil, teşbih û îstiareyan û bi xeyalên pir dewlemend ve sêwirandine. Wan estetîk di form û kirasên ciyawaz de jî nûve saz kirine û bi mezmûn û gotinên klîşe yê curbecur ên ciwannasiyê ve anîna ziman.

Şair û edebiyatnasên Kurd ên serdema klasîk jî digel hembûşeyên xwe yê ji milletên erdnîgariya Rojhilata navîn, ciwan û ciwanî bi heman nêrîn û boçûnê şîrove kirine. Ev nêrîn di zimanê wan ê Kurdî de û di berhemên wan ên bijarte de bi awayên herî rewnaq û herî xweser derdikeve pêşiya me. Melayê Cizîrî jî yek ji wan şairên Kurd ên mezin û berbiçav e ku di helbestên xwe de estetîk yanî hizr û nêrîna ciwan û ciwaniyê bi tabloyên herî rewnaq û herî bala û balkêş xêz kiriye di risteyên xwe de terenum kiriye. Melayê Cizîrî jî yek ji wan şairên Kurd ê serdema klasîk e ku ciwanî di helbesta xwe

de bi awayekî herî bala û balkêş, bi teherekî herî rewnaq û rengîn aniye ziman. Dîwana wî ya muretteb, helbesta wî ya coşîş û beytên wî yên muhkem di vî warî de temsîlkarê banê estetîka zimanê Kurdî ne. Her wiha sertaciya taqa zêrîn a qesra edebiyata Kurdî dikin.

Rastiyên metafîzîk ên xeybî ji ber ku mucered û bê ser û ber in, nakevin bin hed û hudûdên maddî û şeklî. Lewma ji bo anîna wan a ziman, pêwistî bi zimanekî alegorîk heye. Li gor Mela alema mecazan a maddî, tecelliyeke cihana heqîqetan e. Ji ber vê qasê ji vê hêlê ve heqîqet in. Lêbelê bi gelemperî kesret û piratiya mecazan, demî, xapînok û arizî ne. Lewma mecaz wek pire û wesayît in ku diçe ber bi vê heqîqetê. Her wiha heqîqeta mutleq bi vê wesileyê ve tê fêmkirin û nasîn. Ji ber vê qasê li gor şair bêyî mecazan heqîqet nayê fêmkirin.

Fêmdariya estetîka Melayê Cizîrî ciwaneke mutleq a muşexxes yanî şênber napejirîne. Her wisa bi gelemperî di estetîka serdema klasik de jî ciwanî rasterast bi xwe nayê vegotin. Her wiha wesfên ciwaniyê jî rasterast nabe mijara gotinê. Şair û edîban ciwaniyê bi gelemperî li ser mezmûnên wê yên herî tîkûz vedibêjin. Ev prototîp jî tiştên dîtbarî yan jî takekesên xwedî ciwaniya destanwarî ne. Bi vî awayî ew tiştên ku temsîla ciwaniyê dike, dibite usûrekî herî rewnaq di navbera hiş û ziman de. Wihareng objeya di rola nûnertiyê de, dikeve dewsa ciwaniyê. Yanî ew dibê ciwanî bi xwe. Bi vî awayî şair bi rêya xususiyeta prototîpê, estetîkê bi awayekî şênber yanî muşexxes li ber çavan radixe û raveyî hiş dike.

Ciwaniya mutleq a îlahî di nêrîna estetîka Cizîrî de xwe di sûretên mukemmel de dide ravekirin. Her wisa xwe di awayên nûwaze de dide tezahurkirinê. Lewma prototîpên kamil ên ciwaniya îlahî, wucûdên bi awayekî ciwan hatine afirandin ên wek nûra muhemmedî, milyaket, roj, hîv, însan in. Lewra ev cure prototîpên ciwaniyê di hîyerarşiya hebûnê ya Xweda de herî berbiçav in. Gava meriv prototîpên ciwaniyê yên sereke ku şair jo bo anîna ziman a ciwaniya mutleq bikartîne dinhêre, prototîpên wek lehengên efsanewî yên eşqê, hêmanên razber, hêmanên sirûştî, hêmanên hunerî yên maddî, hêmanên kozmik derdikevin pêş.

Çavkanî

- Ayvazoğlu, B. (1989). *İslâm Estetiği ve İnsan*, (1. Baskı), İstanbul: Çağ.
- Aykaç, Y. (2022). “Şah û Pahlewanên Mîtolojîk di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de”, *Mîtos û Edebiyat Mîtosên Kurdo-Îranî di Edebiyata Kurdî de*. (Edîtor: Shahab Vali & Kenan Subaşi), Stenbol: Nûbihar, 205-256.
- Bozkurt, K. (2016). *Fuzûlî'de Güzellik Tasavvuru*, İnönü Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili ve Edebiyatı Ana Bilim Dalı, Esk Türt Edebiyatı, Malatya.
- Cizîrî, Melayê, (2013). *Dîwan*, Çapa Pêncem, Selman Dilovan wer. bi tirkî: Osman Tunç, Stenbol: Nûbihar.
- Cizîrî, Mela Ebdusselamê, (2018). *Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, Wergera Ji Erebi Bi Bal Kurdî: Jan Dost, Diyarbakır.
- Cîhanî, P. (2013). *Şiroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî*, Stenbol: Nûbihar.
- Coşkun, Ş. (2004). *Kültürel İletişim Sürecinde Kalıp Düşüncelerin ve Önyargıların Rolü*, Teza Akademik, Ankara Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Radyo ve Televizyon Ana Bilim Dalı, Ankara.
- Coşkun, İ. (2010). “Molla Ahmed Cezerî'nin Vahdet-i Vücutçu Allah Tasavvuru ve Hoşgörücü Kişiliği”, *Uluslararası Şırnak ve Çevresi Sempozyumu* (Ed. M. Nesim Doru), Şırnak Üniversitesi Yayınları, Ankara, r. 561-578.
- Çam, N. (2013). *İslam'da Sanat Sanatta İslam*, Ankara: Akçağ.
- Çetinkaya, Bayram A. (2015). “Molla Ahmed el-Cezerî/Melayê Cizîrî”, *Doğudan Batıya Düşüncenin Serüveni-Osmanlı'da Felsefe ve Aklî Düşünce-*, ed: İnsan Yay., İstanbul. r.797-822.
- Çelikaş S. (2021). “Hêmanên Mîtolojîk û Kesayetên Efsanewî Di Dîwana Melayê Cizîrî de”, *Cizîrînasî Maqaleyên Li Ser Melayê Cizîrî û Şi'rên Wî*, Weşanên Dara, Diyarbakır/ Amed, r. 163.
- Deleder, S. (2012). “Grek Estetiği ve Sanat Felsefesinde Önemli Kavramlar”, *Farabi e-Dergi*, Yıl: 2, Şubat, r. 5.
- Eminoğlu, N. (2022). *Tesewira Estetik Li Nik Melayê Cizîrî*, Zanîngeha Bingölê Enstîtuya Zimanên Zindî, Bingöl.
- Erebî, İ. (2017). *Tecelliler Kitabı*, Tercüme: Osman Yolcuoğlu, İstanbul: Gelenek.
- Hartman, M. (1904). *Der Kurdische Diwan Des Schech Ahmad*, S. Calvary & Co., Berlin.
- Izady, M. (2005). *Bir El Kitabı Kürtler*, İstanbul: Doz.
- Öz, R. (2022). “Tevkîflik-Kıyâsîlik Bağlamında Molla Ahmed el-Cezerî'nin Esmâ Nazariyesi”, *Bingöl Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi* 1/19, 15.
- Öz, R. (2022). *Şarkın Bilgesi Melayê Cizîrî*, Hüsnü Turgut (ed.) Van: Peywend Yayınları.
- Taşkent, A. (2013). *Güzelin Peşinde*, İstanbul: Klasik.
- Timuçin, A. (2009). *Sorularla Estetik El Kitabı*, (1. Baskı), Bulut Yayınları, İstanbul.
- Timuroğlu, V. (2013). *Estetik*, İstanbul: Berfin.
- Towensend, D. (2002). *Estetiğe Giriş*, Çev: Sabri Büyük Düvenci, İstanbul: İmge.
- Todorov, T. (2001). *Poetikaya Giriş*, (Wergêr: Kaya Şahin), İstanbul: Metis.
- Turan, A. (2010). *Melayê Cizîrî Divanı ve Şerhi*, İstanbul: Nûbiharê.
- Turgay, N. (2011). “Ahmed el-Botî el-Cizîrî ve Divanında Kur'an'a Yaklaşımı”, *Mukaddime*, cîld: 4, jimar: 4, r. 139-157.
- Tunalı, İ. (2011). *Grek Estetik'i*, İstanbul: Remzi Kitabevi.
- Uludağ, S. (1999). *Tasavvuf Terimleri Sözlüğü*, İstanbul: Marifet.

MELA NÛRULLAHÊ GODIŞKÎ Û DÎWANA WÎ

“Te ew daxa ku kêşaye dil
Heya mehşerê dimîne kul”

Godişkî

Nesim SÖNMEZ,

Doç. Dr., Zanîngeha Van Yüzüncü Yilê, Enstîtûya
Zimanên Zindî, Beşa Ziman û Çanda Kurdî
e-mail: nesimsonmez@gmail.com .
ORCID: 0000-0002-6315-6075

Nesim SÖNMEZ

Article Type/Makale Türü:

Research Article/Araştırma Makalesi

Received / Makale Geliş Tarihi: 10.03.2023

Accepted / Makale Kabul Tarihi: 15.07.2023

Published / Makale Yayın Tarihi: 20.10.2023

DOI: 10.35859/jms.2023.1262932

**Değerlendirme ve İntihal/Reviewing and
Plagiarism:**

Bu makale iki taraflı kör hakem sistemine göre
en az iki hakem tarafından değerlendirilmiştir.
Makale intihal.net adlı intihal sitesinde
taranmıştır. / This article has been reviewed
by at least two anonym reviewers and scanned
by intihal.net plagiarism website.

Citation/Atf:

Sönmez, N. (2023). Mela Nûrullahê Godişkî
û Diwana Wî, The Journal of Mesopotamian
Studies, Jîmara Taybet a Edebiyata Kurdî ya
Klasîk, rr. 63-84,
DOI: 10.35859/jms.2023. 1262932.

KURTE

Edebiyata kurdî ya klasîk xwediyê xezîneyeka gelek dewlemend e. Berhemên ku di vî warî da hatinê nivîsîn roj bi roj bi xebatên pisporên qadê jî quncikên tarî têne derxistin û li ser wan, ji aliyê vekoleran ve curbicur vekolîn têne kirin û ew, ji nû ve di nav edebiyat klasîk da cihê xwe digirin. Edebiyata kurdî ya klasîk, bi kevneşopîya xwe ya kûr xwediyê bi sedan berhemên e ku ev berhem bi piranî îro di pirtûkxaneyên destxetan da yan jî di quncikên medreseyan û di pirtûkxaneyên taybet yê şêx û mela yan jî warisên wan da wekî destxet li bendê ne ku ew, bêne kifşkirin, li ser wan xebat bê kirin û di nava edebiyata kurdî ya klasîk da cihê xwe yê nû bigirin. Ji van berhemên yek jî diwana Mela Nûrullahê Godişkî ye ku hetanî roja îro wekî destxet maye û bi awayekî akademîk li ser wê xebat nehatine kirin. Mela Nûrullahî, di sala 1918an da hatîye dinê û di sala 2003yan da jî wefat kirîye û wî li pişt xwe gelek berhemên hiştine û ji wan berhemên yek jî diwana wî ye. Em dê di vê vekolînê da di derheqê jîyan û berhemên Godişkî da agahiyên tekûz bidin û bi berfirehî diwana wî binirxînin.

Peyvên Sereke: Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Destxet, Diwan, Qesîde, Mela Nûrullahê Godişkî.

Molla Nurullah Godîşki ve Divanı

ÖZ

Klasik Kürt edebiyatı oldukça zengin bir hazinedir. Bu alanda yazılan eserler, alanında uzman kişilerin çalışmaları ile unutuldukları yerlerden her geçen gün çıkarılıp üzerlerinde çeşitli araştırmalar yapıldıktan sonra yeniden basılarak klasik edebiyattaki yerlerini almalarını sağlamaktadırlar. Klasik Kürt edebiyatı köklü bir geleneğe sahiptir. Bugün elyazması şeklinde kütüphanelerde veya medreselerin köşe başlarında ya da şeyhlerin, mollaların veya onların varislerinin şahsi kütüphanelerinde keşfedilmeyi ve üzerinde çalışılmayı bekleyen onlarca eser bulunmaktadır. Bu eserlerden biri de bugüne kadar elyazması olarak kalmış ve henüz akademik olarak incelenmemiş olan Molla Nurullah Godîşki'nin divanıdır. 1918 yılında dünyaya gelen ve 2003 yılında vefat eden Molla Nurullah, arkasında pek çok eser bırakmıştır. Bu eserlerden birisi de elimizde bulunan divanıdır. Araştırmamızda Godîşki'nin hayatı ve eserleri hakkında sahih bilgiler verip divanını ayrıntılı olarak değerlendireceğiz.

Anahtar Kelimeler: Klasik Kürt Edebiyatı, Elyazması, Kaside, Divan, Molla Nurullah Godîşki.

Molla Nurullah Godishki and His Poems

ABSTRACT

Classical Kurdish literature is a very rich treasure. The works written in this field ensure that they take their place in classical literature by being removed day by day from the forgotten places with the work of experts in the field and reprinted after various researches are done on them. Classical Kurdish literature has a long tradition. Today, there are dozens of works waiting to be discovered and studied in manuscript libraries or on the corners of madrasas, in the private libraries of sheikhs, mullahs or their successors. One of these works is the divan of Molla Nurullah Godîşki, which has remained as a manuscript and has not yet been studied academically. Molla Nurullah, who was born in 1918 and died in 2003, left many works behind. One of these works is this divan that we have. In this research, Godîşki's life will be briefly explained and his divan will be explained in detail.

Keywords: Classical Kurdish Literature, Manuscript, Qasidah, Diwan, Molla Nurullah Godishki.

EXTENDED ABSTRACT

Classical Kurdish literature is a very rich treasure. The works written in this field ensure that they take their place in classical literature by being removed day by day from the forgotten places with the work of experts in the field and reprinted after various researches are done on them. Classical Kurdish literature has a long tradition. Today, there are dozens of works waiting to be discovered and studied in manuscript libraries or on the corners of madrasas, in the private libraries of sheikhs, mullahs or their successors. One of these works is the divan of Molla Nurullah Godîşki, which has remained as a manuscript and has not yet been studied academically. Molla Nurullah, who was born in 1918 and died in 2003, left many works behind. One of these works is this divan that we have. In this research, Godîşki's life will be briefly explained and his divan will be explained in detail.

Mullah Nurullah Godishki is a madrasah and mystic. For years, he has been interested in the education of religious scholars in madrasahs and has left behind dozens of works. Some works are written in verse and some in prose. As a result of the investigation, we reached these conclusions.

Mela Nurullahi's childhood was spent in a difficult life, when he was six or seven months old, his father died and his mother remarried, so he grew up as an orphan. Godishki, despite such a difficult life, did not despair, did not withdraw his hands from the world and continued his struggle for life until

the day of his death. Mela Nurullahi, along with mulati and seydati, is quite a poet and writer, he has left dozens of works in the field of Islamic science and Kurdish literature and most of his works are written in his mother tongue. It is said that he saw the mother tongue as a verse of the Koran, so he tried to protect the Kurdish language with his writings.

There are two copies of the court, the first copy is in the western part of Turkey in the city of Izmir in the collection of signatures of Şükrü Arasan, who owns a special collection of signatures. The second copy is in Tetwan district in the library of Mela Sefa Özdemir, who is the son of Mela Nurullah Godishki. After the analysis, we found that the complete copy is from Tetwan and the one from İzmir does not contain all the poems. It is said that Godishki wrote the İzmir copy first and added many poems to this copy. Diwana Mela Nûrullahi is a multilingual diwana, that is, he wrote his poems in Kurdish, Persian and Arabic, and sometimes used Turkish words or phrases in his poems.

The language of poetry is clear and fluent. Poetry, words and concepts that have a difficult meaning and are not widely understood, are not used. He wrote his poems mostly in Kurdish, then in Persian and then in Arabic. The poet writes his poems in the cursive script, but he is not very successful in using the cursive script. Most of the poems are poems and poems. Apart from these two types, there are four, masnawi, ekmalik and ruba'i. Mullah Nurullahi wrote his judgment according to the Arabic letters in order, and therefore one can say that this judgment is a muretteb judgment. He decorated some of his poems in his court and two of those decorated poems are included in the court. Godishki, as the tradition of classical literature poets, gave mekhlesa in his poems; Nurullah, Nuri and Nuriyeh Miskin are used.

According to our analysis, there are various topics in Godishki's poems, his poems are mostly about Hazrat. Prophets (peace be upon them) are not written. Sometimes he writes poems about the love of prophets such as Prophet Zechariah and Prophet Ibrahim Khalil. He wrote a large number of poems about the sheikhs of his sect, namely the sheikhs of Werqanis and Oxin. As a result of the investigation, it was revealed that Mela Nurullahi loved the city of Bursa so much that he wrote poems about this city and also about the earthquake that happened in 1976 in Begiri and Çaldiran districts of Van city and hundreds of people died and Many houses were destroyed, he wrote and wrote a poem about the leader of the Democratic Party and the Prime Minister of Turkey, Ednan Menderes, who was hanged by the soldiers in 1961, and showed his love for him in the poem.

Godishki has mentioned the death of many sadats and sheikhs of his sect in his poems and in order to draw the attention of the readers to these sadats and sheikhs, he has written their names in red ink. As a result of the investigation, we found that Mella Nurullahi was more under the influence of Mella Jiziri, Feqi Teyran, Ahmed Khani and Sheikh Abdirahman Akhtepi. Godishki wrote about the poems of Mella Jiziri, commented on the poems of Feqi Teyran and praised Ahmed Khani and Sheikh Abdirahman Akhtepi in his poems.

Destpêk

Destxet, ji wan berhemên ku bi destan li ser mijara dîn, edebîyat, zanist û hwd ve hatîye nivîsîn ra tê gotin. Destxet, yek ji girîngtirîn çavkanîyên dîrok, edebîyat, ziman û çanda mîletan e. Pirtûkxaneyên ku têda destxet têne parastin ji bo nîfşên nû cihê xezîneyên herî bi qîmet in. Destxetên mîletekî, nîşaneyên asta zanîna wî mîletî ne û her weha çavkanîyên wî mîletî yê dîrokî ne. Çi di pirtûkxaneyan da be çî jî di medrese û quncikê odeyên ehlê ilm û îrfanê da be ji aliyê nîrxên huner, edebîyat û zanîstê ve bi dehan destxetên qîmetdar hene ku hetanî vê gavê li ser wan vekolîn nehatine kirin û ew li benda pispor û vekolerên qadê ne.

Wezîfeyekî muhîm li ser milê lêkolîner û zanayên vê qadê heye ku lazim e ew, van destxetan ji refên tozgirî bigirin, li ser bixebitin û wan bikin xizmeta mîlet û qada zanîstê. Ji bo ku bi awayekî rêk û pêk ji wan destxetan were îstifadekirin hewce ye berîya her tiştî ew baş werine fêmkirin, pişt ra werine tesnîfkirin û pişt ra jî ji bo vekolera û zanayan werine pêşkêşkirin.

Destxetên ku bi kurdî di warê dîrok, ziman û edebîya kurdan da hatine nivîsîn, hetanî vê gavê bi awayekî zanîstî di pirtûkxaneyên taybet da nehatine komkirin û parastin. Ji ber nekirina xebatên weha, bi dehan destxetên kurdî yan jî holê hatine rakirin an jî wenda bûne. Ew destxetên ku bi kurdî hatine nivîsîn û di pirtûkxaneyan da hatine parastin jî, piranîya wan ji aliyê hinek kesên nezan an jî nîyetxerab ve di pirtûkxaneyên destxetan da dema hatine qeydkirin, derbareyê nav û zimanê wan da agahîyên nerast di katalogên wan da hatine nivîsîn. Bo nimûne li Enqereyê di Pirtûkxaneya Millî da sê destxetên berhema Mela Xelîlê Sêrtî (1754-1843) ya bi navê *Nehcu'l-Enamê hatine parastin, lêbelê mirov dema li kataloga destxetan mêze dike dibîne ku navê nusxeya yekem û sêyem di kataloga wan da rast hatîye nivîsîn lê zimanê her du nusxeyan jî wekî farisî hatîye nîşandan*¹. Di kataloga nusxeya duyem da jî navê berhemê wekî *Manzûme-i 'Akâ'id hatîye nivîsîn û zimanê wê jî wekî farisî hatîye nîşandan*². Mirov dikare gelekî nimûneyên weha rêz bike. Şaşîyên weha jî dibine sebeb ku xebera mirovan ji wan destxetan çê nebe, eger çê bibe jî nikaribe xwe bigihîne wan, li ser xebatan bike û wan bigihîne ber destê zana û lêkolîneran.

Ji wan destxetan yek jî Dîwana Mela Nûrullahê Godîşkî ye ku bûye mijara vekolîna me. Hetanî vê gavê li ser vê dîwanê gotareka bi navê "*Divan Yazma Geleneğinin Son Halkası: Nûrî Divanı*" ji aliyê akademîsyen Sedat Kardeş ve bi tirkî hatîye amadekirin û ji aliyê Cihat Bakırhan ve jî bi navê "*Mele Nurullahê Godîşkî'nin Çenta Yetîman Adlı Eserinin Tarnskripsiyonu, Türkçeye Çevirisi, Tahlil ve Tenkidi*" tezeka lîsansansa bilind hatîye kirin.

Armanca me ji vê vekolîne ew e ku em di derbareyê jîyan û berhemên Mela Nûrullahê Godîşkî da bi berfirehî agahîyan bidin û bi taybetî dîwana wî, ji aliyê ruxsarî û naverokê ve rave bikin û cihê wê di edebîyata kurdî ya klasîk da dîyar bikin.

1. Mela Nûrullahê Godîşkî

1.2. Jîyana Wî

Mela Nurullahê Godîşkî, li gundê Xarsê/Güneyik ya navçeya Tîlana/Korkut bajarê Muşê li gor nasnameya wî ya fermî di sala 1918an da hatîye dinyayê - kurê wî yê bi navê Mela Sefa Özdemir³ dibêje ew dîroka ku di nasnameya bavê min da hatîye nivîsîn rast nîne, ya rast ew e ku dîroka ji dayîkbûna

¹ Bnr. Molla Halil Siirdî, *Nehcü'l-Enâm, Milli Kütüphane, No: 06 MK. Yz. A 5771; Molla Halil Siirdî, Nehcü'l-Enâm, Milli Kütüphane, No: 06 MK. Yz. B 70*

² Bnr. Molla Halil Siirdî, *Nehcü'l-Enâm, Milli Kütüphane, No: 06 MK. Yz. A 5752.*

³ Sefa Özdemir, kurê Mela Nûrullahê Godîşkî ye, dema me di gel wî hevpeyvîn kir (Tetwan, 12. 05. 2020, saet: 18:30) ew, waizê Tetwanê yê resmî bû û niha jî li navenda bajarê Bûrsayê waiztîyê dike.

bavê min an sala 1915an e yan jî 1916an e - paşnavê wî “Özdemir” e, navê bavê wî Mela Ehmedê Godîşkî, navê dîya wî jî Hurrîyet Xanim e. Malbata wî bi eslê xwe, ji nesla Şêx Mîrza Mihemedê Têlanî tê ku ev malbat ji Cizîra Botan e. Tê gotin ku mezinên malbatê 200 sal berê ji gundê Reştîya ku girêdayî bi navçeya Cizîra Botan e hatine gundê Têlana/Teylan navçeya Misircêya/Kurtalan Sêrtê û ji wir jî hatine gundê Şimlaka/Dağdibi ya Dêrxasa/Hasköy Mûşê û ji wir jî hatine gundê Godîşkê/Alıcık ya navçeya Mûtka Bidlîsê bi cihûwar bûne. Lewra Mela Nûrullahî, zêdetir bi navê gundê Godîşkê hatîye naskirin. Bavê Mela Nûrullahî, dema wêfat dîke ew 6-7 mehî bûye û piştî wêfata bavê wî dîya wî Hurrîyet Xanim, diçe mêr dîke û ji ber van sedeman zaroktîya Godîşkî gelek di nav şertûmercên zehmet da derbaz dibe.

Mela Nûrullahî, bi qasî demekî kurt li gundê Xarsê li cem apê xwe Feqî Mistefa disekine, dest bi xwendina Quranê dîke û paşê jî diçe gundê Nokê/Koç li cem kurê apê xwe Mela Sidîqê kurê Mela Mihyedînê Godîşkî hetanî 8 salîya xwe xwendina xwe berdewam dîke. Bavê Mela Nûrullahî, di nexweşîya xwe da wesîyet kiribû ku Şêx Alâuddînê (w. 1949) kurê Şêx Fethullahê Werqanîsî (w. 1899) ji kurê wî Nûrullahî ra bibe wasî. Ji ber vê yekê dema temenê Nûrullahî dibe 8 salî Şêx Alâuddînî, wî digire dibe Oxînê/Koyunlu di medreseya bavê xwe Şêx Fethullahê Werqanîsî (w. 1899) da dide xwendinê. Mela Nûrullahî, bi piranî ji Şêx Alâuddînî dersê digire û ji wî hînî zimanê farîsî dibe. Godîşkî, di heman medreseyê da ji Şêx Xalidê kurê Şêx Alâuddînî jî ders girtîye û îcaznameya xwe ya ilmî jî, di temenê xwe yê 19 salî da ji Şêx Xalidî girtîye. Mela Nûrullahî tevahîya xwendina xwe li vê medreseyê qedandîye.

Nûrullahî, piştî ku xwendina medreseyê diqedîne Şêx Alâuddînî, wî ji gundê Werqanîsa navçeya Havêla/Baykan Sêrtê bi keça Seyyîd Ebdurrehîm a bi navê Fatîma xanimê ra dizewicîne, ji vê zewacê 9 kur û 2 keçê çê dibin.

Mela Nûrullahî, li gor rêzê li gundê Qeraboya/Yukarı Karaboy girêdayî bi navçeya Mûtka Bidlîsê, li gundê Şikranîsa/Yoncabaşî navçeya Tetwanê, li gundê Kizvakê/Sarıcum û li gundê Xizorkînê/Hanelmalî melatîyê dîke. Paşê diçe gundê Kuştîyana/Alakur navçeya Xelatê/Ahlat dibe melayê resmî yanê ji dewletê qadroyê digire û piştî demekî ji wir diçe li nehîyeya Sorpê/Reşadiye melatîya xwe berdewam dîke. Herî dawîyê jî diçe gundê Koxaka/Dokuzpınar navçeya Kopê/Bulanik ya Mûşê li wir bi qasî çend salan melatîyê dîke, pişt ra malnişîn dibe û hetanî wêfata xwe li navçeya Tetwanê jîyana xwe didomîne. Mela Nûrullahî, li van gundan ne tenê melatî kirîye, wî digel melatîyê di medreseyan da feqî jî perwerde kirine.

Godîşkî, di sala 2003an da li navçeya Tetwanê wêfat dîke û li Oxînê di goristana Sulavê da tê definkirin (Sağrıç, 2002: 609-612). Mela Nûrullahî, digel zimanê kurdî, erebî, farîsî û tirkî jî baş dizanîbû. Godîşkî, di nav tevahîya şairên Bidlîsê da kesekî herî zêde xwedîyê berheman e (Adak, 2016: 39).

Mela Nûrullahî, kesayetekî ji ehlê terîqetê ye, ew peyrewê terîqeta neqşebendî ji şaxa xalidîyan e û wî întisabî şêxê Oxînê Şêx Mezher kirîye. Bi qasî ku me ji malbata wî agahî wergirtine wî îcaznameya terîqetê wernegirtîye û di heyata xwe da kar û barên şêxtîyê jî nekirîye. Tê gotin ku ji Mela Nûrullahî hatîye pirsîn ku ew çima şêxtîyê nake. Wî di bersiva xwe da gotîye “Terîqa min kitêbên min in û ilmê min e”⁴.

1.2. Berhemên Wî

Em ê di bin vê sernavê da berhemên Mela Nûrullahê Godîşkî bidin nasîn.

⁴ Nesim Sönmez, *Hevpeyvîn Digel Sefa Özdemir*, (Tetwan, 12. 05. 2020, saet: 18:30).

1.2.1. el-Hemaîl Fî'ş-Şemaîl

el-Hemaîl Fî'ş-Şemaîl, berhemeka menzûm e, bi kurdî hatîye nivîsin, di tevahîya wê da 5569 malik hene û mijara wê danasîna exlaq û karakterê Hz. Muhemmed (sxl) e. Destxeta berhemê di pirtûkxaneyê Mela Sefayî ya taybet da hatîye parastin. Berhem bi şaşîti di sala 2007an da ji aliyê nivîskar û lêkolîner Zeynelabidin Zinar ve di nav weşanên Dozê da wekî berhema Şêx Fethullahê Werqanîsî hatîye çapkirin. Malbata Şêx Fethullahê Werqanîsî jî ev şaşîti qebûl kirine û di derbareyê mijarê da nameyek nivîsiye û teslîmî malbata Godîşkî kirîye. Ev name, di pirtûkxaneyê Mela Sefa Özdemir da hatîye parastin (Bakırhan, 2017: 208).

1.2.2. es-Sebaîk fî'l-Menasîk

es-Sebaîk fî'l-Menasîk, berhemeka pexşanî ye, bi kurdî hatîye nivîsin û mijara wê menasîkên hecê ne yanê di demajoya kirina hecê û umrê da bicihanîna hin tevgeran e. Berhem hetanî vê gavê nehatîye çapkirin û destxeta wê di pirtûkxaneyê Mela Sefayî ya taybet da hatîye parastin.

1.2.3. el-Cewahîru'r-Reşadiye fî Sîretî'n-Nebewî

el-Cewahîru'r-Reşadiye fî Sîretî'n-Nebewî, berhemeka menzûm e, bi kurdî hatîye nivîsin, di tevahîya wê da 5204 malik hene û mijara wê jî jîyana Hz. Muhemmed (sxl) e. Li gor agahiyên ku Mela Sefayî daye me destxeta vê berhemê, Mela Nûrullahî bi xwe bi armanca çapkirinê daye feqîyê xwe yê bi navê Mela Ebdulezîzî. Mela Ebdulezîzî teqrîben di sala 1976an da diçe Libnanê û destxeta Mela Nûrullahî jî bi xwe ra dibe û piştî demekî têkiliya di navbera wan da qut dibe. Hetanî vê gavê nayê zanîn ku gelo ev feqî li heyatê ye yan na û herweha nayê zanîn ku ev destxet li ku derê û li cem kî ye. Ancax bi navê Mela Fadilî, feqîyekî din ê Godîşkî heye û wî, ji bo xwe nusxeyeka vê berhemê ji ber nusxeya eslî ku hîna Mela Ebdulezîzî neçûbûye Libnanê nivîsiye. Di vê nusxeyê da hinek destxetên Mela Nûrullahî bi xwe jî hene û wî, ev destxet bi xwe di ber çavan ra derbaz kirîye. Berhem hetanî vê gavê nehatîye çapkirin û fotoqopîyeka vê destxetê di pirtûkxaneyê Mela Sefayî ya taybet da hatîye parastin.

1.2.4. Çenta Yetîman

Çenta Yetîman, berhemeka pexşanî ye, bi kurdî ji bo zarokên kurdan hatîye nivîsin û mijara wê eqaîda îslamê yanê şeş ruknên îmanê, pênc şertên îslamê, û kirina îbadetan e. Mela Nûrullahî, armanca nivîsandina vê berhemê di dawîya nusxeya nû ya vê berhemê da wekî nîşeyekî weha dîyar dîke: “*Ev kitap navê wê ‘Çenta Yetîman’ e. Lewra kurt e û hindik e. Ji bo zarokên kurdan eqîda îslamê ye û Fiqha Şafî ye heta ser bey’an. Bi zimanê wan e ku ji xwe ra hîra bibin û dîn û mezhebê xwe nas bikin û xwe ji delaletê xelas bikin.*” (Godîşkî, 2001: 2; Bakırhan, 2017: 31). Du destxetên berhemê hene, destxeta yekem di sala 1987an da û ya duyem jî di sala 2001ê da hatîye nivîsin û her du destxet jî di pirtûkxaneyê Mela Sefayî ya taybet da hatîye parastin. Li ser berhemê ji aliyê Cihat Bakırhan ve bi tirkî tezeka lîsansa bilind hatîye çêkirin.

1.2.5. Kufru'l-Kebaîr

Kufru'l-Kebaîr, bi eslê xwe berhema Şêx Fethullahê Werqanîsî ye û Godîşkî, ev berhem bi kurdî û bi şêklê nezmê jî nû ve nivîsiye. Berhem ji aliyê Mela Birhanê Tarînî ve hatîye latînezekirin û di sala 2020an da di nav weşanên Darayê da wekî 128 rûpel hatîye çapkirin.

1.2.6. Dîwan

Dîwan, çawa ji navê wê jî tê fêmkirin berhemeka menzûm e, bi sê zimanan yanê bi kurdî, erebî, û farisî hatiye nivîsin, di dîwanê da bi sê zimanan yanê kurdî, erebî û farisî 366 helbest hene û ji van helbestan 256 heb bi kurdî ne. Cureyên helbestan; qesîde, xezel û çarîn in. Godîşkî, di helbestên xwe da kêşa erûzê bi kar anîye. Ev berhem jî ber ku mijara vekolîna me ye em ê di beşa duyem da bi berfirehî binirxînin. Dîwan, hetanî vê gavê nehatiye çapkirin. Destxeta dîwanê di pirtûkxaneya Mela Sefayî da ye û faksmileyeka dîwanê jî di pirtûkxaneya me ya taybet da ye⁵.

1.2.7. Camîu'l-Me'anî

Camîu'l-Me'anî, şerhe berhema Ehmedê Xanî ya bi navê “*Eqîda Îmanê*” ye, bi pexşanî û bi erebî nivîsiye. Berhem hetanî vê gavê nehatiye çapkirin û destxeta wê di pirtûkxaneya Mela Sefayî ya taybet da hatiye parastin.

1.2.8. Şerha Beyta Dilo

Beyta Dilo, bi eslê xwe helbesta Feqîyê Teyran a bi navê “*Dilo Rabe*” ye. Mela Nûrullahî, bi erebî şerha vê helbestê kirîye. Berhem hetanî vê gavê nehatiye çapkirin û destxeta wê di pirtûkxaneya Mela Sefayî ya taybet da hatiye parastin.

1.2.9. Şerha Mewlûda Kurmancî

Mewlûda Kurmancî, bi eslê xwe berhema Melayê Bateyî ye û Godîşkî, şerha mewlûdê bi erebî çêkirîye. Berhem hetanî vê gavê nehatiye çapkirin û destxeta wê di pirtûkxaneya Mela Sefayî ya taybet da hatiye parastin.

1.2.10. Şerha Tecwîdê

Berhem, şerha berhema Şêx Alâuddînî ya bi navê “*Hidayetu's-Sibyanê*” ye û li ser ilmê tecwîdê hatiye nivîsin. Mela Nûrullahî, bi erebî şerha wê nivîsiye. Berhem hetanî vê gavê nehatiye çapkirin û destxeta wê di pirtûkxaneya Mela Sefayî ya taybet da hatiye parastin.

1.3. Kesayetîya Wî ya Edebî

Mela Nûrullahê Godîşkî, di dawîya sedsala XIXan da hatiye dinê, di wê serdemê da Dewleta Osmanîyan ber bi hilweşandinê ve diçû, gelek deverên dewletê hatibûn dagirkirin. Di vê navberê da tevahîya mîrektîyên kurdan jî holê hatibûn rakirin û bi taybetî tevlihevîyekî mezên di herêma kurdan da rû dabû. Hêza medreseyên kurdan gelekî lawaz bibû û di van sazgehan da perwerde di nav zor û zehmetîyan da dewam dikir.

Mela Nûrullahê Godîşkî, di nav atmosferekî weha da tê dinê û di medreseyên herêmê da xwendina xwe berdewam dike. Ew, ji alîyekî ve melatî û seydatîyê dike û ji alîyê din ve jî bi pexşanî û bi nezmê berheman telîf dike û hinek berheman jî bi armanca ku baş werine fêmkirin şerh dike.

1.3.1. Mexlesa Wî

Di edebîyata klasîk da wekî kevneşopiyekî, helbestvan di helbestên xwe da gelek caran navên xwe yên rasteqînî bikarnaînin, di dewsa navên xwe da jî xwe ra mexlesan bikartînin. Wekî mînak; di edebiyata Kurdî da Melayê Cizîrî mexlesa “*Nîşanî û Mela*” zêdetir bi kar anî ye û Feqîyê Teyran jî “*Mîm Hê û Feqî*” zêdetir bi kar anî ye.

⁵ Me li ser dîwanê vekolînek kirîye, tîpguhezîya helbestên kurdî yên ku di dîwanê da hene ji bo latînî kirye û ev xebat li ber çapê ye.

Em dema li dîwana Mela Nûrullahê Godîşkî mêze dîkin, dibînin ku ew jî li dû kevneşopîya edebiyata klasîk çûye û wî jî di helbestên xwe da mexlesa “*Nûrullah, Nûrî û Nûrîyê Miskîn*” bi kar anî ye. Godîşkî, mexlesa xwe hinek caran di malika dawîyê ya helbestê da bi kar anî ye û hinek caran *jî di* nava helbestê da bi kar anî ye. Wekî nimûne:

Ezîzê min te *Nûrullah* li ber daxa fîraqa xwe
Kire wek fe‘mê ya lîllah zelîl û zar û bêcan e (Godîşkî: 103)

Ey *Nûrîyê* naçarê zar
Wenda li te ew nazîdar
Maye zelîl û ustûxar
Ya Reb bidey me rehberêk (Godîşkî: 35)

Dibînî *Nûrîyê* miskîn bûye sewda û şeyda dîn
Di dil da sed hezaran xem wekî şewkan hêşîn bûne (Godîşkî: 175)

1.3.2. Hin Taybetmendîyên Zimanê Wî

Godîşkî, di berhemên xwe da bi piranî zimanekî zelal û herikbar bi kar anîye û ew bi armanca ku helbest an jî gotinên xwe bedewtir û bi tesîrtir bike neketîye pey vegotinên dilnegerm û sunî. Her çiqas di nav hevokên wî da hinek caran peyvên erebî, farsî û tirkî derbaz bibin jî kurdî serdest e. Bo nimûne; ade: girav, ateş; agir, temîz: paqij, geber bû: mir, ... û hwd (Titiz, 2020: 17).

Mela Nûrullahî, xemxwarê zimanê kurdî ye û ew, dixwaze zimanê dayîka xwe biparêze, lewra ew peyvên ku di roja îro da yan qet nayên gotin an jî hindik têne gotin di nav helbestên xwe da reşandîye. Bo nimûne wisan (alîyê Diyarbekir, Batman), welê (alîyê Botan û Hekari), qerizî (qerimî), xalet (xaltîk), û ... hwd (Titiz, 2020: 16).

Mîrov dema helbestên wî di ber çavan ra derbaz dike, çawa li jêrê jî derbaz dibe, dibîne ku bandora devoka Botan xwe tê da nîşan dide. Di devoka Botan û Hekariyê da herfa “t” yê dikeve dawîya lêkeran. Wekî nimûne: bibit, dibit, nabit, diket, naket, divêt, bivêt, navêt û hwd. Di van malikên jêrê da ew lêkerên ku hatine bikaranîn herfa “t”yê hatiye dawîya wan (Sönmez, 2018: 15). Bo nimûne;

Xudaya Nûrî ehqer
Di roja mehşera ekber
Çewan ew ku *bibit* mudder
Ew î bigehîne ‘ednanê (Godîşkî: 16)

Di tecwîdê da lew xelet ger *hebit*
Muheqqeq di me‘nê xelet *çê dibit* (Godîşkî: 27)

Di devoka Botan û Hekariyê da bi taybetî peyva “dî gel” û “nik” tê bikaranîn (Sönmez, 2018: 16). Mîrov dema li helbestên Godîşkî mêze dike, dibîne ku wî gelek caran ev peyv bi kar anî ne. Bo nimûne:

Digel her selat û selamê dipur
Şerê û delalê bi teşbîh e dur (Godîşkî: 26)

Derdê wî ser derdan temam tîra li cergê da temam
Êdî ku ez bême qîyam lew piştîkeşt û li *nik* neman (Godîşkî: 67)

Di devoka Botan û Hekariyê da qertafên wekî “key, dey, ey” têne dawîya lêkeran (Sönmez, 2018: 17). Godîşkî jî ev qertafana zêde zêde emilandine. Bo nimûne:

Ya Reb dilan dewa *key* birînê wan şifa key
Bi heqqê Mustefa *key* êdî neînî derdan (Godîşkî: 71)

1.2.3. Edîbên ku Tesîra Wan li Ser Çêbûye

Mela Nûrullahê Godîşkî, ne tenê mela û seydayê medresan e ew, digel vê yekê bi edebîyatê ra jî eleqeder bûye û helbestên gelek têr û tîjî nivîsîne. Haya wî bi awayekî baş ji edebîyata klasîka kurdî heye, ew stêrkên edebîya kurdî nas dike û di şairîya xwe da di bin tesîra wan da maye. Godîşkî, herî zêde di bin tesîra Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî û Şêx ‘Ebdirehmanê Axtepî da maye û ji wan sûd wergirtiye.

Godîşkî du xezelên Melayê Cizîrî texmîs kirine. Texmîs, teşeyeka nezmê ya pêncmisrayî ye ku şairek li ser helbesta şairekî din, li pêşîya her malika wî, sê misrayan bi heman kêş û serwayê zêde dike (Adak, 2019: 471). Mela Nûrullahî jî ev teşeya nezmê bi kar anîye û helbesta xwe ya bi navê “*Zulf û xalên dîlberê ez be mumkînatê nadem*” (Godîşkî, 167-168) li ser helbesta Cizîrî ya bi navê “*Şerbeta lam û bêyan ez bi heyatê nadem*” (Zivingî, bd: I/413-419) û helbesta xwe ya bi navê “*Me ji camên di wîsalê dilê pur nurî kirin*” (Godîşkî, 168-170) jî li ser helbesta Cizîrî ya bi navê “*Ez nizanîm sebebê yarê çira durî kirin*” (Zivingî, bd: II/458-461) nivîsîye.

Mirov, dema li helbesta Mela Nûrullahî ya bi navê “*Sorgula Bustanê Cennet Bêhn û Buda ye Enam*” dike bi awayekî aşkera dikare têda tesîra Melayê Cizîrî tesbît bike:

Melayê Cizîrî di helbesta xwe ya bi navê “Daneyên ‘Enber li Nesrînan” da weha dibêje:

Mela:

Daneyên ‘enber li nesrînan reşandin xali xam
Sosinên nazik li ser xalan cevandin dali dam
Cebhet û dêmê ji qudret lê nivîsî herf û herf
Kagulan ta ta li ser herfan kişandî lam û lam

...

Herkesê camê ji destê wê binoşî noşî bit,
Ê ji wî destê nenoşî zehrî bit lê ew mudam

...

‘Umrek e dîr bûm ji canan ketme benda firqetê
Nagihan perde hilanî go Melayim esselam” (Zivingî, bd: I/424-428).

Godîşkî jî “*Sorgula Bustanê Cennet Bêhn û Buda ye Enam*” weha dibêje:

Godîşkî:

Sorgula bustanê cennet bêhn û buda ye enam
‘Itrê kir me rojhilatê mest û sukran in temam
Dil dinalî ta bibînî bedrê wechê dîlberê
Ey dilo miskîn dilo çehvê te girtine xemam
Seyqela qelban û çehvan wî li nik ridwanê dil
Mustemendê dilbirînan wernê lê ken ihtîmam
Murşîdê ehlê heqîqet rehberê rahê Huda
Şafiyê zeyxê cerahet wî di nêv qelban meqam
Pişkivî mislê gula geş şu‘le da vê bilbilê
Bilbilo û wey bêdilo vêca tu lêke sed selam (Godîşkî: 166-167)

....

Mirov, dema van her du helbestan dixwîne dibîne ku helbesta Mela Nûrullahî, zêdetir dişibihe helbesta Melayê Cizîrî. Ev yeka jî dide xwîyakirin ku tesîra Cizîrî li ser Godîşkî çê bûye.

Mela Nûrullahî, di dîwana xwe da gelek caran têgeha “dil” bi kar anîye û herweha çawa li jor derbaz bû wî şerhe helbesta Feqîyê Teyran a bi navê “*Dilo Rabe*” kirîye. *Li gor me ev yeka jî dide nîşandan ku Feqî, tesîreka balkêş li ser Godîşkî kirîye.*

Mela Nûrullahî, xezela xwe ya “Werdê Dihê Bişkiftin Nav Baxçeyê Oxîn da” wekî nezîre li ser helbesta Ehmedê Xanî ya bi navê “Neqqaşê Ezel Roja Serlewheyê Rengîn da” nivîsîye. Nezîre ew cure ye ku li ser helbesta helbestvanekî ji aliyê heman helbestvanî ve yan jî ji aliyê helbestvanekî din ve di heman mijarê da bi heman wezin, qafîye û redîfê nivîsîna helbestekî din e (Adak, 2019: 471).

Xanî:

Neqqaşê ezel roja serlewheê rengîn da
Pergar di destan bû sersefhe ku tezyîn da (Xanî, 2014: 140-144).

Godîşkî:

Werdê dihê bişkiftin nav baxçeyê Oxîn da
Bostanê welatê min hercaê be tezyîn da (Godîşkî: 107-108)

Herweha tesîra Ehmedê Xanî û Şêx ‘Ebdirehmanê Axtepî ji li ser Godîşkî çêbûye. Bo nimûne di helbesta bi navê “*Xuy û Qencîyên Dîyar*” ku di berhema bi navê *el-Hemâlu Fi’ş-Şemâilî* ya Mela Nûrullahî da derbaz dibe da peyvên “Xanî û Qamûş” hatine bikaranîn. Armanca Godîşkî li vir jî “Xanî” Ehmedê Xanî ye û ji “Qamûş” jî hespa Şêx ‘Ebdirehmanê Axtepî ye.

Godîşkî:

Qelem rabe meqsed jibo me bibêj
We xûta dilê xwe jibo me birêj

Tu reyhana Xanî bûyayî, bira!
Qesem dê serê te minê jê kira

Û yan jî tu Qamûşa Axtepîyî
Bûyayî, dê bikrama bedbextîyî (Werqanîsî, 2007: 149)

2. Dîwana Mela Nurullahê Godîşkî

Di vê beşê da Dîwana Mela Nurullahê Godîşkî, ji aliyê ruxsarî û naverokê ve dê were nirxandin.

2.1. Nusxeyên Dîwanê

Li gor vekolîna me du nusxeyên Dîwana Mela Nurullahê Godîşkî hene. Nusxeya yekem li bajarê Îzmîrê di nav koleksiyona koleksiyoner Şükrü Araslan da ye. Dema em pê hesîyan ku dîwaneka bi kurdî li ba vî destxetkarî heye me hewl da ku em bi awayekî xwe bigîhînim vê nusxeyê. Bi alîkarîya dostekî me têkilî bi vî camêrî ra danî û jê faksmîleyekî dîwanê xwest û em gelek spasdarê wî camêrîne ku em neşkênandin û wekî emanet dîwan ji me ra şand û me ji faksmîleya wê li ba xwe girt û eslê dîwanê ji xwedîyê wê ra şand.


Piştî ku me vekolîn li ser vê dîwanê kir, em agahdar bûn ku ev nusxe ya eslî nîne, nîveka dîwanê ye û eslê dîwanê li navçeya Tetwana Bidlîsê li cem kurê Şairî yê bi navê Mela Sefayî ye. Me, demildest

bi wî ra têkilî danî û em çûn Tetwanê mala wî û me hem jê, di derbareyê bavê wî da agahîyên tekuz girtin û hem jî eslê dîwanê wekî emanet jê girt û piştî ku faksmîleya wê wekî pdf ji xwe ra girt, eslê dîwanê şunde dayê. Li jêrê danasîna van her du nusxeyan hatîye kirin.


2.1.1. Nusxeya Îzmîrê

Nusxeya Îzmîrê, ji 164 rûpelan pêk tê, bi destxeta Şairî hatîye nivîsîn, di her rûpelê da 12 rêz hene, her rûpel du stûn e. Hejmara her rûpelê li jorê rûpelê bi murekeba sor hatîye dayîn. Helbest bi murekeba reş li ser kaxizên kayê bi nivîsa rîqayê hatine nivîsîn. Cihê ku mexlesa şairî derbaz bûye wî, jorî mexlesê bi murekeba sor xêz kirîye. Qafiyeya helbestan, li gor alfabeya erebî hatîye rêzkirin, bi murekeba sor di destpêka her qafiyeyê da navê tîpa erebî li derkenarê rûpelê hatîye nivîsîn. Li dawîya her rûpela alîyê rastê jî peyva “reçebeyê” yanê peyva berdeyamîyê hatîye nivîsîn û ev yeka jî bûye alîkar ku mirov bizanibe rûpela alîyê çepê bi çi peyvê destpê dike. Ketebeya dîwanê di rûpela yekê da hatîye dayîn û têda dîroka nivisandina dîwanê tune ye.


Navê Dîwanê	Dîwanu Muhemmed Nûrî el-Muznîb el-Godîşkî
Mijara Dîwanê	Helbest
Muelîf	Muhemmed Nûrî el-Muznîb el-Godîşkî
Dîroka Nivîsînê	Ne dîyar e, li gor me di navbera 1950-2003yan e.
Cihê Wê	Koleksiyona destxetan ya Şükrü Arasan li Îzmîrê
Ziman	Kurdî/Erebî//Farisî
Cureya Nivîsê	Rîka
Cureya Kaxizê	Kaxiza Kayê
Rengê Murekebê	Reş
Hejmara Rûpelan	164
Hejmara rêzan	12
Berg	Kartona Stûr



(Nusxeya Îzmîrê: 1)



(Nusxeya İzmîrî: 2)



(Nusxeya İzmîrî: 164)


2.1.2. Nusxeya Tetwanê

Nusxeya Tetwanê, ji 217 rûpelan pêk tê, bi destxeta Şairî hatîye nivîsîn, di her rûpelê da 20 rêz hene, her rûpel du stûn e. Hejmara her rûpelê hatîye dayîn, helbest bi murekeba reş li ser kaxizên kayê bi nivîsa rîqayê hatine nivîsîn. Cihê ku mexlesa Şairî derbaz bûye wî, jorê mexlesê bi murekeba sor xêz kirîye. Qafiyeya helbestan, li gor alfabe ya erebî hatîye rêzkirin û bi murekeba sor di destpêka her qafiyeyê da navê tîpa erebî li derkenarê rûpelê hatîye nivîsîn û li dawîya her rûpela aliyê rastê peyva “reçebeyê” yanê berdewamîyê hatîye nivîsîn û ev yeka ji bûye alîkar ku mirov bizanibe rûpela aliyê çepê bi çi peyvê destpê dîke. Ji ber ku li gor rêza tîpên erebî helbest hatine nivîsîn û rêzkirin mirov dikare bibêje ev dîwan, dîwaneka murettab e. Ketebe ya dîwanê di rûpela yekê da hatîye dayîn û têda dîroka nivîsandina dîwanê tune ye. Di destpêka dîwanê da ji aliyê Şairî ve 4 rûpel lê hatine zêdekirin û di van rûpelan da bi menzûm û pexşanî hinek agahî bi erebî û farisî hatine dayîn. Di rûpela yekem da serlewhe cih digire û ji rûpela duyem da hejmara rûpelan li jorê rûpelê bi murekeba sor hatîye dayîn. Di dawîna rûpelan da Şairî tradîsyona berê neşopandîye û li gor serdema me hejmar daye. Şairî, berîya


ku dest bi helbestên xwe bike cih daye helbesteka Şêx Muşerrefê Xinûkî (1926-2008) ya bi zimanê erebî. Ev yeka jî nişan dide ku wî ji Şêx Muşerrefî zêde hezkirîye. Şairî, di rûpela duyem da piştî nivîsîna besmeleyê dest bi helbesta xwe ya yekem kirîye. Di derkenarên rûpelan da hinek caran haşîye, nîşe û malik hatine nivîsîn û hinek caran jî peyv an jî malik hatine sererastkirin.

Navê Dîwanê	Dîwana Eşar û Qesaîdan
Mijara Dîwanê	Helbest
Muelîf	Nûrullah el-Godîşkî el-Xuyûtî Summe et-Tetwanî
Dîroka Nivîsînê	Ne dîyar e, li gor me di navbera 1950-2003yan e.
Cihê Wê	Pirtûkxaneyay taybet a Mela Sefa Özdemir
Ziman	Kurdî/Erebî//Farisî
Cureyê Nivîsê	Rîka
Cureyê Kaxizê	Kaxeza Kayê
Rengê Murekebê	Reş
Hejmara rûpelan	217
Hejmara rêzan	20
Berg	Kartona Stûr


Helbestên ku di nusxeya Îzmîrê da cih girtine bi tevahî di vê nusxeyê da ji hene. Wisa tê xwîyakirin ku Şairî, helbest li nusxeya Îzmîrê zêdekirine û ev nusxe Tetwanê wekî ya kamil qebûl kirîye û tevahiya helbestên xwe têda bicih kirîye.



(Nusxeya Tetwanê: 1)



(Nusxe ya Tetwanê: 2)



(Nusxe ya Tetwanê: 217)

2.2. Şiklê Tertîbê

Dîwana Mela Nurullahê Godîşkî, diwaneka pirzimanî ye. Di dîwanê da 256 helbest bi kurdî, 66 bi farisî û 44 bi erebî ne. Helbest, li gor zimanan nehatîye dabeşkirin û têkel hatine nivîsîn. Dîwan, dîwaneka murettêb e; lewra qafiyeya wan li gor tîpên alfabe ya erebî hatîye rêzkirin û têda bi piranî cureyên helbestan hene.


2.3. Teşeyên Nezmê

Nusxeya eslî ya dîwanê nusxeya Tetwanê ye û lewra me jî li gor vê nusxeyê agahî dane. Mela Nurullahê Godîşkî, helbestên xwe bi heşt cureyan nivîsîne. Cureyên helbestan bi vî şiklê cih digirin: 156 xezel, 114 qesîde, 58 murebbe', 20 yekmalik, 8 tarîx, 6 mesnewî, 5 muxemmes û 4 jî ruba'î ne. Çawa ku ji vê agahîyê jî tê fêmkirin Godîşkî, di dîwana xwe da bi piranî xezel û qesîde nivîsîne.

Li jêrê cureyên helbestan wekî tablo hatîye dayîn û rêjeya cihgirtina helbestan di dîwanê da jî di grafikeka bi stûn da hatîye nîşandan (Acar, 2016: 84).


Cure	Xezel	Qesîde	Murebbe'	Yekmalik	Tarîx	Mesnewî	Muxemmes	Ruba'î	Yekûn
Hejmar	151	114	58	20	8	6	5	4	366

(Tablo 1: Rêjeya Helbestan li Gor Teşeyên Nezmê)



(Grafîk 1: Rêjeya Helbestan li Gor Teşeyên Nezmê)


Di dîwanê da dema xezel hatine rêzkirin berê xezelên bi farisî pişt ra yên bi erebî û pişt ra jî yên bi kurdî hatine dayîn. Wisa tê xwîyakirin ku Godîşkî, ji xemilandina helbestan hez kirîye û di dîwana xwe da sê helbest xemilandine, ji wana du helbest bi terza muşeccerê nivîsiye. Peyva muşeccerê bi erebî ye, ji lêkera “şe-ce-re”yê hatîye dariştin û di edebiyatê da navê wê helbestê ye ku bi wêneya xwe dişibihe kok û şaxên dara hêşin a ku şaxên wê di nav hev ra darbaz bûne (Durmuş, 2003: 293).



(Muşeccer Xezel: 79)



(Helbesta Xemilandî: 208)



(Muşeccer Xezel: 156)

2.4. Zimanê Helbestan

Dîwana Mela Nurullahê Godîşkî, dîwaneka pirzimanî ye, wî helbestên xwe herî zêde bi zimanê dayîka xwe yanê bi kurdî nivîsiye. Godîşkî piştî kurdî herî zêde bi farisî helbest nivîsiye û pişt ra jî bi erebî nivîsiye. Anegorî tesbîta me Şairî, piraniya cureya qesîde û xezelan bi kurdî û çarîn jî bi erebî nivîsiye. Mela Nurullahî, di helbestên xwe da hinek caran peyvên tirkî û hinek caran jî hevokên tirkî jî bi kar anîye. Bo nimûne:

Saqî meya cama zelal
Bîne *bene olsun helal*
Da dil wekî şem' û şemal
Pur nûr û hem pur sade bit (Godîşkî: 127)

Di vê mînakê da "*bene olsun helal*" bi hatîye gotin.


Xurbet bize zehmet gelîr
Barê giran firqet *gelîr*
Ez dîde sade xûn *gelîr*
Yar görmedim yandim xerîb (Godîşkî: 123)

Çawa di vê çarînê da jî tê xwîyakirin Mela Nûrullahî, di helbesta ku bi redîfa *yandim xerîb*, berdewam dike da peyv û hevokên tirkî ji yên kurdî zêdetir bi kar anîye. Herweha di helbesta Ey Dilbera Horîmîsal (Godîşkî: 155) û Ey Mihribanê 'Aşiqan (Godîşkî: 133) da jî gelek peyvên tirkî emilandîye.

Li jêrê zimanên ku helbest pê hatine nivîsîn di tabloyekê da hatine dayîn û di grafikeka bi stûn da jî rêjeya di nivîsandaina helbestan da bikaranîna zimana hatîye nîşandan.

Cure	Kurdî	Farisî	Erebî	Yekûn
Hejmar	256	66	44	366

(Tablo 2: Rêjeya Helbestan li Gor Zimanan)



(Grafik 2: Rêjeya Helbestan li Gor Zimanan)

2.5. Wezna Helbestan

Mela Nûrullahî, helbestên xwe bi kêşa erûzê nivîsiye. Şairî, di bikaranîna wezna erûzê da zêde serkeftî nîne. Godîşkî di helbestên xwe da behra hezecê, rezecê, remelê û muteqarîbê bi kar anîye. Wisa tê xwîyakirin ku wî zêde ji behra hezec û rezecê hezkirîye û di helbestên xwe da 31 caran qalibên behra hezecê û 29 caran jî qalibên behra rezecê emilandîye. Anegorî tesbîta me Godîşkî di helbestên xwe da ev behr û qalib bi kar anîne.

	Behr	Qalibê Behrê	Bikaranîn
1	Hezec	Me fa 'î lun / Me fa 'î lun / Me fa 'î lun / Me fa 'î lun	19
		Me fa 'î lu / Me fa 'î lu / Me fa 'î lu / Me fa 'î lun	11
		Me fa 'î lu / Me fa 'î lu / Fe 'û lun	1
2	Recez	Mus tef 'î lun/ Mus tef 'î lun / Mus tef 'î lun / Mus tef 'î lun	29
3	Remel	Fa 'î la tun / Fa 'î la tun / Fa 'î la tun / Fa 'î lun	16
4	Muteqarîb	Fe 'û lun/ Fe 'û lun/ Fe 'û lun/ Fe 'ûl	1

(Tablo 3: Behrên ku di Dîwanê da Hatine Bikaranîn)

2.6. Naveroka Dîwanê

Mela Nûrullahê Godîşkî, ji alîyekî ve kesayetekî ehlê medreseyê ye, bi salan di medreseyan da xwendîye, pişt ra melatî û seydatî kirîye û ji alîyê din ve kesekî mutesewwif e. Ji ber vê yekê helbestên wî yê ku di dîwanê da cih digirin jî ji alîyê naverokê ve mijarên dînî û tesewufê ne. Di dîwanê da helbestên ku mijara wan munacat, ne't, şefaetname, tewbename, nedametname, firaqname û mersîye ne bi giranî cih digirin (Kardaş; 2019: 95).

Godîşkî, di dîwanê da gelek qesîdeyên ku mijara wan hezkirina Hz. Pêxember (sx1) e nivîsîne û pişt ra li ser Zekerîya Pêxember (r. 23), Îbrahîm Xelîl Pêxember (r. 23), Uwyselu'l Qarenî (r. 24), şêxên terîqeta xwe wekî Şêx Elauddînî, (r. 29, 38, 39, 55), Seyîd el-Celîl Şêx Ebdulbarî el Kaşaxî (r. 42), Şêx Mihemed Reşîd Hefîd el-Xews el-Hîzanî (r. 43), Şêx Mehsûm Hefîdî (r. 44-45), Şêx Merûfî (r. 46), Şêx Meşûqê kurê Şêx Mehsûmî (r. 49), Şêx Taha Hefîdî (r. 52), Şêx Ebdurezaqî (r. 69-70), Şêx Seyfullahê kurê Şêx Mezherî (r. 70), Şêx Nûreddînê kurê Şêx Ebdulbarî (r. 73) û Şêx Zeynelabidîn el-Fursanî (r.77) mersîye nivîsiye.

Mela Nûrullahî, ji bajarê Bûrsayê gelek hezkirîye û ev hezkirina xwe jî bi helbestekî anîye ziman û têda pesnê vî bajarî daye (r. 26) û herweha ji ber ku Oxîn (r. 70-71) û Werqanis (r. 25) cihên ku şêxên terîqeta wî lê jîyane ye li ser van cihan jî helbest nivîsiye û pesnê wan daye.

Godîşkî, di derheqê siyaseta tirkîyeyê ya wê demê da jî fikr û ramanên xwe anîye ziman û li ser li darvekirina Serokwezîr Ednan Menders jî sê mersîye nivîsîne (r. 80-81) û di mersîyeyan da hezkirina xwe li hember Ednan Menderes (1899-1961) nîşan daye û anîye ziman ku zilmeka mezin li wî hatîye kirin.

Li bajarê Wanê di sala 1976an da erdhejeka mezin çê dibe û di encama vê karesatê da bi hezaran kes li navçeya Çaldîranê û Bêgirê/Muradîyeyê dimirin û bi hezaran kes jî mal û milkê xwe û avahîyên xwe wenda dikin. Godîşkî, ji bo ku vê karesata mezin bîne ziman û ev felaket neyê jibîrkin helbestek nivîsiye (r. 82-83).

Dîsan Mela Nûrullahî, li ser xêr û bereketa girtina rojîya remezanê û rabûna paşîvê jî helbestek nivîsiye. Godîşkî, di dîwanê da dîroka wefata hinek sadat û şêxên terîqeta neqşebendîyan bi helbestekî daye (r. 84) û navê wan bi murekeba sor nivîsiye.

Di dîwanê da di navbera Godîşkî û Xîyasedîn Emre da bi navê Nûrî û Emre mûaşereyeka dirêj derbaz dibe (r. 66-69), cih digire.

Encam

Mela Nurullahê Godîşkî, kesayetekî ehlê medreseyê û tesewufê ye. Ew, bi salan di medreseyan da bi perwerdeya feqîyan ra eleqeder bûye û li dû xwe bi dehan berhem hiştine. Hinek berhem bi nezmê û hinek jî bi peşanî hatine nivîsîn. Di encama vekolînê da em ghiştin van encaman.

Zaroktîya Mela Nurullahî, di nava jîyaneka dijwar da derbaz bûye, ew şeş-heft mehî bûye bavê wî wefat kirîye û dayîka wî jî cara duduyan mêr kirîye lewra ew bi êtîmî mezin bûye. Godîşkî, digel jîyaneka weha dijwar bêhêvî nemaye, destên xwe ji dinyayê venekişandîye û micadela xwe ya jîyanê hetanî roja mirina xwe berdewam kirîye.

Mela Nurullahî, digel melatî û seydatîyê têra xwe şair û edîb e, wî di warê zanista îslamî û edebîyata kurdî da li dû xwe bi dehan berhem hiştine û piranîya berhemên xwe bi zimanê dayîka xwe nivîsîne. Wisa tê xwîyakirin ku wî zimanê dayîkê wekî ayeteka Quranê dîtîye lewra hewl daye ku bi nivîsên xwe zimanê kurdî biparêze.

Du nusxeyên dîwanê hene, yekem nusxe li rojavayê Tirkîyeyê li bajarê Îzmîrê di nav koleksiyona destxetan ya Şükrü Arasan da ye ku ev kes xwedîyê koleksiyoneka destxetan ya taybet e. Nusxeya duduyan jî li navçeya Tetwanê di pirtûkxaneyê Mela Sefa Özdemir da ye ku ev mirov, kurê Mela Nûrullahê Godîşkî ye. Piştî vekolînê me dît ku nusxeya kamil ya Tetwanê ye û ya Îzmîrê tevahîya helbestan di xwe da nahewîne. Wisa tê xwîyakirin ku Godîşkî, di serî da nusxeya Îzmîrê nivîsîye û pişt ra li ser vê nusxeyê gelek helbest zêde kirine.

Dîwana Mela Nûrullahî, dîwaneka pîrzimanî ye yanê wî helbestên xwe digel zimanê kurdî, bi farisî û erebî jî nivîsîye û di nava helbestên xwe da hinek caran peyv an jî hevokên tirkî jî emilandîye.

Zimanê, helbestan zimanekî zelal û herikbar e. Şairî, peyv û têgehên ku maneya wan dijwar e û zêde nayêne fêmkirin, bi kar neanî ye. Wî helbestên xwe bi piranî bi kurdî pişt ra bi farisî û pişt ra jî bi erebî nivîsîye. Şairî, helbestên xwe bi kêşa erûzê nivîsîne lê di bikaranîna kêşa erûzê da zêde serkeftî nîne. Piranîyan helbestan qesîde û xezel in. Ji xeynî van her du cureyan çarîn, mesnewî, yekmalik û ruba'î jî hene.

Mela Nûrullahî, dîwana xwe li gor tîpên erebî bi rêzê nivîsîye û ji ber vê yekê mirov dikare bibêje ev dîwan, dîwaneka muretteb e. Wî, di dîwana xwe da hinek helbestên xwe xemilandine û ji wan helbestên xemilandî du hebên ku bi wêneya xwe muşeccer in di dîwanê da cih digirin. Godîşkî, wekî tradîsyona şairên edebîyata klasîk di helbestên xwe da mexlesa; Nûrullah, Nûrî û Nûrîyê Miskîn bi kar anî ye.

Li gor tesbîta vekolîna me di helbestên Godîşkî da curbicur mijar hene, qesîdeyên wî bi piranî li ser Hz. Pêxember (sxl) hatine nivîsîn yanê ne't in. Hinek caran li ser hezkirina pêxemberên wekî Zekerîya Pêxember û Îbrahîm Xelîl pêxember jî helbest nivîsîne. Wî, bi hejmareka zêde helbest li ser şêxên terîqeta xwe yanê şêxên Werqanîsê û Oxîne nivîsîne.

Di encama vekolînê da derket holê ku Mela Nûrullahî, zêde ji bajarê Bûrsayê hezkirîye lewra wî li ser vî bajarî bi taybetî helbest hûnandîye û herweha li ser erdheja ku di sala 1976an da li navçeya Bêgirî û Çaldîrana bajarê Wanê qewimî bû û bi sedan mirov miribûn û gelek mal wêran bibûn, nivîsîye û li ser serokê partîya demoqrata û serokwezîrê Tirkîyeyê Ednan Menderesê ku ji alîyê leşkeran ve di sala 1961î da hatîye darvekirin jî helbest nivîsîye û di helbestê da hezkirina xwe nîşanî wî daye.

Godîşkî, di helbestên xwe da wefata gelek sadat û şêxên terîqeta xwe daye û bi armanca bala xwîneran bikişîne ser van sadat û şêxan navê wan bi murekeba sor nivîsîye.

Di encama vekolînê da me dît ku Mela Nûrullahî, zêdetir di bin tesîrê Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî û Şêx ‘Ebdirehmanê Axtepî da maye. Godîşkî, li ser helbestên Melayê Cizîrî nazîre nivîsîne, şerha helbestên Feqîyê Teyran kirîye û di helbestên xwe da pesnê Ehmedê Xanî û Şêx ‘Ebdirehmanê Axtepî daye.

Çavkanî

- Adak, A. (2016). “Helbestvanên Klasik ji Perspektîfa Herêmi: Nimûneya Herêma Bedlîsê”, *The Journal of Mesopotamian Studies*, Cild: 1/1, Havîn, rr: 33-56.
- Adak, A. (2019). *Teşeyên Nezmê. İstanbul: Nûbihar.*
- Acar, H. (2016). *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr- Metn û Lêkolîn-. İstanbul: Nûbihar.*
- Bakırhan, C. (2017). *Mele Nurullahê Godîşkî'nin Çenta Yetîman Adlı Eserinin Transkripsiyonu, Türkçeye Çevirisi, Tahlil Ve Tenkidî, Teza Mastîrê, Muş: Zanîngeha Muş Alparslanê, Enstîtuya Zanîstên Cîvakî.*
- Durmuş, İ. (2006). “Müşeccer”. *Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi*. 32: 158-160. İstanbul: TDV
- Ehmedê Xanî. (2014). *Dîwan*, İstanbul: Avesta.
- Godîşkî, M. N. (2001). *Çenta Yetîman, Nusxeya Nû ya Destxeta Orjînal.*
- Kardaş, S. (2019). “Divan Yazma Geleneğinin Son Halkası: Nûrî Divanı”, *Tarihî ve Kültürel Dokusuyla Koğak*, İstanbul, Çizgi Kitabevi.
- Mela Nûrullahê Godîşkî, *Dîwan, Nusxeya orjînal, di pirtûkxaneyê kurê wî Mela Sefa da.*
- Molla Halil Siirdî, *Nehcû'l-Enâm*, Milli Kütüphaneyê, No: 06 MK. Yz. B 70.
- Molla Halil Siirdî, *Nehcû'l-Enâm*, Milli Kütüphaneyê, No: 06 MK. Yz. A 5752.
- Molla Halil Siirdî, *Nehcû'l-Enâm*, Milli Kütüphaneyê, No: 06 MK. Yz. A 5771.
- Sağrıç, F. H. (2002). *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Stenbol, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Sönmez, N. (2018). *Dîwana Şêx Muşerrefê Xînikî-Metn û Lêkolîn- Diyarbakir: Seyda Kitabevi.*
- Sönmez, N. (2020). *Hevpeyvîn bi Mela Sefa Özdemirê kurê Mela Nûrullahê Godîşkî re, (Tetwan, 12. 05. 2020, saet: 18:30).*
- Titiz, F. (2020). *el-Cewahîru'r Reşadiye fî Sireti'n-Nebewîyye ya Mela Nûrullahê Godîşkî-Metn û Lêkolîn û Ferheng- Teza Lîsansa Bilind, Bingöl: Zanîngeha Bingölê, Enstîtuya Zîmanên Jîndar.*
- Werqanîsî, Şêx Fethullah. (2007). *el-Hemâilu Fiş 'Şemâil*, İstanbul: Doz.
- Zivingî, Ehmed b. el-Mulla Muhemmed ez-Zivingî. (bd). *el-'Eqdu'l-Cewherîyyu fî Şerhî Dîwan eş-Şeyx el Cezerî, bê cih, Weşanxane, (?)*.

Pêvek

Wekî Mînak Çend Helbestên Mela Nurullahê Godîşkî

Ya Resûlellah

Fa'î la tun / Fa 'î la tun / Fa'î la tun / Fa'î lun
- . - -/-.--/-.--/-.--
Ya Resûlellah daxilî erd û dergahê te me
Tu şefae't ke hebîbellah ricakarê te me
Ez firarê nefis û şeytan im barekellha teva
Wer xwey curmê giran im daxili darê te me
Min nehêle girtiyê şeytan û şûmê nefse bed
Multecî me bal te va ber xan û dîwarê te me
Min per û bask şikestîne di tîpa duşmenan
Lêk parastî bi dengê û bangekî ferwarê te me
Min hila ye barî 'îsyân û be yalî te qetîm
Be ûmîda barî rakey her di fizarê te me
Ez bi mêhvanî be dergahê te nîm xeyre'l-beşer
Lutf û îhsan zêde daxwaza min e zarê te me
Dilxoşem ku tu kerîm î ey kerîmê cem Xuda
Nîne hacet 'erzê hacet nazirî karê te me
'Ehd û mîsaqa te ye ku me rihakey ez nekal
'Ehdê reb jî ba te ye wey ez fidakarê te me
Ya Resûlellah giran e barê 'îsyânî di min
Min nihe taqet ku hildem pur stûxawrê te me
Wer çî naçiz û heqîr û şermîyê rûyê te bim
Lêk ferdek ummet û hem dilbirîndarê te me
Pur dîlfîkar im ji teşmîta 'eduwê şeytanê bed
Min neke xemgîn û wî dilşa ricakarê te me
Lew ku muhtacî te ne cumle ûlu'l-'ezmê kiram
Hem tu pur payebilind î hem xwehişyarê te me
Bende me hem bo kerîmanê di eshabî di te
Xadimê wan çarîyar û alî ebrarê te me
Ya Hebîbellah bibexşîn min bi wan sadedilan
Wer çî naşayisteê zumreê salarî te me
Nûrî dil rehber ke bo vê nûdîyê kel biderî
Dilxoş û hem rohnî dilke dilxoşê barê te me (Godîşkî: 2-3)

Horîya Ridwanê Xeybê

Fa 'i la tun / Fa 'i la tun / Fa 'i la tun / Fa 'i lun

-.--/-.--/-.--/-.--/

Horîya Ridwanê Xeybê rehmê ke tu li îştîyaq
Wesletê ferman bike ah ez fîraq ah ez fîraq
Sunbulan xalan veşarin ma tu nişanî mi ke
Wer nekey ma li me ferz e sefera Şam û Iraq
Lutf û îhsanê dixwazin ji te ey Şahê Cemal
Carekê kifş e ji Leyla reş bike neyyir dêfaq
Mihnetê zalim evînê kî dîye medhûş e lew
Derdekî zor û giran e qet bi kes naket rîfaq
Esera daxê evînê pur di dil kir cerh û key
Vê demê hîva dunî me mu'cizê da inşîyaq
Qameta yek tayê nazik zahidan me'zûr diket
'Abidan mehbûsê zulfeş mî neyabend întîlaq
Qedr û hurmet pur bizanin behrê Nûrî lew ku wî
Ji hemî ser xwe nivîsî soz û germî û ihtîraq (Godîşkî: 153)

Şewq û Zewqa Dilberan

Fa 'i la tun / Fa 'i la tun / Fa 'i la tun / Fa 'i lun

-.--/-.--/-.--/-.--/

Şewq û zewqa dilberan suhtim wekî şem' û şemal
Ez 'elîl im bê dewam e der fena me ber cemal
Derdê mehbûban heland im şubhetî pêt û pereng
Di iftîraqê ji ihtîraqê dil diket axîn û nal
Ah û efxanê me têtin daîma ji balê berîn
Lehzeya dilber xuya ket dil diçî zulfê şepal
Huzn û xem zêde dibin hîna hebîb tête dîyar
Çeşm û ebrû tîr li dil dan min kirin bê î'tidal
Hiş tune sewda û dîn em ger nebînim dîlberê
Xalîyê ji şem'an dimînim zar û bê 'eql û kemal
Xozîya roja wîsalê ku tewaf kem dilberê
Meqsedan pêkve bigêjim bêm selama zulf û xal
Zulf û xalan pêkve Nûrullah kirne esîrê çengilan
Pur ze'îf e hal tunîne zer bûye mislê hîlal (Godîşkî: 155-156)

Bîst û Neh Teyr

Fa 'i la tun / Fa 'i la tun / Fa 'i la tun / Fa 'i lun

-.--/-.--/-.--/-.--/

Bîst û neh teyrê çîne hêlûn vedane panzde cî
Nîne qet yek di semaê lê di erdê yek bicî (Godîşkî: 1)

MEWLÛDA NETEMAM YA ŞÊX QUTBEDÎNÊ KORÎKÎ: AWIRVEDANEK LI SER TAYBETMENDIYÊN ZIMANÎ YÊN METNÊ

Zafer AÇAR,

Dr. Öğretim Üyesi, Bingöl Üniversitesi, Kürt Dili
ve Edebiyatı Anabilim Dalı,
zafer13acar65@gmail.com,
ORCID: 0000-0001-5323-9531

Zafer AÇAR

Article Type/Makale Türü:

Research Article/Araştırma Makalesi

Received / Makale Geliş Tarihi: 05.09.2023

Accepted / Makale Kabul Tarihi: 25.09.2023

Published / Makale Yayın Tarihi: 20.10.2023

DOI: 10.35859/jms.2023.1355769

Değerlendirme ve İntihal/Reviewing and

Plagiarism:

Bu makale iki taraflı kör hakem sistemine göre
en az iki hakem tarafından değerlendirilmiştir.
Makale intihal.net adlı intihal sitesinde
taranmıştır. / This article has been reviewed
by at least two anonym reviewers and scanned
by intihal.net plagiarism website.

Citation/Atrf:

Açar, Z. (2023). Mewlûda Netemam ya
Şêx Qutbedînê Korîkî: Awirvedanek li ser
Taybetmendiye Zimanî yên Metnê, The Journal
of Mesopotamian Studies, Jimara Taybet a
Edebiyata Kurdî ya Klasîk, rr. 85-113,
DOI: 10.35859/jms.2023.1355769.

KURTE

Wekî cureyeke edebiyata klasîk Mewlûd siyerên menzûm in û di edebiyatên gelên misliman de cihekî girîng digirin. Di Edebiyata Klasîk a Kurdî de jî vê cureyê bi Melayê Bateyî dest pê kiriye û nivîsandina van berheman îro jî dewam dike. Mewlûda Şêx Qutbeddîn Korîkî jî yek ji van Mewlûdan e lê Korîkî berhema xwe neqedandiye. Mewlûda wî xêncî malika dîsgotinê, serhev heştê û sê malik in. Ji bo ku nîrxandina hêla edebî ya berhemên nivîskî tewtîbûnê dixwaze, ev xebat ji bilî hin agahiyên giştî yên derbarê edebiyata metnê, lêkolîna zimanê metnê dike mijar ku ew jî ji fonolojiyê bûyerên dangan, ji morfositaksê jî hin mijarên serekî ne ku xusûsiyetên ast û şiyana zimên a şairî dinimîn. Bi vî şiklî tê armanckirin ku resmeke giştî ya şiyana şairî ya li ser zimanê wî, devoka wî û zanîna wî ya devokên kurmançî yên mayîn bê diyarkirin. Di encama vê lêkolînê de hat dîtin ku bûyerên dangan têkilî ladan û axaftina rojane ne, şair devokên curedar ên kurmançî dizane, di metna xwe de hêmanên morfositaktîk bi hostayî bi kar anîye û bi vî awayî zimanekî belîx ê mewlûda xwe heye.

Peyvên Sereke: Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Mewlûd, Şêx Qutbeddîn Korîkî, Lêkolîna zimanî.

Şeyh Kutbeddin Koriki'nin Tamamlanmamış Mevlidi: Metnin Dil Özelliklerine Genel Bir Bakış

ÖZ

Klasik edebiyatın bir türü olarak Mevlid manzum siyerlere örnek olarak müslüman halkların hayatında önemli bir yere sahiptir. Klasik Kürt Edebiyatında Melayê Bateyî ile başlayan bu türün yazımı günümüzde de devam etmektedir. Şeyh Kudbeddin Koriki'nin mevlidi de bu esrlerden biridir. Yazımı tamamlanmamış olan bu eser, nakarat beyiti hariç olmak üzere toplam seksen üç beyitten oluşmaktadır. Edebi eserleri değerlendirmek için eserin bütünlüğü önemli olduğu için araştırmamız eserin edebi yönüyle ilgili bazı genel bilgiler dışında dil özelliklerine odaklanmaktadır. Metnin ses bilgisi ile ilgili olarak ses olayları mercek altına alınmış, şairin dil seviyesi ve kabiliyetini ortaya koyabilecek önemli morfosentaktik konular da incelenmiştir. Sonuç olarak ses olaylarının günlük konuşma ve şiirdeki ölçü ve ahenk uyumu için yapılan sapmalar olduğu görülmüş, metinde kullanılan ifade ve kalıplardan ve morfosentaktik unsurlardan şairin zengin, sade ve belîğ bir anlatıma sahip olduğu görülmüştür. Bu anlamda şairin metninde kullandığı dilden yola çıkarak onun Kürtçe'nin Kurmanci lehçesinin farklı ağzlarına aşına olduğunu ortaya koymak bu araştırmanın amaçlarından biridir.

Anahtar Kelimeler: Klasik Kürt Edebiyatı, Mevlid, Şeyh Kutbeddin Koriki, Dil incelemesi.

Sheikh Kutbeddin Koriki's Incomplete Mawlid: An Overview of the Linguistic Features of the Text

ABSTRACT

Mawlid, a genre within classical literature, holds a significant place in the lives of Muslim communities, serving as an exemplar of verse siyars. This genre, originating with Melayê Bateyî in Classical Kurdish Literature, persists to this day, with Sheikh Kudbeddin Koriki's Mawlid being one such work. Comprising a total of 83 couplets, excluding the refrain couplet, this work remains incomplete. In our study, we emphasize the importance of evaluating literary works based on their integrity, focusing on linguistic features alongside providing general insights into the work's literary aspects. We delve into sound elements related to the text's phonology, as well as critical morphosyntactic aspects that shed light on the poet's language proficiency and skill. As a result, it becomes apparent that sound events serve as deliberate deviations for the sake of rhythmic and melodic harmony, both in everyday speech and poetry. Additionally, the text reveals the poet's proficiency, evident in the richness, simplicity, and eloquence of expressions, patterns, and morphosyntactic elements employed. Consequently, one of the primary objectives of this research is to demonstrate the poet's familiarity with various dialects of the Kurmanci dialect of Kurdish, as reflected in the language used throughout the text.

Keywords: Classical Kurdish Literature, Mawlid, Sheikh Kudbeddin Koriki, Language review.

EXTENDED ABSTRACT

As a genre of classical literature, Mawlid has an important place in the lives of Muslim peoples as an example of poetic *siyar*. The writing of this genre, which started with Melayê Bateyî in classical Kurdish literature, continues today. Sheikh Qutbeddin Korikî's mawlid is one of these works. This unfinished work consists of a total of eighty-three couplets, excluding the repetitions of the refrain couplet.

Sheikh Qutbeddîn Korikî, known by the pseudonym Xakî (Khakî), was born in 1916 in a neighborhood of Batman, Turkey. He died in the same city in 1979 at the age of 63. After completing his madrasa education, Korikî received a religious *ijazah* from the Naqshbandi Order along with his scientific *ijazah*. He received his *tariqa* from Sheikh Seyda Cezeri. Korikî's Kurdish works include a verse *aqedahnama*, three poems and an unfinished mawlid. He also wrote some *qasida* in Arabic and wrote a legend about his teacher Sheikh Seyda. Our study focuses on Sheikh Qutbeddin Korikî's unfinished mawlid among his works.

Since the integrity of the work is important for evaluating literary works, our research focuses on the language features of the work, apart from some general information about the literary aspect of the work. Regarding the literary aspect of the text, it can be said that a plain and clear language is used, the poetic style specific to mawlids is adhered to and it is seen that it has a fluent style. It is also important to note that the poet was influenced by Melaye Batêyi's mawlid both in terms of subject matter and style. On the other hand, our research focused on the characteristics of the text, and while analyzing these characteristics, we focused especially on the phonology and some morphosyntactic features of the text.

Since this study deals with a text belonging to the field of Classical Literature, it is handled with a text-linguistic approach. In addition, while analyzing the language features of the text, attention was drawn to the dialectal features used by the poet, which is included in the field of dialectology in linguistic studies. Likewise, the language features were analyzed from a synchronic perspective, because when analyzing the language, two different periods were not compared, but the variants within the same period were taken as basis.

When we examine the text in terms of phonology, as seen in many works of classical literature, in this text, in addition to the standard sounds in Kurdish, Arabic sounds that are not in Kurdish are also used. In our research, the letters representing Arabic sounds were transcribed and their Latin-Kurdish equivalents are given in the method section of the study. Again, sound events that are worth analyzing in the text are scrutinized; examples of events such as sound drop, derivation, change and contraction are presented. The following can be said about the sound events in the text: The vowel "i" and the consonants "t" and "n" are particularly common. Regarding sound twinning, this event is seen especially in Arabic words. In Kurdish words that require sound doubling, the Arabic symbol for this, the *shadda*, was not used. Again, examples of sound changes are "e > a, i > e, e > û, f > v". Another phonetic phenomenon is contraction, for which the poet uses the short and long forms found in different dialects of Kurmanji. For example, while he prefers the long variant "çehv", he prefers the contracted variant "cî" of the word "cih".

On the other hand, examples are given from the morphology and syntax of the text such as future tense morpheme, conjugation of some verbs, ergative feature, inflection of masculine nouns, final prepositions from compound prepositions, different variants of some words in dialects. If we give an example; the poet used both future tense morphemes "dê" once and "wê" more often. Again, in one couplet, the poet uses the standard form of the verb "bun" but also uses the Botan variant form. This can also be seen in the use of the verb "heyin". Among the final prepositions of compound

prepositions, he uses Botan-Behdinan variants "de" and "re", and the final preposition "ve" is used as "va", which is the Serhad-Berfirat variant. Likewise, examples of the poet's use of Kurmanji dialectal variants include forms such as "cî-cih, bira-bila, xweş-xoş, xwe-xu, xwendin-xundin".

Although the dominant dialect in the works of classical Kurdish literature is usually the Botan-Behdinan variant of Kurmanji, some poets also include some features of their own dialects in their works. In addition, since they learned other dialects of Kurmanji in the tradition of studying in madrasahs and as imams after receiving an Ijazah, it is possible to see uses other than the standard dialect in their works. In this respect, Korikî's work is noteworthy and contains data that will inspire future research in this field.

In conclusion, Sheikh Qutbeddîn Korikî, one of the last poets of Kurdish Classical Literature, wrote a mawlid in Kurdish in addition to his aqedah and poems, but he did not complete his mawlid. His mawlid consists of 83 couplets in total, excluding the repetitions of the refrain couplet. In our study, in which we examined the linguistic features of the mawlid, it was seen that the sounds that are not in Kurdish but exist in Arabic were used in the context of phonetic features, and regarding the sound events, it was determined that the sound drops and sound derivations in the text were due to deviations made to catch the harmony of meter and harmony in the poem, the sound twinning within words was seen in Arabic words, and the sound drops and sound changes were generally due to the dialectal features and daily speech style used by the poet. In terms of morphosyntactic features, the poet preserved the ergative structure except for one example, did not preserve grammatical features in the inflection of masculine nouns, and used the future tense morpheme in the variant of Botan-Behdinan in one place, but mostly in the variant common in the dialects of Serhad-Garzan-Berferat. Nevertheless, by using grammatical and lexical features specific to different dialects of Kurmanji, Koriki shows that he is familiar with these dialects, or more accurately, that he knows and uses them.

Destpêk

Ji bo lêkolînên ser zimanekî û eger hebe edebiyata bi wî zimanî hatiye îcrakirin, metnên zarî û nivîskî agahiyên girîng dihewînin ku dikevine ber lêkolînên zimannasiya metnî (ing. *text linguistic*). Têkilî xebatên li ser metnan li Rojava lîteratureke gur û geş heye ku di vê derbarê de cara pêşîn têgeha analîza gotarê (discourse analysis) Harris (1952), têgeha zimannasiya metnî jî Coseriu (1955) bi kar aniyê (Aksan û Aksan, 1991: 99; Vitacolonna, 1988; Beaugrande, 1985). Îja ji van metnan yên nivîskî xusûsên yên helbestkî zêdetir dibin materyalên lêkolînên edebî ku pirî caran zimanê wan tê îhmalkirin yan jî bi qasî edebiyata wan nakeve ber lêpîrsîn û lêkolîn. Îja ji gelek cureyên edebî mewlûd jî metnên edebiyata klasîk in ku piranî lêkolîn li ser aliyê wan yê edebî û carna jî çandî tê kirin. Hal ew e ku ev metn ji bo xebatên dialektolojiyê (zaravanasî) yê zimanekî girîng in; derbarê gramera zimên de agahiyên şênber didin, devok û diyalekta hakim ya serdemê dinimînin û dîsa ji aliyê leksikolojiyê (ferhengnasî) ve jî melzemeyekî girîng dihewînin. Herwiha ew pirî caran şewaza edebî û ya zimanî ya şair an jî nivîskar diyar dikin ku li gorî Enkvist (1973: 16) şewaz yek ji tîpên cureyên zimanî ye tevî cureyên din yên wekî demborî/demkî, herêmî, diyalektên sosyal (komezar), îdyolekt (takezar). Îja yek ji armanca vê xebatê jî nişandana xusûsiyetên zimanê metnê/şairî ye ku hêlekî ve temasî şewaza zimanî ya metnê dike.

Korikî û Mewlûda Wî

Mewlûd peyve erebî ye ku pirjimara wê *mewlûd* e û maneya wê ya ferhengî ya erebî “jidayîkbûn” yan jî “dema jidayîkbûn”ê ye (Kızıl, 2018: 1038; Maoluf, 1973) Mewlûd bi demê re bûye navê berhemên edebî yên rojbûna Hz. Pêxember, dema jidayîkbûna wî, cihê jidayîkbûna wî, jiyana wî, mûcîzeyên wî, xezayên wî, exlaq û wefata dihewînin îfade dike yan jî navê rêwresman ku tê de ev berhem têne xwendin. (Öztürk, 2018: 393; Akdağ, 2008: 85; Akyılmaz, 1999: 196; İçli, 2012: 1501).

Ji bo ku mewlûd şiyerên menzûm in û xwedî îfadeyeke helbestkî ne, meriv dikare bêje ew nişaneyên mihebeta şairan e ya ji bo Cenabê Pêxember (sew.). Îja ji ber vê mihebetê ye ku ji mewlûda yekem vir de di nava gelên misliman de ev berhem hatine nivîsandin ji aliyê şairan ve.

Ji xebatên lîteraturê em fêhm dikin ku mewlûd wekî berhem cara pêşîn bi erebî hatine nivîsandin û ew tradîsyon ji erebî derbasî zimanên devdorê bûye (Çağmar, 2004: 13) Wekî rêwresm jî di serdema Dewleta Fatimiyên de dest pê kiriye û Muzaferuddîn Gokborî (m.1232) yê zavayê Selaheddîn Eyyûbî ev rêwresm li Îran, Anatoliya û Sûrî belav kiriye (Pakalın, 1993: 552). Îja Edebiyata Kurdî ya Klasîk jî ji vê cureyê bêpar nemaye, şair û seydayan bi hemû diyalektên kurdî, xusûsên jî bi kurmançî ev mesnewî li qelemê dane. Li gorî amarên ku Ertekin (2022: 137-140) dide heta niha bi kurmançî 46ên wê telîf, 2 jê werger 48 mewlûd; bi zazakî 9, bi soranî 23 û bi hewramî 4 mewlûdên telîf hatine nivîsandin. Wekî agahiyeke melûm Mewlûda pêşîn a kurmançî Melayê Bateyî dinivîse, piştî navbireke dirêj mewlûdên kurmançî dîsa tînin nivîsandin ku îro jî ev tradîsyon berdewam e. Ji van Mewlûdên kurmançî yek jî Mewlûda Şêx Qutbeddîn Korikî ye ku ketiye ber vê lêkolînê.

Şêx Qutbeddîn Korikî yê bi nasnav Xakî, di sala 1916an de li gundê Korikê bûye ku niha taxeke Batmanê ye, dîsa li heman bajarî di sala 1979an de, di 63 saliya xwe de wefat dike. Piştî ku xwendina xwe ya medreseyê diqedîne ew destûrnameya xwe ya ilmî û herwiha ya terîqeta Neqşîbendî ji Şêx Seyda Cizîrî distîne. Korikî, wekî berhem; bi kurdî eqîdenameyeke menzûm, sê helbest û mewlûdnameyeke neqediyayî û bi erebî jî hin qesîde û menqibeyeke derheq Şêx Seyda hiştiye (Yurt, 2020: 79).

Ev xebata ku Mewlûda Korikî/Xakî vedikole, digel hin agahiyên tîkilî taybetiyên metnê yên edebî ew bêtir li ser zimanê metnê hûr dibe. Çunkî ji bo ku metnê temam nebûye anku nivîşkan maye, lêkolîna wê ya edebî jî ber ne-tewtîbûna metnê ew ê kêmbimîne loma lêkolîn ne li ser edebiyata metnê lê li ser xusûsiyetên zimanî yên metnê disekine.

Rêbaza lêkolînê

Ev xebat ji aliyê kereste û materyalê xwe ve dikeve sehaya zimannasiya metnî (ing. *text linguistic*) ji aliyê lêkolînê ve jî dikeve sehaya zaravansiyê (ing. *dialectology*) û herwiha ji bo ku hin xusûsiyetên devokan dide ber hev dikeve nav sehaya zimannasiya danberhevî (ing. *comparative linguistic*). Îja wekî teknîk jî rêbaza senkronîk bi kar tîne ku di heman demê de rewşa zimanê metnekê dinirxîne.

Xebata me ji bo ku xusûsiyetên serekî yên zimanê metneke klasîk vedikole, me pêşî anî metna mewlûdê transkrîbe kir. Ji bo ku nusxeyeke din ya vê metnê tune danberheveke van nusxeyan hewce nekir. Piştî ku me destxeta metna Mewlûdê transkrîbe kir, me berê xwe da xusûsiyetên metnê û me ew analîz kir. Ji bo transkrîpsiyonê me karakterên li jêr bikaranîn:

Karakterên erebî	Berdêla wan ya latînî	
ث	ṯ	Ṣ
ح	ḥ	Ḥ
ذ	ẓ	Ẓ
ص	ṣ	Ṣ
ض	ẓ, ḍ	Ẓ
ط	ṭ	Ṭ
ظ	ẓ	Ẓ
ع	‘	
غ	ḡ	Ḫ
ء	’	’
Apostrof	’	

Tabloya karakterên transkrîpsiyonê

1. Lêkolîna Metna Mewlûdê

Wekî ku tê zanîn, du rehendên serekî yên metnên menzûm hene ku ew jî edebiyat û zimanê wê ne. Berê jî amaje pê hatibû kirin mijara vê lêkolînê zimanê metna navhatî ye loma tenê çend agahiyên girîng derbarê edebiyata metnê de ew ê bê dan paşê lêkolîn ew ê li ser xalên girîng ên zimanê metnê be ku bi vê, em ê bidine xwe seba aliyên cîyawaz yên zimanî yên vê metnê derxin.

1.1. Edebiyat

Wekî agahiyeke melûm e ji lêkolînerên sehaya edebiyata klasîk re ku mewlûd menzûmeyên edebî ne û ji ber hestên gurr ê vegêrana nezmê helbest in. Herwiha Di edebiyata klasîk de ji bo ku teşeyên nezmê li ser qaliban saz dibin û xwedî weznê ne lêkolîner berî ku berhema edebî ya klasîk vekolin pêşiyê wê bi qalib û wezna wê ve nas dikin û pênase dikin.

Îja Mewlûda Korîkî/Xakî jî wekî ku Yurt (2020: 81) derdibirre li ser qalibê erûzê *Fa'ilatun Fa'ilun* ya behra remel saz bûye. Dîsa li gorî Yurt Korîkî çendî Mewlûda xwe li ser beşan

dabeş nekiribe jî ji qismên mewlûdê yên Hemdê Xwedê, Pesnê Pêxember, Xêra Xwendina Mewlûdê û Afirandina Nûra Pêxember herwiha dîsgotinên mewlûdê ve di bin tesîra mewlûda Bateyî de maye. Heta li gorî Ertekin (2015: 102) mewlûdên ku piştî ya Bateyî hatine nivîsandin piranî yan wergera ya Bateyî ne yan jî teqlîd an nezîre ne ji ya Bateyî re. Herwiha Ertekin belavnebûn û meşhûrnebûna mewlûdên din bi edebiyat û selaseta raser a Mewlûda Bateyî ve girêdide. Îja Mewlûda Korîkî ji gelek aliyan ve bişibe Mewlûda Bateyî jî, ew ji aliyê uslûba edebî ve xwedî îfadeyeke belîx e, digel peyv û terkîbên erebî û farisî jî zimanê wê ne giran e, zimanekî hêsan û edebî bi kar aniyê.

Wekî di qismê destpêkê de jî me gotibû lêkolîna vê xebatê ji bo ku li ser zimanê wê hûr dibe, aliyê wî yê edebî ew ê nekeve ber lêkolînê.

1.2. Ziman

Zimanê Korîkî eger em li devoka wî ya xusûsî binêrin; wekî ku Yurt (2020: 91-92) jî derdibirre ew di piraniya emrê xwe de li Batmanê jiyaye, lê li deverên din yên kurdan geriyaye bo nimûne li Wanê û navçeya wê Qelqeliyê û şagirtên wî yên ji deverine din hebûne ku vê jî hiştiye ew li devokên din ên kurmançî agahdar be. Herwiha zanîna wî ya zimanên erebî û farisî û hindik be jî tirkî tesîr li ziman û vegêrana wî kiriye.

Di vê beşê de, em ê li ser xusûsiyetên fonolojîk û morfolosentaktîk yên metnê bisekinin û nimûneyên xwe ji mijarên girîng yên ast, agahî û şiyana şairî dinimînin bidin.

1.2.1. Fonolojî

Ji aliyê fonolojîk ve meriv dikare bêje wekî gelek berhemên edebiyata klasîk ev metin jî xêncî dengên kurmançî yên standart yên di alfabe ya erebî de bi herfan tene temsîl kirin, ew dengên biyanî, xusûsen jî yên erebî di hewîne ku di transkrîpsiyonê de temsîla wan dangan di beşa Rêbaza Lêkolînê de hatiye dan.

Agahiyeke melûm ji bo lêkolînerên seha şîira klasîk lihevhatina dangan ya di şîirê de ye ku wekî aheng û rîtmî şîirê di lîteraturê de gelek xebat ser hatine kirin. Di lîteratura Rojavayî de ev mijar wekî “phonostylistics/fonostîlistîk” e. (Adak 2017; Aytaç 2016). Loma ya girîng di vê metnê de bûyerên dangan in ku em ê ji ketin, dariştin, dubarebûn û guherîna dangan nîşan bidin.

1.2.1.1. Bûyerên Dangan

Di metnên klasîk de eger ji bikaranîna formeke devokî nebe, şair; ketin, dariştin, dirêj kirin û kurt kirina dangan piranî bi mebesta wezna şîira xwe dikin ku ev jî mijara şewaza şair e û wekî ladan ketiye lîteraturê. Çunkî di lêkolînên fonetîk yên metna zimanekî de ladan mijareke serekî ye. Helbestvan ji bo ahenga zimanê metna xwe carna ji zimanê berbelav û hevpar yê dema xwe vediqete û nimûneyên ladanê dide. Çetin (2004: 171-172) ladana dangan wekî; ketina dengdaran, lêzêdekirina dengdaran, taybetiyên devokî, dirêj kirina dengdaran, ketina dengdaran, guherîna dengdaran tesnîf dike. Di binbeşên li jêr em ê ji van bûyerên dangan nimûneyan pêşkêş bikin.

1.2.1.1.1. Ketina dangan

Di metnê de, ketina dengdaran; 1) di peyvên erebî de ji ber şeweya bilêvkirina wan ya kurdî, bn: şukr (1/1), misl (16/1), qebr (70/1), 2) têkilî aheng û lihevanîna wezn û serwayê, bn: bimre (46/2), bixemlîne (49/1), biherkin (20/2), bişewtîne (50/1), l'qiyametê (51/2), bicvîne (58/2), sebebyet (60/1) ketina dengdaran heye. Heçî dengdar in xusûsen jî di dawiya peyvên de heye ku di zimanê axaftinê de ketina dengên “t” û “n” yê berbelav e. Bn: digo (40/1), mizgîniya (30/2), birçiya (35/1), pera (57/1).

1.2.1.1.2. Dariştina dangan

Di Mewlûdê Korîkî de dariştina dengdêran ji ber lihevanîna weznê pêk hatine. Bn: çari çem (20/2), çihar (80/2).

Dengdarên metnê jî, xusûsen di peyvên erebî de, wekî ku di eslê wan de heye dengên cot hatiye parastin ku bi şeddeyê ew hatiye nîşankiririn. Bn: “rebb (1/2), ummet (3/1), cennat (9/2), cedd (21/1), muferrah (33/1), ... nubuwwet (83/1)” Li aliyekî din di peyvên kurdî de, dengdarên ku di bilêvkirinê de cot dertên bi şeddeyê nîşan nebûne. Bn: “berr (8/1), kerr (8/1), purr (10/2)...” Çendî di kurdî de coddengî kêm be jî di hin peyvên de xusûsen nîşannedana dengî maneyê diguherîne. Bo nimûne: “ker” wekî; 1) nabihîz, 2) perçe, 3) heywana barkêş sê peyvên jêv cuda ne û eger di metnê de bi peywenda peyv û îfadeyan dernekeve dihêle mane xira be.

1.2.1.1.3. Guherîna dangan

Di metnê de zêde nebe jî guherîna dangan heye. “e > a, mah (16/1), mazin “(33/2), “i > e, axerîn” (29/1), “i > e, xelas “, “e > û, vexû” (30/2), “f > v, zehv” (37/1).

Dîsa yek ji guherîna dengdaran a berbelav guherîna “h > y”yê ye ku şair di çend nimûneyan de denge “h”yê tercih kiriye, wekî: rohnî (18/1), şahî (66/1).

1.2.1.1.4. Racivîn

Di kurmançî de yek ji bûyerên fonolojîk jî racivîn e ku li gorî Bedirxan (2000: 60-62) meyleke peyvên ya ber bi kurtbûnê heye. Ê jî van peyvên wî nimûneyên nas di berhema xwe de daye. Ev peyvên hane wekî varyanta dirêj û ya kurt jî tên binavkirin ku kurtbûna van peyvên re racivîn hatiye gotin. Di mewlûda xwe de, şair varyantek tenê tercih nekiriye anku em ji ber terciha wî nikarin derbarê devoka wî de biryarekê bidin. Bo nimûne, wî peyva “çehv” tercih kiriye, ne ya racivî “çav” lê di heman metne de peyva racivî “cî” tercih kiriye ne “cih”. Hin peyvên ku wî bikaranîne yên dibine mijara racivînê ev in:

rohnî (18/1), hîv (22/1), bêhn (49/2), şahî (66/1), çehv (69/1), cî (79/2).

Ji bilî van nimûneyan di berhemê de bi rêya ketina heceyan awayê kurt yê peyvên hatiye bikaranîn ku ew jî nîşan dide di van nimûneyan de şair forma devokî yan jî axaftina rojane bi kar tîne. Bn:

“Cadde” ne wekî “caddeya” wekî “cada” (12/1), lêkera kirinê di rewşa fermanî de ne wekî “bike” wekî “ke” (13/2), “çiya” ne wekî çiyayekî wekî çiyakî (34/2), “lembe” ne wekî lembeyê wekî lembê (48/2)

1.2.2. Morfosentaks

Di xebatên bi vî teherî de ji bo analîzên diyalektolojîk problemek heye ku ew jî ne xwerûbûna devoka şair e. Anku şairê metnê piranî bi devoka standart a şîra kurdî binivîse jî ew carna ji devoka xwe carna jî -ji bo ku li gelek deverên kurdî geriyaye anku li deverên çiyawaz medrese xwendiyê- hin qalib û îfadeyên deverine din jî di berhema xwe de bi cih dike loma zor e meriv devokên kurmançî yên xasî şairan ji berhemên wan derxe. Lê eger em awirekî giştî bidine ser zimanê metnê em dibînin ku digel hin qalib û îfadeyên devokî şairî devoka standart a Edebiyata Klasîk a Kurdî bi kar aniye. Dîsa jî di berhemê de çî ji aliyê rêzimanê ve çî jî ji aliyê ferhengê ve be şair peyv û îfade bi kar anîne ku ji devokên curedar yên kurmançî ne. Bo nimûne:

1.2.2.1. Morfema dema bê:

Di kurmançî de, xusûsen di devoka berhemên klasîk de morfema dema bê wekî “dê” bi kar tê ku di devokên din yê kurmançî de wekî “ê/yê” û “wê” jî heye. Di vê berhemê de em dibînin ku şair piranî şeweya der-Botî-Behdînanî bi kar tîne:

Wê mufferreh be di nava meşşerê
Hem vexû avê ji hewzê kewşerê

Di malikên 42, 46, 51, 52, 53, 57, 61 û 71an de jî heman morfem hatiye bikaranîn. Lê di malika 68an de morfema “de”yê bi kar tîne.

Kî bide xundina mewlûdê di mala xu de
Dê Xuda hîfz ke ji dij û hasid e

1.2.2.2. Kişandin û Bikaranîna hin Lêkeran:

Nimûneyeke din jî lêkera “bûn” e ye ku şair li cihekî (malika 55an) bi şeweya standart, di malika 64an de bi şeweya Devoka Botanê kişandiye:

Herçî tiştê ku ji van tevli bibe
Pir teberrik hem gelek zêde dibe

Hem Celaluddîn riwayet kirebî
Herçiyê lê bixûnin mewlûda nebî

Herwiha di malika 72yan de lêkera “heyin” bi şeweya Botî hatiye kişandin:

Ew kesê hubba nebî di qelbê de hebî
Ev qeder e jê re bizan (yeqîn) kafî dibî

Wekî wê, lêkera “çûn”ê di devoka Botanê de, bi raveya fermanî wekî “biçe” tê bikaranîn ku di devokên din ên kurmançî de wekî “here” yan jî “dere” li kar e. Şair forma “biçe”yê ya Botî bi kar aniye (malikên 42 û 63yan).

Herwiha lêkera latinê, di forma wî ya pasîv de, dema bi şeweya “bihên” di raweya daxwazî de bi kar tîne varyanta devoka Botanê û ya Miks-Xîzanê “bête” tercih kiriye, (malikên 39, 41 û 44an).

Dîsa di berhemê de di lêkerên “xwendinê” de şair ne “ser’e” lê “ber’û” bi kar aniye ku me di transkrîpsiyonê de ew wekî “xundin” guhezt. Lê bo nimûne em dema li Mewlûda Bateyî dinêrin ew bi “ser’e”yê hatiye nivîsandin, (malikên 39, 41, 44, 57, 63, 68an).

1.2.2.3. Rewşa Ergatîv:

Di metnê de em dibînin şair rewşa ergatîv parastîye, heta di lêkolîna xwe de Yurt (2020: 92) jî eqîdeya wî nimûneyekê nîşan dide ku ew li gorî rewşa ergatîf lêkerê dikişîne. Lê di mewlûda wî de, di nimûneya li jêr de ergatîv ji holê radibe:

Me gerandî ummeta şahê huda
Tabî’ê Ehemmed Muhammed muqteda

Di nimûneya li jor de awayê risteyê yê tam divê wiha be: “Wî (Xuda) em gerandin.”

1.2.2.4. Tewang:

Di mijara tewangê de, xusûsen di tewanga navdêrên nêrza de, ji bo ku sistayiyek heye pîrî caran navên nêrza nayên tewandin. Jixwe Celadet Bedirxan sê rewşên tewanga navên nêr jî dide ku li gorî wî meyla tewangê di navên nêr de ber bi rabûnê ye. Di berhema Korikî de jî navdêrên nêr di rewşa bikerê de netewiyane ku di herdu malikên jêrîn de, eger ne ji ladana weznê be divê nav wekî Cuneydî û Celaleddînî bitewiyana.

45. Hem hîkayet kir Cuneyd zatê zerîf
Ew kesê hâzîr ke mewlûda şerîf

64. Hem Celaluddîn riwayet kirebî
Herçiyê lê bixûnin mewlûda nebî

1.2.2.5. Bazinedaçek:

Şair di bazinedaçekan de; paşdaçek “da-de”yê bi forma Botî “de”yê de bi kar tîne:

68. Kî bide xundina mewlûdê di mala xu de
Dê Xuda hîfz ke ji dij û hasid e

70. Hem di qebrê de sehil dike bê guman
Ser mirî dide sûala qaşidan

72. Ew kesê hubba nebî di qelb de hebî
Ev qeder e jê re bizan kafî dibî

Herwiha paşdaçek “ra-re”yê jî bi heman forma Botî wekî “re”yê de bi kar tîne:

73. Herçiyê ku hubba resûl jê re tune
Roj şev bêjim li cem qeydî tune

81. Çûn di pey re çêkirî duwazde hîcab
Tev ji bo nûra ‘ezîm û mustetab

Lê paşdaçek “va-ve”yê bi forma Serhedî û Berfiratî wekî “va” bi kar aniye:

Herçiyê qedrê wî hezim zehv bike
Her wekî îslam ji nû va sax dike

1.2.2.6. Cînava Heçî (Herçi):

Korikî di mewlûda xwe de cînava heçî serkeftî bi kar aniye ku hem li vegêrana mewlûda wî hatiye hem jî belaxat daye vegotina wî.

55. Herçî tiştê ku ji van tevlî bibe
Pir teberrîk hem gelek zêde dibe

73. Herçiyê ku hubba resûl jê re tune
Roj şev bêjim li cem qeydî tune

74. Herçiyê ku ji hubba we şewqê xalî ye
Roj û şev bêjim li nik bê feyde ye

1.2.2.7. Varyantên hin Peyvan:

Şair peyva “cî” (79/2) ya Serhedî û Berferatî bi kar aniye ku beramberî wî di devokên Botan û Behdînanê forma dirêj “cîh” bi kar tê. Nimûneyeke din jî peyva “bira” (48/1) ya Serhedî ye ku di devokên Botan-Behdînanê de wekî “bila” li kar e. Herwiha peyvên di kurmanciya standart û Devoka Botanê de yên wekî “xwe, xweş, xwendin” tên bikaranîn wî wekî “xu, xoş xundin” bi kar anîne.

Ev nimûneyên hanê nîşan didin ku Şêx Qutbeddîn Korikî digel ku devoka standart a şîira klasîk bi kar aniye jî, ji ber ku ew li Batmanê bûye û li deverên ciyawaz maye di vê berhema xwe pêbendî devokekê tenê nemaye û dewlemendiya îdyolektiya (takezar) xwe nîşan daye. Xêncî van nimûneyan eger li ser peyvrêziya metnê lêkolînek bê kirin, ew ê bê dîtîna ku Korikî hem ji aliyê maneyê hem ji aliyê avasaziyê ve risteyên serkeftî bi kar anîne û bi van risteyan asta belaxatê ya vegêrana xwe berz kiriye.

Encam

Yek ji şairên Edebiyata Klasîk a Kurdî Şêx Qutbeddînê Korikî tevî aqîdename û hin şîirên kurmancî wî mewlûdeke kurmancî jî nivîsiye lê ew temam nekiriye. Mewlûda wî xêncî malika dîsgotinê 83 malik in. Di vê lêkolînê de me li ser zimanê mewlûda Korikî analîzeke zimanî kir ku ew jî ji sehaya fonolojiyê bûyerên dangan û mijarên morfosenaktîk ku di kurmanciya kurmancî de cihekî xwe yê girîng hene.

Hat dîtîna ku şair ji aliyê fonolojiyê ve xêncî dengên kurmancî, yên erebî jî bi kar anîne ku ew bi herfên erebî yên derî alfabeya kurmancî nîşan dane. Bûyerên dangan yên di metna wî de; ketin û dariştina dengdêran piranî tîkîlî ladanê ji ber lihevanîna wezna helbestê û serwayan, cottengî anku dubarebûna dengdaran di peyvên erebî de, ketin û guherîna dengdaran ji ber bikaranînên wî yên devokî yan jî axaftina rojane ne.

Ji aliyê morfosenaktîk ve jî şair xêncî nimûneyekî rewşa ergatîv parastiye, tewanga navdêrên nêrza neparastiye, morfema dema bê ji bilî nimûneyekî bi qaydê Serhedî û Berferatî bi kar aniye. Dîsa xusûsiyeteke Korikî jî ew e wî varyantên ciyawaz ên cuda yên devokên kurdî di berhema xwe de bi kar anîne ew jî eleqe, zanîn û agahdariya wî ya li ser kurmancî nîşan dide.

Çavkanî

- Adak, A. (2017). Destnivîsên Mewlûda Melayê Bateyî di Arşîva A. Jaba de: Nasandin û Analîz. *The Journal of Mesopotamian Studies*, 2 (2), 1-29.
- Adak, A. (2017). Aheng û Mûsiqî di Helbestên Melayê Cizîrî de. *Mukaddime*, Jîmar: 8, r. 41-76.
- Aksan, M û Aksan, Y. (1991). Metin Kavramı ve Tanımları. *Dilbilim Araştırmaları Dergisi*, 2, r. 90-104.
- Bateyî, Melayê (2012). *Mewlûd*. (amd. Huseyn Şemrexî). Stenbol: Nûbihar.
- Bayezîdî, Mela Mehmûdê (2010). *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye* (lêkolîn: Jan Dost). Stenbol: Nûbihar.
- Bedirxan, C. û Lescot, R. (2000). *Kürtçe Dilgisi (Kurmanci)*. ç. 5. Stenbol: Doz.
- Çağmar, E. (2004). *Edebi Açından Arapça Mevlidler*. Ankara: İlahiyat
- Çetin, N. (2004). *Şiir Çözümleme Yöntemi*. Ankara: Öncü Kitap
- Enkvist, N. E. (1973). *Linguistic Stylistics*, Paris: Mouton
- Ertekin, M. Z. (2015). Mela ‘Eliyê Baqustanî û Mewlûda Wî. *Mukaddime*, 6 (1), 101-138. DOI: 10.19059/mukaddime.41484
- Ertekin M. Z. û Ertekin, N. (2017). *Kurtedîroka Mewlûdnameyên Kurdî*. Uluslararası Sosyal Bilimler Kongresi Genişletilmiş Özetler Kitabı, Şarkiyat Bilim ve Hikmet Vakfı Yayınları, Diyarbakır, r.149-155.
- Ertekin, M. Z. (2022). *Kürtçe Siyer Yazıcılığı*. İstanbul: Siyer Akademi.
- İlhan, Z. (2013). *Mewlûda Mela Huseynê Bateyî (Metn û Lêkolîn)*, Teza Lisansa Bilind a Neçapbûyî, Mardîn: Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.
- Kızıllı, H. & Şingâr, & C. Çetin, R. (2015). “Ceribandinek li Ser Senifandina Mewlûdên Kurdîya Kurmancî Li Gor Mijarên Wan”, Diyarbakır: *International Journal of Kurdish Studies*, 1/1.
- Korikî, Şêx Qutbedînê (Destxet). *Mewlûd*. Berhema Neçapkirî.
- Pakalın, M. Z. (1993). *Osmanlı Tarih Deyimleri ve Terimleri Sözlüğü*, MEB Yayınları, C.2, İstanbul.
- Öztürk, M. (2018). Süleyman Çelebi ve Mela Huseynê Bateyî'nin Mevlidlerine Karşılaştırmalı Bir Bakış. *TurkishStudies*. Volume 13/5, Winter 2018, p. 389-418, DOI: <http://dx.doi.org/10.7827/1.13040>
- Trask, R.L. (2007). *Key Concepts in Language and Linguistics*, (ed. Stockwell, P.), Routledge, Oxon.
- Yurt, N. (2020). Şêx Qutbedînê Korikî: Jiyan, Berhem û Kesayetiya wî ya Edebî. *Kurdîname*, (3), 76-98.

Pêvek 1: Transkrîpsiyona Mewlûda Şêx Qutbedînê Korikî

1. Hemd û şukr û hem şenaê bê'eded
Roj û şev daîm ji bo rebbê Şemed
 2. Ew îlahê pur cewad û hem kerîm
Daye me dînê 'ezîz û musteqîm
 3. Me gerandî ummeta şahê huda
Tabî'ê Eħmed Muħemmed muqteda
 4. Ew Xudaê bê şerik û bê heval
Dînê me kamil kir û nazik delal
 5. Y'enî da me ew resûlê sade nûr
Hem digel hûr we ğilman û quşûr
 6. Xaliqê erd û sema û kaînat
Xoş li me îhsan kirî Qur'an xelat
 7. Ew Xudaê bê zewal û bê wezîr
Bê nezîr û bê mîsal û bê 'eşîr
 8. Raziqê mexlûqê beħran we ber
Ger çi kor bin hem çi şeħt bin ew çi ker
 9. Em ji te herdem dixwazin ey kerîm
Me bikî mesrûr bi cennat û ne'îm
 10. Her ji me zenb û gunahê pur leîm
Tu 'efû kî wan bi ğufrân ey reħîm
 11. Me bike şabit li ser cada zerîf
Ew rêya Eħmed we eşhabê şerîf
 12. Tu bide îman di weqta sekretê
Tu le'în dûr ke ji me wê sa'etê
 13. Şellî ya rebbî 'ela taha metîn
We 'ela alîn we şeħbîn kulle ħîn
- Ger dixwazin wan cennatê 'aliyat
Pur bixûnin ser Muħemmed eş-şelat*
14. Her zeman û şal û mah û hefte îm
Pur muða'ef ew şelatê nazenîn
 15. Ew bibarin mislê barana buhar
Ser Muħemmed al û eşhabê kubar
 16. Ey şefî'ê, me gunehkarê melûl
Tu bike mehder ji bo me ey resûl
 17. Şellî ya rebbî 'ela şahê heħîm
Ta hebin dunya we cennatê ne'îm

18. Ew Muħemmed rohnîya herdu cihan
Şahîbê m'îrac û xîlwa la mekan
 19. Xûliya n'ela Muħemmed Muştefa
Pê şerîq bûn zem zem rukn û şefa
 20. Şellî ya rebbî 'ela ceddîl Huseyn
Ta biherkin çari çem fil cenneteyn¹
 21. Fexrê cumle enbiya û murselîn
Muştefa yê şadiqê tahir emîn
 22. Yek îşaret daye hîva asîman
Hîv du şeq bû hate erdê ew 'eyan
 23. Şellî ya rebbî 'ela şahê 'ereb
Ma yemûcû'ssalîkûne bîl-tereb
 24. Ew kelîmê rebbê banî'd la mekan
Rabû perde wî xu da dinê 'eyan
 25. Ey şefî'ê 'aşîyû hem muznîbîn
Tu şefa'et ke ji bo min kemterîn
 26. Tu bide min taze ava kewserê
Min bike mesrûr di nava meşserê
- Ger dixwazin wan cennatê 'aliyat
Pur bixûnin ser Muħemmed eş-şelat*
27. Hûn werin rûnin edeb kin ey bira
Da bixûnin mewlûda xeyrul wera
 28. Tev werin guhdarê mewlûdê bibin
Dergehê mizginiya da li we vebin
 29. Gotiye Ehmed Muħemmed Muştefa
Mewlûda min ew kesê bi şidq û şefa
 30. Qedrê wî bigire delal û nazenîn
Ez şefî'ê wî me roja axerîn
 31. Wê muferreh be di nava meşserê
Hem vexû avê ji hewzê kewserê
 32. Şerfê nîv dirhem ji bona mewlûdê
Şubhetê yek çiyakî zêr e li cem Xudê
 33. Şerf bibe ji bona feqîr û birçiya
Xêra wî mazin dibe mişle² çiya

¹ Ta biherkin herdukanê cenneteyn

² şubhê

34. Hem Ebûbekr Şiddîq wuha gotiye³
Qedrê mewlûdê kê pur girtiye⁴
35. Dirhemek daye ji bona qirayetê⁵
Ew ‘ezîz bû min heval e li cennetê⁶
36. Hem wuha gotî îmam zatê ‘Umer
Qedrê mewlûdê ‘ezîm kin bê qeder
37. Herçiyê qedrê wî hezim zehv bike
Her wekî îslam ji nû va sax dike
38. Hem Îmam ‘Uşman digot bixûne bi kemal
Dirhemek kê şerf bike ji bona delal
39. Bête xundin mewlûda ceddê Huseyn
Xêra wê wek xaziyê Bedr û Huneyn
40. Hem digo Îmam ‘Elî şahê ereb⁷
Kê mezin ke mewlûdê ew bibe sebeb⁸
41. Hem ew bike cehdû se’yê pur gerîb
Bête xundin mewlûda tahir hebîb
42. Wê îmana xu xelaş ke hem bi nûr
Biçe cennetê bê hesab surûr⁹
43. Hesen el-Beşrî digot ez hiz dikim
Zêrê min hingê Ûhûd bin şerf bikim
44. Ku bête xundin¹⁰ mewlûda Ehmed Beşîr
Lê xilaş bim ez di wê roja ‘esîr
45. Hem hikayet kir Cuneyd zatê zerîf
Ew kesê hazır ke mewlûda şerîf
46. Zêde t’ezîm û we îkrameke ‘eyan
Weqta bimre wê xilaş ke ew îman
47. M‘erûfê Kerxî digotî ba kemal¹¹
Kê ku çeke xûrina qenc û delal
48. Hem bibêje xelqê “bira bîn” gazî ke
Lembê pêxe şerbetê hazır bike

³ Hem hikayet kir Ebûbekrê şerîf

⁴ Qedrê mewlûdê kê girtî zerîf

⁵ xundinê

⁶ li wê dinê

⁷ Xweş digot Heyderê Kerrar

⁸ li wan bibe bihar

⁹ ne hesab ne kudûr

¹⁰ da bixûnin bidil

¹¹ ey hevalê bidil

49. Xu bixemlîne cilê nû li xwe bike
Dermanê bênxoş xwe pê tezyîn bike
50. Hem bişewtîne buxûrxanê temîz
Da bixûnin mewlûda şahê ‘ezîz
51. Wê Xuda wî şexsî roja axretê¹²
Bi hürmeta Eħmed Muħemmed l’qiyametê¹³
52. Heşir ke nav enbiya û murselîn
Wê bidê qeşra ji e‘ela ‘ilîyyîn
53. Fexruddîn er-Razî go: “ey nazenîn”
Kê bixûne mewlûda sulţanê dîn
54. Ew li ser xu û we zada xwarinê
Wê mubarek bin diyûmna xundinê
55. Herçî tiştê ku ji van tevlî bibe
Pir teberrik hem gelek zêde dibe
56. Bêne danîn ey birader av li pêş
Ew dibe derman ji bo derdan û êş
57. Bête xundin ger li ser new‘ê pera
Wê bibin zêde gelek pir bin bira
58. Ku Muħemmed şafi‘ê îmamê dîn
Kî ku bicvîne birayê muslimîn
59. Hem mekanek xalî ke rewnaq bike¹⁴
Xwarinê çêke gelek îhsan bike
60. Ev sebebyet ke bi qedrek pur ‘ezîm
Bête xundin mewlûda Şahê kerîm
61. Wê heşir ke wî Xudaê ‘alemîn
Tevlî şiddîq û şehîd û şaliħîn
62. Sirriyê Seqtî hîkayet kir ‘eyan
Kî ji bo ħubba Resûlê îns û can
63. Biçe ber mewlûd û xundin qira’etê
Her wekî ew biçe bagê cennetê¹⁵
64. Hem Celaluddîn riwayet kirebî
Herçiyê lê bixûnin mewlûda nebî
65. Cebraîl û ‘Ezraîl û Îsrafil
Hem digel quddûsiyan Mikaîl

¹² saetê

¹³ şefî‘ê axretê

¹⁴ tezyîn bike

¹⁵ şahê ummetê

66. Ew bi şahî tîne wî der şef bi şef
Rehm dibare tev di‘a dikin çar teref
67. Boxoy zad û heçiyê li wir sam‘i in
Ew ji bo hubba nebî bûn hazir in
68. Kî bide xundina mewlûdê di mala xu de
Dê Xuda hifz ke ji dij û hasid e
69. Hem ji çehv û agir û qeht û gela
Wî yû tevê mal û weled jê new‘ê bela
70. Hem di qebrê de sehil dike bê guman
Ser mirî dide sûala qaşidan
71. Kin me gotin weşf û n‘etê bê hisab
Ger beyan kim wê dirêj be ev kitab
72. Ew kesê hubba nebî di qelbî de hebî¹⁶
Ev qeder e jê re bizan¹⁷kafî dibî¹⁸
73. Herçiyê ku hubba resûl jê re tune
Roj şev bêjim li cem qeydî tune
74. Herçiyê ku ji hubba we şewqê xalî ye
Roj û şev bêjim li nik bê feyde ye
75. Qedrê mewlûdê bizanin ey bira
Da li axretê ew bibe şem‘ û çira
*Ger dixwazin wan cennatê ‘aliyat
Pur bixûnin ser Muhemmed eş-şelat*
76. Beriya¹⁹ ‘erd û şema lewh û qelem
‘Erş û kursî enbiya û muhterem
77. Ger îrade Şan‘iê mutleq wedûd
Ku bike ‘alem seraser der wucûd
78. Ewwela bike qebde nûra nazenîn
Girtî Xaliq ew ji nûra xwe yeqîn
79. Gote wî tu bibe hebîbim ba şefa
Ew di cî de bû²⁰ Muhemmed Muştefa
80. Daîma tesbîh dikir nûra kubar
Şeş şed û bîst û çihar şalan hezar

¹⁶ jê re hebe

¹⁷ yeqîn

¹⁸ be


¹⁹ Hêjna ev


²⁰ bûye Ehmmed


81. Çûn di pey re çêkirî duwazde hîcab
Tev ji bo nûra ‘ezîm û mustetab
82. Ew çi bûn²¹ qudret nubuwwet menzîlet
T‘ezîm û şunnet keramet merhemet
83. Ref‘et ta‘et hidayet bûn yeqîn
Hem se‘adet hem şefa‘et in çunîn


²¹ Ew çe bûn şeh


Pêvek 2: Destxeta Mewlûda Şêx Qutbedînê Korîkî





























ANALÎZA DÎWANA MELA EBDULEZÎZÊ BEDLÎSÎ JI LAYÊ ŞIKL Û NAVEROKÊ VE¹

Nurettin ERTEKİN

KURTE

Sala jidayikbûn û wefata wî teqez nehatibe peyitandin jî tê famkirin ku Mela ‘Ebdul’ezîzê Bedlîsî di navbera salên 1875-1923î de jiyaye. Tevî ku şa’irekî sofîmeşreb e, şa’irek e ku di derbarê rêgezên bingehîn yê edebiyata klasîk xwedî agahiyên tekûz e. Dîwaneke murettib li pey xwe hiştî ye. Di vê diwanê de du mexles bikar anîbe jî mexlesa Şeyda bêtir ber bi çav e. Di dîwana wî de zimanê sereke farsî ye. Lê hem bi kurdî, hem bi ‘erebî û hem bi tirkî şî’r honaye ku cihê xwe di nava şa’irên çar zimanî de çêkiriye. Di vê xebatê de dîwana Mela ‘Ebdul’ezîzê Bedlîsî ji aliyê şikl û naverokê ve hate nirxandin. Piştî destpêkeke kurt di beşa yekem de kurtejiyana Mela ‘Ebdul’ezîzê Bedlîsî hate nirxandin. Di beşa duyem de dîwan ji aliyê şikil ve hate analîzkirin. Di beşa sêyem de navoroka diwanê hate tehlîlkirin. Di encamê de xuya bû ku Mela ‘Ebdul’ezîzê Bedlîsî şa’irekî çar zimanî ye, jî rêgezên edebiyatê agahdar e, hunera wî ya edebî bi hêz e û pirek e di navbera edebiyata tesewufî ya klasîk û edebiyata dergahî de.

Peyvên Sereke: Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Dîwan, Şî’r, Edebiyata Tesewufî, Edebiyata Dergahî, Mela ‘Ebdul’ezîzê Bedlîsî, Şeyda.

¹ Di vê xebatê de me ji daneyên teza xwe ya masterê, ya bi navê “Tesewif di Dîwana Şeyda de” sûd wergirt. Bu çalışma “Şeyda’nın Divanında Tasavvuf” adlı yüksek lisans tezimin verilerinden faydalanarak hazırlanmıştır.

Nurettin ERTEKİN,

Dr., Nurettin Ertekin, nurettin.ertekin@hotmail.com, ORCID: 0000-0003-2744-0447

Article Type/Makale Türü:

Research Article/Araştırma Makalesi

Received / Makale Geliş Tarihi: 13.05.2023

Accepted / Makale Kabul Tarihi: 09.09.2023

Published / Makale Yayın Tarihi: 20.10.2023

DOI: 10.35859/jms.2023.1296819

Değerlendirme ve İntihal/Reviewing and Plagiarism:

Bu makale iki taraflı kör hakem sistemine göre en az iki hakem tarafından değerlendirilmiştir. Makale intihal.net adlı intihal sitesinde taranmıştır. / This article has been reviewed by at least two anonym reviewers and scanned by intihal.net plagiarism website.

Citation/Atf:

Ertekin, N. (2023). Analîza Dîwana Mela Ebdulezîzê Bedlîsî ji layê Şikl û Naverokê ve, The Journal of Mesopotamian Studies, Jimara Taybet a Edebiyata Kurdî ya Klasîk, rr. 114-132, DOI: 10.35859/jms.2023.1296819.

Mela Abdülaziz Bitlisi Divan'ının Şekil ve Muhteva Yönünden Analizi

ÖZ

Doğum ve vefat yılı kesin olarak bilinmemekle beraber 1875-1923 yılları arasında yaşadığı şiirlerinden anlaşılan Mela Abdülaziz Bitlisi, sūfî kimliği ile beraber; divan edebiyatının temel esaslarını bilen bir şairdir. Mürettep bir divan sahibi olan Mela Abdülaziz Bitlisi şiirde ağırlıklı olarak Şeyda mahlasını kullanmıştır. Divanında temel dil Farsça olmakla beraber Türkçe, Arapça ve Kürtçe şiirler de bulunmaktadır. Böylece Mela Abdülaziz Bitlisi, dört dil ile şiir yazan ender klasik şairler arasında yer almaktadır. Bu çalışmada Mela Abdülaziz Bitlisi'nin divanı şekil ve muhteva yönünden incelemeye tabi tutulmuştur. Kısa bir girişten sonra birinci bölümde Mela Abdülaziz Bitlisi'nin hayatı ele alınmıştır. İkinci bölümde Mela Abdülaziz Bitlisi'nin divanı şekil bakımından değerlendirilmiştir. Üçüncü bölümde divan muhteva açısından ele alınmıştır. Sonuç bölümünde Mela Abdülaziz Bitlisi'nin edebiyat bilgi ve yeteneğine sahip olduğu ve Kürt tasavvuf edebiyatı ile Kürt dergâh edebiyatı arasında bir köprü olduğu görülmüştür.

Anahtar Kelimeler: Klasik Kürt Edebiyatı, Divan, Şiir, Tasavvuf Edebiyatı, Dergâh Edebiyatı, Mela Abdülaziz Bitlisi, Şeyda.

Analysis of Mullah Abdulaziz Bedlisî Divan in terms of Form and Content

ABSTRACT

The precise dates of Mullah Abdulaziz Bedlisî's birth and death are uncertain. However, based on his poetic works, it is inferred that he lived within the period spanning from 1875 to 1923, while also embracing a Sufi identity. The individual in question possesses a comprehensive understanding of the fundamental tenets of divan literature, thereby establishing himself as a proficient poet in this particular domain. Mullah Abdulaziz Bedlisî, a notable figure known for his proficiently composed divan, predominantly employed the pseudonym *Şeyda* in his poetic works. While the primary language utilized in his divan is Persian, it is worth noting that there are other poetic compositions present in Turkish, Arabic, and Kurdish. Mullah Abdulaziz Bedlisî stands out as a notable classical poet who shown proficiency in composing poetry in four distinct languages. This study focuses on the analysis of Mullah Abdulaziz Bedlisî's divan, with a particular emphasis on its form and content. The first chapter of the text provides a succinct introduction followed by an examination of the life of Mullah Abdulaziz Bedlisî. In the subsequent section, an analysis was conducted on the structure of Mullah Abdulaziz Bedlisî's divan. The content of the divan is examined in the third chapter. The analysis of Mullah Abdulaziz Bedlisî's work reveals his profound literary acumen and remarkable artistic abilities, positioning him as a pivotal figure in connecting Kurdish Sufism literature with Kurdish lodge literature.

Keywords: Classical Kurdish Literature, Divan, Poetry, Sufi Literature, Dervish Lodge Literature, Mullah Abdulaziz Bedlisî, Şeyda.

EXTENDED ABSTRACT

The precise dates of Mela Abdülaziz Bitlisi's birth and death are uncertain. However, based on his poetic works, it is inferred that he lived throughout the period spanning from 1875 to 1923. Notably, in addition to his affiliation with Sufism, Mela Abdülaziz Bitlisi possessed a profound understanding of the fundamental tenets of divan literature. Mela Abdülaziz Bitlisi, a fervent patron of divan literature, predominantly employed the pseudonym Şeyda in his poetic works. While the primary language employed in his divan is Persian, it also has poems composed in Turkish, Arabic, and Kurdish. Mela Abdülaziz Bitlisi stands out as a distinguished classical literature poet who demonstrated proficiency in composing poetry in four distinct languages.

This research focused on the analysis of Mela Abdülaziz Bitlisi's divan, with particular attention given to its form and content. The present study comprises a concise introductory section, three main chapters, and a concluding section wherein the findings derived from the investigation are presented.

The present analysis focuses on the poetry of Mela Abdülaziz Bitlisi within the broader context of Classical Kurdish Literature, as outlined in the introductory section. The incorporation of Arabic and Persian linguistic features, as well as cultural elements from Persian society, has exerted a significant influence on Classical Kurdish Literature, representing fundamental components within this literary tradition. As a consequence of this phenomenon, it has been seen that several Kurdish poets have composed verses in Arabic, Persian, Turkish, and Kurdish languages. Due to this rationale, poets can be categorized into monolingual, bilingual, trilingual, and quadlingual poets. Mela Abdülaziz Bitlisi falls inside the quadlingual poet group.

Classical Kurdish Literature incorporates Sufism and its various components, since it is evident that Sufism and Sufi aspects hold a significant position among the fundamental elements of classical literature. Nevertheless, Classical Kurdish Literature has yet to establish a differentiation for Sufism. The examination of Classical Kurdish Literature can be categorized into two primary domains: Classical Sufi Literature and Dergah Literature. Mela Abdülaziz Bitlisi served as an intermediary between the two literary traditions, as his divan encompassed the characteristics of both Classical Sufi Literature and Dergah Literature.

The initial segment of the essay provides an account of the life of poet Mela Abdülaziz Bitlisi. The available resources provide limited information regarding the precise year and location of the individual's birth, educational background, and place of death. The individual in question has been identified as Abdülaziz, who adopted his name as a pseudonym in the realm of poetry. Based on the content of the elegies and eulogies authored by the individual in question, it may be inferred that their lifespan encompassed the years spanning from 1875 to 1923. The poet employed the aliases Şeyda and Abdülaziz in his literary works. Based on the content of his poems, it may be inferred that he was affiliated with the Naqshbandi order.

The subsequent section of the analysis focused on the examination of Mela Abdülaziz Bitlisi's divan in relation to its structural characteristics. The examination conducted on the divan has yielded the following findings: there are a total of 117 poems, comprising 97 ghazals and odes, 6 masnawi, 6 kit'a, 3 ferd, 2 terci-ibend, 1 muhammes, 1 murabba, and 1 rubain.

Upon examining the odes authored by Mela Abdülaziz Bitlisi, it becomes apparent that these compositions primarily comprise elegies and eulogies. It is evident that these eulogies and dirges were specifically dedicated to the esteemed members of the religious community to which the poet himself belonged. The presence of a large number of gazelles characterizes him as a poet who draws inspiration from gazelles. The Masnawi holds the distinction of being the second most prevalent kind of poetry

within his divan. It is worth mentioning that their masnawis contain a sâkinameme. This observation indicates that his literary works were shaped by the impact of Iranian literature. Furthermore, the poet's treatment of the historical events during his era, as depicted in his masnawis, indicates that he was not detached from society and experienced a spiritual impact from the contemporary events that unfolded.

The third phase of our research involved an analysis of the content of Mela Abdülaziz Bitlisi's divan. The study reveals that the primary motif explored in the divan is that of love and mysticism. Furthermore, it has been observed that Mela Abdülaziz's poetry encompass a variety of issues. The themes of love and spirituality are explored in a collection of 68 poems. Furthermore, it is worth noting that out of the total number of poems, 27 can be classified as eulogies, 8 as elegies, 6 as naats, 2 as historical compositions, 1 as a silsilename, 1 as a philosophical piece, 1 as a tranquil composition, and finally, 1 as the primary motivation behind the creation of the divan.

The primary thematic focus of the Divan revolves around the concepts of love and mysticism, as seen by the substantial quantity of poems dedicated to exploring these themes. Mela Abdülaziz Bitlisi's poetic works prominently feature motifs and themes associated with love, as he has embraced romantic mysticism. Poems pertaining to the thematic domain of amorous mysticism, which involves the fusion of love and mysticism, warrant assessment within the context of Classical Sufi Literature.

The second primary theme explored in the divan is to the genres of eulogy and elegies. As previously stated, the aforementioned poems were composed for the purpose of being presented to the sect sheikhs with whom the author has a connection. The poetry that were crafted within the context of a cult dervish lodge need evaluation within the framework of Dergâh Literature. Hence, Mela Abdülaziz Bitlisi emerges as a noteworthy Kurdish poet who successfully amalgamated both sub-branches of Sufi literature inside a single divan.

The conclusion section presents a comprehensive overview of the findings derived from the analysis of Mela Abdülaziz Bitlisi's divan, focusing on both its form and content. The data can be enumerated in the following manner. The precise dates of his birth and death are uncertain; nonetheless, it is widely accepted that he existed within the temporal span of 1875-1923. It is widely acknowledged that he resided in Bitlis for a specific duration, therefore earning the appellation "Bitlisi." He belongs to the Naqshbandi sect.

The individual's profound scientific and literary expertise is evident by their adept utilization of language and engagement with various issues within their divan. Furthermore, their mastery extends to encompass literary terminology, as well as a comprehensive understanding of Arabic, Persian, Turkish, and Kurdish literature. He possesses the exceptional ability to compose poems proficiently in all four languages.

The author's divan contains love and mystical poems that demonstrate a profound understanding of Sufism, encompassing its scientific aspects, philosophical underpinnings, and affiliation with the Wahdatu'l-wucûd school of thought. The individual in question demonstrates exceptional poetic abilities, adeptly merging Classical Sufi Literature and Dergah Literature inside a single divan, so establishing a connection between these two distinct literary traditions.

The subject of interest is to the realm of Classical Kurdish Literature, with a specific focus on the genres of Divan, Poetry, Sufi Literature, Dergah Literature, as well as the notable figures Mela Abdülaziz Bitlisi and Şeyda.

Destpêk

Edebiyata kurdî ya klasîk di binê siya medrese û dergahan de hetanî roja me jî berhemdayîna xwe didomîne. Ji vî alî ve edebiyata kurdî ya klasîk edebiyateke dewlemend e. Tevî dewlemendiya xwe edebiyata kurdî ya klasîk, bi tevahî derneketiye holê û xebatên şayeste li ser nehatine kirin. Helbet gelek eger ji bo vê derneketinê dikare were rêzîkirin. Bi dîtînin me egera sereke peydanekirina berheman e. Hetanî dema me jî gelek berhemên edebiyata kurdî ya klasîk li deverên çiyawaz tên bidestxistin. Yek ji van berhemên nuhbidestxistî dîwana Mela ‘Ebdul’ezîzê Bedlîsî ye.

Ji çavkaniyên hizrî yên edebiyata kurdî ya klasîk unsûrên ‘erebî, unsûrên farsî û unsûrên çanda Îranî karîgeriyek mezin li edebiyata kurdî ya klasîk kiriye. Ev karîgerî ji layekî ve dewlemendiyeke bide edebiyatê jî, ji layekî din ve xebatên li ser edebiyata klasîk zehmettir dike. Di heman demê de tevî vê karîgeriyê bi hinek sedemên din şa’irên edebiyata kurdî ya klasîk di berhemên xwe de tevî zimanê kurdî bi zimanên ‘erebî û farsî jî şî’r honandine. Hejmara wan ne zêde bin jî hinek şa’iran di berhemên xwe de cih dane şî’rên bi zimanê tirkî jî.

Li gor zimanên di berhemên edebiyata kurdî ya klasîk de cih digirin em şa’iran kategorize bikin em ê bigihêjin vê encamê. Şa’irên yek zimanî; ku tenê bi kurdî şî’r honandine. Şa’irên du zimanî; ku bi kurdî- farsî yan bi kurdî-‘erebî şî’r honandine. Şa’irên sê zimanî; ku bi kurdî-farsî-‘erebî şî’r honandine. Şa’irên çar zimanî; ku bi Kurdî- farsî- ‘erebî-tirkî şî’r honandine. Mela ‘Ebdul’ezîzê Bedlîsî, yek ji şa’irên çar zimanî yê edebiyata kurdî ya klasîk e.

Tesewuf û unsûrên tesewufê jî yek çavkaniyên hizrî yên edebiyata kurdî ya klasîk e. Tesewuf bi hemû layên xwe di edebiyata kurdî ya klasîk de cih girtiye. Hem edebiyata tesewufî ya klasîk û hem edebiyata tesewufî ya dergahî di hundurê edebiyata kurdî ya klasîk de ji terefê şa’iran ve hatiye zimên.² Mela ‘Ebdul’ezîzê Bedlîsî, di şî’rên xwe de hem cih daye edebiyata tesewufî ya klasîk û hem cih daye edebiyata tesewufî ya dergahî. Bi vî rengî em dikarin bibêjin ku Mela ‘Ebdul’ezîzê Bedlîsî pirek e di edebiyata tesewufî de di navbera edebiyata tesewufî ya klasîk û edebiyata tesewufî ya dergahî de.

Ji ber van taybetiyên Mela ‘Ebdul’ezîzê Bedlîsî ku li jor amaje bi wan hatin kirin me xwest ku em dîwana wî ji layê şikl û naverokê ve binirxînin. Ev xebat li ser destxetekê hatiye kirin ku ne destxeta şa’irî bi xwe ye û tenê yek nusxe ye û di medreseya Oxînê de tê parastin.

Xebata me ji sê beşan pêk tê: Di beşa yekem de li gorî jêderên berdest em li ser jiyana Mela ‘Ebdul’ezîzê Bedlîsî rawestiyayin. Di beşa duyem de dîwan ji layê şikl û di beşa sêyem de dîwan ji layê neverokê ve hate tehlîl kirin. Ji bo herdu beşan tabloyên amaran hatin amade kirin. Di encamê de bidestxistinên me bi peywendîdarî re hatin parve kirin.

Di vê xebatê de malikên mînak yên farsî û ‘erebî bi pîtên aramî û malikên mînak yên kurdî³ û tirkî bi pîtên latînî hatin dayîn. Wateya malikên farsî û ‘erebî di binê malikan de hatin dayîn.

² Di derbarê Edebiyata Tesewufî ya Klasîk û Edebiyata Dergahî de di binê sernavê “tesewuf”ê de bi kurtasî agahi hatiye dayin. Di pêşerojê de ji teref pisporên edebiyata kurdî pêkan e ku edebiyata kurdî ya klasîk wekî du beşên sereke; Edebiyata Tesewufî ya Klasîk û Edebiyata Dergahî ji hev were veqetandin. Me hêviye ku ev xebat bibe destpêk ji bo xebat û lêkolînên bi vî rengî.

³ Di vê gotarê de ji bo agahiyên derbarê dîwana Mela ‘Ebdul’ezîzî de dema em dibêjin malik kurdî ye yan ziman kurdî ye, mebesta me ji kurdî, kurmancî ye.

1. Jiyana Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî

Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî, yek ji wan şa'îrên edebiyata kurdî yê wenda û nenas e. Derbarê jiyana wî de agahiyên berfireh nehatine bidestxistin. Di dîwana wî de derbarê jiyana wî, bi taybet derbarê binemal û welatê wî de zêde agahî nehatine bidestxistin. Li gorî jêderên berdestên me derbarê jiyana Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî de em digihêjin van agahiyan.

Navê wî 'Ebdul'ezîzê. Em vê agahiyê ji dîwana wî derdixînin. Lewra navê xwe weke mexles di dîwana xwe de bi cih kiriye. Hatiye gotin ku navê bavê wî 'Ebdulkerîm e (Adak, 2016: 36). Lê di derbarê navê dayika wî û binemala wî de tu agahî nehatine peyda kirin.

Mela 'Ebdul'ezîz, di dîwana xwe de du mexles bikaranîne; 'Ebdul'ezîz û Şeyda. Lazim e were gotin di dîwanê de mexlesa Şeyda ji 'Ebdul'ezîz bêtir cih digire. Wî, di du şî'rên xwe de (§ 50) û (§ 92)⁴ herdu mexles bi hevra bikaranîne.

Mela 'Ebdul'ezîz, weke ku ji Bedlîsê be bi navê Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî tê nasîn. Lê ji Bedlîsê ye yan ji deverê din e ne diyar e. Ji dîwana wî derbarê welatê wî tu agahî nayên bidestxistin. Navê Bedlîsê di du malikan de derbas dibe. Di malikê de behsa xweşbûna Bedlîsê dike û dibêje; Bedlîs tecellîgah e û dil fireh dike. (§ 86-1) Di malika jêrin de dîsa behsa Bedlîsê bi xweşikahiyê dike.

بدلیس چه جای خوبست مأوای نازنینان

Bedlîs çi deverê xweşik e, penahgahê nanzenîna ye (§ 50-10)

Bi van herdu malikan mirov neşê bi teqezî bibêje ku Mela 'Ebdul'ezîz ji Bedlîsê ye. Di şî'reke xwe de dema behsa rewşa xwe dike weha dibêje; *Min terka mal û cahê xwe kir, min hemû di bihayê xet û xalên te de dan. Ez li ku, koçberî li ku, Amed li ku, Mardîn li ku...* (§ 55-3,4) dîsa di heman şî'rê de dibêje; *Ez ji bajarê Amedê hatim ji bo ku ez bigihêjim Mêrdînê.* (§ 55-7) Tiştê ji van malikan tê deranîn ev e ku Mela 'Ebdul'ezîz bi şikleki li Amedê maye û ji Amedê berê xwe daye Mêrdîn. Mirov dişê ihtîmaleke din bide berçava ku Mela 'Ebdul'ezîz ji Amedê be û malika jorîn ku dibêje; *Ez ji bajarê Amedê hatim* weke delil bipejirîn e.

Di vê mijarê de di xezelek wî ya mustezad de em rastî vê malikê dibin.

چون یوسف کنعانی که ماردین شده چاهم

ای عالی پناهم

Weke Yûsîfê Ken'anî Mêrdînê bûye çala min, ey piştevanê minî mezin (§ 70-3)

Ji vê malike mirov neşê bibêje Mela 'Ebdul'ezîz ji Mêrdînê ye, lê mirov dikare bibêje ku demekê (demeke ne diyar û belkî heta dawiya temenê xwe) li Mêrdînê jiyana xwe borandiye.

Derbarê dîroka jidayikbûna Mela 'Ebdul'ezîz tu agahiyên zelal nehatin bidestxistin. Bes ev heye em dizanin ku di terîqetê de pêşî bûye pêgirê Şêx 'Ebdurrehmanê Taxî.⁵ Şêx 'Ebdurrehmanê Taxî di navbera 1831-1886an de jiyaye, di sala 1868an de xelîfetiya terîqeta Neqşebendî wergirtiye û di sala 1875a de li Norşînê di medrese û dergahê xwe de dest bi dersdayîn û îrşadê kiriye. (Çakır, 2017: 30) Eger em hizir bikin ku Mela 'Ebdul'ezîz li Norşînê di temenê xwe yê 20 an 30 de bûye pêgirê Şêx 'Ebdurrehmanê Taxî ew dem em dikarin bibêjin ku di salên 1850 de li jiyana bûye.

⁴ Di vê gotarê de malikên mînak yê ji dîwanê bi vî şiklî ew ê werin nîşandayin: (§ 10-8) Ş, Şeyda, 10 hejmara şî'rê, 8 hejmara malikêye.

⁵ Di sala 1831ê zayînî li gundê Taxê girêdayê Bedlîsê hatiye dinyayê. Ji Seyyîd Sibxetullah Erwasi (q.s.) xelîfetiya terîqeta Neqşebendî wergirtiye. Di sala 1886ê zayînî diçe ber dilovaniya Xwedê. Aramgaha wî li Norşînêye (Tenik, 2015, r. 125-126).

Tiştê ku ji dîwanê tê famkirin Mela 'Ebdul'ezîz derbarê tesewuf û edebiyatê de xwedî agahiyên tebût e. Herweha di warê zanistên dînî de jî agahiyên wî yên berfireh hene. Ev bi me dide zanîn ku xwendinek baş kiriye. Lê di derbarê bajar û medreseyên ku lê xwendiyê me tiştek bidest nexist. Herweha derbarê wergirtina îcazeya 'ilmî jî tu jêder li ber destê me nînin.

Mela 'Ebdul'ezîz, pêgirê terîqeta Neqşebendî ye. Ji malikên şî'rên wî tê famkirin ku di merheleya seyr û silûka xwe de pêgiriya sê murşidan kiriye. Weke li jor hate gotin pêşî Şêx 'Ebdurrehmanê Taxî ji xwe re murşid pejirandiyê. Piştî wefata Şêx 'Ebdurrehmanê Taxî li ber destê xelîfeyê wî Şêx Fethullahê Werqanîsî⁶ perwerdehiya xwe ya tesewufê domandiyê. Piştî wefata Şêx Fethullahê Werqanîsî, Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (Hezret) ji xwe ra weke murşidê terîqetê hilbijartiyê.

شاهی تاخی اولاما را بعشقی بو مشیر
پس از ان فاروقی بو عون و پناه و دستگیر
صیقلا قلبی مه ما دورا ته ای شمسا منیر

Pêşî Şahê Taxê bi 'işqê ji me re bû rayezan, Piştî Farûqî' bû alîkar û stargeh û alîkar, Sîqala qelbê me ma dema te ey roja rewneq (§ 104-13)

Di nava xelîfeyên Şêx 'Ebdurrehmanê Taxî, (Akot, 2013: 208) Şêx Fethullahê Werqanîsî (Akot, 2013: 210) û Şêx Mûhemmed Dîyauddîn de (Çağlayan, 1996: 201-202) navê wî derbas nabe. İhtîmalek mezin xelîfetiya terîqetê nesitendiye.

Di derbarê sala wefata Mela 'Ebdul'ezîz de tu agahi nehatin peydakirin. Her weha cihê aramgaha wî jî nehate peyîstandin. Weke li jor jî hatiye gotin Mela 'Ebdul'ezîz, herî dawî bûye pêgirê Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (Hezret).⁸ Şêx Mûhemmed Dîyauddîn di sala 1923an de diçe ser dilovaniya Xwedê. Mela 'Ebdul'ezîz, ji bo wefata Şêx Mûhemmed Dîyauddîn yek bi 'erebî (§ 97) û yek bi farsî (§ 98) du qit'eyên maddeya tarîxê honandiyê. Ji wan qit'eyan diyar dibe ku Mela 'Ebdul'ezîz di sala 1923 yan de li jîyanê bûye. Ji 1923 yan şûnde çend sal temen borandiyê nediyar e.

Di destê me de tenê dîwana Mela 'Ebdul'ezîz heye. Ji vê dîwanê pêve berhemên wî hebin jî derneketine holê. Destnivîsa resen ya dîwana Mela 'Ebdul'ezîz peyda nebûye. Nuxxeya li ber dest jî terefê kesekî ne diyar ji bo Şêx 'Elaeddîinê Oxînî⁹ di sala 1936an de hatiye istînsah kirin. Ev nusxe di arşîwa medreseya Oxînê de ye. Ev xebat jî li ser fotokopiya vê nusxeyê hatekirin. Di destpêka nusxeyê de di pêşîya xezela yekem de '*Haza Xezelîyatî Mela 'Ebdul'ezîz El Bedlîsî*' hatiye nivîsandin. Yanî; ev xezelên Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî ne.

2. Ji Layê Şiklî ve Dîwana Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî

Edebiyata klasik li ser hinek hêmanan ava bûye ku yek ji wan hêmanan teşeyên nezmê ne. Teşeyên nezmê, form û şiklê honandina şî'rê ne. Şa'irên edebiyata kurdî ya klasik, ji layê teşeyên nezmê li pey

⁶ Di sala 1846an de li gundê Werqanîsê ku girêdayî navçeya Hawêl a bajarê Bedlîsê ye hatiye dinyayê. Bûye muntisibê Şêx 'Ebdurrehmanê Taxî (q.s.) û xelîfetiya terîqetê ji wî wergirtiye. Di sala 1899 an de rehmet kiriye (Zinar, 2011, r. 11-16).

⁷ Mela 'Ebdul'ezîz, weke misraya minak di gelek malikan de ji bo Şêx Fethullahê Werqanîsî *Farûqî* bikartîne. Şêx Fethullah Werqanîsî (q.s.) ji binemala Şêx Mûsayê Zolî ye (Baz, 2014, s. 90). Şêx Mûsayê Zolî jî ji binemala Hezretî 'Umer e. (r.x.l.) (Ertekin, 2015, r. 74-75). Ji ber vê Şa'ir şêxê xwe bi bernavka Hezretî 'Umer dinasîne.

⁸ Lawê Şêx 'Ebdurrehmanê Taxî (q.s.) ye. Di sala 1855an de li Usp ê giridayî bi navçeya Hîzana Bedlîsê hatiye dinyayê. Xelîfetiya terîqetê ji Şêx Fethullahê Werqanîsî (q.s.) wergirtiye. Di sala 1923 yan de li Norşînê wefat kiriye. (Çağlayan, 1996, r. 201-202).

⁹ Di sala 1881an de li Norşînê hatiye dinyayê. Lawê Şêx Fethullahê Werqanîsî ye. Perwerdehiya xwe ya tesewufî li cem bavê xwe destpêdike, piştî wefata bavê xwe li cem Şêx Mûhemmed Dîyauddîn perwerdehiya tesewufê didomîne û îcazeya tesewufî ji Şêx Mûhemmed Dîyauddîn werdigire. Di sala 1949an de li Oxînê diçe ber dilovaniya Xwe. (Bilen, 2012, r. 87-108).

kevneşopiya ku ji edebiyata 'ereban gihaştîye edebiyata farisan û di edebiyata farisan de gihaştîye asta kemalê, meşiyane. Kêm şa'irên me dikaribûn xwe ji vê kevneşopiyê reha bikin ku pêşengê wan Melayê Cizîrî ye. Mela 'Ebdul'ezîz, bi tevahî li ser kevneşopiya edebiyata klasik şî'rên xwe honandiye û dîwanek murettab ava kiriye. Di dîwana Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî de teşeyên nezmê û hejmarên wan ev in.

Teşeyên Nezmê	Hejmara Şî'ran
Xezel- Qesîde	97
Mesnewî	6
Qit'e	6
Ferd	3
Tercî'î Bend	2
Muxemmes	1
Murebbe'	1
Rûba'î	1
Giştî	117

2.1. Qesîde

Di edebiyata klasik de her teşeyek nezmê ji bo hinek mijaran hatine terxankirin. Bi nêrînek giştî dema ku mijar li gorî teşeyan werin dabeşkirin ewê were dîtin ku qesîde ji bo pesindariyê, qit'e ji bo pend û hikmet, mesnewî ji bo fêrkirinê û xezel jî ji bo şî'rên 'aşiqane hatine terxankirin. (Şemîsa, 1380: 250) Di seyra tarîxa edebiyata klasîk de em dibinin ku ev rewş guherî ye. Qesîde û xezel tîkilî hev bûne. Çewa ku xezelên mijara wan bi tevahî pesîndarî ye tînin dîtin her weha xezelên ku di wan de malikên pesîndariyê cih girtine jî tînin dîtin. Di edebiyata farsî de gelek şa'iran bi vê şewazê şî'r honandine. Ji ber navdariya wan em Se'diyê Şîrazî (w. 1292) û Hafîzê Şîrazî (w 1390)¹⁰ mînak bidin ewê bes be.

Di dîwana Mela 'Ebdul'ezîz de jî em heman rewşê dibinin. Qesîde û xezel tîkilî hev bû ne. Ji ber vê jî hev veqetandina qesîde û xezelên Mela 'Ebdul'ezîz karekî muşkil e. Belkî em bikaribin *Ne'î* û *Mersiyeyên* Mela 'Ebdul'ezîzî weke qesîde bihesibînin. Bi vî şiklî em dikarin 14 şî'rên Mela 'Ebdul'ezîz weke qesîde bi nav bikin.

Xezel

Di dîwana Mela 'Ebdul'ezîz de herî zêde teşeya xezalan tînin dîtin. Bi vî rengî ew xezelnûsek e. Di dîwana wî de 83 xezel cih girtine. Bi nêrînek giştî mijara xezelan ya sereke tesewufa 'aşiqane ye.

Muxemmes

Di dîwana Mela 'Ebdul'ezîz de yek muxemmes cih digire. Ev muxemmes ji 10 benda pêk hatiye. Mijara muxemmesê 'îşq e. (Ş 106)

Mesnewî

Mela 'Ebdul'ezîz, di dîwana xwe de cih daye 6 mesnewîyan. Mesnewîya yekem saqîname ye. Saqîname jî 26 malikan pêk hatiye. (Ş 111) Ziman farsî ye. Mesnewîya duyem bi zimanê 'erebî ye,

¹⁰ Ji bo mînakên dîwana Se'diyê Şîrazî binêr; (Deştî, 1365). Ji bo mînakên dîwana Hafîzê Şîrazî binêr; (Rehber, 1373)

ji 44 malikan pêk hatiye û mijar pesindarî ye. (§ 112) Mesnewiya sêyem bi ‘erebî nivîsiye pesnên hersê murşidên xwe dide û ji 10 malikan pêk hatiye. (§ 113) Ya çarem dîrok kiriye mijara xwe û ji 19 malikan pêk hatiye. (§ 114) Di mesnewiya pençem de sebebê nivîsandina dîwanê bi sê malikan aniye ziman. (§ 115) Mijara mesnewiya şeşan dîrok e, 13 malik e û zimanê wê tirkî ye. (§ 116)

Rûba’î

Di dîwana Mela ‘Ebdul’ezîz de yek rûba’î cih digire. Mijara rûba’iyê dûrbûna ji me’şûqê ye. Ziman farsî ye. (§ 117)

Ferd

Sê ferd di dîwana Mela ‘Ebdul’ezîz de cih girtine. Zimanê her sê ferda jî farsî ye. Mijara wan ‘işq û xema dûrbûna me’şûqê ye. (§ 108, 109, 110)

Murebbe’

Em di nava şîrên Mela ‘Ebdul’ezîz de liqayê yek murebb’ê dibin. Di binyata xwe de ev, murebbe’a mulemme’e. Mulemme’êke çar zimanî ye û ji 11 benda pêk hatiye. (§ 107) Mela ‘Ebdul’ezîz, di mulemme’a xwe de pergalek ava kiriye. Di serê her bendekê de bi rêzê cih daye zimanekî. Di benda pêşî de rêza zimanan bi vî rengiye. ‘Erebî, farsî, tirkî û kurdî. Di benda duyem de; farsî, tirkî, kurdî û ‘erebî li pey hev hatine. Bi vî şiklî di her bendê de ziman cih diguherin. Mijara murebbe’a mulemme’ê mersiye ye.

Qit’e

Şeş qit’e di dîwana Mela ‘Ebdul’ezîz de cih digirin. Du qit’e ku yek bi ‘erebî (§ 97) û yek jî bi kurdî ye (§ 98) maddeya tarîxêye û li ser dîroka wefata Şêx Mûhemmed Dîyauddîn hatine honandin. Her çar qit’eyên din ku yek bi ‘erebî ye û yên mayî bi farsî nin mijarên wan ‘işq e. (§ 100, 101, 102, 103) Sê qit’e bi sê malikan û sê qit’e jî bi du malikan hatine honandin.

Tercî’î Bend

Tercî’î bendên Mela ‘Ebdul’ezîz du heb in. Ya yekem mersiye ye li ser Şêx Mûhemmed Dîyauddîn. Ev mersiye ji heft bendan pêkhatiye. Ziman kurdî ye. Weke mulemme’êke sê zimanî û netekûz jî dikare were hesibandin. Benda yekem weha dest pê dike.

Ey şehê ‘alî cenab ey warisê ‘ilmê Resûl
Em jî derdê firqeta te bûne mehzûn û melûl

لشيء كنت تراباً اذ شرعتم في الافول

Dil keîb im dil keîb im dil keîb im dil keîb
Derdemend im derdemend im derdemend im bê tebîb (§104-1)

Şî’ra duyem ji 15 benda pêkhatiye. Mijar medîhe ye. Ziman kurdi ye lê mulemme’êke du zimanî û netekûz jî dikare were hesibandin. Destpêka şîrê weha ye.

Ey Dîyeddîn û dunya wey şehê ‘alî himem
Wey siracê rahê ‘eql î menbe’a hilm û kerem
Te vekir dîsa di dilda hesret û eş û elem

Ez feqîr im bê nesîb im hem xerîb im dil keîb
Talibe wesla te me nîne ji xeyrê te tebîb (§105-1)

3Naveroka Dîwana Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî

Naveroka edebiyata klasîk gelek dewlemend e. Li gorî naverok, mijaran nav li şî'r û menzûmeyên edebiyata klasîk hatine kirin ku bi istilaheke edebî *Cûreyên Nezmê* hatiye gotin. Di vê beşe de em ê li ser cûreyên nezmê yên dîwana Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî rawestin. Di devara pêwîst be bi kurtasî pênaseyên cûreyan, di dîwana Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî taybetiyên sereke yên cûreyên nezmê û dîsa dema pêwîst be malikên mînak ew ê werin dayîn. Li gorî tespîtên me cûreyên nezmê yên dîwana Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî bi vî şiklî derketin holê.

Mijara Şi'ran	Hejmara Şi'ran
'Îşq - Tesewuf	68
Medîhe	27
Mersiye	8
Ne't	6
Dîrok	2
Maddeya Tarîxê	2
Silsilename	1
Felsefe	1
Saqîname	1
Sebebê Nivîsandina Dîwanê	1
Giştî	117

Tesewuf

'Îşq, di dîwana Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî de mijara sereke ye. Ev 'îşq, 'îşqa Îlahî ye. Em dikarin edebiyata kurdî ya tesewufî di çerçoweya edebiyata kurdî ya klasîk de weke du beşên sereke dabeş bikin. *Edebiyata Tesewufî ya Klasîk û Edebiyata Dergahî*.¹¹ Di edebiyata tesewufî ya klasîk de du taybetiyên sereke derdikevên pêşmerî me; mijara sereke 'îşqa Îlahî ye û ziman giran e. Di edebiyata dergahî de li hember 'îşqa Îlahî evîna rêberên terîqetan cih digire û ziman sivik e.¹² Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî hem nûnerê edebiyata tesewufî ya klasîk e û hem nûnerê edebiyata dergahî ye. Di dîwana wî de herdu cûre edebiyat cih bigirin jî edebiyata tesewufî ya klasîk serdesttir e.

Tesewufa Mela 'Ebdul'ezîzê tesewufa 'aşîqane ye.¹³ Di Tesewufa 'Aşîqane de 'îşq û mijarên têkildarî 'îşqê mijarên sereke ne. Şî'rên Mela 'Ebdul'ezîzê yên di çerçoweya edebiyata tesewufî ya klasîk de

¹¹ Dibe ku Edebiyata Dergahî, weke têgeheke nuh derkeve pêşberî hin kesan. Edebiyata Tesewufî li dor du mijarên sereke dizivîre. Yek jê 'îşqa Xweda û Resûlê Xweda, ya düyem jî hezkirina şêx û murşîdên terîqetê ye. Divê ev herdu mijar jî hev werin veqetandin û di çerçoweya xwe de werin nixandîn. Ji ber vê jî di vê gotarê de ji bo şî'rên li dor dergahên terîqetan û li ser şêx û murşîdan hatine honandin em dibêjin Edebiyata Dergahî. Û ji neha û pêve di binê vî navî de dê ewê were nixandîn.

¹² Ji ber ku mijara me ne berawirdiya herdu edebiyata ne, tenê me du cudahiyên sereke dest nîşan kir. Helbet bi vokolînên berfireh gelek taybetiyên herdu edebiyatan ewê derkevin holê.

¹³ Di sedsala 7 û 8ê koçî de di tesewufa Îslamê de du ekolên sereke tîn dîtin. Yek jê ekola Ferîduddîn 'Ettarê Nisabûrî (w 618/1221) û Mawlana Celaleddînê Belxî ye (w 672/1273) ku ji vî ekole re Tesewufa 'Aşîqane tê gotin. Ya din ekola Şehabeddîn Suhrewerdî (w 632/1234), Muhyiddînê 'Erebî (w 638/1240) û Îbn Farîd (w 632/1235) e ku ji vî ekole re Tesewufa 'Abidane tê gotin. Di Tesewufa 'Aşîqane de tesewuf îbaret e ji zuhd, 'îbadet, pêkanîna ferda, dewama li ser adab û sunnet û ewrad û zikran. Di Tesewufa 'Aşîqane de tesewuf 'îbaret e ji wecd, sima', qewl, terane û şî'rê (Kaşanî, 1394, r.25-26). Di ekola Tesewufa 'Abidane de bêtir berhemên peşan hatin nivîsîn ku îro em wan weke klasîkên tesewufê bi nav dikin. Di ekola Tesewufa 'Aşîqane de berhemên menzûm hatin nivîsîn ku di wan berhemên de mijara sereke 'îşq e (Zerrînkûp, 1344, r.156).

hatine honandin em vê yeke dibinin. Di nêrîna Mela ‘Ebdul’ezîzî de her însan girîftarê belaya ‘işqê ye.

داغ انوار محبت بر رخس آثار عشق

از بنی آدم نباشد هرکه نبود در دلش

Ji ademîzadan nayê hesibandin herkesê ku di dilê wî de daxê nûra evînê û di rûyê wî de nîşanên ‘işqê cih negirtibe (§ 62-4)

Xala girîng ev e ku şî’rên Mela ‘Ebdul’ezîz yên di çerçoweya edebiyata dergahî de hatine honandin, bi taybeti di medîhe û mersiyyan de ku du cûreyên sereke yên vê edebiyatê nin em heman mijarê, ‘işqê dibinin. Mela ‘Ebdul’ezîz, dema pesnê şêxên xwe dide û dema li ser wefata wan xemên xwe di malikên xwe de tîne ziman bi nêrînek ‘aşiqane hest û hizrên xwe tîne ziman. Ji ber vê hinek medîhe û mersiye li ser kê hatine honandin bi zelalî ne diyar e. Bi hinek bêjeyên wekî “ji darê dunyayê çû” (§. 83-3) em dizanin ku şî’r mersiye ye. Bêje, têgih û terkîbên di şî’rên ‘aşiqane de tîne dîtîni di şî’rên edebiyata dergahî yên Mela ‘Ebdul’ezîzî de zêde cih girtine. Wekî mînak dema dibêje; “yara min wekî masî ji destê min çû, çare nîne ji vî bextê min yê wendayî re, ey ronîya çehvên min kafîrek nebîne xema ku ez dikêşim ji hicreta wî şahî, sebir zor e, mirin asan e, dîsa vegehrîne qedeha wîsalê ey saqî, yek cur’eyekê bide me ku em şukrê Xweda bikin...” (§. 83-5-6-7-8) bêje û têgehên wekî yar, bextê wendayî, şah, wîsal, saqî, cur’e û bêjeyên wekî mecnun, bêçare, rû û mah ku di malika jêrîn de ew ê werin hemû bêje, têgih û terkîbên şî’rên ‘aşiqane nin.

محروم گشتیم از روی آن ماه

ما همچو مجنون بیچاره بودیم

Em wekî Mecnûn bêçare bûn, mehrûm man ji rûyê wê mehê (§.83-9)

Bi vî şiklî şî’rên Mela ‘Ebdul’ezîzê Bedlîsî yên tesewufî, çî yên edebiyata tesewufî ya klasîk û çî yên edebiyata dergahî li ser ‘işqê ava bû nin. Eger em vê yeke wekî taybetiyên Mela ‘Ebdul’ezîz hîlbijêrin em dê bibêjin ku Mela ‘Ebdul’ezîz di navbera edebiyata tesewufî ya klasîk û edebiyata dergahî de pîrek e.

Medîhe

Pîştî mijarên tesewufî herî zêde di dîwana Mela ‘Ebdul’ezîzî de medîhe cih digirin. Medîhe¹⁴ yek ji kevintirîn cûreyê şî’rê ye. Medîhe ev cûre şî’r e ku di şî’rê de pesnê kesekî/ê, girûhekê, avakerê netew-hukumetekê û yan jî rewş û xilqeta nefsanî ya însên hatibe kirin (Dad, 1375, r.431). Li dor vê pênaseyê di dîwana Mela ‘Ebdul’ezîzî de du cûre medîhe tîne dîtîni. Medîheyên li ser kesayetan û medîheyên li ser rewşê.

Di biwarê medîheyên li ser rewşa kêfxweşiya rûhî de yek şî’r cih digire di dîwana Mela ‘Ebdul’ezîzê Bedlîsî de. Di vê medîheyê de şa’ir bi hatina zanyarê xwendina Qur’ana Pîroz ku şa’ir wî bi “reîsê cumle qurra” serokê hemû zanayên xwendina Qur’ana Pîroz di pesinîne gelek kêfxweş e û ji bo vê rewşê spasdariya Xweda dike. Malika yekem ya şî’rê weha ye.

Şukur olsun sena Rebbim ki oldi dinimiz me’mur

Kelamin husni tecwidle bizi pek eyledin mesrur

Xweda ya! sipas ji te ra ku dîne me abadan bû, gotinên te (Qur’ana Pîroz) bi xweşikahiya

¹⁴ Di edebiyata tirkî de “Methîye” tê gotin. Bêje bingeha xwe ji zimanê erebî ji “medh”ê werdigire û bi wateya pesnê ye. Di edebiyata Ereban de bi bêjeyên weke; medh, medîh, medîhe, umdûhe ve midhe cih digire. (Durmuş, r. 406) Di edebiyata Farsî de bi gelemperî Medîhe tê bikaranîn. Bnr: (Kraçî, 1391, r 143) Li Başûr, hem li herêma Behdînan û hem li herêma Soran jî “Medîhe” tê bikaranîn. Bnr: (Doskî, 2022, r.117) Ji ber vê me jî di vê gotarê de “Medîhe” bikaranî, û êdî em ê “Medîhe” bikarbinîn.

tecwîdê em gelek kêfxweş kirin. (Ş 99-1)

Di medîheyên li ser kesayetan de em rastî navê çar kesayetan dibin. Ji van kesayetane sisê ji wan em bi teqez dizanin ku murşîdên Mela ‘Ebdul’ezîzî ne. Ev her sê kesayet Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî, Şêx Fethullahê Werqanîsî û Şêx Mûhemmed Dîyauddîn e. Yê çarem Şêx ‘Elaeddîn e.¹⁵ Ji dîwanê nayê famkirin ku Şêx ‘Elaeddîn murşîdê wî ye yan ne murşîdê wî ye.

Yek ji taybetiyên sereke yên medîheyên ev e ku navê kesê/a ku pesindarî ya wî/wê tê kirin di şî’rê de cih bigire. Ev taybetî di tevahiya medîheyên Mela ‘Ebdul’ezîzî de nayê dîtin. Bi vî rengî medîheyên Mela ‘Ebdul’ezîzî ne yekaheng in. Hin medîheyên wî ne diyar e ji bo kê hatine honandin.¹⁶ Bi siyaq û sîbaqa bêjeyan tê famkirin ku cûreyê şî’rê medîhe ye. Weke mînak di malika jêrîn de bi bêjeyên weke *terîqet û qutbu’l-ewlîya* em tê digihêjin ku şî’r medîhe ye.

راكب الفلك علايم الطريقة غائبا اخذاً در الحقيقة انت قطب الاولياء

Sîwarê keştiyê li ser deryaya terîqetê, xwe noq dike derdixe durrên heqîqetê, tu qutbê ewlîya yî. (Ş 8-5)

Di medîheyên din de li dor kevneşopiya edebiyata klasîk navê kesayetan reterast derbas dibin. Weke di destpêka vê şî’rê de ku navê Şêx Mûhemmed Dîyauddîn bi lêv dike.

Ela ey serwerê xwûban *Dîyauddîni* sultan em
Senin ‘eşkinde can werdim senin yolinde kurban em (Ş 65-1)

Mersiye

Rabirdûya mersiyeyan, zêmaran li gorî hinek lêkolîneran digihêje destpêka mirovahiyê. Li gorî van lêkolîneran kesê yekem şî’r honandiye Hezretî Adem e (s.x.l.). Hezretî Adem (s.x.l.) şî’ra xwe li ser kuştina lawê xwe Habîl honandiye. Bi vî rengî dibêjin yekem şî’ra mirovahiyê mersiye ye¹⁷ (Bethayî, 1381,r.164).

¹⁵ Lawê Şêx Fethullahê Werqanîsî ye. Di sala 1299/1881 an de li Norşînê hatiye dinyayê. Îcazeya xwe ya ‘ilmî ji Mela ‘Ebdulkêrîm El Hîzanî werdigire. Di tesewufê de xelîfeyê Şêx Mûhemmed Dîyauddîn e. Di sala 1369/1949 an de li Oxînê rehmet dike. (Bilen, 2012, r. 87-108)

¹⁶ Li gorî jêderên berdestên me di edebiyata kurdî ya klasîk de yekem kesê ku di medîheyên xwe de navê pesindarî derbas nekiriye Melayê Cizîrî ye. Melayê Cizîrî di du qesîdeyên xwe de ku naveroka wan – bi nêrînek giştî – medîhe ye navê kesekî/ê derbas nake. Qesîdeya ku bi metle’ a

Ey şehinşahê mu’ezzem heq nîgehdarê te bî

Sûreyê inna fetehna dor û madarê te bî (Cizîrî, 2019, r. 282).

destpê dike û di qesîdeya ku bi metle’ a

Xanê xanan lami’ê necma te her purnûri bî

Keştiya bextê te ez bayê muxalîf duri bî (Cizîrî, 2019, r. 285).

destpê dike de em rastî tu navan nayên. (Helbet pêwîste li ser qesîdeyên Melayê Cizîrî nîrxandinên xweser werin kirin. Pêkan e bi van xebatan hin taybetiyên ciyawaz jî derkevên holê û di derbarê medîheyên edebiyata kurdî ya klasîk û medîheyên edebiyata ‘erebî, farsî û tirkî xalên cûda werin bidestxistin.)

¹⁷ Li gorî lêkolîneran mersiyeya Hezretî Adem (s.x.l.) weha ye:

تَغَيَّرَتِ الْبِلَادُ وَمِنْ عَلَيْهَا فُوجُهُ الْأَرْضِ مَغْبَرٌ قَبِيحٌ

تَغَيَّرَ كُلُّ ذِي طَعْمٍ وَلَوْنٍ وَقَلَّ بِشَاشَةِ الْوَجْهِ الْقَبِيحِ

فَوَا اسْفَا عَلَا هَابِيلُ ابْنِي قَتِيلٌ قَدْ تَضَمَّنَهُ الضَّرِيحُ

Hemû serzemîn û tişt û kesên tê de veguhezîn, tozê li çehreya zemîn û girt pîs bû / reng û tama her tiştî guherî û rûkeniya wechên xweşik kême bû / ax xem û derdê lawê min Habîl ku hat kuştin û gorê ew ji xwe re bir.

Mersiye, zêmar bi pênaseyek giştî ew cûre şî'r e ku derbarê şîn û metama mîriyan de hatiye honandin (Fesayî, 1380, r 172). Lê dema mersiye tên dabeşkirin em dibinin ku ne tenê li ser mirina kesayetan tên honandin. Belkî hemû şî'rên mijarmatem weke mersiye hatine qebûlkirin.¹⁸ Medihe çewa nişandayîna heskirinê ye, mersiye yan zêmar jî rengvedana xema dûrketinê ye. Pêkane ku ev dûrketin ji kesekî/ê be yan ji tişteki be.

Di dîwana Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî de li ser sê kesayetan mersiye hatine honandin. Bi vî şiklî di dîwanê de tenê li ser kesayetan mersiye tên dîtin. Her sê kesayet jî murşidê Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî ne. Ev her sê kesayetane weke li jor jî derbas bû Şêx 'Ebdurrehmanê Taxî, Şêx Fethullahê Werqanîsî û Şêx Mûhemmed Dîyauddîn e.

Xala girîng ev e ku di mersiyyên xwe de Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî şîna wefata murşidên xwe tevî xema pisgirêkên tesewufî anîye ziman. Bi vî rengî mersiyyên Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî hem mersiyyên kesayeti nin û hem mersiyyên felsefî nin. Bi gotinek din mersiyyên wî *kesayet-felsefî* ne.¹⁹ Di van mersiyyan de hem şîna kesayetan heye û hem jî xema rewşa wî ya tesewufî heye. Di malika jêrîn de eşkera xema xwe derbarê rewşa xwe ya me'newî tîne ziman.

كيف حالى يا الهى ما لنا حسن العمل

Hem irakdir yolumuz yokdur bize hiçbir emel

Xwedaya! Ewê halê me çewa bibe, kiryarên me yên baş nînin, rêka me dûr e, ji me re tu hevî tune.
(Ş 107-10)

Ne't

Di bingeha xwe de ne't cûreyek mediheya ye. Şî'rên ku mijara wan pesn û wesfên cenabê Peyamber in (s.x.l) ji wan ra ne't hatiye gotin. Weke ku Mela Huseynê Bateyî (1670-1750) di şî'ra xwe de ji bo wesf û medhên cenabê Peyamber (s.x.l) ne't gotiye. Ne't, weke cûreyek serbixwe di berheman de cih girtine.

Ey ne'te tu ez 'erşî heta ferşê şehîra
Ez pertwê nura te cîhan geşt munîra (Sadîni, 2013: 80)

Çewa ku di ne'ta Bateyî de navê cenabê Peyamber (s.x.l) derbas nabe, ji pesnên ku hatine kirin mirov têdigihêje ku cûreya şî'rê ne't e, di ne'tên Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî jî de heman rewş tê dîtin. Ev yek weke kevneşopiyek edebiyata klasîk jî dikare were hesibandin. Di ne'tên Melayê Cizîrî de jî navê cenabê Peyamber derbas nabe.²⁰

¹⁸ Fesayî, mersiyyan bi heft cûreyan dabeş dîke. Mersiyyên fermî, mersiyyên şexsî û malbatî, mersiyyên derbarê heval û şa'îrên dîtir, mersiyyên mezhebi, mersiyyên felsefî, mersiyyên civakî û mersiyyên dastanî. Ji bo agahiyên berfirehtir bnr: (Fesayî, 1380, r 172-174).

¹⁹ Li gorî cûreyên ku Fesayî destnîşankirine me navekî wusa hilbijart. Divê were gotin ku dabeşkirina Fesayî li gorî edebiyata farsî ye. Hetanî neha li ser mersiyyên edebiyata kurdî xebatên xweser nehatine kirin. Li zanîngeha Bîngolê li ser mersiyyên edebiyata kurdî tezek doktorayê amade dibe. Di dema nivîsandina vê gotarê de teza navborî nehatibû parastin û pejirandin. Pêkane ku di edebiyata kurdî de hin cûreyên din yên mersiyyan werin peyitandin bi vê xebata berfireh. Ji ber ku mijara me bi tena serê xwe ne mersiye ne em ê nekevên nava hûrguliyên mijarê.

²⁰ Di dîwana Melayê Cizîrî de hem di ne'ta bi malika
Ismê te ye mektûbî di dîwanê qidem da
Herfêk qelemê 'ilmi bi teqwîmê reqem da (Cizîrî, 2019: 18).

destpêdike û hem di ne'ta bi malika
Îro ji cemala te dilê min bi birîn e
Ellah çî hebîbî çî tebîbî vikewîne (Cizîrî, 2019: 219) de navê cenabê Peyamber (s.x.l) cih nagire.

Mela ‘Ebdul’ezîzê Bedlîsî, di ne’tên xwe de hestên xwe yên evînî anîne ziman. Bi gotineke din hezkirina xwe ya li hember cenabê Peyamber (s.x.l) tîne zimên. Ango di van ne’tan de tevî wesfên cenabê Peyamber (s.x.l) hestên şa’irî yên ‘aşiqane jî xuya dibin. Di malikên jêrîn de ev rewş eşkera xuya ye. Di malikan de bi bêjeyên “rehmetê ‘alem”²¹ xuya dibe ku ev şî’r ne’t e.

آن نور مقدس که نما بود برویت
قد صیر جسمی و فوآدی لک صیدا
چون رحمت عالم شدی ای بحر کرمکار
صیرت لقلبی بفنا بابک قیدا

Ew nura pîroz ku xuya bû di wechê te de, teqez cism û dilê min bû seyd ji te re, ji ber ku tu bû rehmet ji ‘alemê re ey behra keremkar, bi fanîkirinê te min bi deriyê xwe ve girêda. (Ş 5-5,6)

Mela ‘Ebdul’ezîzê Bedlîsî, ne’teke xwe bi şeweya munacatê honandiye. Di şî’rê de hawar û gaziya xwe bi cenabê Peyamber (s.x.l) dike. Di vê ne’tê de jî weke ne’tên din navê cenabê Peyamber (s.x.l) derbas nabe, jî taybetiyên sereke yên cenabê Peyamber (s.x.l) em tê digihêjin ku cûreya şî’rê ne’t e. Malika ku taybetiyên cenabê Peyamber (s.x.l) tê de derbas dibe weha ye.

Pîşwayê enbîyaê muhterem
Peykê esrarê tu Cibrilê Emîn
‘Aşiq û mehbûbê Yezdan elxîyas
Dafî’ê şekk û ruyûban elxîyas (Ş 28-7,8)

Felsefe

Mela ‘Ebdul’ezîzê Bedlîsî, di dîwana xwe de xasma di şî’rên tesewufî de cih cih pertewên felsefeya xwe numayan dike. Di malikên wî de em derkdikin ku şopînerê felsefeya Wehdetu’l-wucûdê ye. Derbasbûna hedîsa “kuntu kenzen”²² di du malikan de nişana vê yeke ye (Ş 27-6, 53-4). Herçend di şî’rên tesewufî de cih cih pertewên felsefeya tesewufê xuya bikin jî Mela ‘Ebdul’ezîzê Bedlîsî şî’reke xwe jî bo mebestên xwe yên felsefî terxan kiriye. Ev şî’r jî 16 malilkan pêk hatiye. Zimanê şî’rê kurdî ye. Destpêka şî’rê bi vî rengî ye;

Ey dil demekê tu bibe namiq
Hetta ku Xweda neyaferîdî
Da bo te beyan bikim heqaiq
Yek bû, bi xwe bû, bo xwe ‘aşiq (Ş 61-1,2)

Silsilename

Silsilename, Şecerename, Tebarname yan Dûdname ev fihrista bi rêkûpêk e ku di wê fihristê de nisbeta ferdeki bi yekî din nişan dide (Niyûz, 1451). Silsile, bi wateya zincîrê ye. Silsilename, ji bo wan kesan tê bi karanîn ku weke helqeyên zincîrê bi şikleki, bi tîkiliyekê bi hevudû girêdayî nin (Niyûz, 1451). Silsilenameyên terîqetan jî bi sedema ku her murşidek ji murşidekî din dest, xelîfetiye werdigire hetanî jor bi hevudû girêdayî nin. Silsilename çi dema bi nezm derdikeve holê di edebiyatê de dibe cûreyek edebî.²³

²¹ Rehmetê ‘alem telmiha ayeteke Qurana Pîroz e. Qurana Pîroz ji bo cenabê Peyamber (s.x.l) weha dibêje; (Hey Muhammed) Me tu şandî bes da ku tu ji heyînan re bibî rehmet (Qur’an, 2015: 330).

²² Her çend di çavkaniyan de metnê vê hedîsê ciyawaz derbas bibin jî bi nêrînek giştî wateya vê hedîsê wehaye. “*Ez gencîneyek veşartî bûm, ji bo ez werim naskirin, min xelq afirandin.*” Behs û fehisa ku ev hedîs e yan ne hedîs e di nava zanyaran de berdawam e. Xasma ji teref mutesewifan weke hedîs hatiye pejirandin. Li gorî mutesewifan ev destpêka afirandina hemû heyînen gerdûnê ye tevî gerdûnê. Di nêrîna wan de xweşikahiyeke Xweda hebû ku ev xweşikahî veşartî bû. Xweda, ji bo xweşikahiya xwe ya bêdawî bide nasîn gerdûn û hemû heyînen gerdûnê afirand. Ji bo behs û fehîsên derbarê vê hedîsê de ku hedîs e yan ne hedîs e bnr: (Ergül, 2015: 262). Ji bo cudahiyeke metnê vê hedîsê bnr: Aryanfer&Neqîzade, 1390: 182).

²³ Ji bo hin agahiyeke derbarê silsilenameyên edebiyata kurdî bnr: (Ertekin N. , 2020: 112).

Di silsilenameyên terîqetê de navê murşidan ji yê yekem destpêdike hetanî digihîje yên dawî. Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî, ev kevneşopiya silsilenameyan neşopandiye. Pêşî navê hersê murşidên xwe aniye ziman. Piştî ku ji Xweda alîkariyê dixwaze bi rêzê navê cenabê Peyamber (s.x.l), her çar xelîfeyan û rêberên terîqeta neqşebendî tîne ziman. Şî'r bi vî şiklê xwe ne silsilenameyek tekûz e. Silsilename kurte, bi tevahî ji 9 malikan pêkhatiye û zimanê silsilenameye farsî ye. Malika pêşî ev e;

مرا شد روزی عشق روی خوبان

برآفت چون نگه کرد عبدالرحمن

Çi dema 'Ebdurrehman bi mihribanî li me nêrî, ji me re evîna rûyê xweşikan bû nesîb. (§ 76-1)

Dîrok

Di dîwana Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî de mijara du şî'ran dîrok e. Teşeya herdû şî'ran jî mesnewî ye. Di herdu mesnewiyên de behsa cenga li derdora Bedlîsî hatiye kirin. Di mesnewiyekê de behsa cenga di sala 1890 de ku li Bedlîsî û di mesnewiya din de cenga di sala 1899 de li Taloriyê²⁴ tê kirin. Weke ku ji dîrokî xuya ye di van salan de bûyerên Ermena li herêma Bedlîsî tîne dîtîn (Cırık, 2015: 269). Mesnewiya ku behsa cenga Bedlîsî dîke bi 'erebî hatiye nivîsîn û 19 malik e. Mesnewiya behsa cenga Taloriyê dîke bi tirkî hatiye nivîsîn û 13 malik e. Ya rastî di vê mesnewiyê de ji dîrokê bêtir pesnê walî hatiye dayîn. Lê Şa'ir navê walî nabêje.

Maddeya Tarîxê

Maddeya Tarîxê ew cûre şî're ku di şî'rê de dîrok hatibe destnîşankirin. Şa'ir, di şî'rê de dîroka bûyer û serpêhatiyên mezin, mijarên balkêş cîbicî dîke. Dîroka roja ji dayikbûn û mirina kesayetan, destpêka desthilatdariya desthilatan, avakirina mizgeft, kax, medreseyan, telîfa berhemana û amadekirina berhemana ji hinek mijarên maddeya tarîxê ne (Fesayî, 1380, r 310). Maddeya tarîxê dibe di dawîya şî'rekê de bi cih bibe û dibe ku şî'rên serbixwe bin. Dema ku maddeya tarîxê weke şî'rên serbixwe tîne nivîsîn bi gelemperê bi teşeya qit'e yan çarînan tîne nivîsîn.

Di dîwana Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî de bêtir ku di hinek şî'ran de maddeya tarîxê cih girtibe, di şî'rên serbixwe mijara wan maddeya tarîxê ne. Herdû şî'r jî bi teşeya qit'eyan hatine nivîsîn û ji sê malikan pêkhatine. Serwabendiya herdu şî'ran bi vî rengî ne. a-a, a-a, b-a. Qit'eya yekem bi 'erebî ye (§ 97) û ya duyem bi farsî ye. Herdû maddeyên tarîxî jî ji bo dîroka wefata Şêx Mûhemmed Dîyauddîn hatine terxankirin. Di qit'eya ku bi farsî hatiye nivîsîn de malika ku dîrok di wê de bi cih bûye weha ye.

گشت از دنیا بسوی جنت الماوی روان

در هزارو سیصدو چهل دوم از سال هجر

Di sala sêsed û çil û diduyan de ji salên koçê, ji dinyayê ber bi cennet'u-l mewa ve rewan bû. (§ 98-3)

a. Saqîname

Saqîname, ew cûreya şî'rê ye ku bi teşeya mesnewî, bi kêşa 'erûzê û bi behra Muteqarib hatiye nivîsandin. Bê feyde buna dinê, pend, hikmet, mirin û bîranîn weke mijarên sereke di wan de tîne vegotin. Tevî bêtir saqî, bêtir wekî; bade, mey, mutrib, cam, ney ku bi şerab û saz tîkildarin bêtir sereke ne (Şefî'yan, 1392, r.12). Di ev cûre şî'rê de şa'ir, saqî ji xwe re muxateb dibîne. Kul û xemên xwe ji saqî re vedibêje û her dixaze ku saqî bi mey û bade û bi saz û neyê elemên dilê wî bide jibîr kirin.

²⁴ Talorî, gundê Qabilcewz (Sason) ê ye. Di dîrokê de serhildanên Ermenan li Qabilcewz û Taloriyê bi nav û deng e. Di sala 1899de leşkerên ji parêzgeha Bedlîsî li Taloriyê û derdora wê bi Ermenan re şer dîkin û serok û çekdarên Ermenan dikujin (Çelik, 2016: 178).

Saqînameya Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî ji 26 malikan pêk hatiye. Bi teşeya mesnewiyê û bê behra muteqarib honandî ye. Zimanê saqînameyê farsî ye. Bi gotinek din hemû taybetiyên saqînamayen di xwe de civandiye. Malika serî bi vî rengî ye.

که با وی کنم دین و ایمان درست

بیا ساقی با جام روز نخست

Were saqî bi wê cama roja yekem ku bi wê ez dîn û îmanê durust bikim. (§ 111)

b. Sebebê Nivîsandina Dîwanê

Di edebiyata klasîk de xasma di mesnewiyan de em rastî sebebê nivîsandina berhemana dibin. Nazimê mesnewiyan ne weke beşek serbixwe, bêtir di destpêkê de bi çend malikan sebebê nivîsandina mesnewiyê dide ber çavan. Weke ku Şêx Ehmedê Xanî di destpêka Nûbihara Biçûkan de dibêje;

Ne ji bo sahibrewacan

Belkî ji bo biçûkên Kurmancan

Wekî ji Qur'anê xelas bin

Lazim e li sewadê çavnas bin (Yıldırım, 2008, r.159)

Lê em dibînin ku şa'irên Kurdan ji bo dîwanên xwe sebebê nivîsandinê di şî'rek serbixwe de gotine. Weke mînak Mela Beşîrê Şêx Zahir di serê dîwana xwe de bi mesnewiyeke çar malikî sebebê honandina şî'rên xwe aniye zimên. Bnr: (Doskî, 2022, r 5.)

Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî, mesnewiyeke kurt ji bo sebebê nivîsandina şî'rên xwe honandî ye. Ev mesnewî ji sê malikan pêk hatiye. Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî sebebê nivîsandina dîwanê di wê mesnewiyê de bi van malikan tîne zimên.

مجتمع بودی چو پنهان بود آن مولای من

این نوشتم در زمان لشکر غمهای من

Min ev nivîsandin di demên ku leşkerê xemên min li min kom dibûn çî dema ku Mewlayê min ji min wunda dibû. (§ 115)

Encam

Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî, şa'irê edebiyata kurdî ya klasîk e. Derbarê jiyana wî de agahiyên zêde nehitine bidestxistin. Tiştê ku ji dîwana wî tê famkirin di navbera salên 1875-1923an de li heyatê bûye. Yanî di dawiya sedsala 19an û di serê sedsala 20î de jiyaye. Bi eslê xwe jî ku ye ne diyar e. Nasixê destxeta dîwana wî, wî bi Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî nasandiye. Ji ber vê wekî şa'irê Bedlîsî tê nasîn.

Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî, dîwanek murettib li pey xwe hiştîye û di dîwana xwe de du mexles; 'Ebdul'ezîz û Şeyda bikaranîbe jî mexlesa Şeyda bêtir derdikeve pêş.

Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî, di honandina şî'rê de serkeftî ye. Derbarê edebiyatê de û xasma resm û rêçên şî'rê de xwedî agahiyên tekûz e. Herweha di derbarê ziman û edebiyata 'ereb, faris û tirkî de jî xwedî agahi ye.

Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî, şa'irê edebiyata kurdî ya klasîk yê çar zimanî ye. Di dîwana xwe de bi çar zimanan şî'r honandî ye. Di dîwana wî de zimanê sereke farsî, yê duyem kurdî yê sêyem 'erebî û yê çarem tirkî ye. Ji bilî şî'rên ku bi tevahî bi zimanekî hatine honandin, şî'rên mulemme'ên du zimanî, sê zimanî û çar zimanî jî cih girtine.

Di dîwana Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî de 117 şî'r cih girtine. Ji teşeyên nezmê li gorî hejmarê

zêdebûna wan bi rêzê; Xezel-Qesîde, Mesnewî, Qit'e, Ferd, Terci'î bend, Muxemmes, Murebbe' û Rûba'î têne dîtin.

Dîwana Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî ji layê naveroka xwe, cûreyên nezmê ve gelek dewlemend e. Ji cûreyên nezmê, ji yên pir ber bi yên hindik ve; 'Işq – Tesewuf, Medîhe, Mersiye, Ne't, Dîrok, Madeya Tarîxê, Felsefe, Silsilename, Saqîname û Sebebê Nivîsandina Dîwanê di dîwanê de cih girtine.

Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî, şa'irekî sofî ye û pêgirê terîqeta Neqşebendî ye. Di şî'rên wî de hem mijarên edebiyata tesewufî û hem mijarên edebiyata dergahî tên dîtin. Ji layê edebiyata tesewufî pêgirê tesewufa 'aşîqane ye. Di tesewufa 'aşîqane de felsefeya Wehdetu'l-wucûde şopandîye. Ji vê tê famkirin ku Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî xwe di derbarê tesewuf, felsefe û nêrînên felsefeya tesewufê de perwerde kiriye.

Mela 'Ebdul'ezîzê Bedlîsî, bi honandina medîhe û mersiyyên li ser murşîden xwe edebiyata dergahî jî xistiye dîwana xwe. Ji vî layî ve, ji ber ku di medîhe û mersiyyên wî de hestên 'aşîqane derdikevin pêş di navbera edebiyata tesewufî û edebiyata dergahî de weke pirekê xuya dike.

Çavkanî

- Adak, A. (2016). Helbestvanên Klasîk ji Perspektîfa Herêmi: Nimûneya Herêma Bedlîsê. *The Journal of Mesopotamian Studies*, , Cilt-1, Sayı-1, 33-56.
- Akot, B. (2013). *Nurşin Medresesinin Yetiştirdiği Mutasavvıflar*. Bingöl Üniversitesi Medrese ve İlahiyat Kavşağında İslamî İlimler Uluslararası Sempozyumu (s. 199-2010). Bingöl: Bingöl Üniversitesi Yayınları.
- Aryanfer, M.&Neqîzade, H. (1390). Berresî û Neqîd Sened û Metnê Hedîsê Kenzê Mexfî, 'Ulûmê Hedîs, Fesilnameê 'İlmî-Pijûheşî, Salê Şanzdehom, Şomareê Suwwom, Payîz, 171-187.
- Baz, İ. (2014). Osmanlı'dan Cumhuriyet'e Norşin Dergâhî ve Şeyh Abdurrahman-ı Tâgî. *Tasavvuf İlmî ve Akademik Araştırma Dergisi*, 34 [2014/2], 78-108.
- Bedhayî, S.H. (1381). Şî'r û Neqşê An Der Camî'e, *Mecelleê Danişgahê Edebiyat û 'Ulûmê İnsanı*, Dewre 52, Şomare 164, Tehran, 161-172.
- Bilen, M. (2012). Ohinli Şeyh Alaaddin ve Hadis Usulune Dair Manzumesi. *Atatürk Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, 87-108.
- Cırık, B. (2015). *İkinci Meşrutiyet Döneminde Bitlis Sancağı (1908-1914), Yayınlanmamış Doktora Tezi*. Sakarya: Sakarya Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Tarih Anabilim Dalı.
- Cizîrî, M. (2019). *Dîwan*, Amadekar: Tehsîn İbrahim Doskî, İstanbul: Nûbihar.
- Çağlayan, M. (1996). *Şark Uleması*. İstanbul: Çağlayan Yayınları.
- Çakır, M. S. (2017). Şeyh Abdurrahman-ı Tâgî ve Norşin Tekkesi'nden Yayılan Kollar. *İhya Uluslararası İslam Araştırmaları Dergisi*, c.3, s. 2, Güz 2017, 26-53.
- Çelik, N. (2016). *XIX. Yüzyılda Osmanlı İmparatorluğunda Sason Ermenileri ve Sason Ermeni İsyancıları*, Yüksek Lisans Tezi. Batman: Batman Üniversitesi, Fen Edebiyat Fakültesi, Tarih Bölümü.
- Dad, S. (1385). *Ferhengê Istilahatê Edebî*, Tehran: İntişaratê Morwarîd.
- Deştî, 'E. (1365). *Qelemrûyê Se'dî*. Tehran: İntişaratê Emîr Kebîr.
- Ergül, N. (2015). İnsan-ı Kâmil – Güzel Ahlak İlişkisi. *The Journal of Academic Social Science Studies*, Number: 35, Summer I, 259-270.
- Ertekin, M. Z. (2015). *Biyografiyeke Menzûm a Mela 'Eliyê Baqustanî, Siltan Şêxmûs (metn û Lêkolîn)*. Van: Lorya.
- Ertekin, N. (2020). Nazim û Şa'ir Mela Zahid Zeherî (Başer): Jîyan, Berhem û Kesayetîya Wî ya Edebî. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi 6 / 11 (Haziran 2020)*, 105-136.
- Fesayî, M. R. (1380). *Enwa'ê Şî'rê Farsî*, Şîraz: İntişaratê Nuwêd.

- Kaşanî, M.'E. (1394). *Misbahu'l-Hidaye we Miftahu'l-Kifaye*, Teshîh; Celaledîne Humayî, Tehran: Soxen.
- Qur'an. (2015). *Qur'ana Piroz û Meala Wê Ya Kurdî*. Ankara: Seokatîya Karûbarên Dîyanetê.
- Rehber, X.X. (1383). *Dîwanê Hafîzê Şîrazî*, Tehran: Întîşaratê 'Elî Sefîşan.
- Sadinî, M. X. (2013). *Mela Huseynê Bateyî; Jiyan, Berhem û Helbestên wî*. İstanbul: Nûbihar.
- Şefî'îyan, Z. (1392). Berresî û Tehlîlê Saqînamehayê Edebê Farsî (Ber Esasê Peñç Şa'irê Berceste), *Payannameê Karşunasê Eşed, Şehrêkurd*, Danişgahê Şehrêkurd, Danişgedê Edebiyat û 'Ulûmê Însanî, Grûhê Zenban û Edebiyatê Farsî.
- Şemîsa, S. (1380). *Seyrê Xezel der Şi'rê Farsî (Ez Ağaz ta Îmroz)*, Tehran: Întîşaratê Firdews.
- Tenik, A. (2015). *Tarihsel Süreçte Kürt Coğrafyasında Tasavvuf ve Tarikatlar*. İstanbul: Nûbihar.
- Zerrînkûp, 'E. (1344). *Erzişê Mirasê Sofîye*, Tehran: Întîşaratê Arya.
- Zinar, Z. (2011). Şêx Fethullahê Werqanîsî. *Nûpelda, hejmar: 5, Van*, 11-16.
- Durmuş, İ. *Methiye*, DîA, c 29, r. 406.
- Kraçî, Ruhengîz, Nuxwustîn Zenê Medihe Serayê Kîyst, *Pijûheşnameê Zenan, Pijûheşgahê 'Ulûmê Însanî û Mutale'atê Ferhengî*, Salê Siwwom, Şomareê Ewwel, Bihar û Tabistan, 1391, r, 143-157.
- Doskî, T.Î. (2022), *Gulzar*, Dihok: Weşanên Palo.
- Doskî, T.Î. (2022), *Dîwana Bêxew, Mela Beşîrê Şêx Zahir*, Dihok, Weşanên Navenda Xanî ya Rewşenbîrî û Ragihandinê.
- Yıldırım, K. (2008). *Nûbehara Biçûkan*, İstanbul: Avesta.
- Niyûz, A. (1399). <https://www.azhangnews.ir/2021/02/27/%D8%B4%D8%AC%D8%B1%D9%87%D9%86%D8%A7%D9%85%D9%87%D9%86%D9%88%DB%8C%D8%B3%DB%8C%D8%8C%D8%AD%D9%81%D8%B8%D9%BE%DB%8C%D8%4%DB%8C%D9%86%D9%87%D8%AA%D8%A7%D8%B1%DB%8C%D8%AE%DB%8C/> (Pêgihîn: 12.06.2023)

FEQİYÊ TEYRAN: DANÊRÊ ÇİROKEŞI'RA KURDÎ

Şiyar LEVENT,

Vekolerê Serbixwe, siyarlevent@outlook.com,
ORCID: 0000-0001-7919-5581

Article Type/Makale Türü:

Research Article/Araştırma Makalesi

Received / Makale Geliş Tarihi: 07.04.2023

Accepted / Makale Kabul Tarihi: 10.07.2023

Published / Makale Yayın Tarihi: 20.10.2023

DOI: 10.35859/jms.2023.1279294

**Değerlendirme ve İntihal/Reviewing and
Plagiarism:**

Bu makale iki taraflı kör hakem sistemine göre en az iki hakem tarafından değerlendirilmiştir. Makale intihal.net adlı intihal sitesinde taranmıştır. / This article has been reviewed by at least two anonym reviewers and scanned by intihal.net plagiarism website.

Citation/Atf:

Levent, Ş. (2023). Feqiyê Teyran: Danêrê Çîrokeşî'ra Kurdî, The Journal of Mesopotamian Studies, Jimara Taybet a Edebiyata Kurdî ya Klasik, rr. 132-145,
DOI: 10.35859/jms.2023.1279294.

Şiyar LEVENT

KURTE

Me di vê xebata xwe de berê xwe da yek ji taybetmendiyên Feqiyê Teyran ku çima divê wekî danêrê çîrokeşî'ra kurdî bê nasîn. Di mijara çîrokeşî'ran de Feqî li gor helbestkarên serdema xwe bi awayekî berbiçav derdikeve pêş. Li ser çîrokeşî'rên kurdî hin aloziyên neçareserkiî hene ku xebata me dê li ser wan aloziyan hûr bibe. Di edebiyata kurdî ya klasîk de hin berhemên xwedîmediyar hene û ev nisbetî hin helbestkarên navdar bûne me bal kişande ser vê. Ev mijara heta niha nebûbû mijara xebateke taybet. Di vê xebatê de jî me bal kişand li ser çîrokenûsiya Feqiyê Teyran. Ji ber ku mijara me di mijarên edebiyata zimanên din yê dinyayê de jî mijareke girîng e me berê xwe da lîteratura edebiyatên nêz û ji wan mînak anîn, piştî me nimûneyên kurdî yê derveyê Feqî û herî dawî her çar berhemên Feqî anîn. Me di xebata xwe de berê xwe da tegerîna lîteraturê ji çavkaniyên heyî sûd wergirt û herî dawî dane dan berhev. Di encema xebata me de derket ku Feqiyê Teyran bi çar berhemên xwe yê çîrokeşî'r di edebiyata kurdî de bûye danêrê vê qadê.

Peyvên sereke: Edebiyata Kurdî, Çîrokeşî'r, Çîrokên Menzûm, Menzûmên Kurdî, Feqiyê Teyran.

Kürtçe Manzum Hikayeciliğin Kurucusu: Feqiyê Teyran

ÖZ

Bu çalışmamızda Feqiyê Teyran'ı neden Kürtçe manzum hikaye yazıcılığının kurucusu olarak nitelediğimizi aktarmaya çalıştık. Manzum hikaye konusunun Feqiyê Teyran döneminin şairleri arasından açık bir şekilde öne çıkmaktadır. Çalışmamızda Kürtçe manzum hikayeler üzerine olan bazı karışıklıklara değindik. Klasik Kürt edebiyatında bazı ünlü şairlere nisbet edilen eserler olup henüz eser sahiplerinin kim oldukları netleştirilememiştir, biz de buna dikkat çektik. Bu konu şu ana kadar özel bir çalışmanın konusu olmamıştı. Biz de bu çalışmamızda Feqiyê Teyran'ın hikaye yazıcılığı yönüne dikkat çekmek istedik. Bu konu yakın coğrafya edebiyatlarında da önemli bir konu olduğu için onların da literatür taramasını yapıp onlardan da örnekler sunduk, kürt edebiyatından örnekler vererek Feqiyê Teyran'ın dört manzum hikayesini işledik. Bu çalışmamızda literatür taramasının yanında var olan çalışmalardan istifade edip bulguları karşılaştırdık. Çalışmamızın sonucunda Feqiyê Teyran dört manzum hikaye eseri ile kürt edebiyatında bu alanda kurucu olarak öne çıkmaktadır.

Anahtar kelimeler: Kürt Edebiyatı, Şiirsel Hikayeler, Manzum Hikaye, Kürtçe Manzumeler, Feqiyê Teyran.

Feqiyê Teyran: The Founder of Kurdish Verse Storytelling

ABSTRACT

In this study, we have tried to explain why we consider Faqî Tayran to be the founder of Kurdish verse story writing. Faqî Tayran clearly stands out among the poets of his time in the field of verse stories. In our study, we have addressed some of the confusion over the Kurdish verse story. We drew attention to the fact that there are works attributed to some famous poets in classical Kurdish literature, but the identity of the authors has not yet been clarified. This subject has not been the subject of a special study until now. In this study, we wanted to draw attention to Faqî Tayran's aspect of story writing. Since this subject is also an important subject in the literatures of nearby geographies, we have reviewed their literature and presented examples from them as well, and we have given examples from Kurdish literature and studied four verse stories of Faqî Tayran. In this study, in addition to the literature review, we benefited from the existing studies and compared the findings. As a result of our study, Faqî Tayran stands out as a founder in this field in Kurdish literature with his four verse stories.

Keywords: Kurdish Literature, Poetic Stories, Manzum Stories, Kurdish Manzums, Faqî Tayran.

EXTENDED ABSTRACT

In this study, we have focused on examples of poems/stories that have become a literary genre that has continued from ancient times to the present day in the world and that have many examples in classical literature. However, due to the scope of this study, apart from the examples of this genre in the world, only four poetic stories of Faqî Tayran in classical Kurdish literature have been discussed. Sometimes new names have to be given to some subjects or things, and if it is in another language, it should be appropriate. In Kurdish, a new name, "çîrokeşi'r", has been given to the verse story. According to our findings (Ertekin û Basuğuy, 2022: 72), this name was used for the first time in his work and became widespread over time. Each of the four verse stories, which are the subject of our study, is treated separately and brief summaries are given in the content of the article. Although there are examples of verse stories in classical Kurdish literature before Faqî Tayran, the authors of the works have always been the subject of debate, so much so that some anonymous works have even been attributed to Faqî Tayran.

Faqî Tayran (1563-1632) lived in what is considered the golden period of classical Kurdish literature (late 16th-early 17th century). In addition to his poems, he also wrote four verse works (Bersîsê 'Abid, Şêxê Sen'an, Zembîlfiroş, Kela Dimdim). In this study, we have focused on these four works and at the end of the study, it has been determined that Faqî Tayran was a pioneer in classical Kurdish literature with these four works.

Many studies on Faqî Tayran have been conducted on various subjects and published in different places. Examples of these studies are given in the literature and bibliography section of our article and they have been utilized. However, according to our research, no special study has been conducted on this subject. The subject of Faqî Tayran's being a pioneer of poetic stories in Kurdish is covered in this article. The article includes examples of verse stories from around the world and the reasons for their emergence. Some examples from the literatures of nearby geographies are given, and similarities and differences between the given examples are also identified and explained. Some verse stories have different characters or different names, but they are similar in terms of subject matter, which is also explained in the article with a few examples.

In summary, the content of this article includes the general explanation of the subject, the subject itself, examples, conclusion and bibliography respectively. In the introduction part of this article, a general explanation of the article has been made. Since the subject is a new and different field, the information given is scanned from the literature and the information obtained is written in its place. As a result, the content of the article was written and concluded according to the essence of the subject.

Destpêk

Her milletek xwedî dîrok, ziman, çand û nirxên mirovî ye. Nirxên Xwedêdayî û yên ku milletan çêkiriye digel hev dibin gencîneyên neteweyî. Di warê edebiyatê de jî milletan bi cureyên cuda berhem hilberandine, hin ji wan cure berhemana ku di warê çand, ziman û folklorê de cîhê girîng digrin çîrok, destan an jî efsane ne. Dabeşkirinên bi vî rengî bi geşedana edebiyatê re çêbû. Di despêkên xwe de yan wekî devkî ji bo gel dihatin gotin, yan jî dibûn keresteyên reşbelekê edîbên serdema xwe. Di dîroka edebiyata kurdî de jî hin bûyer, bi saya edîbên zana bi honakên edebî bûne keresteyên helbestan û teşeyên wekî menzûme wergirtine. Herçend vegotina çîrok an cureyên wekî wê bi qaîdeyên helbesta klasîk zehmet be jî helbestvanên xwedî şiyar, ew berhemên xwe heta roja me veguhestine.

Di warê çîrok û cureyên mîna wê de wekî devkî û nivîskî berhemên me hene, lê hêj jî em li ser wan zêde kûr nebûne û me ew nekirine mijarên kitekit, wekî mijarên şanazî û lêkolînên nekûr mane. Li gorî me edîbên kurd û berhemên wan jî aliyê lêkoleran ve di mijarên cîyawaz de kêmtên kolandin, lewra gava em berê xwe didin kesayet û berhemên edîbên xwe, ew piralî ne. Yek ji wan jî Feqiyê Teyran e, ku bi menzûmeyên/çîrokeşi'rên¹ xwe, nebûye mijara xebateke taybet.

Çîrokeşi'r, bi taybetiyên xwe di nav helbestên cureyên din de aşkere dibin û çêjeke wan ya taybet heye. Digel vê helbestvanên ku çîrokeşi'r nivîsîne, heta niha bi awayekî têkel bi mijarên din re hatine analîzkirin. Ev yek girîngiya vê mijarê di neqebeke teng de dihêle. Bi qasî me lêkola, mijara çîrokeşi'rên kurdî heta niha nebûye babeta lêkolîneke taybet, bo vê boneyê me jî ev mijar kir babeta xebata xwe.

Ji bo ku ev mijar û angaştê wê piştrast bibe, di naveroka vê xebatê de daneyên derbarê vê mijarê de wê bîn dayîn ku têkilî mijara vê xebatê ne. Ji bo ku ev xebat bigihêje çareseriyekê me mînakên edebiyatên nêzî edebiyata kurdî anîn û di edebiyata kurdî de hebûna wan cure berhemana bi awayekî kronolojîk nivîsî, ku ev yek bibe tesbîta angaştê me.

¹ Prof. Dr. M. Zahir Ertekin di xebatên xwe de li şûna hikayetên menzûm peyva "çîrokeş'ir" bikar tîne. (Ertekin û Basuğuy, 2022: 72) Em ê jî di vê xebatê de wê peyvê bikar bînin.

Di lîteratura kurdî de Feqiyê Teyran wekî şai'rekî zimanhêsan tê naskirin, ev tespît her çiqas şaş be jî ev tespît bûye sedem ku gelek xebat li ser Feqiyê Teyran bîn çêkirin. Lê xebatên hêja ên li ser Feqiyê Teyran jî pir in. Külter (2023) di xebata xwe de li ser nêrînên îlahî (*kelamî görüşleri*) yê Feqiyê Teyran, İlî (2019) di xebata xwe de li ser nêrînên heyînî (*varlık görüşü*), Tenik (2021) di helbesta ey av û avê de zimanê heyînî (*varlık dili*), Orkin (2015) li ser hêmanên tesewufî yê berhemên wî xebitîne. Saydun (2018) li ser teşe û ciwankariya dîwana wî xebitiye. Karaca (2021) qesîdeya Fuzûlî û helbesta Feqiyê Teyran dane ber hev, Cîhanî (2019) li ser şewaza wî xebitîne. Ji bilî van, li Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê ji aliyê Enstîtûya Zimanên Zindî ve di gulana 2022ê de bi temaya Feqiyê Teyran û Mîrateya Wî, Sempozyûma Kurdiyatê ya IIIyê ya Navnetewî hate lidarxistin û gotarên hatine pêşkêşkirin di pirtûka Feqinasîyê de hatine çapkirin. Me jî ji bo vê xebatê bi piranî berê xwe da van xebatan.

Carna hin têgeh ji aliyê bilêvkirin û hişdemayînê ve zehmet in, lewma navlêkirin û navdîtin hêsaniyek e, lewra em ê jî ji vir û pê ve ji bo menzûmeyan "çîrokeşî'r" bibêjin. Ev xebat ji çar sernavan û ji encamekê pêk tê. Pêşî ji geşedana çîrokê di edebiyatê de nexasim di edebiyatên cîran de çawa bûye û digel mînakan wê were pêşberî me. Xaleka duyem de em ê li ser çîrokeşî'rên kurdî rawestin ku yê berî Feqî û yê piştî wî diyar bikin. Di beşa sêyem de em ê bi kurtasî behsa çîrokeşî'irên kurdî bikin û yeko yeko li ser çîrokeşî'irên Feqî bisekinin. Sernavê dawî û mijara eslî wê ji Feqî û çîrokeşî'rên wî pêk were.

1. Çima Çîrokeşî'r

Derbirîna meremêkê ji hebûna însên ve heta îroroj her tim bi rêya vegotinê pêk hatiye. Ev vegotinê ji devkî çî jî bi nivîskî be her dem bûye rêya ravekirina meqsedan. Heta em dikarin bibêjin ku Xwedê jî bi rêya vegotinê emrên xwe ji Nebiyên xwe re veguhestiye. Ji ber van sedeman hêza vegotinê her hebûye û wê her hebe. Milletan jî ji bo ku heyînên dîroka xwe wekî kevnosopî veguhêzin, serî li rêya vegotinê dane. Nimûneyên pêşîn yê van mînakan ekserî destan, çîrok, helbest û cureyên ww. in. Meqседа nivîsîna bûyeran li gorî nivîser, mijar, û bûyerê diguhere, lê armanc tekane ye, ew jî ravekirin e.

Eger em berê xwe bidin dîrokê, nivîs û cureyên edebî di sînorên gelek teng de asêkirî bûn, ev yek jî dibû sedem ku bûyer bi piranî bi awayekî devkî bîn vegotin. Bi demê re nivîs û cureyên edebî zêde bûn lê îcar jî qaîdeyên edebî rê nedidan ku çîrokek bi awayê devkî were nivîsîn. Di edebiyata kevn a yewnanîyan de û ya ereban de ji bo berhemên edebî qaîdeyên pîvanî hatibûn danîn, vê yekê karê vegotina çîrokan zehmet dikir. Wekî çareserî cureya mesnewî; menzûme yanî çîrokeşî'r welidî. Ev teşe nivîs li gorî cureyên din serbesttir bû, digel hunerên edebî peyamdayîn armanca sereke bû. Bi çîrokeşî'ran êdî du cureyên ji hev cuda têkel bibûn û êdî ji teşeyên din azadtir bû, ev di dîroka edebiyatê de pêngaveke mezin û ciyawaz bû.

Li gorî ku Uygur (2005, r.128) dibêje; di nav cureyên edebî de yê ku herî zêde têkelî hev bûne û di bin bandora hevdu da mane helbest û çîrok in. Eger em vê pênaseyê hinekî fireh bikin em dikarin bibêjin ku çîrok ne tenê di berhemên edebî de, di her warê jiyane de dikare were pêşiya me. Bo nimûne; îro çîrokek dikare di rojnameyekê de jî bê nivîsandin yanî çî bi devkî çî jî nivîskî çîrok her di jiyana mirov de heye. Helbest di serdemên kevin de, piranî bi mijarên wekî; dawet, mirin, qehremanî û mijarên hestiyarî ve dihatin gotin û nivîsîn. Têkelbûna van herdu cureyan di edebîya klasîk de rengekî din veda û bi demê re geş û xurt bû. Digel vê helbest jî ji serdemên kevin de, ji bo mirov hestên xwe bîne ziman bûye amûrek. Her wiha li gorî ku Cemiloğlu (2015, r.20) destnîşan dike metnên edebî bi sê awayan di perwerdeyê da tene bikaranîn: (1) hînkirina zimanî û pêşvebirina şiyanewerî yê zimanî (2) perwerdeya huner û estetîkê (3) perwerdeya nîrx û exlaqê. Gava em berê xwe didin helbestên Feqî ev her sê xal bi awayên serkeftî hatine bikaranîn.

Ji bo ku mijareke dirêj bûbûya helbest diviya di helbestê de jî hin guherîn pêk bihata, wekî me li jorê jî diyar kir ev guherîn bi menzûmeyan destpê kir. Em dikarin li vir bibêjin ku guherîna ku di dawiya sedsala 18hem û destpêka sedsala 19hem de destpê kir di warê edebiyatê de xwe dispart wan sedeman. Sedemên ku zor didan nivîskaran, bûn sedemên qalibşikeniye. Gava berhemnûsan terka qalibên edebî kirin, hin hêsaniyên wekî fêhm kirin û armanca nivîskaran jî çêbû. Lewra di hin berhemên klasîk de bêyî şerh û tesvîrê berhem nedihat fêhmkirin.

Yek ji armanca menzûmenûs hîndarî ye, menzûme bixwe jî nivîsên fêrkarî yanî didaktîk in û nivîser di menzûmeyan de dixwaze ew bûyer di hiş û bîra giştî de bimîne. Qaîdeyên helbestê kêş û serwayê rê dida ku menzûme nikaribe dirêj bibe. Her wiha Sağlık, (2005, r.12-16) dibêje; “di çîrokeşi’ran de şair ji derfetên helbestê sûd werdigire, lê li vir armanca ne helbestnivîsîn e, çîroknivîsîn e”. Menzûmenûs di berhema xwe de li ser veguestina çîrokê, hîs çêkirin, şîretkirin, meraqçêkirin û hînkirinê disekine û wan dike armanca. Ev sedem di encamê de fikra “zimanê menzûmeyan hêsan e” derdixe, rast e jixwe divê wisa be yan na ji armanca xwe dûr dikeve.

Îcar her milletî mijarê nêzî hev bi awayên cuda vehugestine û gelek caran jî ji nimûneyên hevdu sûd wergirtine. Bi piranî mijarên heyî li gorî taybetiyên civata xwe bi awayên çiyawaz honandine. Bo nimûne Ferîduddînê ‘Ettar di Mantîq’-t-Teyrê de bi cureyên cuda yên çûkan mijara Wehdetu’l Wicûdê rave kiriye, mînaka vê di berhemên Feqiyê Teyran de jî helbesta Ey Av û Avê ye. Feqî di vê helbesta xwe de digel avê diaxive av jî bersivê dide wî, carna jî li gorî vegêranên metnê kesê sêyem jî dikeve nava mijarê. Her wiha li gorî ku Akyel (2021, r.404) dibêje; çîroka Yûsuf û Zûleyxayê dişibe çîroka Zembilfiroş û Gulxatûnê. Ku ev yek bûye mijara gotara wê û ji gelek aliyan ve daye berhev. Eger em berê xwe bidin geşedana çîrokeşi’ran di edebiyatên cîran de divê em serenavekî cuda terxan bikin.

2. Çîrokeşi'r di Edebiyata Cîhanê de

Wekî me li navborî jî amaje pê kir cureyên edebî yên wekî çîrok, destan û efsane bi demê re ev navan wergirtine, ji ber ku di honaka helbestan de senifandinê wisa tune ne, em ê jî wan hemûyan wekî çîrok bihesibînin. Di dîroka edebiyata cîhanê de nimûneyên çîrokeşi’ran îlhama xwe ji çavkaniyên mîna şer, dîn û folklorê wergirtine. Ev çavkanî di nava her milletekî de bi taybetiyên xwe jî hev cuda dibê. Bo nimûne; ritûelên dînê Îslamê û dînên din jî hev cuda ne. Her wiha heyînen folklorîk jî li gorî erdnîgarî û milletan diguhere.

Li temamê dinyayê milletek tune ku bi pexşanê dest bi edebiyatê kiribe, nimûneyên edebî di dîroka edebiyata cîhanê de bi helbestan destpê kiriye. Bo nimûne eger em li pirtûka (Bottero, 2005) binêrin li wir jî em ê bibînin ku ji bo Destana Gilgamişê dibêje; “kevintirîn berhema edebî ya helbestkî”. Li gorî ku heta niha hatiye tesbîtkirin nivîsa bi rêk û pêk ya herî kevin “Gilgamiş” e. Îcar eger nivîsa edebî ya herî kevin jî ku bi awayê helbestkî hatiye nivîsîn û di nav xwe de bûyerekê dihewîne, wê demê gotina ku me got despêka nimûneyên edebî helbest in, rast e. Gilgamiş nivîsek beriya mîladê ye û gelek kevn e. Em ê berê xwe bidin nimûneyên hêj nêzîktir ku dikevin nava edebiyata klasîk.

Eger em bixwazin wekî nimûneyên pêşîn yên çîrokeşi’ran bibînin, divê em berê xwe bidin lîteratura Yewneniyân. Lewra li gorî Öztürk (2016, r.562) dibêje berhemên Homeros (“Ὅμηρος”) “Îlyada û Odysseia” jî nimûneyên yekem yên çîrokeşi’ran in. Îlyada çîroka şerê di navbera Trûvayî û Spartiyân de qewimiye di nav xwe de dihewîne. Odysseia jî wekî berdevama Îlyadayê hatiye nivîsîn. Homeros di van berhemên navborî de şerê ku nêzîkî deh salan domiyaye meha dawî bi awayekî giştî nivîsiye. Îlyada jî 16000 hezar beytî û jî 24 beşan pêk tê, wekî cure helbestên epîk in. Bi geşedana edebiyatê re nimûneyên bi vî rengî di edebiyata rojava de zêdetir bûne.

Di edebiyata erebî de nimûneyên pêşî yên çîrokeşi’ran nediyar in, lewra li gorî Guerber (2010, r. 474) nimûneyên pêşî jî aliyê el-Asmaî (m. 216/831) bi navê destana “Entere” ve hatiye nivîsîn. Lê

di rastiya xwe de ev berhem helbestên komkirî ne ku beriya pêxembertiya Hz. Muhammed dewra cahiliyê de hatine nivîsîn. Ev berhema ji 92 qesîdeyan pêk tê ku ji aliyê 72 kesan ve hatiye gotin. Gava nivîskarê Lubnanî el-Bustânî (1905, r. 162-175) wergera berhema Homeros ya Îlyadayê dike di rûpelên navborî de dibêje; “di eslê xwe de destaneke ereban tune ku rasterast xwe dispêre helbesteke li ser kesayetên girîng, lê yên heyî kêmi destanan nînin”. Di vir de *el-Bustânî* behsa çend helbestan dike ku berawirdî *Îlyada û Şahname* yên Îranî dike ku ne kêmi wan in. Li vir em dîsa hêza helbest û heyînen nav wê dibînin ku helbestên naverokçîrok in.

Di edebiyata farisî de destan (dâstân) cîhekî girîng digire. Lewra peyva destanê bixwe peyveke îranî ye (Güzel & Torun, 2020). Dema ku gelên îranî û hîndî (Îndo-Îranîyan) wekî yek gelî dijiyan çanda wan jî hevpar bû vê yekê di warê destanan da gencîneyek mezin ji îraniyan re hişt. Digel vê hin destanên kurdî jî di lîteratura cîhanê de wekî destanên farisî tînin hesabî. Li gorî Yıldırım (2015) destanên farisî despêkên xwe ji mîtolojiyên îranî werdigirin û ev çavkanî bi demê re halê nûjen werdigirin û dibin nivîskî. Eger mijar vegere ser çîrokeşi'ran divê raste rast em balê bikişînin ser Şahnameya Fîrdewsî ku di dîroka edebiyata farisî de berhemeke cîhtaybet e. Şahname di heman demê de berhemeke çîrokeşi'rî ye. Li gorî xebata (Şişman & Kuzubaş, 2017) şahname ji 60.000 beytî pêk tê, berhemeke epîk e, û ji aliyê yek kesî ve hatiye nivîsîn û nimûneya berhemên herî dirêj ya yeknivîskarî ye. Di şahnameyê de serpêhatiya qralên dîrokî hatiye nivîsîn.

Di edebiyata tirkî de destan, li gorî Köprülü (2009) heta niha destanek tirkan tune ye ku heta roja me yekpare hatibe, yên hene di çavkaniyên milletên cuda de cîh werdigirin û perçe perçe ne. Ji van ya herî kevn ji aliyê turkên Altayê ve hatiye veguhestin destana Yaratılışê ye. Piştî Yaratılışê, di dîroka edebiyata tirkî li gorî ku hatiye tesbît kirin yekem çîrokeşi'r *Kutadgu Bilîga Yusuf Has Hacib e* (Gökçek, 2014, r.289). Ev berhem di heman demê de yekem siyasetnameya tirkî ye.

Destan ku di dîroka her gelî de çî bi nivîskî çî jî devkî heye, ya girîng li vir ew e ku hatibe tomarkirin û veguhestin. Wekî têgeheke spesîfik destan, ji bûyerên diyar û nediyar yên dîrokê û ji hêza manewî ya gelan pêk hatiye (Usta, 2020, r.376) which is one of the oldest of literary genres and corresponds to the word “malhama” in Arabic; is a name derived from the root of “l-h-m”. In lexicon, it means “mortal, bloody war, war place, the most violent state of war, scattered corpses and clothes from all sides, oone of the most violent state of war that mankind cannot ran away”. However, specifically, they (epics. Wekî ku Usta jî amaje bi girîngiya destanan kir, destan nîşaneyên xurtbûna çanda folklorîk in. Heta vir me behsa hin destanên ku çîrokeşi'rî ne kir, ji vir û pê ve em ê berê xwe bidin menzûme/çîrokeşi'r yên kurdî.

3. Çîrokeşi'rên Kurdî

Di dîroka edebiyata kurdî de çîrokeşi'r cara pêşî kengî û ji aliyê kê ve hatiye nivîsîn bi awayekî zelal ne diyar e. Lê em dizanin ku di warê berhemdariyê de Feqî nûnerê herî girîng e, çar berhemên wî yên menzûm ji bo vê angaştê delîleke berçav e. Digel vê em ê di vê beşê de zêdetir balê bikêşin ser bandora Feqî ya derbarê çîrokeşi'ran de ku li ser helbestvanên piştî Feqî çawa rûdaye. Li gorî ku nimûneyên heyî berî Feqî ‘Eliyê Herîrî çîrokeşi'rek bi navê “*Qewlê Hespê Reş*” nivîsî ye². Di vê berhemê de behs ji bûyereke dînî-cengî tê kirin. Yıldız (2016, r.42) di berhema xwe de bi hurgulî li ser vê berhemê rawestiyaye û wê wekî menzûme/xezawetname/cengname pênase dike. Piştî ‘Eliyê Herîrî em di dîwana Melayê Cizîrî de jî nimûneyên menzûmeyan dibînin, bo nimûne; muşaareya digel Mîr Îmadedîn Hekarî (38 bend), muşaareya digel Feqiyê Teyran (50 bend) û Menzûmeyaya «*Ellah Sehergaha Ezel*” (284 beyt) *lê tenê wekî menzûme ne yanî di naveroka wan de çîrok tune ne* (2018, r.302-311).

² Em ê piştî vê beşê jî behs bikin ku derbarê nav û nivîskarê vê herhemê de hin gengeşî hene.

Ji bo çîrokeşi'rên kurdî serdema zêrîn serdema Feqî ye ku Feqî di serdema xwe de 4 çîrokeşi'r nivîsîne, ku du heb ji wan (*Zembilfiroş û Kela Dimdim*) xwerû û *resen malê folklorê kurdî ne, yên din jî* (*Şêxê Sen'an û Bersîsê 'Abid*) ji versiyonên edebiyatên din bo kurmancî hatine veguhestin. Lê Feqî ev berhem bi teşe û cureyên cuda veguhestine, Adak (2019, r.245) dibêje, “balkêş e ku Feqî mijara “*Şêxê Sen'an*” ji ‘Ettar wergeritîye, lê belê ji aliyê teşeya wê ve ku mesnewî ye, ‘Ettar neşopandiye û berhema xwe bi teşeya murebbe‘ê nivîsiye”. Piştî Feqî jî menzûmeyên kurdî hatine nivîsîn bê guman li vir dîsa rola Feqî derdikeve pêşiya me bo nimûne; Ehmedê Xanî di berhema xwe ya navdar *Mem û Zînê* de (Xanî, 2022: 42-3) behsa helbestvanên kurdî dîke ku yek ji wan jî Feqiyê Teyran e. Bandora Feqî li ser Xanî çêbûye lewra destana kevnar ya kurdî *Memê Alan* wekî cureyê mesnewî bi navê *Mem û Zînê* honandiye û bûye çîrokeşi'r.

Helbestvanên serdema edebiyata klasîk ku di bin bandora Feqî de mane û ji berhemên wî sûd wergeritine gelek in. Yek ji wan jî Mela Huseynê Bateyî ye, ku wî yekem mewlûda kurdî ya menzûm nivîsiye, her wiha wî jî berhema navdar a berbelav *Zembilfiroş* bi awayê menzûmî nivîsiye (Sadîni, 2022). Hebûna çîrokên gelerî û dînî pîrî caran ji helbestvanan re bûne çavkaniyên îlhamî û wan jî heyînên ku di zimanên cuda de navên cîyawaz lê tê kirin bi hostetîya xwe honandine. Bo nimûne hikaye/çîrok/qisseyaya Hz. Yûsif ku di *Qur'an* a Pîroz de derbas dibe di edebiyata gelên misliman de gelek caran bi varyant û teşeyên cuda bûye babeta reşbelean. Îcar di kurdî de jî li gorî ku tê zanîn kesê yekem car çîroka *Yûsif û Zuleyxayê* bi awayê menzûme nivîsiye Selîmê Hîzanî ye (Geverî, 2013). Bandora bûyeran, bandorê li nivîskaran jî dîke, lewra gava yek yekê dinivîse û nivîskarek wê dixwîne ew jî diçe li bûyereke din digere û dixwaze ji ya berê xwe baştir binivîse, helbet ev angaştê me ye lê di binyada xwe de rastiyek e. Bo nimûne helbestvanê klasîk Harîsê Bedlîsî berhema Selîmê Hîzanî *Yûsif û Zuleyxayê* bi awayekî sadetir dinivîse û digel wê ew dibe yekem kesê ku *Leyla û Mecnûn* bi kurdî nivîsiye (Cihanî, 2021).

Mînakên bi vî rengî di edebiyata kurdî ya klasîk de gelek in. Di vir de xala/ên girîng Feqî û çîrokeşi'r in, lewra me di navborî de jî behs kir Feqî ji bo çîrokeşi'rên kurdî dibe hîmek û yên piştî wî tîne nivîsîn dibin perçeyên ser û derdorê.

3.1. Feqiyê Teyran û Çîrokeşi'rên Wî

Feqiyê Teyran di serdema xwe de û di roja me de her bûye kesayetê girîng. Li ser Feqî heta niha di nav gel de gelek çîrok hatine gotin û di edebiyata nivîskî de jî lêkolînên zanistî li ser hatine kirin. Em nikarin Feqiyê Teyran bi giştî bi gotarekê rave bikin lewra em êdî ji taybetmendiyên wî lêkolînê çê dikin. Yek ji van taybetîyan jî bê guman çîrokvebêjî û çîroknûsîbûna wî ye. Feqî di nav gel de jî û di berhemên xwe de jî bi çîrokên xwe tê nasîn. Feqî ji bo çîroka bibêje çîrok nedigot, derd û armançekê wî hebû ku ev çîrokên wî bibin şîret û hikmet. Di komxebata bi navê “*Feqînasî*” de gotara (Ertekin & Basuğuy, 2022, r.64) nivîskaran raste rast navê xebata xwe kirine “*Feqiyê Teyran: Şa'irê Hikmet û Nesihetê*” û bi berhemên Feqî bal kişandine ser aliyên wî yên şîretî û hikmetî. Lewma em ê jî ji bo Feqî bibêjin şa'irê nesihet û hikmetê. Her wiha Cihani, (2019, r.116)klasik Kürt edebiyatının kurucularından biridir. Kendisini ve eserlerini zamanının diğer klasik şairlerinden ayıran tüm klasik Kürt şairleri arasında kendine özgü bir tarzı ve yöntemi vardır. Çağdaş şairlerin aksine, şiiirlerini divan dilinde (eski Kürtçe kitapların yazıldığı sert dil jî her çar menzûmeyên Feqî ji aliyê şîret, tesewif û hikmetê ve rave dîke û ew jî heman têhegê bikartîne. Eger em bi giştî behsa Feqî bikin divê em ji wî re bibêjin “mîrovê pîralî” Feqî di “ilm û tîgîhiştana xwe de li gorî serdema xwe di asteke lûtkeyî de ye.

Nîqaşên ku heta niha li ser jidayikbûn, nav, cîh, berhem û ww. hatine kirin nikaribûye girîngiya Feqî binixumîne. Feqî ji van wêdetir e, lewra gava em berê xwe didin berhemên wî naverok kemilî, tîr û tîjî ne. Feqî bi ilm û şiyana xwe xwestiyê hin tîştan rave bike û gel jî ji wan sûd werbigire. Nimûneya wê, helbestên wî yên nîda/gazîkirinê (vokativa) û çîrokeşi'rên wî ne. Gaziya Feqî banglêkirina heqîqetê,

xwestina dîtîna rastiyan û hişyarkirin bûye armanca Feqî, li vir pirs tê bîra meriv gelo civat pîr xirab bû lewma Feqî bi vê êşê ketibû yan ji bo ku ditirsiya civat roj bi roj xirab be lewma ev nimûneyên çîrokeşi'ran vedigot û dinivîsî? Bi ya me Feqî merivekî pêşbîn bû lewma xwestiye ev nimûneyên şîretkar bibin malê gel û her di nav gel de were vegotin. Jixwe yek ji armanca nivîsîna çîrokeşi'ran jî ev e.

Feqî ji aliyê çîrokeşi'rnivîsînê ve xwedî gencîneyek e bêhemta ye, lewra hin çîrokeşi'r hene ku nisbetî wî dibin lê li gorî lêkolînan ev şaşî ye û bi lêkolînan hatiye sererast kirin. Bo nimûne Yıldız di xebata (2016, r.105) xwe de behsa vê mijarê dike dibêje “mînakên mîna berhemên menzûm yên wekî “*Qewlê Hespê Reş û Sîseban*” jî wekî berhemên Feqî hatine destnîşan kirin”. Ev yek vê dide nîşan ku eger em menzûmeyek kurmancî ya bê xwedî, yanî ku nav û mexlesa nivîser li ser tune be peyda bikin em bi piranî wê nisbetî Feqî dikin. Lewra em dizanin ku ew di vî warî de hoste ye.

Feqî di berhemên xwe de karakterên gelek ecêb hilbijartîne. Lewra li gorî çîrokan karakterên dijberî hev in. Bo nimûne di *Şêxê Sen'an* de karakter çendî bikeve rêya xirab jî di encamê de her tişt tê ser rîya rast. Di *Bersîsê 'Abid* de karakter pêşî baş e lê piştî xwe wenda dike xirab dibe. Di *Zembilfiroş* de jî bi heman awayê honaka karakter dewam dike ku mirovekî zahid e û li ser rîya rast şaş nabe. Di vir de Feqî bi karakterên cuda û çîrokên wan berê me dide rastiya rêya rast. Li gorî nusxeyên ber destan 4 berhemên Feqî yên çîrokeşi'r hene. Ew jî ev in; *Şêxê Sen'an*, *Bersîsê 'Abid*, *Zembilfiroş* û *Kela Dimdimê* ye. Ji ber ku mijara me raste rast ne naveroka çîrokeşi'ran e, em ê jî li jêrê di mijara her çar çîrokeşi'ran de tenê behsa çend hêmanên sereke bikin.

3.1.1. Şêxê Sen'an

Menzûmaya *Şêxê Sen'an* ew çîrokeşi'r e ku di nav berhemên Feqî de bûye çîroka herî bi bandor. Lewra di edebiyatên gelên wekî ereb, fars û tirkî de jî cîh wergirtiye. Gemi, (2016, r.108) di xebata xwe de di derbarê derketin û belavbûna menzûmeya *Şêxê Sen'an de agahiyên berfirehtir dide. Di edebiyata kurdî de jî ji bilî Feqî edîbên wekî Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî jî ev çîrok telmîh kirine. Bo nimûne;*

Nimûneyek ji Melayê Cizîrî

*Mey nenoşî Şêxê Sen'anî xelet
Ew neçû nêv Ermenistanî xelet
Mislê Mûsa, Wî tecellaya Te dî
Ê Tu dî, kanê xeta, hane xelet?*

Nimûneyek ji Ehmedê Xanî

*Şêxê we ku pence hec bijarî
Dîn kir Te ji bo keça kufarî!*

Li vir ji wan mînakan tê fehm kirin ku edîbên kurd jî hay ji keresteyên edebiyata gelên din hebûye û wan jî di berhemên xwe de îşaret pê kirine. Dirêjtirîn berhema Feqî *Şêxê Sen'an e, ku ji 362 bendan pêk tê* (Dereşî & Elî, 2011, r.295-479). Helbet çîrok hinekî dirêj e lê em ê li vir bi kurtî behs bikin;

“*Di vê çîrokê de karakterê serekî ku Şêx e, li gorî çavkaniyan ji gundekî Yemenê ye ku dikeve navbera Şam û Yemenê. Di sala 743yê de hatiye dinyayê û di sala 828ê de wefat kiriye. Şêxê Se'nan, di serdema xwe de şêxekî navdar bû. Nêzikî pênsed softyên wî hebûn û nêzîkî pêncî salî ev kar berdewam kiribû. Softyên wî jî wekî wî bûn. Bi roj di riyazetê de û bi şev di 'ibadetên de dibuhurandin. Şêxê Se'nan hem zana bûhem 'emelkar bû. Rind haydar bû ji civata xwe û derdora xwe. Tiştên nepenî jî keşif dikir û ji derdan re merhem bû. Nêzîkî pêncî carî hec kiribû û hed ji umreyên wî re nebû. Li ser*

kîjan nexweşî bixwenda, şîfayab dibû. Lêmêj û rojî û sunnet, jiyana wî bi xwe bû. Her kî dihate nik wî, rêberatiyeke rind ji wan re dikir. Şêx çend rojan li ser hev xewneke ecêb dît. Di xewna xwe de keçeke ermenî ya xaçparêz dibîne û aşîqê wê dibe. Ji bo ku wê bibîne digel murîdên xwe diçe Ermenistanê. Di encamê de Şêxê Se'nan keçikê dibîne, lê keçik ji bo teklîfa Şêx qebûl bike hin şertan davêje ber. Bo nimûne; divê Şêx, li dêrê 'ibadetên xwe bike. Divê Şêx Quranê bişewitîne. Divê Şêx zunnar li piştta xwe girêde, û şivantiya xenzîran bike û wd. Şêxê Se'nan van hemû şertan qebûl dike. Li gorî vegotina çîrokê duayên sofîyên wî qebûl dibin û Şêx ji wê riyê vedigere, keçika xaçparêz jî dibe misilman lê zû wefat dike”.

Ji xwe me di navborî de jî ameje kiribû ku wekî teşe menzûme wê derfetê dide ku helbestvan mijarê dirêj bike, sedemek din jî ew e ku Feqî derdê xwe encax karibûye bi wî awayî bîne ziman. Ji xwe wî di dawiya vê çîrokeşî'ra xwe de ev eşkere gotiye.

*Muksî ji işqê sotiye
Ev qewl bi Şêx ve notiye
Halê xwe tê da gotiye
Ji “xeyn” û “lam”a hîcretê (Dereşî & Elî, 2011)*

Feqî bi van malikan dide zanîn ku wî merema xwe û derdê ku jê ditirsiya bi hev re honandiye dilê xwe bixwe şewitandiye û bi vî awayî di heman wextê de dilê xwe bo gelê xwe jî şewitandiye. Feqî di despêka helbestên xwe de wekî gazîkirin û şîretkirinê bang li xwendevan û guhdêran dike. Bo nimûne dîsa di benda yekem ya çîrokeşî'ra Şêxê Sen'an de bi vî awayê destpê dike.

*Guh dêrin nutqa aşîqî
Da ez bixwînîm vê xetê
Hemd û Senayê Xaliqî
Subhan ji Şahê Qudretê*

Gava Feqî di misra yekem de dibêje “ez bixwînîm vê xetê” em dizanin ku wî ev mesele nivîsiye û xwestiye her bimîne û bibe nimûneyek ji berhemên sûdewer.

3.1.2. Bersîsê ‘Abid

Menzûmeyê Bersîsê ‘Abid, di vê çîrokê de tiştta ku herî zêde bala me dikişîne karakterê Bersîsî ye. Lewra Bersîs di eslê xwe de mirovekî zahid e lê piştê bi dek û dolabên şeytên tê xapandin û jî rê derdikeve. Armanca Feqî di çîroka Bersîsî de ew e ku meriv çiqas zahid û zana be jî divê meriv bi rênîşandarekî re derkeve rê, tenêbûn xetere ye. Feqî encama bê rêbertiyê di helbestê de gelek baş nîşan daye ku çawa şeytan hêdî hêdî Bersîsî dixapîne. Ev çîrokeşî'ra ji 211 bendan pêk tê. Kurtêya çîrokê wiha ye;

“Bersîs, zahidekî bi rêk û pêk û baş e û li Şamê dijî. Heta 71 saliya xwe ji însanan dîr bi ‘ibadetê mijûl bûye. Şeytan lê nagere û her dixwaze wî ji rê derxe. Piştî gelek planan Şeytan xwe dixê şiklê şêxekî herêma Necîdê, gopalekî dixê destê xwe yê çepê û tizbiyekê jî dixê destê xwe yê rastê û tê cem Bersîsî. Piştî gelek suhbet û tîkiliyan, Şeytan 73 Bersîsî îqna dike ku bê şêx di vê riyê de çûyîn gelekî xeter e. Û bi hunerên xwe yê şeytanî Bersîs heyranî xwe dihêle. Axir Bersîs wî weke şêxekî mezin û heqîqî dipejirîne û dikeve bin bandor û hukmê wî. Piştî ku Şeytan xwe wek şêxekî da qebûl kirin, vêca beşa duyem a planê dixê dewrê. Şeytan diçe odeya keçikeke xweşik a mîrekî navdar e wê serdemê. Keç di xew de ye û Şeytan li ber guhê wê bi dengê bilind diqire. Piştî dengê Şeytên, keçik nexweş dikeve. Bavê keçikê, wê dibe cem seyda, şêx û melayên navdar ên wê serdemê, lê tu çereyekê ji keça xwe ra nabîne. Şeytan sê şevan li ser hev dikeve xewna bavê keçikê û jê re dibêje; eger tu keça xwe bibî cem Bersîsî û şevêkê li cem wî bihêlî, ji ber ku nefesa wî xurt e, wê keça te li ber destê wî şîfayê

bibîne. Çendîn ku wezîrê mîr, jê re got ku: “bi xewnan meriv ‘emel nake” jî bê fayde ma. Bav û birayên keçîkê, ew xemilandin û birin nik Bersîsî. Bi telqînatên Şeytên, Bersîs bi keçîkê re zina kir. Piştî vî karî Şeytan ji Bersîsî re dibêje eger tu keçîkê nekuji, wê malbata wê pê bihesin û wê te bikujin. Li ser vê telqîna Şeytên, Bersîs radibe keçîkê dîkuje û binax dike. Paşê Şeytan bi Bersîsî dide zanîn ku wî karekî kirêt û guneh bi encam kiriye. Şeytan ji bo ku çareseriyekê peyda bike ji Bersîsî destûrê dixwaze û diçe cem bavê xwe. Şeytan dereng vedigere. Şeytan ji bavê xwe te‘lîmatê werdigire ku Bersîs ji wî re secde bike. Ji bo vê yekê Şeytan diçe xewna bavê keçîkê, di sûretê keçîkê de. Û mijara kuştinê ji bavê keçîkê vedibêje. Malbat hemû tîn nik Bersîsî, erdê dikolin, xewn rast derdikeve, cezayê îdamê li Bersîsî dibirrin. Di wê maweyê de Şeytan tê. Bersîs jê re dibêje tu li ku mayî? De min xilas bike. Şeytan dibêje eger tu ji min re secde bibî ez dê te rizgar bikim, min çare peyda kiriye. Bersîs radibe secdeyê ji şeytan re dibe û ji dîn derdikeve”.

Feqî wekî di her berhema xwe de di vê berhemê de jî bi çîrokan bûye rênîşanderek. Di çîrokeşi'ra Bersîsê ‘Abid e Feqî dîsa bang li me dike û dixwaze em berê xwe bidin gotinên wî yên rênîşander. Bo nimûne di despêka helbestê de wiha dibêje;

*Guh bid'ne pîrê deftera
Da ez bixwînim vê xetê
Mazin bibi Baxo me ra
Li cindiyê di xizmetê*

Eger wekî wate em nêzîkî vê çarînê bibin em di misra ya yekem de dibînin ku Feqî xwe wekî hosteyê van karan dide nîşan ku bêguman jî wisa ye. Gava Feqî dixwaze em guh bidinê ne ku em guhdar bikin û hew. Armanca wî ew e ku em guhdar bikin û li gorî wê ‘emel bikin. Lewra misraya çaremê dide nîşan. Eger ne wisa be wê aqûbet mîna Bersîsî bibe. Hostetiya Feqî di honak û tesîrê de gelekî serkeftî ye û kesên ku wî guhdar dikin bi vî awayê dikevin binê bandora wî.

3.1.3. Zembilfiroş

Menzûmeya Zembilfiroşê jî 60 bendan pêk tê. Kurtiya çîrokê wiha ye;

Zembilfiroş xortekî qeşeng e û debara xwe bi çêkirin û fîrotina zembilan dike. Û bi vî şiklî nanekî helal dibe nav mala xwe. Rojekê dema ku dîsa zembilan difiroşe, di ber keleha mîrê wî welatî re derbas dibe, jina mîr çav li Zembilfiroş dike û evîndara wî dibe. Bi fen û fûta wî tîne heta nava qesra xwe û de'wa ‘işqê lê dike, dixwaze ji wî îstîfade bike. Zembilfiroş jî dibêje; “ez ji Xwedê ditirsim” û li derfetekê digere ku xwe ji destê jinikê rizgar bike. Paşê bi behaneya destnimêjê, derdikeve ser baniyê qesrê û xwe davêje jêr. Berî ku bikeve erdê, melek Cebraîl wî digire û bi nermahî datîne erdê. Rojekê dema ku Zembilfiroş dîsa li hawirdor û bazarê selikên xwe difiroşe, macereya xanima mîr rû dide û ev macera ji çarîna 7em heta çarîna 31ê berdewam dibe ku mezintirîn beşa vê çîrokê ye; Piştî israra jinikê Zembilfiroş nesîhetan dike. Zembilfiroş dibêje ez ji Xwedayê xwe ditirsim. Du namehrem nikarin li ciyekî bicivin, eger na wê agir bi ser wan de bibare; Zembilfiroş li ber xwe dide ku xatûnê ji niyeta wê ya xirab veder bike lê jinik pir ciddî ye. Çi nesîhetên ku Zembilfiroş lê kirin jî, wê guh neda wan û ji şehweta dîlkorkirî venegeriya. Çawa ku di qisseyê Hz. Yûsif de ku di Quranê de derbas dibe, Zelîxa jî bi heman şeweyê deriyên digire û dixwaze ji nefsa wî sûd werbigire. Yûsif jî wê re dibêje; “mêrê te ez xweyî kirime û qencî bi min kiriye. Bê guman ew ên ku zalim in nikarin xwe bigihînin felahê” (Bnr. Sûretê Yûsif, 12/23). Zembilfiroş jî ji jina mîr re dibêje, her çi rindî û xweşikiya te heye ew heqê mîr e/ mêrê te ye û li wî pîroz be;

Yek ji taybetmendiyên vê berhemê ew ku çavkaniya wê aîdê folklorê kurdî ye, digel vê ev çîrok bûye mijara kilamên dengbêjan, beravajî wê em dikarin bibêjin ku ev çîrok jî ber ku ji aliyê çîrokbêj û dengbêjên wê serdemê dihat gotin lewma bû keresteya Feqî. Li gorî hin nêrînan çîroka Zembilfiroş jî

gelek aliyan ve bi qîsse ya Hz. Yûsif ve tê şibhandin lê li gorî ku tê zanîn ew ji qelema Feqî bişkiwiye ser reşbelekên dîroka edebiyata kurdî ya klasîk. Sedema vê jî şibîna bûyerê ye, ya din Feqî xweşikbûna rûyê Zembilfiroş dişibîne xweşikbûna Hz. Yûsif ku vê yekê di çarîna duyem de dibêje; *Zembilfiroş lawek rewal bû/ Bi kulfet û ehlî 'eyal bû/ Husneka Yûsif li bal bû/ Heqq e rezzaqe qismetê*. Em di çîroka Zembilfiroş de rastî peyama Feqî ya –xweş ‘ehlaqiyê- tîn.

Zembilfiroş jî mîna *Şêxê Sen'an* bandor li edebiyata gelên cîran kiriye û bûye çîrokeke nasyar. Piştî Feqî, Melayê Bateyî û Miradxanê Bazîdî jî menzûmeyaya Zembilfiroş nivîsîne.

3.1.4. Kela Dimdimê

Ji her sê menzûmeyên din cudatir Kela Dimdimê dişibe cureyên edebî yên wekî destan, cengname û helbesteke dirêj a epîk. Şerê ku li kelehê pêk tê û berxwedana şervanên kurd ku bi pêşengiya Xanê Lepzêrîn û tîkçûna wê ku bûye mijara vê çîrokeşî' rê. Feqî li vir aliyê xwe yê kelecandinê bikartîne ku bi malikên helbestê hêzê dide şervanên parêzvan. Digel vê em dibînin ku dîroka Kurdistanê de çî berxwedanên dijwar pêk hatine ku demên dirêj domiyane. Kela Dimdimê jî 67 malikan pêk tê û kurteya wê wiha ye;

“Di vê helbesta xwe de ruhê leşkeran ji aliyê şer ve wêrektir dike, û edebiyatê wekî hêzeke derûnî bikartîne. Lewra di helbestê de ew girîngiya şer, berxwedan û şehîdbûnê dide nîşan ku di riya şer de girîngtirîn merhele ew e. Ev çîrokeşî' r jî 67 bendan pêk tê û kurteya wê wiha ye; Di salên 1608û 1609ê de şerê Kela Dimdim rû dide. Devera ev bûyer lê qewimiye, Kela Dimdim e ku dikeve başûrê rojavayê bajarê Êrmiyeyê. Mijara vê destanê şerê di navbera Kurdên Biradostî û Dewleta Sefewiyan e. Sefewiyan di bin rêveberiya Şah Ebbas da xwestiye desthelatdariya Mîrektiya Biradostiyên tîk bibin û ji holê rakin. Kurd vê qebûl nakin û bi pêşdariya Emîrxan Biradostî an jî Xanê Lepzêrîn, li hemberî Sefewiyan berxwedaneke mezin dest pê kiriye. Lêbelê di encama şer û dorpêçêke giran û domdirêj de, Kela Dimdim dikeve û Kurdên Biradostî şikestinê dixwin. Destan, vê şikestinê û mîrxasiya kurdên cengawer di hundurê xwe de dihewîne”.

Ji vê çîrokeşî' rê jî diyar dibe ku Feqî di mijarên cuda de jî berhem nivîsîne. Lewra ev helbest di ‘eslê xwe de mijareke durrî mijarên çîrokeşî' rên berî xwe ne. Feqî di honandina hunerê de hosteyekî baş bû ku dikarî bû di mijarên ciyawaz de helbestan binivîse, Kela Dimdim nimûneyek ji van e.

4. Danêrê Çîrokeşî'ra Kurdî Feqiyê Teyran

Erê me got danêrê çîrokeşî'ra kurdî Feqî ye lê ka em binêrin bê di encamê de em bi çî delîlan vê angaştaya xwe dikarin bipeyitînin. Çend pirs hene ku divê em bikevin dû bersivên wan da ku mijar zelal bibe. Gelo Feqî ji ber ku xwedî çar berhemên e dibe danêr, an jî ji ber ku berhemên wî nimûneyên ewil ên vê cureyê ne? Gelo ji ber ku berhemên xwe bi hostetî û şiyaneke nûwaze honandiye, an jî ji ber ku di warê vê cureyê de tesîreke mezin li peyrewên xwe kiriye?

Ji bo pirsaya yekem em dikarin bibêjin ku erê bersiveke rast e, lê kêma e. Feqî berhemdarekî pîralî ye ev yek di warê berhemên wî yên çîrokeşî' rî de diyar dibe. Lewra di nava çîrokeşî' rên wî de çîrokeşî' rên warên cuda jî hene. Bo nimûne *çîrokeşî'ra Kela Dimdim* û *yên din ji hev cuda ne. Yanî Feqî ne ku ji bo tenê çar berhemên çîrokeşî' rî nivîsîne danêr e, berhemên xwe li ser mijarên cuda nivîsîne, danêr e.*

Dema ku em li helbestên Feqî dinêrin curbicuriya mijaran xwe dide dest. Hukma li ser mijarên edebiyata klasîk jî şiyana şai' r nîşanî meriv dide. Feqî di berhemên xwe de mijarên zanistên civakî yên wekî; eşq, şîret, hikmet, jiyana gel, tekiliyên mîr û jinan û mezin û biçûkan û ww. û mijarên tesewwûfî bi hostetî bikar anîne. Ev hostetîya wî di her çar berhemên wî yên çîrokeşî' rî de jî gelekî beloq e.

*Çawa ku tê zanîn her hoste tesîrê li derdora xwe dike û li pey xwe peyrew û feqîyan dihêle. Peyrew û feqî bi tesîra hosteyên xwe berhemên xwe dihonin û di berhemên xwe de hostetiyên xwe jî dikin. Di serî de Ehmedê Xanî ameje bi Feqî kiriye û piştî Xanî jî çend nûnerên giring ên edebiyata kurdî li pey Feqî meşiyane. Feqe Reşîd ewqasî di bin bandora Feqî de maye ku xwe wekî Feqiyê duyem (*Ela ey Feqiyê sanî, heta kengî bikî dewran*) (Gemi, 2018, r. 128) binav dike. Feqe Reşîd jî wekî Feqiyê Teyran berhemdar e û mesnewî nivîsîne. Her wiha Şêx 'Ebdurrahmanê Aqtepe jî yek ji şai'rên navdar e ku di bin tesîra Feqiyê Teyran de maye (Adak, 2015, r. 10-15).*

Gelek caran di xwendina berhemên klasîk de ji ber ziman, zeman, naverok, qalibên edebî û tiştên derdora van, merema helbestvên gelekî zor tê fehm kirin lewma meriv berê xwe dide ferheng, şerh û şiroveyan. *Lê gava em berê xwe didin berhemên Feqî em dibînin ku hin tişt jixweber di hişê me de zelal dibin, sedema vê jî ew e ku di nav berhemên Feqî de bûyereke/ên hev girtî heye.*

Têkiliya edebiyat û folklorê yanî helbest û çîrok gava bi hev re hevsengiyê *dikin* hêsani çêdibe, yên ku dibêjin zimanê Feqî sivik e di gotinê de rast dibêjin lê di kûrahiyê *de şaş in*. Lewra felsefeya Feqî ewqas ne hêsan e. Feqî ji bo armanceke mayînde amûreke ji aliyê têgihîştinê ve zexm bikaraniye ku em niha jê re dibêjin çîrokeşi'r. Ev pêngava ku bi wî xurt bûye piştî wî jî her berdeyam bûye, Ehmedê Xanî ku Mem û Zîna xwe li ser heman metod û armancê nivîsiye ku ew jî bi xwe dibêje; *Şer'ha xemê dil bikim fesane/ Zîne û Memê bikim behane* em dibînin ku helbestvanên klasîk yên dixwestin ji herkesî re tiştêkî bibêjin be yî ku ji qalibên edebî yên hişk derkevin rêyeke wiha dîtine ku serkeşiya wan Feqî dikişîne.

Di dîrokê de kesên ku bi taybetiyên *berhemên xwe derdikevin pêş bi piranî di wî warî de xwedî yek berhemê ne lê di vê mijara çîrokeşi'ran de em dibînin ku be yî yên nisbetî Feqî dibin çar çîrokeşi'rên Feqî hene ku ev jî hostetiyêke nûwaze dide nîşan. Digel vê her çar berhem jî di qadên xwe de ji hev cuda dibin ji van ya herî cuda jî Kela Dimdimê ye û naveroka wê şoreşgerî-dîrokî ye ku di eslê xwe de cengname û destanek kurdî ye. Yên mayî bi naverokên xwe wekî berhemên şîretdayînê tînin dîtine helbet ji van wêdetir in.*

Me di vê xebata xwe tenê Feqî ji aliyê hîmdarê çîrokeşi'ran ve lêkola lê em dizanin û di wê baweriyê *de ne ku* Feqî bi berhemên xwe ji her aliyê mijarên lêkolînan ve wekî ava ku di helbesta *ey av û avê de ye*. Berhemnûsiya Feqî *wî aniye* vê astê lê nivîsîna berhemên cuda bûye ku ew bêtir derkeve pêş. Feqî *hîmê çîrokeşi'ra kurdî hem bi çîrokeşi'rên xwemalî û hem jî ji çîrokên* edebiyatên nêz li gorî qabiliyeta xwe veguheştiye kurdî û bi vî awayê bi taybetî di vî warî de û di warên cuda de di edebiyata kurdî ya klasîk de bûye nûnerekî ciyawaz.

Encam

Sedema ravekirina hestan di dîroka edebiyata klasîk a dinyayê de ne hêsan bû. Lewra her milleta ku çî rave kiribe yan bi devkî yan jî bi cureya helbestê ku xwedî qaîdeyên hişk e ravekirine. Helbestê rê li ber ravekirina hin hest û hîsan digirt lewra hinek tişt divê bi zelalî bihata nivîsîn û dirêj biba. Di serdema klasîk de ji ber gelek sedeman ev yek ne mimkîn bû. Nimûneyên ku me di navborî de behs kir di edebiyata dinyayê de jî di heman pêvajoyê de derbas bûne. Vê pêvajoyê xwe gîhandî edebiyata kurdî ya klasîk.

Di dîroka edebiyata kurdî ya klasîk de bê guman gelek kesan cîh wergirtine lê yên mayînde yên berhemdar bûn. Di serdema edebiyata klasîk de navdarbûn ne karekî hêsan bû. Lewra qaîde û qûralên gelek hişk hatibûn danîn û kesên xwedî hîs û ramanên kemilî carna nikarî wan bi rêya nivîsê veguhêzin, tenê kesên şareza dikaribûn vê pêk bînin. Helbet carna jî ji bo hin cureyên edebiyata klasîk werin nivîsîn divê di qaîdeyên edebiyatê de hin guherîn çêbibin ev yek bi destê helbestkar dihat kirin ev yek tenê di aliyê teşeyê de helbest diguherand, ji aliyê wateyê ve helbest xurt û watedar dikir.

Mijara çîrokeşi'ran berî ku werin nivîsîn di nav gel de heyînên devkî bûn piştî ku bûn nivîskî ji folklorê derbasî edebiyatê bûn. Di edebiyata kurdî ya klasîk de ev cure digel ku cûreyekê nû bû jî bi awayekê serkeftî hatiye hilberandin. Çîrokeşi'r bi naverokên xwe mijarên curbicur dihewînin ev yek di serdema xwe de jî mijarên cuda bûn. Bi van taybetmendiyên xwe çîrokeşi'r di nav berhemên klasîk de digel helbestan bêtir hatine hezkirin, sedema vê yekê jî têngîhîştina wan a naverokî ye. Mijarên çîrokeşi'ran bi gelemperî mijarên nav gel in, dikarin bên veguheştin û hişdemayîna wan hêsan in. Lewra hosteyên serdema klasîk ev bi zanayî kirine mijarên reşbelekên xwe.

Yek ji wan hosteyan Feqiyê Teyran e ku me di naveroka vê gotarê de bi qasî lêkolîna xwe berî da yek ji taybetmendiyên wî ku hîmdarê/danêrê çîrokeşi'ra kurdî ye. Di lêkolîna me de derket ku Feqî bi 4 berhemên xwe yên çîrokeşi'rî di nav lîteratura kurdî de dibe ew kes ku herî pêşî di vî warî de herî zêde berhem nivîsiye. Em dikarin angaştta xwe wiha bipeyîtin; bi berhemdariya wî ya curbicurî û ji ber ku berhemên wî nimûneyên ewil ên vê cureyê ne û herwiha ji ber ku bi hostetî û ne kêmî edebiyatên cîranan berhemên xwe nivîsîne û li pey xwe peyrew hiştine ku di heman cureyan de berheman bidin. Feqî ev çîrokeşi'r bi zanayî xistiye nava jiyana xwe û gel lewra wî dizanîbû bi helbestên qaîdeyên hişk nikare ji gel re hin tiştan rave bike. Bi vê hewla Feqî çîrokên nav gel bûne çîrokên pendî, şîretî, dersî, hikmetî û ww.

Çavkanî

- Adak, A. (2015). *Ekola Aqtepeyê ya Edebiyatê û Hizra Kurdî-Elewîtî-Neqşebendîtîyê*. Stenbol. Nûbihar.
- Adak, A. (2019). *Teşeyên nezmê: Di edebiyata kurdî ya klasîk de* (Çapa yekem, C. 1). Stenbol. Nûbihar.
- Akyel, Z. (2021). *Silvan'ın Tarihi Yapıları Ve Üzerlerindeki Bazı Figürler* (1. bs, C. 1). Ankara. Son Çağ Yayıncılık.
- Bottero, J. (2005). *Gilgamiş Destanı: Ölmek İsteyen Büyük İnsan* (O. Suda, Çev.; Sy 2; 1. bs, C. 1). İstanbul. Yapı Kredi Yayınları.
- Cemiloğlu, M. (2015). *İlköğretim Okullarında Türkçe Öğretimi* (6. bs, C. 1). İstanbul. Alfa Aktüel Yayınları.
- Cihani, P. (2019). Feqiyê Teyran'ın Şiirlerinde Üslup. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 5(10), Art. 10.
- Dereşî, S., & Elî, D. (2011). *Dîwana Feqiyê Teyran* (Çapa 1, C. 1). Amed. Lîs Basın-Yayın.
- Dilovan, S. (2018). *Dîwan / Melayê Cizîrî* (5. bs, C. 1). Stenbol. Nûbihar Yayınları.
- el-Bustânî, S. (1905). *İlyâzetul Hümîrûs* (C. 1). Kahire.
- Ertekin, M. Z. û Basuğuy, B. (2022). Feqiyê Teyran : Şai'rê Hikmet û Nesihetê. Timurtaş, A. û Tek, A. û Özdaş, H. û Ahmad, H. O. û Acar, M. (Ed). *Feqînasî. 63-93*. Ankara: Peywend.
- Gemi, A. (2018). Çend Agahî Derheq Jiyanê Feqê Reşîd û Sirru'l-Mehşera Wî de. Nûbihar Akademî, Jimar 9, Sal 5, 127- 145.
- Gemi, A. (2016). Feriduddin Attar'ın Etkisinde Gelişen Gülşehrî Ve Feqiyê Teyran'ın Şeyh San'An Hikâyelerinin Mukayesesi. *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, 9(45), 10.
- Geverî, A. (2013). *Yûsuf û Zuleyxa: Selîmiyê Hizanî* (Çapa yekê, C. 1). Stenbol. Nûbihar.
- Gökçek, F. (2014). *Mehmet Akif'in Şiir Dünyası* (1. bs, C. 1-1). İstanbul. Dergah Yayınları.
- Guerber, H. A. (2010). *Destanlar Kitabı* (1. bs, C. 1). İzmir. İlyâ Yayınevi.
- Güzel, A., & Torun, A. (2020). *Türk Halk Edebiyatı El Kitabı* (10. bs, C. 1). Ankara. Akçağ Yayınları.
- İli, E. (2019). Feqiyê Teyran'nın Varlık Görüşü. Hejmara Weşandinê: 537105. [Yüksek Lisans Tezi, Mardin Artuklu Üniversitesi]. <https://tez.yok.gov.tr/>.
- Karaca, F. (2021). Berawirdkirinek Li Ser Qesîdeya Avê Ya Füzûlî û Helbesta Ey Av û Avê Ya Feqiyê Teyranî ji Alîyê Hêmana Avê ve . *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi* , 7 (13) , 9-35.

- Külter, Y. (2023). Feqiyê Teyran'ın Kelamî Görüşleri. (Yayın No:793159). [Yüksek Lisans Tezi, Şırnak Üniversitesi]. <https://tez.yok.gov.tr/>.
- Köprülü, M. F. (2009). *Türk Edebiyatı Tarihi*. Ankara. Akçağ Yayınları.
- Orkin, Ş. (2015). Di Berhemên Feqiyê Teyran De Hêmanên Tesewufî. (Hejmara Weşandinê: 415846). [Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Muş alparslanê]. <https://tez.yok.gov.tr/>.
- Öztürk, Ö. (2016). *Dünya Mitolojisi* (1. bs, C. 1). Ankara. Nika Yayınevi.
- Sadini, M. X. (2022). *Mela Huseynê Bateyî—Dîwan Berhem û Helbestên wî* (4. bs, C. 1). Stenbol. Nûbihar.
- Sağlık, Ş. (2005). Dergah I Edebiyat Sanat Kültür Dergisi. *İslami dergiler projesi*, 190, 12-16. İstanbul.
- Saydun, E. (2018). Teşe û Ciwankariyên Wêjeyî Di Dîwana Feqiyê Teyran De. (Hejmara Weşandinê: 505074). [Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê]. <https://tez.yok.gov.tr/>.
- Şişman, B., & Kuzubaş, M. (2017). *Şehname'nin Türk Kültür ve Edebiyatına Etkileri* (C. 1-1). İstanbul. Ötüken Neşriyat.
- Tenik, A. (2021). Sûfi Feqiyê Tayran'ın "Ey Av û Av" Şiirinde Varlık Dili. Maardin. Artuklu Akademi, 2021/8(2), 382-399.
- Usta, İ. (2020). Arap Edebiyatında Edebi Bir Tür Olarak Destan. *Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, 47, 375-392.
- Uygur, S. (2005). *Türlerarası İlişkiler Açısından Ziya Osman Saba'nun Şiir ve Öyküleri* [Yüksek Lisans Tezi]. Marmara Üniversitesi .
- Xanî, E. (2022). *Mem û Zîn. (Amadekar: Huseyn Şemrexî). Çapa Şeşem. Stenbol. Nûbihar.*
- Yıldırım, N. (2015). *İran Mitolojisi* (2. bs, C. 1). İstanbul. Pinhan Yayıncılık.
- Yıldız, A. (2016). *Qewlê Hespê Reş (Metn û Lêkolîn)* [Teza Lîsansa Bilind]. Mardin Artuklu Üniversitesi.

HERMENOTİK Û EDEBİYATA KURDÎ YA KLASİK

Serdar YILMAZ,

Xwendekarê Doktorayê, Zaningeha Mardin
Artukluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî yên li
Türkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda
Kurdî, Mardin-Türkiye.

e-mail.bamedserdar@gmail.com.

ORCID: 0009-0001-2283-2778

Article Type/Makale Türü:

Research Article/Araştırma Makalesi

Received / Makale Geliş Tarihi: 23.05.2023

Accepted / Makale Kabul Tarihi: 05.09.2023

Published / Makale Yayın Tarihi: 20.10.2023

Doi: 10.35859/jms.2023.1300699

**Değerlendirme ve İntihal/Reviewing and
Plagiarism:**

Bu makale iki taraflı kör hakem sistemine göre
en az iki hakem tarafından değerlendirilmiştir.
Makale intihal.net adlı intihal sitesinde
taranmıştır. / This article has been reviewed
by at least two anonym reviewers and scanned
by intihal.net plagiarism website.

Citation/Atıf:

Yılmaz, S. (2023). Hermonetik û Edebiyata
Kurdî ya Klasik, The Journal of Mesopotamian
Studies, Jimara Taybet a Edebiyata Kurdî ya
Klasik, rr. 146-159,
DOI: 10.35859/jms.2023.1300699

Serdar YILMAZ

KURTE

Ev xebat têgeha hermenotîkê, xebatên bi rêbaza hermenotîkê
yên di edebiyata Kurdî ya klasîk de hatine kirin û behsa pêwîstiya
hermenotîkê weke rêbaz ji bo edebiyata Kurdî ya klasîk dike. Armanca
me di vê xebatê de nasandina têgeha hermenotîkê, cihê hermenotîkê
di edebiyata Kurdî ya klasîk de û lêkolîna xebatên ku bi rêbaza
hermenotîkê di edebiyata Kurdî ya klasîk de hatine kirin e. Hermenotîk
di çanda Rojava de sistemek fikre ya bi bandor û rêbazeke fikrê ya
popilîst e. Di roja me de hermenotîk ji rêbaza teolojiye derketiye û bûye
rêbaza hûner û edebiyatê. Hermenotîk di roja me de dûrketina ji fikren
deng û azad kirina ramanan e. Hermenotîk bingeha her tiştê ku **şirove** û
famkirin tê de ye. Mijara hermenotîkê ya bingehîn deşifrekirina metnan
e. Şirove kirin dilê hermenotîkê ye. Meriv dikare hermenotîkê di çanda
Îslamê de bi navê te'wîlê bide nasîn. Hermenotîk, ji bo edebiyata Kurdî
wateyeke nû ye û ciyê xwe di qada edebiyata Kurdî de hîn baş nedîtîye.
Li Bakur di vi warî de baş xebat nehatine kirin. Çend xebatên ku di
warê hermenotîkê de hatine kirin jî li Başûr hatine kirin. Pêwîst e di
qada hermenotîkê de berhemên Kurdî yên klasîk bi hûngilî bêne **şirove**
û lêkolîn kirin.

Peyvên Sereke: Hermenotîk, Şirovekirin, Edebiyata kurdî ya
klasîk, Şerh, Te'wîl.

Hermetik ve Kürt Klasik Edebiyatı

ÖZ

Bu çalışma hermetik kavramından, Kürt klasik edebiyatında hermetik metoduyla yapılan çalışmalar ve Kürt klasik edebiyatında hermetik metodunun öneminden söz etmektedir. Bu çalışmada amacımız hermetik kavramının tanıtılması, hermetiğin Kürt klasik edebiyatında yeri ve hermetik metoduyla Kürt klasik edebiyatında yapılan çalışmaları araştırmaktır. Hermetik düşünce sistemi batı kültüründe çok etkili ve popüler bir düşünce akımıdır. Günümüzde hermetik teoloji yönteminden çıkıp doğrudan bir edebiyat ve sanat düşünme metodu haline gelmiştir. Hermetik günümüzde dar görüşlerden uzak ve düşüncelerin özgürlüğü haline gelmiştir. Hermetik içinde yorum ve anlama bulunan her şeyin temelidir. Hermetikin asıl konusu metinleri deşifre etmektir. Yorumlama hermetiğin kalbidir. İslam kültüründe hermetik te'vil ile tanıtılabilir. Kürt klasik edebiyatı için hermetik yeni bir anlamdır ve Kürt klasik edebiyatında tam yerini almamıştır. Kuzey'de bu alanda çalışmalar yeterli olmamakla birlikte Güney'de kısmen daha fazla hermetik ile ilgili çalışmalar olduğu görülmektedir. Dolayısıyla bu çalışmayla klasik Kürt eserlerin hermetik metodla daha fazla yorumlamaya ve araştırılmaya ihtiyacı olduğu ortaya konmaya çalışılacaktır.

Anahtar Kelimeler: Hermetik, Yorumlama, Klasik Kürt edebiyatı, Şerh, Te'vil.

Hermeneutics And Classical Kurdish Literature

ABSTRACT

This study deals with the concept of hermeneutics, studies with the method of hermeneutics in classical Kurdish literature and the necessity of hermeneutics as a method for classical Kurdish literature. Our goal in this study is to introduce the concept of hermeneutics, the place of hermeneutic in classical Kurdish literature and to study the works done with this method in classical Kurdish literature. Hermeneutics is an effective system of thought and a populist way of thinking in Western culture. Nowadays, hermeneutics has moved away from the framework of the theological method and has become the method of art and literature. Today, hermenotics has turned away from narrow views and has become the freedom of thoughts. Hermeneutics is the foundation of everything that involves interpretation and understanding. The main subject of hermeneutics is the deciphering of texts. Interpretation is the heart of hermeneutics. One can introduce hermeneutics in Islamic culture by the name of ta'wil. Hermeneutics is a new meaning for Kurdish literature and has not yet found its place in the field of Kurdish literature. In the North, no studies have been carried out in this area. Some studies on hermenotics have done in the South. In the field of hermeneutics, classic Kurdish works must be carefully interpreted and studied.

Keywords: Hermetotic, Classical Kurdish literature, Commentary, Interpretation.

EXTENDED ABSTRACT

At the outset, we would like to mention the reason for the title "Hermeneutics and Kurdish classical literature". We wanted to draw attention to this topic, since no work on this subject has been done in the North so far, and we also wanted this article to be a start for those who will work in the field of hermeneutics in the future.

Kurdish classical literature is a written literature. Kurdish classical literature includes Kurdish folklore, faith, politics, astronomy, philosophy, mythology, etc. Kurdish classical literature is not just a few mystical poems written in aruz. Kurdish classical literary works need to be studied in detail

and with different methods. We can clearly say that the Kurdish language is in need of reinterpreting Kurdish classical works. Because Kurdish classical literature draws its subjects from many sources. It draws on all religious subjects, the Qur'an, the hadith, the prophet's parables, miracles, famous personalities, nature, cosmography, celestial science, unknown secrets, and all sciences and cultures. Our aim in this article is to introduce hermeneutics, to draw attention to the place of hermeneutics in Kurdish classical literature, to draw attention to the need for hermeneutics of Kurdish classical literary works and to examine the work done in this field so far. Before entering the subject, we would like to focus on the concepts of commentary, tafsir and tawil.

The concepts of commentary and tawil are confused with each other. There is a bond of interpretation at the basis of tawil (Kortantamer, 1992: 1). At the beginning of understanding there is interpretation. In tawil, on the other hand, the text is interpreted in general and in detail. Most of the works in Kurdish classical literature can be called commentaries.

Tafsir is a term used for the writing and putting forward views that explain the verses and verses of the Qur'an. Tafsir focuses on the true meanings of the verses of the Qur'an. Tawil, on the other hand, focuses on the multiple meanings of the Qur'an (Gültekin, 2020: 137).

Tevîl is the evaluation of sentences in detail and the interpretation of words and sentences. It is the finalization of a meaning (Yavuz, 2012: 27). We can see tawil as the equivalent of hermeneutics. In history, human beings have always wanted and endeavored to find new meanings.

Hermeneutics is expressed as interpreting the messages brought by Hermes (Gadamer, 2003: 13). Hermes is an intermediary between God and human beings (Özcan, 2000: 13). The first examples of hermeneutics were the interpretation of sacred books and classical language (Palmer, 2003: 37). The traces of hermeneutics go back to Aristotle and Homer (Aytaç, 1999: 89- 90). In Western hermeneutics, texts are interpreted with the help of philology and human sciences (İnalçık, 2002: 22). Interpretation is the heart of hermeneutics (Palmer, 2003- Bilen, 2002: 32). With interpretive hermeneutics, it reveals the contents of the text and the hidden meanings that many people do not know as knowledge in literature (Toprak, 2016: 9).

Hermeneutics is a new meaning in Kurdish literature. It has not found its place in Kurdish literature. It has been determined that no studies on hermeneutics have been conducted in the North, and the few studies that have been conducted have been conducted in the South. Two doctoral theses were prepared in the South in Kurdish Sorani and Kurdish Kurmanji dialects with the hermeneutic method in Kurdish classical literature. Dr. Hussein Osman Abdurrahman Êrweyî prepared his doctoral thesis in Kurdish Kurmanji dialect at Soran University in 2013. The topic of his doctoral thesis is Melayê Cizîrî's ode "hê di ber qalû belayê" with a hermenotic reading. This ode of Melayê Cizîrî consists of 17 couplets. In the ode, Mela talks about existence. This doctoral study consists of 397 pages. The most remarkable aspect of this study is that a very long doctoral thesis was prepared on a 17 couplet ode. Êrweyî used the hermeneutic method of Paul Ricœur.

The second study we will analyze is a doctoral dissertation in Kurdish Sorani dialect titled "The Hermeneutics of Sophian Poetry" (Mehwî) by Hemin Omar Ahmed. This thesis was prepared at the University of Sulaymaniyah in 2014. This thesis consists of an introduction and three chapters. It talks about the Sufi opposition of the ghazal, the concepts of woman, cemal, jalal and kemal. It talks about the mey, which is a Sufi heritage. It also talks about the hermeneutic reading of the phonology as a tool for hermeneutic reading, the poet's experience and the ipsthology of understanding. He also talks about the hermeneutics of semiology and the contribution of logic to hermeneutic reading. He talks about the problems of hermeneutics with Sufism and the interpretations made in the name of commentary and tawil. He emphasizes the Sufi elements.

In conclusion, we wanted to find out what hermeneutics is, why hermeneutics is used in literature, the place of hermeneutics in Kurdish classical literature and what studies have been carried out. Hermeneutics is a new subject for Kurdish literature and has not been well established in Kurdish literature. For a better understanding of Kurdish classical literature, the method of hermeneutics should be used and Kurdish classical works should be studied, analyzed and interpreted in detail.

Destpêk

Di despêkê de em dixwazin behsa sedema danîna serenavê *hermetotîk û edebiyata Kurdî ya klasîk* bikin. Heta niha li ser mijara hermetotîkê û bi rêbazên hermetotîkê weke xebat li Bakûr ji ber ku tu xebat nehatine kirin, me xwest ku em balê bikşînin ser vê mijarê û di vê qadê de valahiyekê dagirin. Me xwest ku ev gotar bibe despêkek ji bo kesên ku di pêşerojê de xebatan li ser mijara hermetotîkê bikin.

Edebiyata Kurdî ya klasîk edebiyateke nivîskî ye. Edebiyata Kurdî ya klasîk di serdema Îslamê de, di bin bandora unsûrên dînî de hatiye afirandin. Edebiyata Kurdî ya klasîk ji sedsala XIIIan heta sedsala XIXan berdewam kiriye. Li erdnîgariyeke fireh û bi zaravên cuda xwe gihandiye roja me (Adak, 2013: 15). Bi pejirandina dînê Îslamê, Kurd ketine bin bandora ola Îslamê. Herwekî di qada edebiyatê de Kurd ketine bin bandora Îslamê û edebiyateke nivîskî, Îslamî derketîye meydanê. Em dikarin bipirsin ji bo çî pêwîstîya hermetotîka edebiyatê, bi taybetî ya dîwanan girîng e? Ji ber ku çanda îro ya Kurdan û şertên jîyanê ne mîna dema ku ev berhem hatine nivîsîn. Ji ber ku edebiyata Kurdî ya klasîk bi mijarên xwe gelekî berfireh e. Edebiyata Kurdî ya klasîk ji folklorê Kurdan bigire heta bawerî, siyaset, astronomî, felsefe û mîtolojiya wê demê ya heyî di xwe dihewîne. Em nikarin tenê bibêjin ku edebiyata Kurdî ya klasîk çend heb helbestên ku bi wezna erûzê û bi mijarên tesewufê hatine nivîsîn e. Pêwîst e ev berhemên edebî bi awayekî hûgîlî ji bo xwendevanên îro bi rêbazeke cuda yanî bi rêbaza hermetotîkê werin analîz kirin.

Em dikarin bibêjin ku zimanê Kurdî mihtacê şirovekirina filolojiya Kurdî ya klasîk e. Ji ber ku edebiyata Kurdî ya klasîk mijarên xwe ji gelek çavkanîyan distîne. Ji hemû mijarên dînî, qur'an, hedîs, qisetên pêxemberan, mucîzat, kesayetên navdar, xweza, kozmografya, felekiyat, esrarê keybê û ji hemû zanyarî û çandan xwe xwedî dike û wan mijaran kêr-zêde di xwe de dihewîne (Yılmaz, Serdar, 2015: 87). Ji ber ku edebiyata Kurdî ya klasîk ji hêla ziman û ji hêla mijaran ve qadeke fireh e, pêwîst e bi awayekî baldar û zanistî li ser tekstên edebiyata Kurdî ya klasîk bê rawestandî. Me xwest ku em bizanibin ka li ser edebiyata Kurdî ya klasîk bi çavê hermetotîkê weke milletên din Kurdan çî xebat kirine û di çî astê de xebat hatine kirin. Armanca me di gotarê de; danasîna hermetotîkê, cihê hermetotîkê di edebiyata Kurdî ya klasîk de, balkişandina pêwîstîya hermetotîk kirina tekstên edebiyata Kurdî ya klasîk û heta niha xebatê di edebiyata Kurdî ya klasîk de bi rêbazên hermetotîkê hatine kirin e. Berîya ku em têkevin mijarê pêwîst e ku em çend têgehên îzah bikin. Em dixwazin li ser têhgehên mîna şerh, te'wîl û tefsîrê rawestî. Gelo tefsîr, şerh û te'wîl yek in an ji hev cuda ne. Dawiyê em ê têkevin mijara hermetotîkê û di edebiyata Kurdî de xebatên ku li ser hermetotîkê hatine kirin rawestî.

1. Şerh

Di ferhengê de bi wateya jêkirina goşt, fireh kirin û belav kirina tiştêkî, îzah kirina pêyvên ser wan girtî tê qebûl kirin (Ibnî Manzûr, 2004: 522). Di şerhê de bêje û hevokên ku ji hêla xwendevanên nayêne famkirin tene îzah kirin. Di şerha metnan de bi tevahî parçe kirina metnan tê kirin. Lê di te'wîlê de şirovekirina metnan bi awayekî tevahî tene analîz kirin. Şerh û te'wîl li gorî bikaranîna çavkanî û delîlan, weke; bikaranîna ayetan, hedîsan peyvê mezinan, qisetên peyxemberan, metnên edebî û hwd hinekî dişibîne hev.

Şerh weke têgeh ravekirina ziman, naverok û hukmê hedîsan e (Aydınlı, 2015: 293). Weke têgeha hedîsê şerh, ravekirina bêje û têgehên rîwayeta hedîsekê ye (Efendioğlu, 2010: 559). Her çiqas şerha berhemên ku di warê tefsîr, fîkîh, kelam, edebiyat, dîrok, mentîq û tibê de hatine nivîsîn jî, dema ku dibe şerh tiştê herî pêş ku tê eqlê meriv ‘ilmê hedîsê ye. Ev têgeh bi hedîsê re bûye wekhev û bi qalibê “şerhul hadîs” re bû ye weke qadekê (Şeker, 2015: 11).

Têgehên şerh û te’wîlê ketine nava hev. Bingeha te’wîlê bi navgîneke şerhe tê kirin (Kortantamer, 1992: 1). Di despêka famkirinê de şerh heye. Armanca **şirove** kirina metnên edebiyata Kurdî ya klasîk, bi taybetî helbest, ji bo baştirîn têgihîştina wan berheman in. Her çiqas te’wîl û şerh weke têgeh ji hêla wate pratîkê ve ketibin nava hev jî lê di bingeha xwe de ne yek tiştin. Di despêka metnekê de pêşî şerh tê kirin dawiyê te’wîlê tê kirin. Di tarîxa Îslamê de kevneşopîya şerh kirina pirtûkan pir belav e. Şerha gelek pirtûkan hatiye çêkirin. Herwekî di edebiyata Kurdî ya klasîk de gelek şerhê dîwanên helbestan hatine çêkirin. Di serî de şerhên ku li ser dîwana Melayê Cizîrî hatine çêkirin pir in. Rêbaza şerh kirina berhemên edebiyata Kurdî ya klasîk tev mîna hev in. Weke mînak duwazde xebatên şerhên dîwana Melayê Cizîrî hene ku nivîskarên wan ev in: 1. Mele Yehyayê Mizûrî 2. Seyid Ehmedê Kilirmanî 3. Şêx Qedriyê kurê Hesên 4. Mele Ebdurrehîmê Westanî 5. Mela Ebdusselam Nacî 6. Mela Ehmedê Zivingî 7. Ebdurrahman Şerefkendî 8. Cegerxwîn 9. Abdulkûrî Septîoğlu 10. Celalettin Yöyler 11. Mihemed Emîn Doskî 12. Abdulbaqî Turan. Lêbelê kêma zêde bi heman rêbazê hatine şerhkirin. Em dikarin van xebatan tevan weke şerh bidine nasîn. Dîsa em dikarin behsa çend gotarên ku ji hela Yakup Aykaç û Veysel Başçı ve hevpar hatine nivîsîn bikin. Ev her sê xebat li gorî tabîra nivîskarên gotaran bi navê şerhê hatine nivîsîn. Ev gotar bi navê 1. Dahûrîneke Tesewîfî li ser Qesîdeya Çelebî ya Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî (Aykaç û Başçı, 2022: 74-103). 2. Şerha Tesewîfî ya Qesîdeya Bangê Weys a Kerbelayî (Başçı û Aykaç, 2022: 537-562). 3. Şeyh Muhammed Kerbelâyî’nin Mevlâna Halid-i Bağdâdî’nin Gazeline Yazdığı Tahmîsin Tasavvufî ve Edebî Şerhi (Aykaç û Başçı, 2022: 63-91) ne. Dîsa bi heman rengî gotara Aykaç (2023: 195-227) jî heye ku bi navê *Analîzeke Edebî li ser Muşî ‘ereya Aşîq û Maşûq a Rûhî* hatiye weşandin. Her çiqas bi awayekî fireh û serkeftî ev xebat hatine kirin jî lê ne bi rêbazên hermetofîkê hatine kirin. Weke mînak em dixwazin behsa gotara *Dahûrîneke Tesewîfî li ser Qesîdeya Çelebî ya Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî* bikin. Ev qesîde ji 17 beytan pêktê. Di despêka gotarê de behsa binemaleya Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî, têkiliya wan û terîqetan û kurtejiyana Şêx Şemsedîn dîke. Paşî *Qesîdeya Çelebî* ji hêla rûxsarî, ziman û devokan îzah bûye. Nezîreya ku ji hêla Nûr Elişanê Îsfahanî (kd.1797), (Aykaç û Başçı, 2022: 84) di gotarê de hatiye destnîşan kirin. Têgeha “Çelebî” ji hêla wate, dîrok û tesewîfê ve hatiye îzah kirin. Paşî 17 malikên qesîdeyê ji hêla ferhengî peyvên sereke wateya wan hatiye dayîn û bi kurtasî wergera beytan hatiye kirin. Bi navê şîrovê, şiroveya malikan hatiye kirin. Herî dawî jî bi awayekî kurt hunerên edebî destnîşan bûne. Her sê xebat bi heman rêbazê hatine kirin. Ev her sê xebat jî bi pirina nêzî metoda şerha klasîk in. Di kevneşopîya metoda şerha klasîk de, bi heman rêbazê wateya peyvên Erebi û yê Farisî têne kirin û peyv weke hevok têne çêkirin. Bi awayekî berfireh li ser **şirovekirina** peyvên, malikan, helbestan nabe. Li gorî kevneşopîya şerhê ku ji wateya ferhengî, têgînî, rêzimanî û dawiyê wateya wan weke hevok saz kirinê pêktê. Heta roja me jî di edebiyata Kurdî ya klasîk de ev rêbaz dewam kirîye. Lê bi bandora çanda Rojava ev rêbaz hatiye guhertin. Herçiqas gelên weke Erebi, Faris û Tirkên ev rêbazên modern di edebiyata xwe de bikaranîbin jî Kurdan heta niha weke **pêwîst** ev rêbaz bikarneanîne. Pêwîst e di vê serdema modern de ev rêbazên klasîk ya şerhkirina dîwanan di ber çava re derbas bibe û bi rêbazên modern weke gelen din Kurd jî metnên xwe yê edebî bi rêbazên cuda bidine famkirin û şirovekirin.

2. Tefsîr

Di ferhengê de bi wateya daxwuya kirinê tê vegotin. Tefsîr ji koka “fesr”ê çêbûye û bi wateya birina sergirtina peyv û hevokan e (Birişik, 2011: 281). Her çiqas nîfşê tefsîran hebin jî lê meriv dikare tefsîrê mîna şerhê bide nasîn. Ji ber ku herdu jî raste rast li ser peyvên ser wan girtî dirawestin.

Di despêka tefsîrên Qur’anê de te’wîl bi wateya tefsîrê dihate nasîn. Weke mînak; Te’wîlû Muşkilîl Qûr’an ya Îbn Kuteybe û Camîlûl Beyan ‘En Te’wîlî ayî’l Qur’an ya Taberî bi navê te’wîlê hatine binav kirin. Dawiyê ev hişmendî û rêbaz hatiye guhertin û berhem bi navê tefsîrê hatine kirin. Matûrîdî cudahî xistiye nava te’wîl û tefsîrê û gotiye tefsîr tiştê ku wateya wê yek e û te’wîl tiştê ku wateya wê gelek e (Yavuz, 2012: 27).

Di kevneşopîya tefsîrên Qur’anê de du heb şiklên tefsîran hene. Yek ji şiklên tefsîran tefsîra rîwayet ya din tefsîra dirayet e. Di tefsîra rîwayet de mûfessîr metnan dispêre bûyerên dema nûzûlê û agahiyên rêzimanî, bi awayekî objektîf xwe digihîne wateya metnan. Di tefsîra dirayet de mûfessîr xwe naspêre rastiye dîrokê û ne ji agahiyên rêzimanî rasterast xwe dispê şiroveya xwe û eqlê xwe (Ebu zeyd, 2014: 239). Tefsîra dirayet ji ber ku şirove û fikren eqlî tê de hene hinekî nêzî hermetotîkê ye.

Yên ku tefsîra rîwayet dicibînin ji wan re dibêjin ehle sünnet û selefê salihîn. Yên ku tefsîra dirayet dicibînin ji wan re dibêjin felasîfe, mu’tezîle, şîa û mutesewwîf. Di dîroka Îslamê de li hemberî ehlê tefsîra dirayet bertekê tund hatine nişandan, heta gelek caran pirtûkên wan hatine şewitandin. Lê em dikarin bibêjin ku di tefsîrên rîwayet de, weke tefsîra Ibn Abbas îctîhad û te’wîlên berbiçav hene (Ebu zeyd, 2014: 239).

Tefsîr, rêbaza li ser manaya heqîqî yê lefzên Qur’anê diraweste. Te’wîl li ser lefzên ku wateya wan pir in diraweste û ji bilî wateya berbiçav, bi taybetî li ser wateya wan ya eqlî, mecazî û subjektîf diraweste (Gültekin, 2020: 137). Em dikarin bibêjin ku tefsîr û te’wîl seranser ne mîna hev in, ji hev cuda ne.

3. Te’wîl

Di ferhengê de vegeerîna gihaştin, vegeerîna hatinê tê vegotin. Ji koka “evl”ê çêbûye. Bi hûrgilî nirxandina peyvê û şirovekirina gihaştina wateya peyvê ye. Gihandina asta tiştêkî ya herî dawî ye (Yavuz, 2012: 27). Meriv dikare *te’wîlê* bi beramberiya hermetotîkê bide nasîn. Ji ber ku te’wîl mijaran bi awayekî cuda dinirxîne. Însan, di dîroka zanistê de, di her warî de her daim xwestîye û hewl daye ku wateyên nû bibîne.

Her çiqas di metnên edebî de em nîfşên tewîla bikarnînin jî, lê di lîteratura Îslamê de gelek nîfşên te’wîla henin. Herwekî te’wîla ze’îf, te’wîla fasîd, te’wîla nexweş, te’wîla dûr û te’wîla bi zorê hatine bi nav kirin (Kaya, 2018: 132). Mufessîran, ev te’bîr ji bo wan kesên ku te’wîla ayetan û hedîsan baş nekirine birkarînin.

Di tarîxa Îslamê de tefsîr ji bo wateya metnên olî, bi taybetî rave kirina ayetên Qur’anê hatiye bikaranîn. Peyva şerhê jî ji bo ravekirina metnên olî hatiye bikaranîn (Gültekin, 2020: 148). Em dikarin bibêjin ku şerh û te’wîl ne yek tiştin.

4. Hermetotîk

Navê hermetotîkê, bi şirovekirina peyamên ku Hermes ragihandine tê îfade kirin (Gadamer, 2003: 13). Sazumankarê têgeha hermetotîkê *Hermes* Xwedayê rêvî û şivanan e. Di nava Xweda û însanan de peyamberek e. Koka navê Hermes bi wateya kevirê sînor ji *hermaxê* tê. Ew di sînorê zanebûn û nezanîne de rêbertiya rêwiyan û însanan re bi erka xwe yî peyamberîyê tiştên tene zanin û tiştên nayine zanin nêzîkî hev dike (Özcan, 2000: 13).

Di tevên çandan û şaristaniyan de bi kêmanî sê taybetmendiyê Hermes yê hevpar hene. Bi tofanê tê bi bir anîn. Di çandan tevan de merivekî bijarte, zana, nebî û welî tê nasîn. Ya herî giring ku derketiye maqamekî bilind (esman) e (Kılıç, 1998: 228). Em dikarin bibêjin ku hermetotik pirek e. Hewildaneke ku asoyên du cihanên ji hev biyanî digihîne hev.

Hermetotik, bi Yunanî tê wateya werger û şirovekirinê, ji bêjeya hermeneuo hatiye afirandin. Koka wê ya mîtolojîk digihêje Hermes. Şiklên hermetotikê cara pêşî, ji şirovekirina pirtûkên pîroz û ji ûnsurên filolojiya klasîk pêk hatiye (Palmer, 2003: 37). Di mîtolojiya Yûnan de Hermes, navbeynkariyê di nava Xweda û însanan dike. Peyamên Xweda bi awayekî rast şirove dike û digihîne însanan. Di despêkê de hermetotik, ji bo ku peyamên îlahî baştir werin famkirin ji bo şirovekirina Încilê hatiye bikaranîn.

Şopa hermetotikê digihêje heta Arîstoteles û Homeros (Aytaç, 1999: 89-90). Arîstoteles di *Retorika* xwe de, tevahiya berhemekê nivîskî perçe kiriye. Nîfşên têgehên ji hev cuda kirine. Bandora peryodên ritmê, mecazan (metefor) hîn kiriye (Wilhelm, 1999: 91). Ji bilî şirovekirina pirtûkên pîroz em dikarin *Peotika Arîstoteles* weke şiroveya filolojiya klasîk bidine nasîn.

Hermetotik ne zanyariyek e, bingeha her tiştê ku şirove û famkirin tê de ye. Mijara wê ya esas deşifre kirina metnan e (Özcan 2000, 10: 89). Me got hermetotik famkirin û **şirovekirina** metnan e. Di dîrokê de ev mijar her daîm bûye mijareke edebî. Sedema wê jî ji bo ku ji famkirina metnan re tu sînora nehatiye danîn.

Her çiqas têgeha hermetotikê bigihêje sedsalên kevin yê fikra Yunanî jî, bi wateya xwe ya felsefî Wilhelm Dilthey bikaraniye. Li gorî Wilhelm Dilthey her cure fêmkirin bi jiyane re têkildar e. Li gorî wî wateyên fêmkirinê yên bingeh û yên bilind hene (Aytaç, 1999: 92). Bi Wilhelm Dilthey hermetotik di felsefeyê de hatiye bikaranîn.

Di hermetotika Rojavayî de şirovekirina metnan bi alikariya filolojîyê, zanistên beşerî, civakî û felsefe bi awayekî fireh tê kirin. Di Îslamê de bi batiniyê û bi tesewifê gihiştina wan wateyan. Li gorî Îmam Xezalî di her tiştî de derveyek (zahirek) û hundirek (batinek) heye. Ayetên Qur'anê jî wateyên wan yên lefzî û batîni hene. Ji tefsîrên meşhur ya Fexreddîn Razî de têgehên felsefe û tesewwifê hatine bikaranîn (Înalçık, 2002: 22).

Armanca hermetotikê têgihîştina pirsgerêkan e. Li gorî filologê sedsala 19. Boeckh hermetotik hewildaneke famkirina berhemekê ku ji famkirina nivîskarê wê berhemê baştir e (Tatar, 2004: 8-24). Şirovekirin dile hermetotikê ye. Mutercim berhemên ku di wextekî de hatine nivîsandin, dixwaze hilgire wextê xwe û bi bi vî awayî 'alema xwendevanan û metin bigihîne hev (Palmer, 2003: 62 -Bilen, 2002: 32).

Yek ji rêberê hermetotika nûdem Schleiermacher dibêje: Armanca hermetotikê ne ku perçeyên zor yê metin ji hev derxe û famkirinên şaş ji holê rake. Armanca wê rasterast şertên famkirinê û rêbazên şirovê bîne meydanê ye (Tatar, 2004: 20). Cara yekem bi bandora F. Schlegel, Schleiermacher xwestiye ji hermetotikê re wateyêke giştî deyne û ji hêlên wê yê dogmatik rizgar bike. Schleiermacher nunerekî hermetotika klasîk e. Schleiermacher têgeha hermetotikê ji wate ya wê yî teolojîyê derxistiye û kiriye rêbazek ji bo analîzkirina metin û têgihîştina wan. Di roja me de hermetotik di pir ciyan de bandora xwe didomîne. Di binê vî bandorê de gelek têgehên hermetotikê derketine holê.

Di edebiyatê de şirovekar, tişta ku di hundirê metin de heyî û tişta ku haya gelek kesan jê tune, daxwuyakirina wateya veşartî ya metin û parvekirina wê weke agahî dike (Toprak, 2016: 9). Li gorî Dilthey, berhemên edebî guherînan di civaka dîrokî de nişan didin û dibin şahidên guherînan. Edebiyat, bi jiyana insan ya derûnî jî re alaquadar e. Lo gorî Dilthey edebiyat û hûner weke têgihîştina hebûnê

ne (Dilthey, 1999: 34). Berhemên edebî, çiqas hebûnê bi hostayî şirove bike ,evqas wê bala meriv bikşîne. Ew dinya ya ku pêşkêşî meriv dike pêwîst e ku naskirî be (Gadamer, 1990: 90). Hinek faktorê di metnekê de weke dem, cîh û ziman, dibe ku tiştêkî neyîne hişê xwendevanan. Armanca hermetotîkê bi navgîna şîrovê, derbas kirina van astengîyan e. Em dixwazin çend mînakên ji Şêx Şemseddîn Exlatî bidin:

مست و خرا بم ژمی تن تل لات لا لا

دبیژم از یا لبی تن تل لات لا لا¹

Mest û xerab im ji meyê *ten tele lat la la*
Dibêjim ez ya lebeyê *ten tele lat la la* (Serdar, 2015: 123)

عنبر و مسلک و بخورم صحف و لؤحوزبورم²

اکر و افم و نورم تنناها یا هو

‘Enber û misk û bixûr im Sihuf û Lewh û Zebûr im
Agir û av im û nûr im *tenenaha ya hû* (Serdar, 2015: 146)

Li jorê di beytan de du qalibên ku helbestvan weke qalibên serbixwe ava kirine hene. Qalibê *ten tele lat la la* (تن تل لات لا لا) û qalibê *tenenaha ya hû* (تننا ها یا هو) ye. Dema ku ev qalib û qalibên weke van di helbestan de bi rêbazeke hermetotîkî, bi awayekî berfireh, neyêne analîz kirin wê xwendevan baş tê de negihêjin. Ka armanca helbestvan ji avakirina van qaliban çiyê? Beramberiya van qaliban di termonolojiya tesewifê çiyê? Weke mînak em dikarin qalibê *tenenaha ya hû* şirove bikin:

Tenenaha ya hû (تننا ها یا هو) li gorî sofîyan ku bi felsefeya Wahdet-ul Wicudê ve girêdayine, kinkirina *ente ena; ene îlah, ya hû* (انت انا؛ ان الاله ، یا هو) ye (Yılmaz, Serdar, Bamed, 2015: 64). Beriya em analîza qalibê *tenenaha ya hû* (تننا ها یا هو) bikin pêwîst e em hinek agahî derbarê wahdetul wicudê bidin. Wahdet-ul Wicudê: Bi Erebi yekîtiya hebûnê ye. Ji bilî Xweda tunebûna hebûna hebûnê ye. Wahdet-ul wicudê bi zewqê tê bidestxistin û bi jiyane jî tê zanîn. Li gorî wehdet-ul wicudê her tiştên hebûnê tecelliyatên Xwedane (Cebecioğlu, 1997: 683). Em dikarin qalibê *tenenaha ya hû* (تننا ها یا هو) li gorî felsefeya wahdet-ul wicudê analîz bikin.

Şêx Nureddîn Birîfkanî ev qaliba bi awayekî berfireh tehlîl kiriye. Dema ku tehlîla vî qalibi dike bi felsefeya wahdet-ul wicudê ve girêdide: Çi kelimên heyî weke şetafat, reng, çêbûn, beqa, fena û tiştên heyî tev ji gotina *Laîlahe Îlallah* (لااله الاالله) çêbûne. Şêx Şemseddîn xwestîye di wirdên xwe de yekîtiyekê di nava xwe û Rebbê xwe de çêke û hem jî di gotinê de veqetandinekê deyne (Birîfkanî, 1986: 92). Ev qalib li cem Şêx Şemseddîn weke *Laîlahe Îlallah* (لااله الاالله) e. Bi zikre *tenenaha ya hû* (تننا ها یا هو) îlahê batil tune dike. Şêx Şemseddîn dî bahweriya xwe ya Wahdet-ul Wicudê weke mutesewwifê mîna Hallacê Mensûr bi şatafat û serxweşiya eşqê neaniye ziman. Ji bo ku gotina *enel-heq* (انل حق) ji ser zimanê wî neye girtin, Şêx Şemseddîn gotiye *ente-ena* (انت انا). Yanî ji bo ku weke Hallacê Mensûr neyê famkirin gotiye *tenenaha ya hû*.

Li gorî şêx Şemseddîn, bi nerîna wahdet-ul wicudê *tenenaha ya hû* (تننا ها یا هو) tewhîda heqîqî guhertina zat bi zatê heq e û guhertina sîfatê ebd bi sîfatê heq e. Ev giranbûna kâinatê weke hesinê din ava agir de ye. Dema ku hesin din ava agir de sor û zer dibe, dibe mîna agir. Lê di eslê xwe de hesin nabe agir. Lê hesin mîna agir dide xwuyakirin. Di esere xwe de germayî wî dike mîna agir.

¹ Destxeta Şêx Mihemed Tahirê Birîfkanî û destxeta Şêx Memduhê Birîfkanî.

² Destxeta Şêx Mihemed Tahirê Birîfkanî û destxeta Şêx Memduhê Birîfkanî.

Em dixwazin hinekî din li ser qalibê tenanaha ya hû (تتناها يا هو) rawestin. Hahahana ya hû (هاهانا) zikrê zimanê şevê ye. Naha (ناها) bi wateya ez Xwedê me. Elîfa (ا) Naha (ناها) îşareta gihandina ezê bi ebedê dike. Nisbeta bi bal axir û ezê gotina Naha (ناها) ye. Herfa h (ه) yê îşareta dirêjbûna kesayeta di alema fanî dike. Herfa Elîfê (ا) îşaretî kesayeta heqîqî dike. Ya hû (يا هو) gotineke piştî tevahiyê ye. Zikirkirina Ellah (الله) bi zimanê şevê ye û zikirkirina çiya, cewahiran û hewaye ezman e (Yılmaz, Serdar Bamed, 2015: 66).

Qalibê duyemîn ku me li jorê di nava malike de dabû qalibê tentelelat la la (تن تل لات لا لا) ye. Herwekî ku ev qalib jî weke qalibê tenanaha ya hû (تتناها يا هو) hatiye şifre kirin. Pêwîst e ku em vî qalibî jî ji hela ferhengê û wate ya wê analiz bikin û şifre ya wê derxin holê.

Ten: Ten (Cesed), *Tele:* Xefk (kemîn), (Kanar, 1995: 51-469).
Lat: Pût, *La la:* Na na (Sarı, 1982: 682-684).

Li gorî felsefeya di vî qalibî de; Ten (cesed) ji bo rihê meriv mîna kemînekê ye. Dîsa cesedê (beden) meriv wekî pûtekî ye. Pêwîst e meriv nekeve kemîna bedenê û bedena meriv ji meriv re nebe mîna pûtekî. Li gorî vê felsefeyê ya giring giyanê meriv e. Pêwîst e kes ji bedena xwe pirtir giyanê xwe xurt bike û li du xwestekên bedena xwe (nefa xwe) neçe û giyanê xwe li paş nehêle (Yılmaz, Serdar Bamed, 2015: 64). Li gorî Platon; ruh ji 'alema îlahî bi ketina bedenê destpêdike û bi mirina bedenê dîsa vedigere 'alema îlahî. Li gorî Platon ruh di bedena însan de li xurbetê ye, weke hebûnekê di qefesê de ye. Li gorî Platon pêwîst e di vê serdemê de ruh ji jiyana maddî rû bizîvirîne, ji azwerî û şewhetên xirab dur bikeve. Qabilîyeta xwe ya vegera ber bi îlahî ve ji xwe re esas bigire. Li gorî Platon beden çavkanîya xerabîya tevan e. Pêwîst e rûh ji xwestekên bedene re serî netewîne (Platon, 2001: 69). Li gorî tesewîfa Îslamî yê ku xerabîya təkiliya ruh û bedene dixwaze nefsa e. Yê ku rûh nexweşik dike nefsa e. Nefsa şewhetê, azweriyê û xwestekên maddî temsil dike. Nefsa daim dixwaze bedene ber bi xwestekên maddî ve bibe (Şimşek, 2014: 142). Her çiqas di qalibê *tentelelat la la* (تن تل لات لا لا) de Şêx Şemseddîn behsa nefsa nekiriye jî lê nefsa û beden mîna hev dîtine.

Di tarîfa têgehên hermetotîkê de lihevkirinek tune ye. Lihevkirin û gihandina wateyeke hevbeş jê re ne armanc e. Nediyaîya ku bingehên wateyan saz dikin weke şirove, şerhkirin, metin, famkirin, ji ber sedema şiroveyên van têgehên, ne mumkin e ku meriv bikare ji hermetotîkê re tarîfeke hevbeş bike.

Meriv dikare hermetotîkê di çanda Îslamê de bi navê te'wîlê bide nasîn. Di çanda Îslamê de heta sedsala 11. şirove weke çandeke zindî hatiye domandin. Me di despêkê de jî got ku zimanê Kurdî muhtacê şirovekirina filolojiya Kurdî ya klasîk e. Em dixwazin li jêrê çend mînakên ji beytên Melayê Cizîrî bidin û li ser çend peyvên rawestin:

Tu ji Melayî her bipirs esrarê îşqê hel dikit
Wê mu'emmâyê çî zanin sed mela û muste'id (Tunç, 2008: 316)

Zanim perişan î ji dil bêhed bi êşan î ji dil
Teşbihê buryan î ji dil billah ne însan î Mela (Tunç, 2008: 468)

Mîm metle'ê şemsa ehed ayine sîfet kir
Lami' ji 'Ereb berqê li fexxarê 'Ecem da (Tunç, 2008: 54)

Dema ku em tenê li ser beytekê an peyvekê ji beytê rawestin em dikarin gelek şîrovan derxin. Mînak; di beyta dawî de peyva *fexxar* bi wateya pesindar, ew kesê xwediyê pesin tê zanîn (Sarı, 1982: 573). Di **şîroveya** Dîwana Melayê Cizîrî ya Mela Ehmedê Zivingî de peyva *fexxar* bi wateya xaka Ecem îfade kiriye. Ji bilî Mela Ehmedê Zivingî bi piranî peyva *fexxar* bi vî şiklî hatiye **şîrove** kirin.

Dema ku em li dîrokê dinerin em jî dikarin bi vî şiklî şîrove bikin: Dema ku Cenabê Pêxember (s.x.l.) çêbûye weke mucîzeyên wîladeta wî weke berqekê li seraya Melik Kîsrayê Ecem xistiye, seray hejriyaye, şaneşînên wê û çardeh burcên serayê hilweşiyane. Agirê atêşperestên ‘Ecem vemirine. Gola Savayê zûha bûye. Alimê olî Mûbezan yê ‘Ecem, di xewna xwe de dîtiye ku deveyên serkêş hespên beza danin ber xwe û Çemê Diclê derbas dikin û di nava xaka Îranê de belav dibin (Özkan, 2016: 30).

Dîsa di dema belavbûyîna dînê Îslamê de cenabê Pêxember Muhemmed (s.x.l.) ji mezinê Ecem Husrev Pervîzê II. re, bi Ebdullah b. Huzafe es- Sehmî re nameyekê dişîne. Dema ku name jê re diçe haqaretê li Ebdullah b. Huzafe es- Sehmî dike û nameya Cenabê Pêxember (s.x.l.) diçirîne. Piştî vê bûyerê cenabê Pêxember (s.x.l.) gotiye: Xwedê milkê Kîsra perçe perçe bike. Paşî layê kîsra wî dukuje û xaka Ecem perçe dibe. Li vira jî ev şîrove derdikeve ku berqa nura Îslamiyê, nura cenabê Pêxember Muhemmed (s.x.l.) li seltêneta mezinên Ecem xistiye. Hikmê seltêneta *fexxarê* ‘Ecem winda bûye û nura îslamê li axa ‘Ecem belav bûye (Avcı, 2002: 71-72).

Dîsa meriv dikare şîroveyekê wiha jî bike; her çiqas *fexxarê* Ecem gelek bin jî yek ji *fexxarê* Ecem Selmanê Farisî ye. Selmanê Farisî ji malbateke dewlemend û xwedî îtibar bû (Hatipoğlu, 2009: 441-443). Selmanê Farisî jî ji *fexxarê* ‘Ecem tê hesabandin. Nura Îslamê li dile wî xistiye yekem kesê Ecem ku ketiye dîne Îslamê.

Weke mînak meriv dikare bêje; çawa ku di beyta Melayê Cizîrî de derbas dibe “Wê mu’emmayê çi zanin sed mela û muste’id.” ka “mu’emma” çi ye? Pêdivî heye ku hermetotîka wê were kirin. Dema ku Mela dibeje: *Billah ne însan î Mela* ka Mela çawa ne însan e? Em dikarin van mînakan zêde bikin lê bi kurtasî pêwîst e ku bi hurbîni li ser tekstê edebiyata Kurdî ya klasîk were rawestandin.

5. Xebatên ku di edebiyata Kurdî de Li Ser Hermetotîkê Hatine Kirin

Hermetotîk, ji bo edebiyata Kurdî wateyeke nû ye û ciyê xwe di qada edebiyata Kurdî de hîn baş nedîtîye. Li Bakûr di vi warî de tu xebat nehatine kirin. Çend xebatên ku hatine kirin jî li Başûr hatine kirin. Em ê du xebatên ku hatine kirin bigirin ber lêkolînê, ka bi çi şiklî hermetotîk di edebiyata Kurdî ya klasîk de hatiye pratîze kirin. Xebatekê em ê ji zaravayê edebiyata klasîk ya Kurdîya Kurmancî ya din jî em ê ji zaravayê Edebiyata klasîk ya Kurdîya Soranî bigirin ber analizê.

Dr. Hüseyin Osman Abdurrahman Êrweyî, weke teza doktorayê, bi navê *Xwendineke Hermetotîkî bû qesîda- hê di ber qalû belayê* ya Melayê Cizîrî di sala 2013an li Zanîngeha Soran li kolejî adab di beşa zimanê Kurdî de amade kiriye. Qesîda hê di ber qalû belayê ya Melayê Cizîrî 17 malikan pektê.

Hê di ber qalûbelayê belku ev ‘alem nebû
Çerx û dewran dewrê gerdûn gunbedê mîna nebû

‘Erş û kursî hêj di mexfîbûn di kenza qudrê
Husnê Heq bû istîwaê lami’a işqê hebû

Nehtîbûn hukmê sifatan ew ji zatê lem yezel
‘Aşîq û me’şûqî yek bûn şem’û hem perwane bû

Husn û hubzatê qedîm in lê cûda bûn ew ji yek
Lê niha isme hudûsê hikmet û tefsîl we bû

Yek di zatê surşîrînan bû cemal û husn û sur
Yek di qelbê ehlê dil nar û celal û cezbe bû

‘Aşiq û me’şûqî elheq herdu mir‘atê yek in
Lew di eslê cem‘ê da eslê qedîm ayîne bû

Cezbe û seyra sulûkê bê mehebbet nabitin
Cehdeya bê‘îşq û hub çendî ku kir bê feyde bû

Salikên ‘îşqê yeka yek hewce nînin ez bibêm
Cameya pîrê terîqê ser ji nik şehzade bû

Reng û reng ehlê meqamatê terîqê çûne seyr
Hin celal û hin cemal û sermeyan ev bade bû

Ê birî ‘eynê beqayê badenoşê îşqê bû
Ê bûyî mehwê fenayê ‘aşiqê bêçare bû

Êk ji wan perwane bû soht û fixanek jê nehat
Êk ji wan teşbîhê goyînê bi ah û nale bû

Awurên eswed‘uyûnan aqilan sewda dikin
Gezmeya ‘aşiq vi dil keftî ji çehvên şehle bû

‘Aşiq û me’şûqî da wasil bi yek bin bê hicab
Mehwî bû bi‘zzati ‘aşiq lew di ‘îşqê perde bû

Lew di ‘îşqê da fena bû da bibit baqî di dost
‘Aşiqê baqî nebû qasil hetta fanî nebû

Nuqteê ‘ilm û sewadê herf û neqşê ‘alemê
Ser didin me‘nayekê eslê sewadê nuqte bû

Her yek e‘w dê yek bimînit ewwel û axir yek e
La cerem nabî du bê ê dê bimînit her hebû

Her çi de‘wayê di ‘îşqê da Mela sabit kirî
‘Eynê de‘wayê di nefsil‘emri dîsa şehde bû (Tunnç,2008:458)

Di vê helbestê de Melayê Cizîrî behsa hebûnê dike. Li gorî bahwerîya Mela, hîn alem tunebû, tiştên aleme hîn xwuya nedikirin (weke ‘erş û kursî hwd.) ronahiya ‘eşqê hebû. Hîn tu tişt tunebû Xwedê ‘eşq afirandîye. Sifatên Xwedê hîn nedihatî zanîn ‘aşiq û maşûq yekbûn. Xwedê aşiqê zatê xwe bû. Xweşîkbûn û heskirin yek bûn. Li gorî vê helbestê û van fikrên Mela meriv dikare bibêje ku Mela behsa wehdet-ul mutlaqê dike. Xweda hebûneke mutleq e.

Teza doktorayê ya Êrweyî ji 397 rûpelî pêktê. Em dikarin bibêjin ku ev xebat cara yekem bi metoda hermetotîkê, di lêkolîneke akademîk de, li ser edebiyata Kurdî ya klasîk hatiye şirove kirin û pratîze kirin. Tiştê herî balkêş ku tenê li ser helbestekê bi 397 rûpelî teza doktorayê hatiye nivîsîn. Lo gorî ku me ji rêbaza xebata Êrweyî famkir, rêbaza hermetotîka Paul Ricoeur bikaraniye. Li gorî Paul Ricoeur, armanca her şiroveyê rakirina dûrahîyan di navbera metnên di serdema çandekê û şirovekar de ye (Göka, Aktay, 1999: 69). Êrweyî, armanca vekolînê di doktora tezî ya xwe de wilo îfade dike; Melayê Cizîrî Hozanvanekî wisa mezin e ku pêdivî bêtir vekolîn li ser bêne kirin heye. Bi metodeke nû kuratiya fikra sofîyekî û rê û rêbaza wî xwuya bibe, ji bo vê meremê, me metoda hermetotîkê hîlbijart.

Teza doktorayê ya Êrweyî ji du beşan pêktê. Beşa yekem behsa hermetotîk û qonaxên wê bi awayekî berfireh dike. Di beşa duyem de pratîze û şîrove kirina xalên edebî dike. Helbesta Melayê Cizîrî ya bi navê *hê di ber qal û belayê* ji bo şîrovê daye sê mamosteyên ayînî, pênc mamosteyên zaningehê û du kesên asayî. Di xebatê de şîrove û fikrên van kesan yên ku li ser qesîdeyê hatine kirin cî digirin. Şîroveya qesîdeyê beyt bi beyt weke tabloyekê derdixe. Paşî bi awayekî berfireh ji şerhên ku li ser vê qesîdeyê hatine kirin weke şerha dîwana Melayê Cizîrî ya Mela Ehmedê Zivîngî û h.w.d. jî sûd werdigire. Bi awayekî pir berfireh bêje bi bêje analîza helbestê dike.

Xebata duyem ya ku em ê bigirin ber analîzê, teza doktorayê ya bi zaravayê Soranî hatiye amade kirin ya bi navê *Hermetotîkay Şi'ri Sofîyaney (Mehwî)* ya ku Hemin Omer Ahmed amade kiriye. Hemin Omer Ahmed, teza xwe ya doktorayê, di sala 2014an li Zaningeha Suleymanîyê amade kirîye. Omer Ahmed, li ser dîwana Mehwî hinekî bi rêbaza hermetotîka kevin û hinekî jî ji teoriyên nû sud wergirtîye. Bi awayekî berfireh li ser ûnsurên tesewifê yên di dîwana Mehwî de rawestiyaye. Teza doktorayê ya Hemin Omer Ahmed ji derwazeyek û sê beşan pêktê. Di derwazeyê de behsa pênaseya hermetotîkê û cudahiya wê li gel te'wîl û tîkîliya wê bi belaxet/rewanbêjiyê û pêwendîya wê bi rêbazên rexneyî ya piştî bûnyadgerî/structuralism hatiye kirin. Di beşa yekem de weke metin bi navê di navbera lezzet û hermetotîkê de ye. Beşa yekem ji du beşan pêktê. Di binbeşa yekem de behsa xezelê dike weke bîngeheke dijberiya tesewifê û tê de li ser hinek tîgehên weke jin, cimal, celal û kemalê radiweste. Di binbeşa duyem de jî behsa meyê weke mîraseke tesewifê di nava hermetotîkê dike. Di beşa duyem ya teza doktorayê de di bin navê hermetotîka finomînolojiyê ye. Tê de behsa finomînolojiyê weke navgînekê ji bo xwendinek hermetotîkê dike. Herwiha behsa mabestdarî û azmûna helbestvan û meseleya ipstolojiya fêmkirinê dike. Di beşa sêyem ya teza doktorayê de bi navê hermetotîka sîmyolojiyê (bingeh û problem) dike. Herwiha behsa lijk (mentiq) weke alîkarê xwendina hermetotîkê û di gel wê hinekî behsa pîrsgirêkên analîza hermetotîkê yê di derbarê tesewifê dike. Herweha behsa wan şîroveyan ku di bin navê şerh te'wîl, tewzîz û tefsîrê hatine kirin gengeşe dike. Li ser ûnsurên tesewifê yên di dîwana Mehwî de derbas dibin diraweste û van ûnsuran bi tewîla dîrokî, bi meşhurên tesewifê yên weke Hallacê Mensur ve girêdide. Ya herî balkêş û giring ev e ku Hemin Omer Ahmed, tewîl û şerh tevlihev nekirine, her tîgeh di ciyê wê de ifade kiriye.

Em karin xebatên ku bi rêbaza hermetotîkê hatine amade kirin gelek mînakên bidin, weke mînak; bi navê *Xwendinewekî Hermetotîkî Bo Şi'ri Mehwî* gotarekdi sala 2019an ji hêla Prof. Dr. Yadîgar Letîf Şarezorî di Kovara Wêjeya Kurdî sal 5 hejmar 7an di rûpelê 136-158an de hatiye nivîsandin. Li ser şî'rek Mehwî rawestiyaye bi metoda hermetotîkê analîz kiriye.

Encam

Me xwest ku em bizanibin ka hermetotîk çiyê, hermetotîk ji bo çî di edebiyatê de hatiye bikaranîn û cihê hermetotîkê di edebiyata Kurdî ya klasîk de çiyê û çî xebat hatine kirin. Me di vê xebatê de dît ku di edebiyata Kurdî ya klasîk de, bi rêbaza hermetotîkê, weke pêwîst pir xebat nehatine kirin û xebatê kevin yê ku hatine kirin jî em dikarin weke şerhê bidine nasîn. Pêwîstiya xebatên edebiyata Kurdî ya klasîk bi rêbaza hermetotîkê heye. Di vê xebata me de derkete holê ku şîrovekarî an hermetotîk armanca wê ya bîngehîn raste rast famkirina metnan e. Hermetotîk gelek wateyan li tîgehên datîne û wan bi rêbazên cihê şîrove dike. Her çiqas hermetotîk cara pêşî, ji şîrovekirina pirtûkên pîroz û ji ûnsurên filolojiya klasîk pêk hatibe jî, lê aniha raste rast bûye rêbazek edebîyat û hûnerê. Hermetotîk ji bo edebiyata Kurdî mijareke nû ye. Hermetotîk, ji bo edebiyata Kurdî wateyeke nû ye û ciyê xwe di qada edebiyata Kurdî de hîn baş nedîtîye. Derketîyê holê ku pêwîst e em helbesta Kurdî ya klasîk gelek caran di ber çavan re derbas bikin û analîz bikin. Wê bê xwuya kirin di her şîrove kirina helbesta Kurdî ya klasîk de, wateyên nû derkevin holê û em ê tê de bigihêjin ku kevneşopîya şerh kirina helbesta Kurdî ya klasîk ya heyî, wê ne bes be ji bo famkirina edebiyata Kurdî ya klasîk. Dema ku em ji hermetotîkê sud wergirin em ê di helbesta klasîk ya Kurdî de asoyên nû bibinin. Li Bakûr di vî warî de tu xebat nehatine kirin. Çend xebatên ku hatine kirin jî li Başûr hatine kirin. Ji bo edebiyata Kurdî

ya klasîk baştir were famkîrin pêwîst e di qada hermenotîkê de berhemên Kurdî yê klasîk bi hûgilî bêne şîrove û lêkolîn kirin.

Çavkanî

- Adak, A. (2013). *Despêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*. İstanbul: Nubihar.
- Avcı, C. (2002). *Kisra*. TDV İslam Ansiklopedisi (c. 26, 71-72). Ankara.
- Aydın, A. (2015). *Şerh, Hadis İstilahları Sözlüğü*. İstanbul: Fav.
- Aykaç, Y. (2023). *Analîzeke Edebî li ser Muşa'ereya Aşiq û Maşûq a Rûhî. Mukaddime* (Özel Sayı 1), 195-227.
- Aykaç, Y., Başçı, V. (2022). *Şeyh Muhammed Kerbelâyî'nin Mevlâna Halid-i Bağdâdî'nin Gazeline Yazdığı Tahmîsin Tasavvufî ve Edebî Şerhi*. Şırnak Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi / 29 (Aralık 2022). 63-91
- Aykaç, Y., Başçı, V. (2022). *Dahûrîneke Tesewîfî li ser Qesîdeya "Çelebî" ya Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî*. Kovara Kurdîname (7), 75-103.
- Aykaç, Y., Başçı, V. (2022). *Şerha Tesewîfî ya Qesîdeya "Bangê Weys" a Kerbelâyî*. Şarkiyat 14 / 2 (Ağustos 2022). 537-562.
- Bilen, O. (2002). *Çağdaş Yorumbilim Kuramları*. Ankara: Kitabiyat.
- Birîfkanî, Ş. N. (1986). *El-Bidûr el-Celiyye*. Erbil.
- Birişik, A. (2011). *Tefsir*. TDV İslam Ansiklopedisi (c. 40, 281). İstanbul.
- Cebecioglu, E. (1997). *Tasavvuf Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü*. Ankara: Rehber.
- Dilthey, W. (1999). *Hermeneutik ve Tin Bilimleri*. Ö. Doğan (Çev.). İstanbul: Paradigma.
- Ebû Zeyd, N. H. (2014). *Hermenotik ve Metin Yorumu*. M. Çoşkun (Çev.). Marmara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi (46). İstanbul, 239.
- Efendioğlu, M. (2010). *Şerh*. TDV İslam Ansiklopedisi. (c.38, 555-558). İstanbul.
- E. Palmer, R. (2003). *Hermenotik*. İstanbul: Anka .
- Gadamer, H. G. (1990). *Tarih Bilinci Sorunu*. Der. P. Rabinow – W. Sullivan, Toplum Bilimlerinde Yorumcu Yaklaşım'da. T. Parla (Çev.). İstanbul: Hürriyet Vakfı Yayınları.
- Gadamer, H. G. (2003). *Hermeneutik*. D. Özlem(Çev.). İstanbul: Paradigma.
- Gültekin, H. (2020). *Metin Şerhi*. Söylem Filoloji Dergisi 5 (1), (137-148).
- G. Jeanrond, W. (2007). *Teolojik Hermenotik*. İstanbul: İz.
- Hatipoğlu, İ. (2009). *Selman-ı Farisi*. TDV İslam Ansiklopedisi. (c.36, 441-443) İstanbul.
- İnalçık, H. (2002). *Hermenotik, Oryantalizm, Türkoloji*. Doğu-Batı, Oryantalizm-I. Ankara: Doğu Batı Yayınları, Yıl:5, Sayı 20.
- Ibnî M. (2004). *Lisanu-l Arab, el-Mu'cemu'l-vasît*. Mektebetu'ş-Şûruk'd-Devliyye. Kahire.
- Kanar, M. (1995). *Büyük Türkçe-Farsça sözlük*. Tahran: Şirin.
- Karadağ, M. (2004). *Edebiyat Bilgi ve Kuramları*. Ankara: Ürün.
- Kaya, M. (2018). *Kur'an'ın Eleştirilen Yorum Biçimlerinin Ortak İfadesi: Tevil ve Çeşitleri*. Dilbilim Akademik Dergisi (2), 132-165.
- Kılıç, M. E. (1998). *Hermes*. TDV İslam Ansiklopedisi (c.17, 228-229). İstanbul.
- Kortantamer, T. (1992). *Teori Zemininde Metin Şerhi Meselesi*. İlesam 1. Eski Türk Edebiyatı Kollogyumu Sunumu. Ankara.
- Omer A. H. (2014). *Hermenotikay Şi'ri Sofiyaney Mehwi*. Teza Doktorayê. Zaningha Silêmanî.
- Özcan, Z. (2000). *Teolojik Hermenotik*. İstanbul: Alfa.

- Özkan, M. (2016). İrhasatla İlgili Rivayetlerin Metin ve Anlam Açısından *Değerlendirmesi* (c. 7, 30). *Timaios Şirnak Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*.
- Platon,(2001). E. Günay-L. Ay (Çev.). İstanbul: Sosyal.
- Sarı, M. (1982). *El-Mevarid Littûlab*. İstanbul: Bahar.
- Şarezorî, L.Y. (2019). *Xwendinewekî Hermenotikî Bo Şi'ri Mehwî*. Kovara Wêjeya Kurdî (7), Zaningeha Selahaddîn. 136-158.
- Şeker, N.(2015). *Ibn Ebu Cemre el Ezdî ve Behcetûl Nûfûs*. Kahramanmaraş: Noya.
- Şimşek, İ. (2014). *Din estetik boyutu / Tanrı, ruh ve ölüm*. Samsun: Etüt.
- Tatar, B. (2004). *Hermenotik*. İstanbul: İnsan.
- Tunç, O. (2008). *Mela Ehmedê Cizîrî*. İstanbul: Nubihar.
- Toprak, M. (2016). *Hermeneutik ve Edebiyat*. İstanbul: Dergah.
- Wilhelm, D. (1999). *Hermeneutik ve Tin Bilimleri*. Ö. Doğan (Çev.). İstanbul: Paradigma.
- Yavuz, Y. Ş. (2012). *Te 'vil*. TDV İslam Ansiklopedisi. (c. 41, 27). İstanbul.
- Yılmaz, B. S. (2015). *Dîwana Şêx Şemsedîne Exlatî*. İstanbul: Nûbihar.
- Êrweyî, H. O. A. (2013). *Xwendineke Hermenotikî bû qesîda - hê di ber qalû belayê- ya Melayê Cizîrî*. Teza Doktorayê. Zaningeha Soran.
- Zivingî, M. E. (1959). *El-Iqdu'l-Cewherî fî Şerhî Dîwanî Şeyxil-Cezerî*, (c 1, 11). Qamişlo.

Halil Akgül,

Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Edebiyatı Yüksek Lisans,
xelilakgul@gmail.com,
ORCID: 0000-0003-1365-8461.

Article Type/Makale Türü:

Research Article/Araştırma Makalesi

Received / Makale Geliş Tarihi: 10.03.2023

Accepted / Makale Kabul Tarihi: 10.07.2023

Published / Makale Yayın Tarihi: 20.10.2023

Doi: 10.35859/jms.2023.1262796

Değerlendirme ve İntihal/Reviewing and Plagiarism:

Bu makale iki taraflı kör hakem sistemine göre en az iki hakem tarafından değerlendirilmiştir. Makale intihal.net adlı intihal sitesinde taranmıştır. / This article has been reviewed by at least two anonym reviewers and scanned by intihal.net plagiarism website.

Citation/Atıf:

Akgül, H. (2023). Tema û Hêmanên Felsefî di "Ey Av û Av" a Feqiyê Teyran de, The Journal of Mesopotamian Studies, Jimara Taybet a Edebiyata Kurdî ya Klasîk, rr. 160-172, DOI: 10.35859/jms.2023.1262796.

TEMA Û HÊMANÊN FELSEFÎ DI "EY AV Û AV" A FEQİYÊ TEYRAN DE

Halil Akgül

KURTE

Ev nivîsar derbarê tema û hizrên felsefî yên di helbesta Ey av û avê de ye. Helbesta Ey av û avê bi naveroka xwe ya felsefî ji helbestên din yên Feqiyê Teyran vediqete. Di helbestê de "av" bi însên ve hatiye wêfandî û di navbera av û Feqî de diyalogên felsefî derbas dibin. Felsefeya hebûnê ji demen kevnar ve bûye mijarên hizr û ramînê. Feqiyê Teyran jî bi siruştê sofîgeriyê di çarçoveya hikemî de di helbesta xwe de li ser zimanê hebûnê felsefe kiriye û bi pirs û bersivan li ser van mijaran fikiriye. Bi çavkaniya Qur'anê hikmeta eşyayan, zimanê hebûnê vekolaye. Li gorî hizra Feqiyê Teyran, Xwedê Vacibu'l Vicûd e, bi qudreta xwe ji tunebûnê çar bakir (av, ax, ba, agir) afirandiye û bi çar tebî'etan (germ, sar, hişk, nerm) wech kiriye. Xwedê ji 'işqa însên bi 'ilme xwe ji van çar madeyan 'alem afirandiye. Armanca însên ku me'rifet e lewma divê bifikire û di hikmeta Xwedê de têbigihe.

Bêjeyên Sereke: Felsefe, Hikmet, Tema, Ey av û av, Feqiyê Teyran.

Feqiyê Teyran’ın “Ey Av û Av” Şiirinde Tema ve Felsefî Unsurlar

ÖZ

Bu makale, Ey av û av şiirinin teması ve felsefî fikirleri üzerinedir. Ey av û av şiiri sahip olduğu felsefî içerik nedeniyle Feqiyê Teyran’ın diğer şiirlerinden ayrılmaktadır. Şiirde suya insani vasıflar yüklenmiştir ve su ile Feqiyê Teyran arasında varlık/varoluş üzerine diyaloglar geçmektedir. Varlık felsefesi eski çağlardan beri düşünce ve fikir konusu olmuştur. Feqiyê Teyran da bu şiirinde tasavvuf gereği, muhakeme çerçevesinde varlık dili üzerine felsefe yapmış ve soru cevap yöntemiyle bu konular üzerine tefekkür etmiştir. Kuran rehberliğinde eşyanın hikmetini ve varlık dilini araştırmıştır. Feqiyê Teyran’ın düşüncesine göre, Allah, Vâcibü’l-vücûd’tur, kudretiyle dört maddeyi (su, toprak, rüzgâr, ateş) yoktan var edendir ve onları dört mizaçla (sıcak, soğuk, sert, yumuşak) vech edendir. Allah insana olan aşkından, kendi ilmiyle bu dört maddeden kâinatı yaratmıştır. İnsanın amacı ki irfândır, dolayısıyla tefekkür etmeli ve Allah’ın hikmetine nail olmalıdır.

Anahtar Kelimeler: Felsefe, Hikmet, Tema, Ey av û av, Feqiyê Teyran.

Theme and Philosophical Elements in Faqî Tayran’s Poem “Ey Av û Av”

ABSTRACT

This article deals with the theme and philosophical ideas of the poem Ey av û av. The poem Ey av û av differs from Faqî Tayran’s other poems due to its philosophical content. In the poem, human qualities are attributed to water and philosophical dialogues take place between water and Faqî. The philosophy of existence has been the subject of thought and ideas since ancient times. In this poem, Faqî Tayran philosophized on the language of being within the framework of Sufism and reasoning and contemplated these issues with the method of question and answer. He researched the wisdom of things and the language of existence under the guidance of the Qur’an. According to Faqî Tayran’s thought, Allah is Wajibu’l Vicud, and with His power He creates four substances (water, soil, wind, fire) from nothing and creates them with four temperaments (hot, cold, hard, soft). Out of his love for man, God created the universe out of these four substances with his own knowledge. The purpose of man, which is wisdom, therefore, must be in contemplation and attain the wisdom of Allah.

Keywords: Philosophy, Wisdom, Theme, Ey av û av, Faqî Tayran.

EXTENDED ABSTRACT

The word “philosophia”, which has been translated into Arabic as “philosophy”, is composed of two Greek words; “fila” means love and “sophia” means wisdom. Although there are many definitions of the concept of philosophy, the following definition stands out in general: Philosophy is a mental movement based on the search for truth through a series of questions. Through reason, man immerses himself in a search, and from each philosophical question he creates another philosophical problem, thus philosophy continues in a continuum.

Throughout the literature, especially in poetry, the search for truth has been treated with philosophical elements. In classical Kurdish poetry, the philosophy of existence and wisdom are dominant themes, and like other Eastern literatures, they are informed by Islamic sources such as the Qur’an, the life of the prophet and hadith. Sufi poets, in their poetry, considered it a deficiency that the truth could only be grasped by the intellect, and therefore, when dealing with philosophical elements, they needed the approval of the heart as well as the intellect. This is where the difference between philosophy

and wisdom comes to the fore: the philosopher pursues his quest through reason, but the wise man confirms the knowledge obtained through reason with his heart and becomes the owner of wisdom.

One of the most prominent wisdom poets in classical Kurdish poetry is Faqî Tayran. Faqî Tayran (1563-1632, lived in what is considered the golden period of classical Kurdish literature (late 16th and early 17th centuries). He lived in the same period as Melayê Cizîrî, another important name in classical Kurdish literature. In addition to his poems, he also wrote four verse works (Bersîsê ‘Abid, Şêxê Sen’an, Zembîlfiroş, Kela Dimdim). The poem Ey av û av differs from other Faqî Tayran poems because of its philosophical content. Water (av) as a concept has been the subject of many poems. The best known of these is Fuzuli’s “Ode to Water”. While in Fuzuli’s poem water is a symbol of purity and compassion, in Faqî Tayran’s poem it is used as a philosophical concept.

There are few scholarly studies directly on the poem Ey av û av in Kurmanji, but there are many studies on Faqî Tayran. These studies have also included this poem. Ertekin and Basuğuy (2022) and Demir (2019) studied the advice aspect of Faqî Tayran. Karaca (2021) compared Fuzuli’s Water Ode with Faqî’s poem. Cîhanî (2019) studied Faqî Tayran’s style, Saydun (2018) studied Faqî’s divan, and Orkin (2015) studied the sufi elements in his poems. In addition to these, in May 2022, the 3rd International Kurdish Symposium was organized by the Institute of Living Languages at Van Yüzüncü Yıl University with the theme “Faqî Tayran and His Legacy” and the papers presented were published in the book Feqînasî.

In this article, we first studied the form and subject of the poem “Ey av û av.” Then we identified the philosophical elements in the poem “Ey av û av” and tried to evaluate the poem in a philosophical and logical context according to these elements. In this article, we worked on the 46 strophes copy prepared by Yıldırım (Teyran, 2014: 40). This poem is included in M. Xalid Sadîni’s work as 51 strophes and in Seîd Dêreşî’s work as 47 strophes. The predominant theme in this poem is the search for truth, and this is evident in almost every line of the poem. Faqî engages in a conversation with water about wisdom by employing various literary arts. In this conversation, Faqî questions the wisdom of water. Faqî makes the water interpret the philosophy of existence by means of internal dialog. Does existence exist? What is existence? What is the beginning of existence? Does existence change? What is the essence of existence? Is there an order to the universe? What is purpose? Is there a limit to the universe? Is existence one? These questions, which keep philosophy in motion, are the questions Faqî also sought answers to.

As a result, it is seen that the philosophy of existence was intensely dealt with in the works produced during the peak period of Classical Kurdish Literature. The poem Ey av û av was the first Kurdish poem in which the view of existence was expressed in a sophisticated way in the representation of water. Faqî expressed his views in the language of existence within the framework of wisdom, with the technique of inner monologue and question and answer method. According to Faqî, Allah is Wajibu’l Vicûd, eternal and uncreated. Allah is both ‘Ibda and Xalik. The four elements (water, soil, air, fire) were created from nothing and have four opposite natures (hot, cold, hard, soft). Allah created the universe from these four elements out of His love for man.

Destpêk

Bêjeya “Felsefe”yê (*filosofia*) ji du bêjeyên grekî pêk hatiye; “*fila*” tê wateya hezkirinê, “*sofia*” jî hikmet e û bi şiklê “*فلسفة*” (felsefe) ketiye zimanê ‘erebî (Kaya, 1995). Li ser têgeha felsefeyê gelek pênase hatine kirin lê bi çarçoveyeke giştî; felsefe, tevgerêke hizrî ye ku bi rêya rêzepsiran li ser lêgerîna heqîqetê ava bûye. Di felsefeyê de lêgerin bi êqil didome. Ji her bersiveke felsefî pirseke din diwêlîde û felsefe bi vî awayî hebûn û tevgera xwe didomîne.

Felsefe ji ber ku bi lêgerîna heqîqetê ve girêdayî ye, ne mimkin e di nav edebiyatê de jî ji xwe re cihekî qehîm çêneke. Edebiyata Kurdî ya Klasîk bi awayê “hikemî” cih daye felsefeyê. Edebiyata Kurdî ya Klasîk wekî edebiyatên din ên rojhilatî, çavkaniya xwe ji Qur’an, Pêxember, Hedîs û pêkhatayên wan stendiye û em dikarin wan wekî çavkaniyên îslamî binav bikin. “Hikmet” di îslamê de têgeheke karîger e û di Qur’anê de gelek caran derbas dibe (bnr. Beqere, 2/32-129-151-220-231-240-251-260-269; Nîsa, 4/11-54; Ehزاب, 33/34; Sad, 38/20; Zuxruf, 43/63; Qemer, 54/5; Cumû’e, 62/2; Alî Îmran, 3/6-48-58-62-81-126-164). Mutesewifan, di helbestên xwe de, gihiştina heqîqetê ku tenê bi êqil pêk tê, kêr û nekamil hesabandine lewma hêmanên felsefeyê digel êqil bi qelb (dil) jî şixulandine. Ferqa felsefe û hikmetê li wir berçav dibe, filozof bi êqil lêgerîna xwe her didomîne lê ‘arif bersivên bi êqil hatine bidestxistin bi qelbê xwe jî dipejirîne û xwe digihîne me’rifetê. Ev halê me’rifetê bi xwe re hin peywirên “hikemî” ava dike û li piştê ‘arif bar dike. Li gorî Kutluer (1998) di Qur’anê de “hikmet” bi gelek wateyan ve hatiye bikaranîn, we’z û şîreta Pêxember çend ji wan in, herwiha wekî hemwateya Qur’anê jî derbas dibe. Îcarê tê zanîn ku Qur’an bi xwe kitêba şîretê ye, ev şîretkarî di çarçoveya hikemî de rênîşander e. Di edebiyata klasîk de helbestên ku hêmanên felsefeyê ji xwe re kirine mijar û bi çavekî hikemî li heqîqeta eşyayê nêrîne wekî “helbestên hikemî” tên zanîn.

Di helbesta kurdî ya klasîk de Feqiyê Teyran wekî şa’irê hikmet û nesîhetê derdikeve pêş. Feqiyê Teyran (1563-1632) di sedsala zêrîn a edebiyata kurdî ya klasîk de jiyaye (dawiya sedsala 16hem, destpêka sedsala 17hem). Hevçerxê Melayê Cizîrî ye. Digel helbestên wî, çar menzûmeyên wî yên serbixwe hene (Bersîsê ‘Abid, Şêxê Sen’an, Zembîlfiros, Kela Dimdim).

Di nav helbestên Feqiyê Teyran de helbesta Ey av û avê bi naveroka xwe ya felsefî bala meriv dikşîne û ji helbestên wî yên din vediqete. “Av” wekî têgeh bûye mijara gelek helbestên klasîk ku yek ji wan a navdar “Qesîdeya Avê” ya Fuzûlî ye. Cureyê helbesta Fuzûlî ne’ t e, peyva avê “su” wekî paşserwa hatiye bikaranîn û sembola pakî, paqijî û rehmetê ye. Feqiyê Teyran di helbesta xwe de di çarçoveya felsefeyê de ev têgeh xebitandiyê.

Di kurmancî de xebatên zanistî yên rasterast li ser helbesta Ey av û avê kêr bin jî li ser Feqiyê Teyran xebat hatine kirin û ev helbest jî bûye beşeke xebatan. Ertekin û Basuğuy (2022) û Demir (2019) li ser şîretkariya Feqiyê Teyran xebitîne, Karaca (2021) qesîdeya Fuzûlî û helbesta Feqiyê Teyran dane ber hev, Cihanî (2019) li ser şêwaza wî, Saydun (2018) li ser teşe û ciwankariya dîwana wî, Orkin (2015) li ser hêmanên tesewufî yên berhemên wî xebitîne. Ji bilî van, li Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê jî aliyê Enstîtûya Zimanên Zindî ve di gulana 2022yê de bi temaya Feqiyê Teyran û Mîrateya Wî, Sempozyûma Kurdiyatê ya IIIyem ya Navnetewî hate lidarxistin û gotarên hatine pêşkêşkirin di pirtûka Feqînasîyê de hatine çapkirin. Di vê xebatê de em ê ‘ewilî li ser şikl û temaya helbesta Ey av û avê bixebitin. Piştê jî em ê hewl bidin hêmanên felesefî yên di helbesta Ey av û avê de tesbît bikin û li gorî van hêmanan, helbestê bi çarçoveya felesefî û hikemî binirxînin.

1. Helbesta “Ey av û av”ê

Berhemên Feqiyê Teyran cara ‘ewilî jî aliyê Seîd Dêreşî ve hatine berhevkirin û di sala 1989ê de li Bexdayê, di sala 2005ê de jî li Dihokê hatine weşandin. Helbest û menzûmeyên wî wekî berhemeke serbixwe bi navê “Dîwana Feqiyê Teyran” jî aliyê M. Xalid Sadîni li Stenbolê (1999) hatine çapkirin.

Berhema Seîd Dêreşî di sala 2011yê de bi heman navî li Diyarbekirê hatiye çapkirin. Kadri Yıldırım di sala 2014yê de digel wergera tirkî bi navê “Dîwan”ê berhemên Feqî çap kirine. Helbesta Ey av û avê bi hin cihêrengiyên teşeyî ve di hemû dîwanên Feqî de heye.

Yıldırım (Teyran, 2014: 40), ji aliyê cure û teşeyê ve helbesta Ey av û avê daxilî qesîdeyên musemm’et dike. Bi teşeya murebbe’ê 46 bend him bi kurmancî him jî bi wergera tirkî hatiye dayîn. Di xebata M. Xalid Sadînê de 51 bend û di ya Seîd Dêreşî de 47 bendên vê helbestê hene.

Mijarên li ser xuliqandin û hebûnê bi qasî hebûna însên kevn in. Çavkaniyên li ber dest me dibe heta Yewnana Kevn. Fikr û hizr û teorîyên ji wê demê heta îro jî tîrên nîqaşkirin. Zimanê hebûnê di nav kelama îslamê de û di edebiyata îslamê de bûye mijareke sereke. Ji ber ku çavkaniya xwe ji îslamê werdigire di edebiyata kurdî ya klasîk de jî berhemên di çarçoveya zimanê hebûnê de hatine dayîn.

Feqiyê Teyran yek ji wan nûneran e ku di vê helbesta xwe de bi awayekî kûr li Vacibu’l Vicûd, xuliqandin, hebûn, Wehdet-ul Wicûd, masîva (ji bilî Xwedê her tişt) û ww. disekine û bi awayekî hikemî van mijaran rave dike. Feqiyê Teyran di vê helbestê de bi temsîliyeta avê, heyberekê dide axaftin û bi halê ‘arif hizra sofîgeriyê derdibire.

2. Temaya “Ey av û av”ê

Di siruştâ sofîtiyê de lêgerîn heye û sofî lêkolerên baş in. Lêgerîn û lêkolîn tevgerê fikrî û hizrî ye ango fikrî e. Sofî dema lêkolînê dike piştî xwe dide çavkaniyên saxlem û piştrast. Li gorî dînê Îslamê, him ji Qur’anê him jî ji hedîsan diyar dibe ku cihê fikrî giring e û wekî îbadetê hatiye pejirandin.

“... Perwerdegarê me! Te ev (kaînata ha) pûç neafirandiye...” (Alî İmran, 3/191)

“Fikirîna saetekê carinan ji îbadeta salekê bixêrtir e.” (Aclûnî, 1351: I:310)

Feqiyê Teyran helbesta xwe li ser vê hizrê bi awayekî sofîyane honaye. Helbest bi pirsê dest pê dike, Feqî pirsên felsefî li avê dike, av bersivên hikemî dide Feqî. Di helbestê de sê vegêr hene; Feqî, av û şa’ir. Wextê em di çarçoveya Wehdet-ul Wicûdê de bifikirin em ê bibînin ku neqandina “av”ê ji bo bersivan ne belasebeb e. Di gelek mîten xuliqandinê de “av” wekî çavkaniya jiyandî hatiye nîşankirin. Feylesofên Yewnana Kevn jî bi xuliqandinê serê xwe êşandine û bingeha çar madeyan (*Anâsir-i Erbaa*) danîne; ba, av, ax û agir. Aristoteles (1982: 156) îfade dike ku li gorî Thales hêmana hebûnê av e, her tişt ji avê hatiye lewma her tişt av e. “Di nav feylesofên Yewnana Kevn de fikrê “ji tunebûnê hebûn” (*ex-nihilo*) tune bû, lewma Xwedê an jî Xwedayan ne ku ji tunebûnê kaînat afirandine, bereksî wê, Xweda û kaînat ji ezê ve hene, Xwedê bes şikil û nîzam daye kaînatê” (Karlıağa, 1991). Di dînên heq de Xweda him “Îbda” ye him “Xalik” e. Herdu jî afirîner in lê “Îbda” ji tunebûnê diafirîne (bnr. Enbiya, 21/30; En’am, 6/14; İbrahîm, 14/10). Lewma ev çar made bi vê ferqê ve ketine felsefeya Îslamê jî. Belê kaînat ji van çar madeyan pêk hatiye lê afirîner Xweda ye û kaînat ji tunebûnê hatiye afirandin.

Îcarê em berê xwe bidin Feqiyê Teyran û berhemên wî, em dibînin ku Feqî li ser hizra Wahdet-ul Wicûdê ye û helbestên xwe jî di bazineya vê fikrê de honane; “Baxê ku baxvan bête ber, erdek heye ew lê nebî? Dara ku enqa bête ser, belgek heye sih lê nebî? (Teyran, 2014: 66). *Wahid zatek ferd e, tecella bi van sifatan, Bi eynê dil nezer de, hemlên te ‘yyunatan* (Teyran, 2014: 78). *‘Aşiq tu yî dilber tu yî, Nazir tu yî menzer tu yî, Ruhê ruhan gewher tu yî, Misbah û nûra qîmetê* (Teyran, 2014: 146). *Genc bûn di kenza eqdemî, Baxo ji işqa Ademî, İnane karê alemî, Zahir kirin vê sûretê* (Teyran, 2014: 45).” Li gorî hizra Wehdet-ul Wicûdê her tişt perçeyek ji Xwedê ye, erê kaînat ji çar madeyan pêk hatiye lê ev çar made jî ji Xwedê ne. Lewma “av” jî perçeyek ji Xwedê ye. Lê ligel ku Xweda “Cemal” e li

aliyê din jî “Celal” e. Çawa ku “av” çavkaniya jiyane ye li aliyê din rûyê mirinê ye. Lehî ye, tofan e, ezyet e, ezab e, cezakirin e (bnr. Ra‘d, 13/17; Sebe, 34/15-7; Nûh, 71/1; ‘Enkebût, 29/14; Meryem, 19/85-6; Mûmîn, 40/69-72).

Di Ey av û ava Feqiyê Teyran de hûnera teşhîsê hatiye bikaranîn. Yanî wesfên însanan li heyberên neînsan hatine barkirin. Di helbesta Feqî de wesfên însanan li avê hatine barkirin û Feqî bi awayekî felsefî nêzî avê dibe. Di edebiyatê de teknîka diyaloga hundirîn heye ku karakter ji bo halê xwe yê rûhî derbibire, weku li hemberî wî kesek hebe, bi xwe re dikeve diyalogê. Ev diyalog pîranî bi pîrs û bersivan ve dimeşe. Di vê helbestê de jî di navbera av û Feqî de diyalogeke felsefî heye û vegêrê sêyem, şa‘ir jî wekî hakim di navbera wan de ye.

(33)

Pîrsa Feqî bêcih nebû
Lewra di Furqanê hebû
Erşê Xwûdê li ser te bû
Avê gelo di bîra te tê? (Teyran, 2014: 44)

Feqî, di çarçoveya îbadetê de avê bi ‘îşq, sîrveşartin, ta‘etkîrin, zîkîrkîrin, xew, karakter, qîlûqalkîrin û ww. ve diwesfîne. Di helbestê de Feqî pîrsan dike av bersivan dide. Feqî xwe wekî “Mecnûnekî heywansifet” û ji êqîl bêpar diwesfîne lê av “arif” e, xwedî me‘rîfet e. Em arîfbûna avê ji îbadetê wê ya bi coş tê derdixin; av bê sekn û bê rahet e, hey gurgur û gujguja wê ye, bê xew e bi şev û rojan zîkir e, bê rûh, bê dest û pê her taetê dike. Lewma ev îşqa Xwedê ne mimkin e ku bê me‘rîfet be.

Feqiyê Teyran bi çavên mirovekî jîrêzê avê tehqîq dike. Erê Feqî xwe biçûk dixwe, xwe dîn dihesibîne lê ji pîrsên wî tê fêhmîkirin ku suhbeta wî ne belasebeb e. Feqî halê avê dişibîne halê xwe lê dîsa jî van pîrsan dike (bnr. 6). Ma gelo Feqî ji ber ku bi bersivan nizane lewma pîrsan dipirse an ji bo ku di halê xwe têbigihe, xwe biceribîne pîrsan dike? Li vir hunera edebî “tecahul-i ‘arif” derdikeve pêş me. Bi vê hunerê, hunermend ya xuya vedişêrê, xwe li nezanîne datîne û pîrsan li muxatabê xwe dike. Armanca pîrsan ne hînbûna bersivan e, hunermend/şa‘ir jixwe bi bersivan dizane û di pîrsan de serbend an jî bersivê dide (bnr. 7).

(6)

Ji emrê kê ti tê bilez
Sewdaser î şubhetê ez
Ji kê ra dikî çûna bilez
Vê serqutan û xizmetê (Teyran, 2014: 40)

(7)

Xizmet dikî bê pê û dest
Ji kê ra dikî çend kûh û best?
Baxo nego gavek vewest
Daîm diçî dengê te tê (Teyran, 2014: 41)

Av, li gorî însên ji gelek nîm‘etan bêpar e; bê rûh, bê dest, bê pê, bê çeng û bê zar e. Lê dîsa jî her di halê îbadetê de ye, bê rûh li erdê dimeşe, bê dest û pê û çeng, pêl û mewc û fetl û gera wê ye. Lewma ilehîm hikmetek heye di vî halî de. Feqî li pey vê hikmetê ye, ne ku bi bersivê nizane belkî ji bo xwe tehqîq bike, di halê xwe de têbigihe, halê xwe bipeyitîne. Heqîqeta çar cewheran bi avê re ye lê îspatek, tégîhiştinek divê bi kaxetê (bnr. 22). Helbet daxwaza peyitandinê ne ji ber şîk û gumanê ye, ji bo îzah û beyan û qanehbûn/qanehkîrinê ye.

(22)

Vê kaxetê îspat bike

Qeydê di hûr ihtiyat bike

Qenc vê bunyad bunyad bike

Wazih ku fêhma min ne tê (Teyran, 2014: 43)

Tiştên ku heqîqeta çar cewheran, me‘rîfeta enasiran li cem wan hebe ne mimkine ku bi hikmetê nizanibin. Lewma Feqî li ser “hedîsbûn an qedîmbûna” avê kêliyêkê têkeve şîkê jî derhal pirsra xwe serast dike û qedîmbûna avê dipeyitîne.

(23)

Bi dar û dunya setrem î

Avê bi Rebbê alemî

Tu hadis î yan qîdem î

Yan tu nizanî hikmetê?

(24)

Gerçî ne meşrû ev su xen

Rojek ji bunyada mezin

Bihna qîdem jê hate min

Yane ji bunyada te tê (Teyran, 2014: 43)

Dema dor tê ser avê da ku pirsên Feqî dibersivîne, av ‘ewilî li pirsên Feqî diheyire. Ji ber ku, ji xuliqandinê heta niha tu kesan ji avê pirsên wiha nekiribûn. Li vir xuya ye av ji van pirsan aciz dibe û mijarê tine ser pêxemberan ku wan jî pirsên wiha nepirsine. Feqî arîfbûn û kamilbûna pêxemberan derdixe pêş, diyar dike ku “ji cara ‘ewil hayê pêxemberan ji çerxa felekê hebûye”. Vegêrê sêyem, şa‘ir (bnr. 33) heq dide Feqî û dixwaze av bersivê bide Feqî, nexwe “Erşê Xwudê li ser avê bû, gelo nayê bîra avê?”. Wate, av yek ji çar cewheran e, “qedîm” e, şahida “hedîs” e.

Îcarê ku av qaneh dibe, pirsên Feqî dibersivîne, ji qedîm heta hedîsê hikmeta hebûnê eşkere dike. Bi îşareta Xwedê, ji tunebûnê hatine der çar bakir; ba û av û ax û agir. Ji ‘îşqa Ademî, Xweda hemû kaînat ji van çar bakiran afirandiye (bnr. 37, 38, 39). Her tişt bi van çar cewheran ketiye qaliban, bo nimûne însan ji axê, cîn ji agir hatine afirandin. Ew jî bûye sebeb ku karakterên wan cuda bin (bnr. 39). Ev çar karakterên cuda jî ev in; germ, sar, hişk, nerm. Erê her heyber ji cewhereke sereke hatiye afirandin û xwedî karakterê cewhera xwe ye lê cewherên din ji di xwe de dihewîne. Însan ji axê hatiye afirandin lewma bi xûyê “hişk” e lê bi avê hatiye nermkirin û ev herî heriyêke pehtî ye û rûhê însânê lê hatiye pîfikirin. “Xwedê, insan ji heriyêke pehtî afirandiye, mîna firaqên ji heriyê” (Rehman, 55/14). “Wextê min ew dirûvand û ji rûhê xwe pîfikirê, hûn derhal jê re secde bikin” (Hicr, 15/29).

(37)

Zahir kirin em çar bakir e

Ba û av û ax û agir e

Heywan hemî jê çêkir e

Dar û nebat û qîmetê

(38)

Dar û nebat û lê’l û dur

Heywan û esnafê di pur

Teyr û tuyûr û lê’l û dur

Terkîb kirin vê wechetê

(39)

Teşbîhê me naferricîn
Însan ji tîned xaricîn
Lew cin ji narî maricîn
Her yek ji me yek teb’etê

(40)

Em çar teb’etan vêk ra did in
Hin ateş in hin barid in
Ji behra hewayê walidîn
Melbûs kirîn bi vê wechetê (Teyran, 2014: 45)

Piştî bersivên avê dîsa vegêrê sêyem, şa’ir dikeve dewrê û xîtabî Feqî dike. Rewş û halê însên diyar dike ku “qedîm” yek e, ew jî çar cewherên qedîm “hedîs” in di qalibê van çar cewheran de. Herwiha, şa’ir balê dikişîne ser heqîqeta “qalû bela”yê û dixwaze vê ayeta Qur’anê bîra Feqî “... *Ma ez ne Rebbê we me? Hemûyan got: Belê, em şahidiyê didin ku tu Xwedayê me yî...*” (A’raf, 7/172). Şa’ir, yanî hakemê di navbera Feqî û avê de, dixwaze dilê Feqî rehet bike, wî qaneh bike lewma “rastiya qewî” tîne bîra Feqî. Di “qalû bela”yê de li hizûra “hatif” (dengê xaîb) soz dane, peyman danîne ku dê heta axretê di xizmeta Xwedê de bin (bnr. 46).

(46)

Di hedretê ma hûn nebûn?
Li hatif î pêwestê bûn
Di xizmeta Baxoy xwe bûn
Heyane roja axretê (Teyran, 2014: 46)

Feqî di helbesta Ey av û avê de civateke hikemî ya xeyalî daniye, bi zimanê hebûnê li ser xuliqandin û hebûnê sohbetê felsefî dikan. Feqî di rola yek ji xelkê ‘am de li pey heqîqetê ye. Bi layenêrîneke îlahî hebûn tê lêkolîn. Ji ber ku av “qedîm” e, xwedî me’rifet e mixatabê pirsan e, beyana kaxetê îspat dike. Şa’irê helbestê jî di navbera Feqî û avê de hekemiyê dike. Ji pirsan jî diyar dibe ku armanca sereke ya Feqî ew e ku di avê û sirra avê têbigihe, hikmeta avê hîn bibe. Wate, Feqî di vê helbestê de di çarçoveya Wehdet-ul Wicûdê de bi teknîka diyaloga hundirîn, bi pirsan, felsefeya hebûnê dike, heqîqetê, “rastiya qewî” bi dilê xwe dipejirîne û bi awayekî şîretkar teblîx dike.

3. Hêmanên Felsefî di “Ey av û av”ê de

Berevajî nêziktêdayinên jiberkirin û neqilkirinê, helwesta felsefî ku piştî xwe dide mereqkirin, jêpîrsîn, tegerîn, fêhmkirin û ditîna pirsiyarê bi pîralî, helwesteke hizrî ye ku pirsan dipirse û tenkît dike (Koç, 2015: 107). Li gorî Keklik (1982: 1) felsefe; zanîna esehî (mehiyet) û heqîqeta eşyayê ye, hewldana diyarkirina sedemên hebûnê ye, xwenaskirina însên e û me’rifet e. Yazır (1996: 29) jî ji bo têkiliya felsefe û dîn wiha dibêje; “Cihê herî dawî ku dê felsefe xwe bigihinê felsefeya dîn e. Lewma bi vê layenêrîne, felsefe kirasê hikmetê li xwe dike. Feylesofên heqîqî, kesên zana (hakim) ên heqîqî ne.”

Di edebiyata klasîk a rojhilat de hêmanên felsefî piranî di vê çarçoveyê de cih digirin; pirsiyarên hebûnê yên însanan, mijarên jêpîrsina cihê însên ê li dinyayê û siruştîna însên. Divê mirov çawa bijî, bextiyariya mirovan, pêdiviyên bûna însên, têkiliya mirovan bi dinya û kaînatê re, mijarên sereke yên felsefî ne di edebiyata klasîk de. Di helbesta Feqî de jî “hebûn” bi perspektîveke îlahî tê lêkolîn.

Hikmet berî her tiştî fikirîn e, fêhmkirin e, fêhmkirina wateya heyberan, di pergala hebûnê de bicihkirina wan e. Fikirîna li ser emrên Xwedê û ta’eta wan e. Hikmeta însên nasîna Xwedê û ta’eta jî bo Wî ye. Armanca Feqî ya jî bo nasîna/nasandina Xwedê û hûrgiliyên pergala ku Wî afirandiyê gelekî beloq e di helbesta Ey av û avê de.

(3)

Da ez bizanim vê sirrê
Ji hindikî heya pirê
Ji me’niya vê gurgurê
Ji kê ra dikî vê taetê?

(5)

Lew şev û rojan bê xew î
Ji mîhnetê lêk ditewî
Şevtariyan qet nahewî
Ji emrê (kê) bi lez ketî? (Teyran, 2014: 40)

“*Ji kê ra dikî vê taetê?, Ji emrê (kê) bi lez ketî?, Ji kê ra dikî işqbazîyî?*” pirsên sereke ne ku di helbestê de tên pirsîn. Av, ji hebûna xwe heya îro bi awayekî bêqisûr, bê sekî her di zîkr û îbadetê de ye. Lewma Feqî avê layiqî van pirsan dibîne. Ne ji mehbûbek yan metlûbek yan jî dost û meqsûdek be çima av digel ku bêlibas û tazî ye jî her gujeguj e û nake betal? Bi van pirsan Feqî dixwaze sirra avê hin bibe, maşuqê avê nas bike, qudreta Xalik hizr bike.

Zimanê hebûnê, yanî hewldanên têgihiştina hebûna heyberan û layenêrînen îlahî di lêkolînên qadê de hertim bala mirovan kişandine. “Di felsefeya Yewnana Kevn de li gorî Thales av, li gorî Anaximenes ba, li gorî Herakleitos agir û li gorî Empedokles jî ax hêmana ewil ya hebûnê ye” (Tenik, 2021: 391). Di tesewwifê de ev hewldana têgihiştinê îbadet e ji bo sofîyan. Her tiştê afirandî ayeteke Xwedê ye, tecela Wî ye. Lewma sofî, li ‘ilmê îlahî yê di heyberan de lêdikole û dixwaze li wan raz û ‘ilman têbigihe. Ev raz û ‘ilmên îlahî ji bo seyr-û siluka sofî rênîşander in. Di tesewwifê de cara ‘ewilî Xezalî (m. 1111) bi berhema xwe ya “Risaletu’t-tayr”ê li ser hal û merheleyên heyberan sekiniye û xwestiye heyberan fêhm bike. Piştî wî, ‘Ettarê Nîşabûrî (m. 1221) “Mantiku’t-tayr” nivîsiye û pê re jî berhemên li ser zimanê hebûne berbelav bûne di edebiyata îslamî de. Di “Risaletu’l-tayr” û “Mantiku’t-tayr” de mirîd teyr in û hal û merheleyên wan bi layenêrîneke îlahî hatine vegêran. Şemsedîn Sivasî (m. 1597) di “Guleşn-abad” a xwe de çiçekan dike mirîd û wan dide axaftin. Feqiyê Teyran jî bi heman armancê avê dide axaftinê. Dixwazê di halê avê de têbigihe hal û hereketên avê fêhm bike û ‘ilmê îlahî ye tê de hizr bike.

Hebûn (heyîn) heye an tune? Felsefeya hebûnê bi vê pirsê destpê dike û li gorî bersivê, pirsên metafîzîk û ontolojîk diwêlidin. Hebûn çi ye? Koka hebûnê çi ye? Hebûn diguhere? Cewhera hebûnê çi ye? Pergala kaînatê heye? Armanc çi ye? Sînoren kaînatê hene? Hebûn yek e an pir e? Li gorî van pirsan bizavên felsefî derketine meydana û feylesofan fikrên xwe yên li ser hebûne diyar kirine. Bo nimûne; li gorî Nihîlîzm û Taoîzmê hebûn tune, li gorî Realîzmê hebûn heye. Bizava Realîzmê jî li gorî bersiva vê pirsê; “Hebûn çi ye?”, di nav xwe de bûye xwedî şaxan. Hizra sofîyan ya li ser hebûnê, piştî xwe dide ‘ilmê îlahî yê di Qur’anê de. Feqî jî di vê çarçoveyê de bi avê re dikeve diyalogê.

Feqiyê Teyran di helbesta xwe de bi temsîliyeta avê dixwaze halê eşyayê (heyîn) fêhm bike. Lewma pirsên felsefî ji avê dike, dixwaze av sîrrên xwe eşkere bike. Çi ne ev sîrr; av ji kê re ta’et û îbadetê dike? Çima ta’et û îbadetê dike, armanc çi ye? Heqîqet çi ye? Heqîqeta hebûnê çi ye? Armanca Feqî ya sereke ew e ku bide nîşan bê ji bilî însanan, heyberên afirandî çawa bêkêmasî û bêqisûr li gorî sedema hebûna xwe tevdigerin. Hikmeta avê heqîqeta hebûnê ye. “*Ma tu nabîni yên li erd û ezmanan; roj, hîv, stêrk, çiya, dar, ajal û gelek insan îbadeta Xwedê dikin, gelek ji wan jî ‘ezabê heq dikin*” (bnr. Hac, 22/18).

Fikirîna li ser halê avê ders e ji bo însên. Li gorî Feqî, maceraya xulîqandina her heyberê di fehma wê de mewcûd e. Her heyber dizane afrînerê wê kî ye û çima hatiye afirandin. Lewma av teslîmî Xwedê ye û li gorî vî halî tev digere (Tenik, 2021: 390). Digel hizra Feqî, bersivên avê yên me’rifetê

bingeha felsefeya helbestê datînin. Bi nav û sifetên Xwedê hikmeta xuliqandinê tê diyarkirin. Padîşahê mezin, Me‘bûd, Xwudê, Baxo afirînerê heyberan e (bnr. 34, 35, 36).

(34)

Avê cewab da ev suxen
Ezmanê hal wê gote min
Remzek ji *Padîşahê mezin*
Subhan ji wê seltetê (Teyran, 2014: 44)

(35)

Subhan ji *Me‘bûdê* li ser
Kî dê ji *Xwudê* ket xeber
Em çar bakir îname der
Genc bûn di kenza qudretê

(36)

Genc bûn di kenza eqdemî
Baxo ji işqa Ademî
Îname karê alemî
Zahir kirin vê sûretê (Teyran, 2014: 45)

Di dînê îslamê de jî wekî dînên heq yên din, Vacibu‘l Vicûd heye. Xwedê heyîna mecbûrî ye, bêyî ku hebûna Xwedê bê qebûlkirin hebûna heyberên din ne mimkine ku bi tiştê ve bê peyitandin. Wate, hebûna Xweda (Baxo) ji xwe ye, mutleq e û mecbûrî ye. Ji ber ku ezel e, inçaq ew dikare biafirîne. “*Qedîm yek e em hadîs in*” (Teyran, 2014: 45). Feqî bi vê risteyê ve piştgiriya vê hizrê dike ku afirandin di hukmê “Padîşahê Mezin” de ye, inçaq bi remza Wî xuliqandin destpê dike. “Me‘bûd” sifeteke din a Xwedê ye ku tê wateya “heyîne ku jê re *ibadet* tê kirin; reb, îlah”. Di hizra Vacibu‘l Vicûdê de, ne ku ji ber Xwedê Me‘bûd e ew Xwedê ye, ji ber ku ew Xwedê ye Me‘bûd e. Wate, Feqiyê Teyran di helbesta xwe de hebûna her tiştî bi hebûna Xwedê ve girêdide, bêyî ku hebûna Xwedê bê qebûlkirin ne mimkin e ku masîva bê *îfadekirin*.

Derbarê afirandina ‘alemê de gelek teorî hatine avakirin. *Çawa* ku li navborî jî derbas bû di Yewnana Kevn de “madeya ‘ewil” heye û her tişt ji vê madeyê ye, lewma tunebûn û ji tunebûnê afirandin tune. Derbarê “madeya ‘ewil” de lihevkiyên tune be jî li ser çar madeyan sekinîne; av, ba, ax û agir. Yanî li gorî wan “hedîs” tune. Di materyalîzmê de jî hebûn li ser “atom”an hatiye avakirin. Li gorê vê; “ya heye” nehatiye afirandin, dê neyê guherîn û dê tune nebe. Li gorî Platinos (Karataş, 2021: 423), ji *çavkanîya* hebûnê (Afrîner) aqil (*nous*) fûriyaye û ber bi jêr ve tebeqeyên *şênber* hatine *çêkirin*. Ev teorî (Sudûr) bi hin guherînan ve ketiye nav feylesofên *îslamê* yên serdema navîn jî. Farabî û *Îbn Sîna* jî derbarê fûrîne de hemfikir in. Di kelama *Îslamê* de hizr û teoriyên wiha hene (Can, 2015: 57-64) ku ‘alemê bi hebûna Xwedê ve girêdidin û dibêjin lewma divê ‘alem jî ezel be. Li gorî Kabylov (2002: 68), di vê mijarê de Xezalî ji wan vediqete, li gorî Xezalî bes Xwedê ezel e, ji bilî Wî her tişt bi qudreta Xwedê hatine afirandin û hebûna wan mecazî ye. Ew tiştên piştê hatine afirandin jî made û cewher in û ew jî guherbar in. Afirandina masîvayê mijareke din e di helbesta Feqî de ku av bi xwe sirra xwe derdibire. Derbirîna avê giring e ji ber ku di helbestê de av ‘arif e, xwedî me‘rifet e.

Di helbesta Ey av û avê de, di bersivên avê de em rastî hizra afirandina ‘alemê tînin. Feqî behsa “*çar bakir*”an dike ku ev çar made (av, ax, ba, agir) ji xezîneya qudretê hatine der (bnr. 35). Wate, ev çar made jî bi qudreta Xwedê ji tunebûnê hatine afirandin. ‘Alem jî ji van çar madeyan hatiye afirandin (bnr. 37, 38, 39, 40). Di Qur‘anê de derbarê vê hizrê de rasterast agahiyên civandî tunebin jî ayetên derbarê afirandina heyberan hene; “*Me her tişt bi avê jîndar kir*” (Enbiya, 21/30), “*Wî hûn ji heriyê (ax) afirandine*” (En‘am, 6/2), “*Me cin ji agirê har afirand*” (Hicr, 15/27), “*Xwedê ye yê ku ba dişîne*

û ewran dixê bizavê, bi vî awayî em bê dişînin de vera mirî (hişkbûyî) û piştî hişkbûna erdê Em dîsa wê hêşîn dikin. Her wisa em miriyan jî piştî mirinê sax dikin” (Fatir, 35/9). Di vê çarçoveyê de em dibînin ku Feqî jî hemû heyberan (heywan, dar û nebat, le’l û dur, teyr û tuyûr, insan, cin û yd.) bi van çar madeyan ve girêdide ku Xwedê ew jê afirandine. Herwiha, ew tiştên afirandî ji çar tebî’etên zid, dijî hev hatine afirandin “*Em çar teb’etan vêk ra did in*” (bnr. 40). “Germ, sar, hişk, nerm” çar tebî’et in ku hemû heyber li gorî wan wech bûne û bi van çar tebî’etan qalib girtine (bnr. 41).

(41)

*Bi çar cihan em labis in**Qedîm yek e em hadis in**Lewma ji tîna yabis in**Hindî dixwazin rif’etê* (Teyran, 2014: 45)

Feqiyê Teyran ne tenê li ser “çawa”yê li ser “çima”yê jî sekiniye. “*Ez xezîneyeke veşartî bûm, min xwest bêm zanîn*” (Aclûnî, 1351: II/132). Mutesewwif koka bêjeya “xwestin”ê bi muhebbetê (‘îşq) ve girêdidin. Yanî, afirandina ‘alemê bi ‘îşqê ve pêwendîdar e, Xwedê her tişt ji ‘îşqa xwe afirandiye. Feqiyê Teyran jî di helbesta xwe de bi devê avê dibêje; Xwedê ji ber ‘îşqa Adem ‘alem afirandiye (bnr. 36). Di Qur’anê de jî hin ayet hene ku piştgiriya vê hizrê dikin; “*Ew Xweda ye ku; çi tiştê li erdê heye, ji bo we afirandiye..*” (Beqere, 2/29), “*Ew e ku, ji kerema xwe, çi li erd û asîmanan heye tev ji bo we bindest kirine...*” (Casiye, 45/13). Piştî wê, Feqî dixwaze armanca li pişt afirandinê jî rave bike. Helbet her tişt li gorî armanca û qayîdeyê hatiye afirandin, di her tiştî de ‘ilmê Xwedê heye; “*Me asîman, erd û tiştên di navbera wan de belasebeb neafirandine*” (Sad, 38/27). Lewma “av” a Feqî wekî her tiştê afirandî, bi ‘ilmê Xwedê dizane ji ku hatiye, çima heye û li gorî wê hebûna xwe didomîne, îbadeta xwe dike “*Çi qas tiştên ku li erd û asîmanan hene Xwedê tesbîh dikin...*”.

Îcarê, di vê ‘alema nîzamî de cihê însên ku der e? Feqî di helbesta Ey av û avê de, di temsîliyeta avê de bi çavekî feylesofî hikmeta heyberan rave kiriye û di dawiyê de jî behsê tîne ser rewşa însên. Weku daye her tiştî, Xwedê ‘ilmê xwe daye însên jî, tiştêkî veşartî tune. Bi fikirînê insan dikare bibe xwedî me’rifet. Divê insan rastiya qewî ji bîr neke;

(46)

*Di hedretê ma hûn nebûn?**Li hatif î pêwestê bûn**Di xizmeta Baxoy xwe bûn**Heyane roja axretê* (Teyran, 2014: 46)

ENCAM

Dema em dibêjin Feqiyê Teyran di sedsala zêrîn a edebiyata kurdî ya klasîk de jiyaye, ne ku Feqî di sedsala zêrîn de hatiye dinê, Feqiyê Teyran tevî hevçerxên xwe ev sedsala zêrîn welidandine. Yanî bi hizr û fikirîna xwe mohra xwe li vê sedsalê xistine û bi berhemên xwe ji yên din cuda bûne. Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî du şaheşa‘irên vê serdemê ne. Herduyan jî berhemen resen bi mijarên resen diyarî edebiyata kurdî kirine. Ji nav mijaran, zimanê hebûne -mijara xebata me ye- di nav berhemên herdu şa‘iran de jî tê dîtin. Melayê Cizîrî di “Ellah Sehergaha Ezel” de, Feqiyê Teyran di Ey av û avê de gelekî beloq li ser mijarê sekinîne.

Ey av û av, helbesta kurdî ya ‘ewil e ku bi rêya avê û di temsîliyeta avê de hizr û ramanên derbarê hebûnê de bi awayekî sofîyane hatine vegêran. Helbest, di bazineya fikirîna de bi teknîka “diyaloga hundirîn” ve li ser pirs û bersivan hatiye honandin. Feqiyê Teyran bi awayekî hikemî li ser zimanê hebûnê hizra xwe derbiriye.

Helbest ji serî heta dawî dişibe xebateke akademîk, gotareke ‘ilmî. Lewma, tema û mijara helbestê yekgirtî ye û hêza edebî ya helbestê jî xurt e. Di helbestê de sê leheng hene; Feqî, av û şa‘ir. Feqî bi teknîka diyaloga hundirîn hikmeta avê tehqîq dike, şa‘ir di navbera wan de hekemtiyê dike. Feqî di rola însanekî jî rêzê de ye û pirsên ‘am ji avê dike. Ji ber ku Feqî teslîmiyeta avê ferq kiriye, dîtiye ku digel ku ji nî‘metên însanan gelekî bêpar e jî kêliyeke nasekine û her îbadeta xwe dike. Lewma Feqî dixwaze hikmeta avê, sirra avê hîn bibe, bide eşkerekirin.

Helbet Feqî ne belasebeb van pirsan dike. Feqî, bi çavkaniya Qur’anê, di çarçoveya hikemê de însanan sewqî fikirîna dike. Li gorî hizra Feqî, ‘ilme Xwedê çawa ku bi ber heyberê re heye bi însên re jî heye û fikirîna dê hikmeta û sirra hebûnê bide eşkerekirin. Jiyîna li gorî ‘ilmê Xwedê di seyrû silukê de rênîşander e ji bo wesletê. Lewma divê însan li gorî ‘ilme xwe bifikire, serwextî zimanê hebûnê bibe û li gorî wê -çawa ku ji qalû belayê ve soz daye- xizmeta Xwedê bike.

Feqî dema armanca xwe pêk tîne referansên felsefî dide. Di çarçoveya hikemî de dide dû van pirs û pirsîyaran; pirsîyarên hebûnê yên însanan, mijarên jêpîrsîna cihê însên ê li dinyayê û siruştaya însên, divê mirov çawa bijî, bextîyariya mirovan, pêdiviyên bûna însên, têkiliya mirovan bi dinyaya û kaînatê re. Feqî bi siruştaya sofîgeriyê, bi perspektîveke îlahî li ser van mijaran dixebite ku ev mijar bi qasî hebûna însên kevn in.

Li gorî hizra Feqî, Xwedê Vacibu‘l Vicûd e, qedîm e, nehatiye afirandin. Xwedê him ‘Ibda ye him Xalik e. Çar made (av, ax, ba, agir) ji tunebûnê hatine afirandin û xwedî çar tebî‘etê zid in (germ, sar, hişk, nerm). Xwedê ji ‘işqa însên, ‘alem ji van çar madeyan afirandiye. Wate, ji bilî Xwedê her tişt (masîva) hedîs e, hatiye afirandin. Xwedê ‘ilme xwe daye her heyberê û di her heyînê de hikmetek heye. Di temsîliyeta avê de heyber bi hikmeta xwe dizanin lewma bi hebûna xwe ve di îbadeta Xwedê de ne. Sofîyê ku dixwaze di hikmeta Xwedê de têbigihe divê bifikire. Fikirîna dê di seyrû silukê de ji sofî re rênîşander be. Di seyrû silukê de fêhmkirin û têgihîştina zimanê hebûnê gihiştina me‘rifetê ye.

ÇAVKANÎ

- Aclûnî, Î. b. M. (1351). Keşfu'l-Hafâ ve muzîlu'l-ilbâs amme's-tehera mine'l-ehâdîsi alâ elsîneti'n-nas, Beyrut., I: 310.
- Aristoteles. (1982). *Metafizîk*. Çeviren: Ahmet Arslan. (https://turuz.com/storage/h-edebiyat-2020-1/0139-Metafizik-Aristoteles-Ahmed_Arslan-1982-120s.pdf) (Erişim:04.01.2023).
- Can, S. (2015). *Fahreddin Er-Râzî'de Yaratılış Teorisi*. Şırnak: Basılmamış Yüksek Lisans Tezi, Şırnak Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Temel İslam Bilimleri Ana Bilim Dalı.
- Cihanî, P. (2019). *Şêwaza Berhemên Feqiyê Teyran*. Bingöl Üniveristesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi. Yıl: 5. Cilt: 5. Sayı: 10, 2019/2. 101-122.
- Demir, M. E. (2019). *Şîret Di Helbesta Kurmancî ya Klasîk Da: Nîmûneya Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Mele Xelîlê Sêrtî û Seyîd Elîyê Fîndîkî*. Mardin: Basılmamış Yüksek Lisans Tezi, Mardin Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Ana Bilim Dalı.
- Ertekin, M. Z. û Basuğuy, B. (2022). *Feqiyê Teyran: Şai'rê Hikmet û Nesîhetê*. Timurtaş, A. û Tek, A. û Özdaş, H. û Ahmad, H. O. û Acar, M. (Ed). Feqînasî. Ankara: Peywend. rr. 63-93.
- Kabylov, N. (2002). *Gazâlî'de Varlık Meselesi*. Ankara: Basılmamış Yüksek Lisans Tezi, Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Felsefe ve Din Bilimleri ana Bilim Dalı, İslam Felsefesi Bilim Dalı.
- İli, E. (2022). *Feqiyê Teyran'da Varlık*. Wan: Peywend.
- Karaca, F. (2021). *Berawirdkirinek li ser Qesîdeya Avê Ya Füzûlî û Helbesta Ey Av û Avê ya Feqiyê Teyranî ji aliyê Hêmana Avê ve*. Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi , 7 (13) , 9-35.
- Karataş, Ö. F. (2021). *Sudûr nazariyesinin gelişimi ve Abdülhak Hâmid Tarhan'ın şiirle Sudûr nazariyesine kazandırdığı yeni bir boyut*. RumeliDE Dil ve Edebiyat Araştırmaları Dergisi, (22), 423-436. DOI: 10.29000/rumelide.886148.
- Karlıağa, H. B. (1991). *Anâsır-ı Erbaa*. TDV İslâm Ansiklopedisi. (<https://islamansiklopedisi.org.tr/anasir-i-erbaa>) (Erişim: 04.01.2023).
- Kaya, M. (1995). *Felsefe*. TDV İslâm Ansiklopedisi. (<https://islamansiklopedisi.org.tr/felsefe>) (Erişim: 04.01.2023).
- Keklik, N. (1982). *Felsefenin İlkeleri*. İstanbul: Doğu Yayınları.
- Koç, E. (2015). *Felsefe ve Edebiyat*. Kırıkkale Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi , 5 (1) , 105-118.
- Kutluer, İ. (1998). *Hikmet*. TDV İslâm Ansiklopedisi. (<https://islamansiklopedisi.org.tr/hikmet>) (Erişim: 04.01.2023).
- Orkin, Ş. (2015). *Di Berhemên Feqiyê Teyran De Hêmanên Tesewufî*. Muş: Basılmamış Yüksek Lisans Tezi, Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Ana Bilim Dalı.
- Saydun, E. (2018). *Teşe û Ciwankariyên Wêjeyî Di Dîwana Feqiyê Teyran De*. Van: Basılmamış Yüksek Lisans Tezi, Van Yüzcüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü.
- Tenik, A. (2021). *Sûfî Feqiyê Tayran'ın “Ey Av û Av” Şiirinde Varlık Dili*. Artuklu Akademi, 2021/8(2), 382-399.
- Teyran, F. (2014). *Fakî-yî Teyran Dîwan – Dîwan Feqiyê Teyran*. (Werger û Şîkar: Kadri Yıldırım). Ankara: Kültür ve turizm Bakanlığı Yayınları.
- Yazır, E. M. H. (1996). *Dibâce (Önsöz), İslam Düşüncesinin Problemlerine Giriş*. Sadeleştirme: Recep Kılıç. Ankara: Türk Diyanet Vakfı Yayınları.

AHENG Û MÛSÎQÎ DI HELBESTÊN FEQÎYÊ TEYRAN DE

Mazhar ÇİFTÇİ

KURTE

Mazhar ÇİFTÇİ,

Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü,
csosyolog78@hotmail.com,
ORCID: 0000-0001-8315-9049.

Article Type/Makale Türü:

Research Article/Araştırma Makalesi

Received / Makale Geliş Tarihi: 25.01.2023

Accepted / Makale Kabul Tarihi: 10.07.2023

Published / Makale Yayın Tarihi: 20.10.2023

Doi: 10.35859/jms.2023.1242076

Değerlendirme ve İntihal/Reviewing and Plagiarism:

Bu makale iki taraflı kör hakem sistemine göre en az iki hakem tarafından değerlendirilmiştir. Makale intihal.net adlı intihal sitesinde taranmıştır. / This article has been reviewed by at least two anonym reviewers and scanned by intihal.net plagiarism website.

Citation/Atf:

Çiftçi, M. (2023). Aheng û Mûsîqî di Helbestên Feqîyê Teyran de, The Journal of Mesopotamian Studies, Jimara Taybet a Edebiyata Kurdî ya Klasik, rr. 173-188, DOI: 10.35859/jms.2023.1242076.

Aheng û mûsîqî du hêmanên bingehîn ên edebîyata klasîkê ne. Edebîyata klasîk xusûsên ji hêla rûxsarê ve li ser van herdu hêmanan hatîye sazîkirin. Ev herdu hêmanên muhîm û hevûdu temamker di helbesta klasîk de li gor hin pîvan, qalib û şewazan xuya dibe. Pîvana sereke ya ahengsaz û mûsîqîsazîyê di helbesta klasîk de kêşa erûzê ye ku kêşa erûzê di helbesta klasîk de wek aheng û mûsîqîya derekî hatîye pênasîkirin. Her wiha di helbesta klasîk de aheng û mûsîqîya navekî jî bi rêya serwa, serwaya hundurîn, paşserwayê û bi rêya hunerên bedî'îyê (ciwankarî) têne sazîkirin. Di Edebîyata Kurdî ya Klasîk de Feqîyê Teyran bi rîtm û aheng û mûsîqîya helbestên xwe ve tê nasîkirin ku vê yeke kirîye ku helbestên Feqî bibin kilam û ji aliyê dengbêjan ve bînan gotin û ji aliyê gel ve bi hêsanî bîne jiberîkirin. Ji ber wê, di vê xebatê de armanca me ew e ku li gorî van pîvan û qalibên navborî di helbestên Feqîyê Teyran de analîz û tesbîtkirina hêmanên ahengsazî û mûsîqîsazîyê bikin. Her wiha ev nivîs ya tîkildarî aheng û mûsîqîyê lîdikole ka Feqî di helbestên xwe de kîjan kêş bi kar anîye. Di bikaranîna kêşê de jî kîjan behre zêdetir bi kar anîye û ji kîjan hunerên ciwankarîyê sûd wergirtîye. Ji bo vê armançê me li ser helbestên Feqîyê Teyran xebatên xwe kirin û di encamê de derket meydanê ku Feqîyê Teyran, hemû hêmanên derekî û navekî yê ahengsazî û mûsîqîsazîyê di helbestên xwe de bi awayekî serkeftî bi kar anîye.

Peyvên Sereke: Helbest, Aheng, Mûsîqî, Hunerên bedî'î, Feqîyê Teyran.

Feqîyê Teyran'ın Şiirlerinde Aheng ve Musiki

ÖZ

Aheng ve mûsikî klasik edebiyatın iki temel unsurudur. Klasik edebiyat esas olarak bu iki unsura dayanmaktadır. Birbirini tamamlayan bu iki önemli unsur, klasik şiirde belli ölçüt, kalıp ve üsluplara göre karşımıza çıkar. Klasik şiirde aheng ve mûsikînin temel ölçütü aruz veznidir ki aruz vezni klasik şiirde aheng ve mûsikîyi oluşturan dışsal bir unsur olarak tanımlanmıştır. Ayrıca klasik şiirde içsel aheng ve mûsikî ise kafiye, iç kafiye, redif ve edebi sanatlarıyla tesis edilir. Klasik Kürt Edebiyatında Feqîyê Teyran, şiirlerindeki ritim, aheng ve mûsikî ile tanınmaktadır ve böylelikle Feqî'nin şiirlerinin şarkı sözü haline gelmesini, halk ozanları tarafından okunabilmesini ve halk tarafından kolaylıkla ezberlenebilmesini sağlamıştır. Dolayısıyla bu çalışmamızda amacımız Feqîyê Teyran'ın şiirlerindeki aheng ve mûsikî unsurlarını bu ölçüt ve kalıplara göre analiz edip tespit etmektir. Ayrıca aheng ve mûsikî ilgili bu metinde Feqî'nin şiirlerinde hangi vezin ölçüsünü kullandığını araştırmaktır. Vezin kullanımında hangi kalıpları daha çok kullanmış ve hangi edebi sanatlardan yararlanmış, araştırıp tespit etmektir. Bu amaçla ve bu çerçevede Feqîyê Teyran'ın şiirleri ile ilgili çalışmamızı yaptık ve sonuç olarak Feqîyê Teyran'ın şiirlerinde aheng ve mûsikînin tüm dışsal ve içsel unsurlarını başarıyla kullandığı tespit edildi.

Anahtar Sözcükler: Şiir, Armoni, Mûsikî, Bedi' sanatları, Feqîyê Teyran.

Harmony and Music in Poems of Feqiyê Teyran

ABSTRACT

Harmony and music are two basic elements of classical literature, and classical literature is built on these two elements. These two important and mutually complementary elements appear in classical poetry according to certain dimensions, patterns and styles. The main measure of harmony and music in classical poetry is prosody meter, which is defined as the harmony and external music in the classical poetry. Also, in classical poetry, the harmony and musicality of a name is established through rhyme, internal rhyme, rime, and through literary arts. In Classical Kurdish Literature, Feqiyê Teyran is known for the rhythm, harmony and music of his poems, which made Feqî's poems become lyrics and can be recited by singers and easily recited by the people. Therefore, in this work, our goal is to analyze and identify the elements of harmony and music in Feqiyê Teyran's poems according to these standards and patterns. In addition, this article examines in relation to harmony and music, what kind of prosody did Feqî use in his poems and which style did he use more in the use of prosody and what skills did he benefit from in literary arts. For this purpose, we did our work on the poems of Feqiyê Teyran and as a result, it came out that Feqiyê Teyran used all external elements of harmony and music in his poems in a systematic way.

Keywords: Poetry, Harmony, Music, Literary arts, Feqîyê Teyran.

EXTENDED ABSTRACT

In this article about the harmony and music in Feqiyê Teyran's poems, before analyzing the harmony and music of his poems, we will first start our work in the context of questions. We will first start our work with questions such as whether the famous classical Kurdish poet Feqiyê Teyran wrote his poems with syllabic meter as some researchers claim, or with prosody meter. We will first go after the arguments, examine and analyze Feqiyê Teyran's poems according to the criteria of syllabic meter and prosody meter of the poem. After identifying the type of style that he used in his poems, this time we will follow the harmonic and musical elements that he used in his poems. Our real purpose of this article will be shaped in the context of these questions.

In order to determine and analyze the harmony and music of Feqiyê Teyran's poems, and related to this issue, to determine and confirm the meter used by Feqiyê Teyran in his poems, we have analyzed the works done on him as far as we could, but maybe that we have not reached all the sources. According to our work, it was revealed that especially in the South Se'id Dereshi and in the North Khalid Sadini have done a lot of valuable work in identifying, obtaining and publishing the poems of Feqiyê Teyran. But in the North, apart from Edip Saydun's master's thesis, Yadiġar Rasul Hamedamin's report and Hemin Omar Ahmed's report, and Perwiz Cihani's article, works that are academically, scientifically and with details on Feqiyê Teyran's poems have either been done very little or done superficially. Therefore, we wanted to scientifically and carefully determine the harmony and music of Feqiyê Teyran's poems and identify and analyze the problem that he used in his poems in relation to the harmony and music of his poems. Also, related to the same topic, identify and analyze the elements of harmony and music such as the rhyme, the internal rhyme, the rime and the literary arts in Feqiyê Teyran's poems.

Although according to some non-academic studies or according to some surface studies, the meter used by Feqiyê Teyran in his poems has been described as a syllabic meter, according to our work, it has been revealed that Feqiyê Teyran uses the prosody meter regularly in his poems. The prosody meter has been used in the classical literature poems as well as in Feqiyê Teyran's poems as an external element of harmony and music. Also, in his poems, Feqiyê Teyran has used the most of the rhythm of prosody meter, in the order of rezaz, hajez, remel, and in one of his poems the simple. Feqiyê Teyran has also perfectly used rhyme, internal rhyme, rime as internal elements of harmony and music in his poems. Another internal element of harmony and music is the literary arts, which we identified in the poems of Feqiyê Teyran as the literary arts, i'ade, repetition, reflection, derivation, exclamation, reduplication, alliteration, assonance and making sounds of nature. As for the literary arts in Feqiyê Teyran's poems, these are the ones that have been identified, but there may be those that have not been identified.

Finally, one can say that in classical Kurdish literature, the name of Feqiyê Teyran is pronounced together with the name of Ahmed Khani and Melay Ciziri, and Feqiyê Teyran is the most famous poet along with the two poets of classical Kurdish literature. But because of Feqiyê Teyran's poetic writing of some folk stories, due to the fluidity and lightness of the language of his poems, and for some other reasons, although according to some researchers, the meter used by Feqiyê Teyran in his poems is even if the syllabic meter has been defined, Feqiyê Teyran, like his contemporaries, has used prosody meter as an external element of harmony and music; rhyme, internal rhyme, rime and some literary arts as internal elements of harmony and music.

Destpêk

Aheng û mûsîqî hem ji layê rûxsarê û hem jî ji layê newayê ve du hêmanên sazker û hevûdu temamker in ku mirov dikare bêje hema di her cure nivîsê de xuya dibin. Her cure nivîsek li gor aheng û mûsîqîyêkê tê nivîsîn, lê xusûsen di helbestê de û xasma jî di helbesta klasîk de ev cure taybetmendî zêdetir li darî çavan dibe. Helbesta klasîk, jî ber ku li gor hin şewaz, qalib û pîvanên mu'ayen hatîye ristîn taybetmendîya aheng û mûsîqîyê zêdetir li ber çav û guhan dikeve. Loma jî li gor hin teorîsyenan di helbesta klasîk de aheng û rîtm dangan û rûxsara helbestê muhîmtir e ji naverokê.

Li gorî Meltem Gülê peyva ahengê di edebîyata dîwanê (klasîk) de digel ku wek têgiheke mûsîqîyê tê bikaranîn, lê di wateya ferhengî de, “-derbarey ahengê de di Ferhenga Edebîyatê ya Tahîru'l-Mewlewî de, her wekî ku karîgerîyeke mûsîqî çêbike bihîstina xweşawazîya peyveke menzûm û mensûr e.” (Gül, 2013: 124-125). Wek tê dîtîn aheng û mûsîqî wekî du peyv an jî du rewşên cewî xuya dikin ku aheng mûsîqîyê saz dike û mûsîqî jî jixwe li gorî aheng û rîtmekê çêdibe. Her wiha wekî ku Özen jî Kazım Yetiş vediguhêzîne, aheng di edebîyatê de, “wekî xusûsîyeteke şewazgerîyê, di helbest û peşanê de wekî ku tesîreke mûsîqîyê bê sazkerin bi lipeyhevîzkerina peyv û risteyan re, bidestxistina hevahengîyê ye.” (Özen, 2015: 253).

Bidestxistina hevahengîyê di helbestê de rîtmekê derdixîne holê, ango hevahengî û rîtm di helbestê de hevûdu temam dikin. Helbest bi wî awayî di çarçoweya wê rîtmê de bi awayekî herikbar û rewan tê xwendin û jiberkirin. Her wiha wekî ku Özen jî Turan Karakaş vediguhêzîne rîtm, “bi ifadeyeke cihewaz, di helbestekê de bi awayekî birêkûpêk tekrarkirina xasyetên ahengdarîya dangan e yên wekî kirpandin û rawestandî, dirêjahî-kurtahî, bilindahî, ziravî û stûrîyê.” (Özen, 2015: 253).

Wekî tê zanîn aheng, mûsîqî, rîtm û hevahengî di helbestan de têkildar û temamkerên hevûdu ne. Lê helbet di helbestan de hevahengî û mûsîqîya ku behs jê tê kirin bi rêya sazkerina hevahengî û mûsîqîya deng, birge, peyv an jî kêşan erûzê ye. Lê ahengsazî, rîtm û mûsîqîya helbestê ne tenê bi kêşan erûzê tê sazkerin, her wiha bi serwayê, bi serwaya hundurîn (tesmît) û bi paşserwayê jî tê sazkerin ku hemû jî di helbestê de bi awayekî perîyodîk bi hevahengîya dangan an jî bi tekrarkirina dangan tê sazkerin. Her wiha bi rêya hin hunerên ciwankarîyê yên wekî alîterasyon, asonans, îştîqaq, î'ade, tekrîr, 'eks, nîda û her wiha bikaranîna cotepeyv an jî ahengsazî, rîtm û mûsîqîya helbestê tê sazkerin. Lê helbet çawa ku edebîyata klasîk bi van hemû taybetmendî û bi van hemû hêmanên xwe ve di edebîyatên ereb, faris û tirkî ên klasîk de jî bo ku ahengsazî û mûsîqîyê saz bikin hatine tetbîqkirin, bi wî awayî di edebîyata kurdî ya klasîk de jî hatîye tetbîqkirin.

Em ê di gotara xwe de li gor van taybetmendî û hêmanên edebîyata klasîk ên ku di helbestan de aheng û mûsîqîyê saz dikin, analîza helbestên Feqîyê Teyran bikin ka gelo aheng û mûsîqî heta çî radeyê di helbestên Feqîyê Teyran de heye? Feqîyê Teyran ahengsazî û mûsîqîya helbestên xwe bi çî awayî û bi kîjan hêmanan saz kirîye? Em ê di vê gotara xwe de bersiva van pirsan bidin.

Em ê aheng û mûsîqîya di helbestên Feqîyê Teyran de li ser du beşan analîz bikin. Aheng, mûsîqî û rîtm ku bi kêşan erûzê hatîye sazkerin di beşekê de, aheng û mûsîqîya ku bi rêya serwayê, serwaya navekî, paşserwayê û bi rêya hunerên ciwankarîyê hatine sazkerin jî di beşekê de analîz bikin. Sebebê dabeşkerina me ya bi wî awayî wekî ku Adak behs jê kirîye mirov dikare kêşan erûzê wekî ahenga û mûsîqîya derekî; serwa, serwaya navekî, paşserwa û hunerên ciwankarîyê jî wekî aheng û mûsîqîya navekî bihesibîne. Adak rîtmê jî bo dubarekirinên perîyodîk yanî jî bo kêşê guncawtir dibîne. Hingê kêş dikeve nava kategoriya ahenga derekî, serwa û paşserwa jî wek hunerên bi dubarekirina dangan re têkildar dikeve nava kategoriya ahenga navekî ku di serwa û paşserwayê de jî ya esas dubarekirina dangan e.

1. AHENG Û MÛSÎQÎYA DEREKÎ

1.1. Kêşa Erûzê

Her wekî ku behs jê hatiye kirin aheng û mûsîqîya derekî an jî rîtma perîyodîk bi saya kêşa erûzê pêk tê. Di helbestan de û bi taybetî di helbestên klasîk de hêmana sereke ya ahengsazî û mûsîqîyê dixulîqîne kêş an jî kêşa erûzê ye.

Kêş an jî kêşa erûzê, dîroka wê heta berîya Îslamîyê de diçe û digihîje edebîyata kevn ya ereban. Kêşa erûzê di helbestan de li gorî birgeyên (hêceyên) dirêj û kurt tê sazîkirin. Dirêjbûn û kurtbûna birgeyan di kêşa erûzê de bi ahengdarî û rîtma helbestê re têkildar e. Her wekî ku Îbrahim Özen ji Zehra Göreyê veguhastîye, “Zêdebûna birgeyên kurt di kêşê de hêdîbûna rîtmê, zêdebûna birgeyên dirêj jî lezgînbûna rîtmê pêk tîne.” (Özen, 2015: 256). Her wiha Ömer Savran jî der barê wê dibêje ku, “kêş di helbestê de hêmaneke ku bêsexberîya peyvên dizgîn dike û mûsîqîya wê derdixe pêş.” (Savran, 2007: 227).

Kêşa erûzê de her risteyek (misrayek) li gorî qalibekî tê nivîsîn. Her qalibekî kêşa erûzê jî ji sê yan jî çar parçeyan pêk tê ku ji wan parçeyan re tefîle tê gotin. Heşt tefîleyên serekî yê kêşa erûzê hene ku li gorî bikaranîna van heşt tefîleyan behrên kêşa erûzê derdikevin meydana. Her wiha şazdeh behrên kêşa erûzê hene ku li gorî bikaranîna van şazdeh cure behreyan bi awayên cîyawaz ahengdarî û mûsîqîya helbestê tê sazîkirin. Wekî Adak jî behs jê kirîye, “tê gotin ku di nava behran de ya herî kevn behra recezê ye û tefîleya sereke ya behra recezê ku mustefîlun e, li ber dengên kurt û dirêj ên ku ji gavên hêştirê derdikevin hatiye sazîkirin ku rêza wan dengên dirêj, kurt, dirêj e. Ji ber ku piyekî hêştirê lawaz e, ew sê gavên tam/dirêj û gaveke lawaz/kurt diavêje.” (Adak, 2013: 333). Her wiha behra remelê jî di erebî de tê wateya revînê, bi lezçûyînê. Wekî tefîle xuyan kêşa erûzê bi her qalib û behreyên xwe ve bi awayekî cîyawaz hevahengî, rîtm û mûsîqîya helbestê saz dike. Lê belê di bin banê her behreyekî de jî çendîn qalibên salim û yê nesalim hene. Qalibên salim wekî qalibên bîngêhî jî tene binavkirin, ji çar tefîle/parçeyên wekî hev pêktên û kêmasî û qusûr tê de nînin. Qalibên nesalim jî wekî yê talî jî tene binavkirin û di wan cure qaliban de kêmasî û qusûr peyda dibin. Her wiha divê mirov behs jê bike ku helbesteke bi kêşa erûzê hatibe nivîsandin gava ku qalibê misraya ewil bê tesbîtkirin qalibên misrayên din jî tê tesbîtkirin. Yanî misraya ewil bi kîjan qalib û pîvanê hatibe nivîsîn ên din jî bi heman qalib û pîvanê tene nivîsîn ku ev jî aheng û rîtma perîyodîk a kêşa erûzê derdixe meydana. Lê her wiha divê behs jê bê kirin ku şa‘îr û helbestvan jî hin caran di sazîkirina qalib û behreyên kêşa erûzê de kêmasî û qusûrên wekî zîhaf û îmaleyê dikin da ku ahengsazî û rîtma helbestê pêk bînin. Îmale, ji bo ku aheng û mûsîqîya helbestê pêk bê, dirêjxwendina birgeyê (hece) kurt a beytekê ye. Zîhaf jî berevajî îmaleyê, di helbestan de ji bo ku aheng û mûsîqîya helbestê pêk were, kurtxwendina birgeyê dirêj a beytekê ye.

1.2. Kêş di Helbestên Feqîyê Teyran de

Feqîyê Teyran yek ji girîngtirîn helbestvanên Edebîyata Kurdî ya Klasîk e ku Ehmedê Xanî jî di helbesteke xwe behs jê kirîye. Feqî her wiha hevçaxê Melayê Cizîrî ye û bi Mela re mu‘aşereyê wî heye. Her wiha Feqî di Edebîyata Kurdî ya Klasîk de xencî helbestên xwe yê resen hinek çîrok û serpêhatîyên wekî Şêxê Sen‘an, Bersîsê Abid, Zembîlfiros û Kela Dimdimê bi awayekî menzûm vehonandine. Helbet têsîra Feqî li ser hin helbestvanên li dû xwe çêbûye ku yek ji wan jî Feqê Reşîdê Hekkarî ye.

Berîya ku di çarçoveya aheng û mûsîqîyê de behsa kêşa erûzê di helbestên Feqîyê Teyran de bê kirin, divê bê gotin ku li ser hejmara helbestên wî de lihevkiirineke kamil tune ye. Mesela di berhema M. Xalid Sadînî ya Feqîyê Teyran Jiyan, Berhem û Helbestên Wî de hejmara helbestan nozdeh e (Sadînî, 2011: 74), lê di çapa dehemîn ya heman di berhema de hejmara helbestan ên biguman jî tev

de hemû li ser hev gihîştîye sî û şeş helbestan (Sadinî, 2020: 59-60). Li gor Perwîz Cihanî, “hejmara helbestên Feqî yên ku gehîştine desten me û bi navê wî hatine weşandinê tevda 23 lib in, ku hemû pêkve dikin: 997 malik.” (Cihanî, 2019: 115). Li gorî teblîxa Yadigar Resûl Hemedemîn û Hêmin Omer Ehmed ya ku di Sempozyûma Kurdîyatê ya Sêyemîn ya Navneteweyî ya Feqîyê Teyran û Mîrasa Wî de ya bi navê Bunyadî Rîtim û Mosîqay Klasîkî le Şî’rekanî Feqê Teyranda hatîye pêşkêşkirin, sercem helbestên Feqîyê Teyran bîst û pênc heb hatine hesabandin. Her wiha li gorî teza lisansa bilind ya bi navê Teşe û Ciwankariyên Wêjeyî di Dîwana Feqîyê Teyran de ya Edip Saydun hejmara sercem menzûmeyên Feqîyê Teyran sî û sê heb in. (Saydun, 2018: 61-62). Li gor Dîwana Feqîyê Teyran a ku Kadri Yıldırım werger û şikariya wê û Wezaret Tûrîzm û Çandê jî çapa wê kirîye hejmara helbestên Feqîyê Teyran sî û sê ne.

Wekî ku tê xuyan hêj li ser hejmara helbestên Feqîyê Teyran lihevkirineke kamil tune ye. Lê her wiha li ser kêşa ku Feqîyê Teyran di helbestên xwe de bikaranîye jî tevlihevîyek heye. Wekî ku Yadigar Resûl Hemedemîn û Hêmin Omer Ehmed di teblîxa xwe ya navborî de destnîşan dikin, “di derbarê vê de tenê nêrîna pênc nivîskarên kurd (sê ji başûr û du ji bakûr) wek nimûne bidin ku şî’rên Feqî dixin nav xaneyê şî’ra folkorî û meheli û li gor wan wisa ye ku zêdetirê şî’ran li ser kêşa xwemalî hatîye nivîsîn.” (Hemedemîn&Ehmed, 2022: 4). Li gor vê teblîxê sê nivîskarên ji başûr ên ku li ser vê boçûnê ne, yek jê Izeddîn Mistefa Resûl e, yek Maruf Xeznedar û yê din jî Şe’ban Çalî ye; yên ji bakûr jî M. Xalid Sadinî û Perwîz Cihanî ne. M. Xalid Sadinî di derbarê vê mijarê de dibêje: “Me gotibû ku helbestên Feqîyê Teyran li ser wezna kîtekêşiyê hatine nivîsîn. Bi piranî helbestên (Feqîyê) Teyran li ser wezna heştkite hatine (nivîsîn).” (Sadinî, 2020: 84). Her wiha Perwîz Cihanî jî di derbarê vê mijarê de wiha dibêje, “Feqî di gelek helbestên xwe de li cihê kêşa erûzî ji kêşa xomalî ya kîteyî wecê werdigire. (Cihanî, 2019: 106). Li gorî teblîxa navborî Izeddîn Mistefa Resûl ji ber sadebûna şeweya gelek helbestên Feqîyê Teyran, helbestên wî wekî yên gelêrî hesabandîye. Maruf Xeznedar ji ber babet û peyvên xwerû kurdî û ji ber dariştina risteyên hêsan, ji aliyê rûxsarê ve helbestên Feqîyê Teyran wekî helbestên gelêrî û kêşa wan jî wekî kêşa xwemalî hesabandîye. Her wiha li gor Şe’ban Çalî Feqîyê Teyran zêde girêdayî kêşa erûzê nebûye, di kêşa penceyî ya xwemalî de çalaktir bûye (Hemedemîn&Ehmed, 2022: 4).

Lê li aliyekî din, Edip Saydun di teza xwe ya lîsansa bilind a bi navê Teşe û Ciwankariyên Wêjeyî di Dîwana Feqîyê Teyran de dibêje ku me tu kêşa erûzê di kitêba M. Xalid Sadinî ya Feqîyê Teyran de peyda nekirîye û Xalid Sadinî helbestên Feqîyê Teyran wekî ku bi kêşa kîteyî hatine honandin hesabandîye. Lê di berdewamîyê de şik û gumana xwe ya derheqê kêşa kîteyî di helbestên Feqîyê Teyran de wiha dibêje, “Dibe ku Feqî, ev manzûme bi kîteyî jî nivîsî bin; lê belê îhtimal e ku ev ji arîşeyên mîna tîpguhêstî û jêgirtî an îstînsê bin jî ji ber vê ev mijar tam ne zelal e û mixtacê lêkolînê ye.” (Saydun, 2018: 32). Jixwe li gorî Edip Saydun, her çiqas di hin helbestên Feqîyê Teyran de kêmasî û qusûrên wekî zîhaf (kurtxwendina kîteya dirêj) û îmaleyê (dirêjxwendina kîteya kurt) hebin jî ji 33 heb helbestan, “29 manzûme û helbestên Feqî bi erûzê hatine nivîsîn.” (Saydun, 2018: 32). Her wiha Saydun behreyên van 29 heb helbestan jî dîyar kirîye û li gor wî Feqîyê Teyran sê behre bikaranîne di helbestên xwe de. “Ji van her sê behran wî herî zêde behra recezê emilandîye û ev behr, xwe di 14 manzûme û helbestan de nîşan daye û dîsa behra hezêcê 10 û behra remelê jî 5 caran xwe dubare kirîye.” (Saydun, 2018: 33).

Kadri Yıldırım jî di encama Dîwana Feqîyê Teyran de ya ku wî werger û şikariya wê û Wezaret Tûrîzm û Çandê çapa wê kirîye, qet behsa kêşa ku Feqîyê Teyran di helbestên xwe de bikaranîye nekirîye û tenê bi çend xalan behs ji Feqîyê Teyran û helbestên wî kirîye. Kadri Yıldırım, têkildarî mijarê di xaleke encamê de behs ji teşeyên nezmê yên ku Feqîyê Teyran pê helbestên xwe honandine dike. “Helbestên Feqîyê Teyran ên ku heta roja me hatine ji aliyê teşeyên nezmê ve zêdetir bi terzên murebayan de ne. Digel ku qîsmek ji murebayan, murebayên muzdevîc an jî murebayên mutekerrîr in, qîsmek jî ji qesîdeyên musemmat û xezelên musemmat in. Di nav helbestên wî de muselles û museddîs jî hene.” (Yıldırım, 2014: 269).

Her wiha Yadigar Resûl Hemedemîn û Hêmin Omer Ehmed jî di derbarê bikaranîna kêşa ku Feqîyê Teyran di helbestên xwe de bikaranîye kêma û zêde wekî Edip Saydun difikirin. Li gor wan, “ji sercem 25 helbestên Feqîyê Teyran de 22 heb bi kêşa curbicur ya erûzê hatîye bikaranîn. Tenê di 3 helbestên wî de kêşa birgeyî (xwemalî) hatîye bikaranîn.” (Hemedemîn&Ehmed, 2022: 5). Her wiha li gor her du lêkoleran ew 3 heb helbestên ku bi kêşa xwemalî hatine honandin jî di bingeha xwe de bi kêşa erûzê hatine nivîsîn, lê ji ber ku di dema xwe de nehatine nivîsandin û bi awayekî devkî hatine bihîstin, loma tê de destêwerdan hatîye kirin. Her wiha li gor her du lêkoleran di 6 helbestên Feqî de ji aliyê kêşê ve kêmasî û qusûr hene ku ew jî ji ber heman sedeman e. Her du lêkolera wekî ku di teblîxa wan de jî hatîye diyarkirin di çarçoveya xebatên akademîk de li ser teblîxa xwe bi awayekî hûrgilî, zanistî û teknîkî xebitîne. Wek çavkanî an jî korpûs Dîwana Feqîyê Teyran a ku Seîd Dêreşî amade kirîye bikaranîne û bi rêbaza wesfî-şîkarî helbestên Feqî analîz kirine. Di vê navberê de divê bê gotin ku Dîwana Feqîyê Teyran a ku Seîd Dêreşî amade kirîye jêdereke muhîm a berhema M. Xalid Sadinî ye jî. Jixwe M. Xalid Sadinî jî wekî ku behs jê dike ku ew zêdetir bi karên berhevkarîya helbestên Feqî re mijûl bûye, loma zêdetir xebat li ser kêş, qalib û behreyên helbestên wî nekirîye.

Her du lêkolera paşê taybetmendiyên helbesta gelêrî û ya klasîkê dane ber hevûdu û li gor vê pîvanê gelêrîbûn û klasîkbûna helbestên Feqî analîz kirine ku ev taybetmendî ji bo vê gotarê jî dê bibe pîvana sereke. Piştî safîkirina gelêrîbûn û klasîkbûna helbestan dest bi analîza kêş, serwa û paşserwaya helbestên Feqî kirine. Di teblîxa navborî de ewilî xasyetên helbesta xwemalî tîne destnîşankirin û piştê jî bi awayekî dijber xasyetên helbesta klasîk bi vî awayî tîne destnîşankirin ku ji bo klasîkbûna helbestên Feqîyê Teyran dê bibine pîvanên sereke.

“- Kêşa helbesta klasîk a kurdî kêşa erûzê ye, ligel hejmara birgeyan (hêce) girêdayî kurtî û dirêjîya birgeyan e jî. Kêşa hezec ji hemûyan berbelavtir e.

- Hejmara birgeyên misreyan bi piranî ji 10 birgeyan dest pê dike heta 15 û 16 birgeyan diçe. Qaliba 15 û 16 birgeyî heta radeyeke zêde di helbesta klasîk a kurdî de hatîye bikaranîn.

- Zimanê helbesta klasîk zimanekî giran e û peyvên biyanî jî tê de zêde ye.

- Qaliba gelemperî ya serwayê qalibê xezel û qesîdeyê ye. Ji bilî van qaliban helbestvan dikarin qalibên curbicur ên din jî biceribînin ku ji wan çarîn, pêncîn, şeşîn, qit'e, mustezad in. Qaliba mesnewîyê di helbesta klasîk de zehf kêma hatîye bikaranîn.

- Gelek ji helbestvanên klasîk digel kêş û serwayê, girîngîyeke hûrgilîyane bi rîtm û mûsîqîya navekî ya deqê dane.

- Hunera paşserwayê (redîf) diyardeyeke helbesta klasîkî ye û kêma zêde helbestvanên klasîk bikaranîne.” (Hemedemîn&Ehmed, 2022: 4).

1.3. Kêşa Erûzê di Helbestên Feqîyê Teyran de

Wekî ku xuya dibe hin lêkorên kurd, helbestên Feqîyê Teyran wekî helbestên gelêrî û kêşa ku bikaranîye jî wekî kêşa xwemalî ya birgeyî (hêceyî) hesibandine, lê bi awayekî akademîk, bi hûrgilî û bi zanistî zêde li ser lêkolîn nekirine. Lê li aliyê din li gor teza lîsansa bilind ya Edip Saydun û li gor gotara akademîk ya Hemedemîn û Omer, helbestên Feqîyê Teyran ên klasîk in û ji bilî çend heb helbestan, wî helbestên xwe hemû bi kêşa erûzê nivîsandîye. Ev her du xebat ên akademîk bi hûrgilî, bi zanistî û li gor pîvanan helbestên Feqî û kêşa ku Feqî di helbestên xwe de bikaranîye tesbît û analîz kirine. Hejmara kêş û behreya ku Feqî di helbestên xwe de bikaranîye bi awayekî teknîkî tesbît kirine. Her çiqas li gor her du xebatan hejmara helbestan û behreyên ku Feqî di helbestên xwe de bikaranîye cudahî hebe jî, lê li gor behreya ku Feqî herî zêde di helbestên xwe de bikaranîye nêzikîtir

hevûdu ne. Li gor her du lêkolînan Feqî herî zêde behreya recezê di helbestên xwe de bikaranîye. Li gor Saydun 14 û li gor Hemedemîn û Omer Feqî di 12 helbestên xwe de behra recezê bikaranîye ku teqabulî sercem % 48 helbestên wî dike. Di helbesta Îro Werin Lêzim Werin de Feqî behreya recezê (mustefîlun mustefîlun mustefîlun mustefîlun) bikaranîye. Wekî ku Adak behs jê kirîye behreya herî kevn behreya recezê ye û di vê behreyê de tefîleya ku herî zêde tê bikaranîn jî tefîleya mustefîlun e. Aheng û mûsîqîya vê behre û vê tefîleyê jî li gor rîtmîna gavavêtîna hêştirê hatîye sazîkirin. Ji ber ku pîyekî hêştirê lawaz û sê pîyên xurt in ahenga vê behreye jî wekî xurtî û lawazîya pîyên hêştirê dirêj, dirêj, kurt û dirêj e.

“Îro werin / lêzim werin / cîran û xel/qê Hêşetê
Hûn rayekê / l’ min biken / îro qewî / girya me tê
- - + - / - - + - / - - + - / - - + -” (Hemedemîn&Ehmed, 2022: 6).

Feqî bi heman behreyê û bi heman aheng û rîtmê helbesta xwe ya Ey Dîlberê jî nivîsandîye.

“Ey dîlbera / gerdên ji ‘ac / wey nazika / mislê zucac
Qamet ji rey / hana qîrac / wêran ez im / malim xirab
- - + - / - - + - / - - + - / - - + -” (Hemedemîn& Ehmed, 2022: 6).

Behreya duyem a ku Feqî di helbestên xwe de ji bo ku aheng û mûsîqîyê saz bike bikaranîye ya hezecê ye ku li gorî Saydun Feqî di 10 helbestên xwe de û li gor Hemedemîn û Omer jî Feqî di 6 helbestên xwe de bikaranîye ku teqabulî sercem % 23 helbestên wî dike. Wekî mînak helbesta xwe ya Qewî Îro Ze‘îf Halim bi behreya hezecê û bi tefîleya mefa‘îlûnê nivîsandîye.

“Qewî îro / zeîf hal im / dinalim ez / li wê tayê
Di birhanan / dihat fal im / tilisma wes/letan nayê
+ - - - / + - - - / + - - - / + - - -” (Saydun, 2018: 35).

Behreya sêyem a ku Feqî di helbestên xwe de bikaranîye ya remelê ye ku li gor Saydun Feqî ev behre di 5 helbestên xwe de û li gor Hemedemîn û Omer jî Feqî di 3 helbestên xwe ev behre bikaranîye ku teqabulî sercem % 12 helbestên wî dike. Wekî ku behs jê hatîye kirin ku behra remelê di erebî de tê wateya revînê û bilezçûyînê, anku rîtm û aheng di vê behreye de li ser bilezçûyîn û revînê hatîye sazîkirin. Wek mînak Feqî helbesta xwe ya Ay Dilê Min bi behreya remelê û bi tefîleya fa‘îlatun fa‘îlatun fa‘îlatun nivîsandîye.

“Çendî bêjim / surr u halan / ah ji destê / çav xezalan
Her dinalim / mah u salan / kes bi halê / min nezan
- + - - / - + - - / - + - - / - + - -” (Hemedemîn&Ehmed, 2022: 7).

Ji bilî van her sê behreyan li gorî Hemedemîn û Omer Feqîyê Teyran her wiha behreya besîtê jî di yek helbesta xwe de, di helbesta Bizan ku Min Yar Tu yî de bikaranîye. Ev helbest ji bo ku aheng û mûsîqîya wê pêk bê li gorî behreya besîtê û bi tefîleya mustefîlun fa‘îlun mustefîlun fa‘îlun hatîye nivîsanidin.

“Ê xerq di xwî/nê ez im / kuştîy birî/nê ez im
Ê dûr ji jî/nê ez im / ‘aşiq bi bî/nê ez im
- - + - / - - + - / - - + - / - - + -” (Hemedemîn&Ehmed, 2022: 7).

Li gor daneyên li ber destê me, bi taybetî jî herdu xebatên akademîk, em gihîştine wê qena‘etê ku helbestên Feqîyê Teyran ên klasîk in û kêşa ku bikaranîye jî kêşa erûzê ye. Lê her wiha ew lêkolerên ku îddîa dikin ku helbestên Feqî yên gelêrî ne û kêşa ku bikaranîye jî kêşa xwemalî ya birgeyî ye, zêde xebat û lêkolînên akademîk nekirine, bi awayekî sethî helbestên Feqî nixandine. Loma îddîayên wan lawaz in.

2. AHENG Û MÛSÎQÎYA NAVEKÎ

Di vê beşê de em ê bi rêya serwayê, serwaya navekî, paşserwayê û bi rêya hunerên ciwankariyê yên wekî î'ade, 'eks, tekrîr, alîterasyon, asonans, îştîqaq û nîdayê û her wiha bi rêya bikaranîna cotepeyvyan ahengsazî û mûsîqîya helbestên Feqîyê Teyran tesbît bikin.

2. 1. Serwa

Serwa di esasê xwe de di dawîya misreyan de li ser tekrarkirinên hevşibîya dangan hatîye avakirin. Li gorî Özen, “Ev hevşibîyên navborî, bi rêya dubarekirina dengên hevpar ve helbestê digihîjîne rîtmekê, bi vî şeklî tamamkerîya wate û ahengê peyda dike. Di heman demê de di bihistbarîya mûsîqî û rîtm helbestê de rol û ristekî werdigire.” (Özen, 2015: 254). Her wiha li gorî Yıldız, “Serwa, di esasê de ji ber ku dubarekirineke dangan e, bi navberên nêzik û dûr ve dubarekirina heman dengî, yek ji faktoreke herî muhîm e ya ku tevna rîtmîk a helbestê saz dike. Serwa di helbestê de hem wek ûnsûreke dengî û hem jî wek ûnsûreke wateyî cih digire” (Yıldız, 2006: 6).

Serwa di helbestên Feqîyê Teyran de binemayeke muhîm a ahengsazî û mûsîqîsazîyê ye. Li gorî Hemedemîn û Omer, Feqî di hemû helbestên xwe de serwa bikaranîye. Lê, “ji sercem 25 helbestên Feqî, 20 heb ji wan dikevîne nav xaneyê serwaya yekgirtî ku dike % 80ê sercem helbestên wî û bi vî şeklî ne:

- Qesîde: 9 helbest AA, BA, CA, DA, EA...
- Xezel: 2 helbest AA, BA, CA, DA, EA...
- Qit'eya xezel û qesîde: AB, CB, DB, EB, FB...” (Hemedemîn&Ehmed, 2022: 9).

Nimûneyek ji serwaya (AA, BA, CA, DA, EA...)yê di helbestên Feqîyê Teyran de:

Ey av û av ey av û av ma tu bi 'îşq û muhbetê (A)
Mewc û pêlan tavêy belav bê sekne û bê rahetê (A)

Bê rahet û bê sekne yî yan 'aşîqê baxwê xwe yî? (B)
Yan şubhetê qelbê me yî ji îşqa kê natebetê (A)

Ji îşqa kê her têt û têt heta kengê her bêy û bêy (C)
Bo min bêj heyranê kêy da ez bizanim qîssetê (A)

Heqîqetq van cewheran me'rifeta 'enasiran (D)
Penhan neke j' yar û biran bê dev bibêje hikmetê (A)

Bê dev û qîl û qal bibêj hêdî bi lefzê hal bibêj (E)
Ber “Mîm û Hê û Dal” bibêj şerh û beyana kaxetê (A) (Sadînî, 2020: 111-112).

Mînakek ji serwaya (AB, CB, DB, EB, FB...)yê ji helbestên Feqîyê Teyran:

Cezbe sur e sur xatem e girtin li meran lazim e (A)
Ceger qewî bit qaim e îzhar bikin vê şuhretê (B)

Ne ji bo riya û muste'îdan ji germa şî'r û qesîdan (C)
Bêne ser behsa murîdan da ji şêx kin qîssetê (B)

Sen'aniya şêxek hebû ew aşîqê Baxoy xwe bû (D)
Qet meyl li dunyâê nebû dûr bû ji vê meşxeletê (B)

Dûr bû ji vê dunya denî pir digirî kê mî dîkenî (E)

Kul bû ji ber secdê enî di kar û zewada axretê (B)

Zad û zewade kar dikir zikrekî bê ijmar dikir (F)

Ji dunyayê îstîxfar dikir dûr bû ji herçî şubhetê (B) (Yıldırım, 2014: 165-166).

Wekî ku ji van nimûneyên ku me ji helbestên Feqîyê Teyran wergirtîye xuya dike ku Feqî wek ûnsûreke bingehîn ya ahengsazî û mûsîqîya navekî ya helbesta klasîk, serwa bi awayekî bi rêkûpêk di helbestên xwe de bi kar anîye.

2. 1. 1. Serwaya navekî an jî Tesmît

Serwaya navekî jî di edebiyata klasîk de hêmaneke muhîm a xurtkirina aheng û mûsîqîya helbestan e. Ji ber wê Feqî jî serwaya navekî an jî tesmît ji bo rîtm û ahengsazîyê di helbestên xwe de saz bike bi awayekî gelemperî bikaranîye. Her wekî ku Hemedemîn û Omer jî destnîşan kirine Feqîyê Teyran di hemû helbestên xwe de yanî di 25 helbestên xwe de serwaya navekî bikaranîye. “Gelek bi hûrgilî mijûlahî ligel mûsîqî û rîtm navekî ya helbestan kirîye. Bi awayekî giştî du cure serwaya navekî bikaranîye. Cureyek ji wan (22 helbest) ew e ku her beytek (hinek caran ji bilî beyta yekem) dabeşî li ser çar parçe kirîye. Sê parçeya yekem bi serwayekê û parçeya dawî jî serwayeke din, yanî (AAAB, CCCB, DDDDB...). (Hemedemîn&Ehmed, 2022: 12). Li gorî wan serwaya navekî ya 3 helbestên din jî wiha ye: (ABAB, CDCD, EFEF...).

Nimûneyek ji serwaya navekî ya (AAAB, CCCB, DDDDB...)yê di helbestên Feqîyê Teyran de:

Xizmeta sultan u mîran (A) sin‘eta dana û zîran (A)

Hûn mekin bê şêx u pîran (A) guh biden vê şîretê (B)

Ev pende xasse şîret e (C) şertê xulaman xizmet e (C)

Ba xo nebînin zehmet e (C) heqê însaf u mirwetê (B)

Mîrvet ji mîr û hakimî (D) xizmet ji qol û xadîman (D)

Bê şeyx û mîr û ‘alîman (D) zayî’ mekin hûn ta‘etê (B) (Dêreşî, 2005: 262-263).

Nimûneyek ji serwaya navekî ya (ABABAB, CDCDCD, EFEFEF...)yê di helbestên Feqîyê Teyran de:

Serçeşmeya feyzê çî ye? (A) hate lisanê ‘arîfan (B)

Ew nûreka esmanî ye (A) darête qelbê xaîfan (B)

Jê şem‘eyek da Miksî ye (A) lew bûm nedîme taîfan (B)

Lew bûm herîf, lew bûm nedîm (C) min ‘îşqeka dijwar heye (D)

Kûvî kirim serfa ‘ezîm (C) min hêj meya pêrar heye (D)

Mînnet ji rehmanê rehîm (C) mim mîrekê sittar heye (D)

Ew mîr kerîm e, satîr e (E) xweş hakim e dibarê xwe da (F)

Xelqno ne dûr e, hazîr e (E) ew wahîd e û bê îbtîda (F)

Herçî biket ew qadîr e (E) ew xalîqê bê bab û da (F) (Dêreşî, 2005: 114-115).

Wekî ku ji van nimûneyên ku me ji helbestên Feqîyê Teyran wergirtîye derdikeve meydane ku Feqî wek hêmaneke esasî ya ahengsazî û mûsîqîya navekî ya helbesta klasîk, serwaya navekî anku tesmît jî bi awayekî hûrgilîyane di helbestên xwe de bi kar anîye.

2. 2. Paşserwa

Paşserwa di dawîya misreyan de ji wan dengên hevşib ên dubarekirî re tê gotin ku hem ji aliyê telafûzê û hem jî ji aliyê wateyê ve wekî hev in. Wekî ku Adak jî destnîşan kirîye ku paşserwa piştî serwayê tîn û hin caran ji qertafekî, hin caran ji peyvekî û hin caran jî ji komepeyvyan pêk tîn. Paşserwa jî wekî serwayê di helbestê de hêmaneke bingehîn a ahengsazî û mûsîqîyê ye. Her wiha Ömer Savran jî girîngîya paşserwayê dupat dîke û “paşserwa di helbestê de ji bilî wezîfeya xwe ya ahengsazîyê, bi awayekî watedar wezîfeya têkilîdanînê di navbera beytan de pêk tîne û her wiha di helbestê de wezîfeya pêkanîna yekîtîya deng û mijarê jî pêk tîne.” (Savran, 2007: 226).

“Di 3 helbestên Feqîyê Teyran de paşserwa (redîf) heye ku ji van helbestan pêk tê (Îro ji Dest Husna Hebîb, Bizan ku Min Yar Tu yî, Xwedawenda Gunehkar im)” (Hemedemîn&Ehmed, 2022: 13).

Îro ji dest husna hebîb sergeşte û heyran *im ez*
Min eşq û muhbet bûn nesîb sewdayê sergerdan *im ez*

Eşqê gelek sewda kirin bê mal û bê mewda kirin
Nûra çira winda kirin Mûsayê ‘Umran *im ez*

Mûsa ji dest husna bi nûr şîrînîya xalên di hûr
Secde bire ber Kohê Tûr nêzikî remze wan *im ez* (Sadînî, 2020: 127).

Bizan ku min yar tu yî dil jê birîndar *tu yî*
Ez kuştîm yekcar tu yî ê bikom û biçar *tu yî*
Bişeml û destar tu yî pir li min kubar *tu yî*

Ê bi xezebxwendî *ez im* di qeyd û benda *ez im*
Kuştîyê rindê *ez im* sozanê findê *ez im*
Zincîr di zendê *ez im* muştîqê rindê *ez im* (Sadînî, 2020: 443).

Her wiha wekî ku ji van mînakên ku me ji helbestên Feqîyê Teyran ên navborî wergirtîye, hate selmandin ku Feqî kêm be jî wek ûnsûreke binçîneyî ya ahengsazî û mûsîqîya navekî ya helbesta klasîk, paşserwa (redîf) jî di helbestên xwe de bi kar anîye.

2. 3. Hunerên Ciwankariyê (Bedî‘î) yên bi Ahengê û Mûsîqîyê re Tekîldar

Di helbestan de û her wiha di helbestên Feqîyê Teyran de xêncî serwayê, serwaya navekî û paşserwayê, aheng û mûsîqî bi hunerên ciwankariyê (bedî‘î) yên wekî î‘ade, ‘eks, tekrîr, alîterasyon, asonans, îştîqaq û nîdayê û bi cotepeyvyan jî hatine sazîkirin.

2. 3. 1. Î‘ade

“Peyva î‘adeyê ji hêla ferhengî ve tê wateya “veger”, “lêvegerandin”, “paş ve vegerandin”, “lêzivirandin”ê.” (Saydun, 2018: 159). Î‘ade hêmaneke girîng a ahengsazî û mûsîqîsazîyê ye di helbestan de. Peyv û komepeyvên ku di dawîya beytekî de hatine bikaranîn, wexta di serê beyteke li dû wê beyte de bê bikaranîn, wekî hunereke ciwankariyê î‘ade derdikeve mexderê. Çend nimûneyên ji hunera î‘adeyê ji helbestên Feqîyê Teyran:

Xulmet dikî bê pê û dest j’ kê ra dikî çend koh û best
Baxwoy negot gavek vewest hindî diçî *denge te tê*

Dengê te tê bê pê û hev ta‘et dikî bê qelb û dev
Peyda dibin j’ tê mewc û kev şîn bûy ji renge qudretê (Dêreşî, 2005: 65-66)

Bê dest û pê bê çeng û perr ew pel û mewc û fetl û gerr
Peyda dibin j' te "kerr" û "ferr" nakî beyan *vê illetê*

Vê illetê beyan bike bes vê sîrrê star bike
Carek li min 'eyan bike da seh bikîn hikayetê (Dêreşî, 2005: 68).

Tu yî Xaliq ez im bende ze'îfê jar û şermende
Dirêj lewra dilim dilim hinde tu kê m nabî *ji ihsanê*

Ji ihsana te pur 'am esema û erz ketin Şam e
Di gunahan de xerîq mame tu her mewcûd û subhan î (Sadîni, 2020: 432).

Di hunera î'adeyê ya her du beytên dawîyê de ji alîyê cureyên qertafan ve cudahî (ji ihsanê û ji ihsana) heye di navbera wan de. Yekî qertafa tewangê ya mê (ji ihsanê) û yekî qertafa veqetandekê ya mê (ji ihsana) wergirtîye. Lê her wekî ku Edip Saydun ji M. A. Yekta Saraç veguhastîye, "Divê neyê jibîrkirin ku ew peyvên bûne mijara î'adeyê dibe ku ji alîyê hin daçek an jî tîpan ve ji hevûdin cuda bin." (Saydûn, 2018: 160).

2. 3. 2. Tekrîr

Ji bo xurtkirin û dewlemendkirina aheng û mûsîqîya helbestan, wekî hunereke ciwankariyê tekrîr jî ji hêla helbestvanên klasîk ve zêdetir hatiyê bikaranîn. Tekrîr ji tekrarkirina heman peyv û komepeyvyan pêk tê ku Feqîyê Teyran jî di helbestên xwe de ji hunera tekrîrê gelek sûd wergirtîye. Wekî ku Mehmet Gül jî behs jê kirîye, "Dubarekirina peyv û komepeyvyan, dubarekirina hemû risteyê, ji hêla dengî ve ahengekî saz dike, hevahengî û rîtmekê saz dike." (Gül, 2013: 126). Feqîyê Teyran jî ji bo bidestxistina heman aheng, hemahengî û rîtmê hunera tekrîrê di helbestên xwe de bikariyê. Çend nimûneyên hunera tekrîrê ji helbestên Feqîyê Teyran:

Dil ji min nakit xeyalan bûme perwana şemalan
Bêriya husn û cemalan *ay dilê min ay dilo*

Can firît im ne nebinim deftera 'îşqê bixwînim
Serxweş û sekran û dîn im *ay dilê min ay dilo*

Serxweş û sekran û mest im ef'alê eswed di gestim
Sebir û aram çûn ji dest im *ay dilê min ay dilo* (Dêreşî, 2005: 178).

Ey dil hilo terk ke sefa *qet kes li bal nînin wefa*
Bêfayde cewr û cefa *qet kes li bal nînin wefa*

Cewr û cefa bê fayde ye çendî bigirîn halê xwe ye
Ageh li halim kê ye *qet kes li bal nînin wefa* (Sadîni, 2020: 449)

2. 3. 3. 'Eks

'Eks ew cure hunera ciwankariyê ye wekî ku Ahmet Özhan Sucu jî behs jê kirîye, "di metnekê de bi awayekî berevajî dubarekirina qismek an jî temamiya peyvyan re 'eks tê gotin." (Sucu, ... :6). Feqîyê Teyran jî bi awayekî berevajî bi tekrarkirina heman peyv û komepeyvyan, ji bo sazkirina aheng û mûsîqîya navekî ji hunera 'eksê sûd wergirtîye. Çend mînakên hunera 'eksê ji helbestên Feqîyê Teyran:

Ey av û av ey av û av ma tu bi 'îşq û muhbetê
Mewc û pêlan tavêy belav *bê sekne û bê rahetê*

*Bê rahet û bê sekne yî yan ‘aşîqê baxwê xwe yî
Yan şubhetê qelbê me yî ji işqa kê natebite (Dêreşî, 2005: 63).*

Bê dest û pê bê çeng û perr bê pêl û mewc û fetl û gerr
Peyda dibin ji te kîrr û firr *nakî beyan vê ‘iletê*

*Vê ‘iletê beyan bike tu vê sîrrê peyman bike
Carek li min ‘eyan bike da seh bikeyn hikayetê (Dêreşî, 2005: 68-69).*

Raste qewî ev mesela eslê qîsan d’zanî mela
Hîna ku bû qal û bela *ma hûn nebûn di hizretê*

*Di hizretê ma hûn nebûn di xilweta baxwê xwe bûn
Li hatinê d’araste bûn heta vî roja axretê (Sadînî, 2020: 137).*

2. 3. 4. Lasayîkirina Dengan

Bi qasî ku me tesbît kirîye tenê Abdurrahman Adak di ahengsazî û mûsîqîsazîyê de li ser rol û rîsta lasayîkirin/bizarîkirina dengan rawestîyaye. Adak di vê behsê de dibêje: “Carinan armanc ji vê yekê derxistina dengê ye, carinan jî sazîkirina ahengekê ye di navbera deng û mijarê de.” (Adak, 2017: 74). Feqîyê Teyran jî di helbestên xwe de kêm be jî ji hunera lasayîkirin/bizarîkirina dengan sût wergerîyê. Çend mînakên hunera lasayîkirina dengan ji helbestên Feqîyê Teyran:

Da ez bizanim vê sîrrê ji hindekê heta pîrrê
Ji me’neya vê *gurrurrê* ji kê ra dikî vê ta’etê

Ji kê ra dikî zîkrî bi hal qet *guşguşa* nakî betal
Şubhetê min rehtê ‘emal şevan û rojan xew nebê (Dêreşî, 2005: 64).

Ava mezin *fîrfîr* meke zîkre bike fexrê meke
Ehlê xwedê aciz meke bes e bike tu ezyetê (Sadînî, 2020: 125).

2. 3. 5. Alîterasyon û Asonans

“Wek tê zanîn alîterasyon û asonans ûnsûrên bîngêhîn ên ahengsazîyê ne. Bi bikaranîna hevahengî-hevsengîya herfên bêdeng alîterasyon, bi hevahengîya herfên bideng jî asonans dixulîqe.” (Yıldız, 2006: 12). Çend nîmûneyên alîterasyon û asonansê ji helbestên Feqîyê Teyran:

Hem nû **kirim** hem bed **kirim** îsewî û murted **kirim**
J’ terîqetê ez **red** **kirim** **kafir** **kirim** bê murwetê

Kafir **kirim** meyxwer **kirim** dîwane û ebter **kirim**
Belkî jî pêxember **kirim** ev **reng** **bela** **bi** **ser** me tê

Ev **reng** **bela** ev **reng** **birîn** **çi** d’**kin** **ji** min ya **hazîrîn**
Hemyan **bihîst** **vêkra** **girîn** **nalîn** **kete** **cema’etê**

Zulfan **gelek** **ebter** **kirim** **cerg** û **hinav** **ker** **ker** **kirim**
Pêçam li Şamê **werkirim** ‘**ebdal** **li** **sûka** **xurbetê** (Dêreşî, 2005: 338-339).

Di van beytan de alîterasyon bi deng/herfa ‘**r**’yê û asonans jî bi deng/herfên ‘**e**, **i**’yê û çend heb jî bi ‘**î**’yê hatîye sazîkirin.

Bab û pis û biraz e hersê kirin cenaze
Bi şîrekê dilxwaz e bo şîn û gaze gaze (Sadînî, 2020: 394).

Di vê beyte de aliterasyon bi deng/herfa ‘z’ yê hatiye cîbicîkirin.

Ji hev dibirin dîl e bûye girên û gîl e
‘Acizbûn betl û fil e peristine hev bi hîle (Sadînî, 2020: 388).

Her wiha di vê beyte de jî aliterasyon bi deng/herfa ‘l’ yê û her wiha asonans jî bi deng/herfên ‘i, e’ yê hatine sazîkirin.

2. 3. 6. Îştîqaq

Di nava riste an jî beytekî de bi rehek/qurmeke peyvêkî ve dariştina gelek peyvên hunera ciwankariyê ya îştîqaqê tê cîbicîkirin. Wekî ku Şule Özbektaşê jî veguhastîye, bi cîbicîkirina îştîqaqê re, “Bi vî şekli helbestvan hem wateyê xurt dikin, di heman demê de armanca bîdestxistina vegotîneke ahengdar jî dikin.” (Özbektaş, 2021: 34). Her wiha wekî ku Özbektaşê jî amaje pê kirîye, reh/qurmên ku îştîqaq pê tê sazîkirin pîranî reh û peyvên erebî ne. Çend mînakên hunera îştîqaqê ji helbestên Feqîyê Teyran:

Lat sûretek *heq* e ji esmayên heqqanî
Li bal min *muheqqeq* e di nêv keşfa subhanî
Lahût e her mutleq e di nasûta însanî

Di nêv agir di nêv pêtê li ser sihlê xewa kê tê
Ecel gurrye yeqîn pê tê te ne *fîkr* e ne *efkar* e. (Sadînî, 2020: 207).

Felek çerx e û *dewran* e mîsalê mewcê behran e
Me‘aşê ehlê şeytan e dinê *dewre* û *dewwar* e. (Sadînî, 2020: 220)

Ne *xalib* ma ne *mexlûb* ma ne *talib* ma ne ne *metlûb* ma
Ne ewladê di Yê‘qûb ma kefa behrê Yûsif xare (Sadînî, 2020: 227).

Hewara min ji dest qebrê li ser min da xebrê
Ji şerman dê biçim heşrê *rehîm* û hem tu *rehman* î. (Sadînî, 2020: 430).

2. 3. 7. Nîda

Di helbestan de di derbirîna hest û heyecanên gur û germ de hunera nîdayê tê bikaranîn. Lê her wekî Sucu jî dupat kirîye, “Hunera nîdayê, her çiqas di vegotîna hest û heyecanên xurttir de amrazek be jî, baxusûs bi dubarekirinên li dû hev û her wiha derbarê bikaranîna digel dubarekirinên dangan de hunereke girîng e ji aliyê sûdwegirtina ji ahengê ve.” (Sucu, ...: 9). Feqîyê Teyran jî hem di derbirîna hest û heyecanên xwe de û hem jî di sazîkirina ahengê di helbestên xwe de hunera nîdayê bikaranîye. Çend mînak ji hunera nîdayê di helbestên Feqîyê Teyran de:

Ey dîlbera gerdenzucac *way* nazika mislê zucac
Qamet ji reyhana qîrac wêran ez im malim xirab

Ey dîlbera qametmîsal *way* nazika dil î hejar
Te j’ xandinê kirim betal wêran ez im malim xirab

Ey dîlberê *wey* dîlberê feryad ji destê keserê
Avek ji ava kewserê wêran ez im malim xirab (Sadînî, 2020: 158).

Xelqno qîsan mekin ji min bê qudreta şahê mezin
Mewcek ji behra lemyekun nayête der bê meşyetê

Hêj qet nebû derya û ber Baxwo nivîsî xeyr û şer
Muhr kir berata nef" û derr *xelqno* ji wî bi ser me tê (Sadînî, 2020: 291).

2. 3. 8. Cotepeyv

Cotepeyv di pexşan û helbestan de piranî ji bo xurtkirin û dewlemendkirina wateyê tê bikaranîn. Lê cotepeyv bi taybetî di helbestan de ji bilî wateya bingeşîn, di cîbicîkirina ahengê de jî tê bikaranîn. Her wekî Mehmet Şenyurt ji Muhsin Macit veguhastîye, "Cotepeyv di helbestan ne tenê ahengê saz dikin, her wiha bi awayekî karîger bi xurtkirina wateyê re alîkarîya pêşkêşkirina helbestê dike." (Şenyurt: 2018: 114). Her wiha wekî ku Sucu ji veguhastîye, "Cotepeyv di helbesta klasîk de zêde hatîye bikaranîn û helbestvanên edebîyata klasîk bi vî şêklî xwestine ku vegotin û wateyê bihêztir, xurttir û ahengê dewlementtir bikin." (Sucu, 2020 : 16).

Her wekî Ertekin û Açar behs jê kirine, "helbestvanên klasîk di berhemên xwe de cotepeyv gelek bi kar anîne û pê wan hêz û bandor dane ser îfadeyên xwe." (Ertekin, Açar, 2015: 88). Feqîyê Teyran jî wekî helbestvanekî edebîyata kurdî ya klasîk di helbestên xwe de ji bo xurtkirin û bihêzkirina wate, vegotin, aheng û mûsîqîyê cotepeyv bikaranîne. Çend mînak ji cotepeyvvan ji helbestên Feqîyê Teyran:

Dar û nebat û le' l û zer heywan û esnafên di ser
Teyr û tûrî û de'bewer teftêş kirin ji nutfetê (Sadînî, 2020: 124).

Îro ji dest husna hebîb *sergeşte û heyran* im ez
Min *eşq û muhbet* bûn nesîb sewdayê sergerdan im ez (Sadînî, 2020: 127).

Ew "Mîm û Hê" *qelb û mitalan* her bi wan *fîkr û xiyalan*
Rast dîkî *pend û misalan* şairê nesîhetê (Sadînî, 2020: 138).

Dinê *mehd e û mehlok e* weku *le' b e û leyzok e*
Çi zanim *tîfl û zarok e* felek çerx e û xeddar e (Sadînî, 2020: 220)

Rûh û rewan pir beşer î *aşiq û me'şûqê* berî
Ew li *surrê* bûn muşterî sahibdil î nûr veketê (Sadînî, 2020: 241).

Encam

Aheng û mûsîqî du hêmanên muhîm ên sazker û hev temamker ên helbesta klasîk in. Aheng û mûsîqî di helbestan de xusûsen bi rêya kêşa erûzê, bi serwayê, bi serwaya navekî, bi paşserwayê û her wiha bi rêya hunerên ciwankariyê (bedî'î) yên wekî î'ade, tekrîr, 'eks, îştîqaq, alîterasyon, asonans, lasayîkirina dangan, nîda û bi cotepeyvvan têne sazîkirin. Ji van hêmanan kêşa erûzê wekî ahengsazî û mûsîqîsazîya derekî ya helbestê; serwa, serwaya navekî, paşserwa û hunerên ciwankariyê jî wekî ahengsazî û mûsîqîsazîya navekî ya helbestê hatîye pejirandin.

Li gor aheng û mûsîqîyê wexta ku mirov li helbestên Feqîyê Teyran dinihêre, ewilî derdikeve meydanê ku li ser gelêribûn û klasîkbûna helbest û helbestvanîya wî li ser hejmarê helbestên wî gengeşî hene. Lê her çiqas li ser klasîkbûn û gelêribûna helbest û helbestvanîya Feqîyê Teyran û her wiha li ser hejmarê helbestên wî gengeşe hatibin kirin jî, wexta ku mirov li gor pîvanên edebîyata klasîk helbest û helbestvanîya wî analîz dike, derdikeve meydanê ku Feqîyê Teyran yek ji girîngtirîn helbestvanê edebîyata kurdî ya klasîk e. Ji ber ku Feqîyê Teyran di helbestên xwe de pîvanên helbesta klasîk ên wekî bikaranîna kêşa erûzê, serwayê, serwaya navekî û paşserwayê bi awayekî birêkûpêk


bikaranîye. Her wiha Feqîyê Teyran piranîya helbestên xwe bi teşeyên nezmê yên wekî qesîde û xezelan honandîye û her wiha di helbestên xwe de bi rêjeyeke bilind peyvên ji edebîyata klasîk ên erebî-farisî jî bikaranîye ku hemû jî nîşaneyên helbest û helbestvanîya edebîyata klasîk in.

Pîvanên edebîyata klasîk di heman demê de di helbesta klasîk de pîvanên aheng û mûsîqîyê ne. Feqîyê Teyran, kêşa erûzê wekî aheng û mûsîqîya derekî di helbestên xwe bi rêjeyeke zêde bilind cîbicî kirîye. Her wiha Feqîyê Teyran têkildarî kêşa erûzê di helbestên xwe de herî zêde behreya recezê û paşê jî behreya hezec û remelê bikaranîye.

Serwa, serwaya navekî û paşserwa jî hem pîvanên rûxsarî yên sereke yên edebîyata klasîk in û hem jî hemanên muhîm ên ahengsazî û mûsîqîsazîya navekî ne ku Feqîyê Teyran bi awayekî birêkûpêk di helbestên xwe de cîbicî kirîye. Her wiha Feqîyê Teyran di helbestên xwe de ji bo sazkirina aheng û mûsîqîyê, hunerên ciwankariyê (bedî'î) yên wekî î'ade, tekrîr, 'eks, îştîqaq, alîterasyon, asonans, lasayîkirina dengan, nîda û cotepeyv jî bi awayekî birêkûpêk cîbicî kirîye.

Çavkanî

- Adak, A. (2013). Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk, çapa yekem, Îstanbul: Nûbihar
- Adak, A. (2017). Dengê Ahengê di Helbestên Melayê Cizîrî de, Mukaddime, 8(3), 41-76.
- Cîhanî, P. Feqîyê Teyran'ın Şiirlerinde Üslup. Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 5(10), 101-122.
- Dêreşî, S. (2005) Dîwana Feqîyê Teyran, çapa yekem, Dihok: Dezgeha Sipîrêz ya Çap û Weşanê.
- Ertekin, Z. Açar, Z. (2015). Di Kurmancî De Cotepeyv û Cureyên Wan. Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 1(1), 82-92.
- Hemedemîn, Y. R. Ehmed, H. U. (2022). Bunyadi Rîtim û Mosîqay Klasîkî le Şî'rekanî Feqê Teyranda.
- Gül, M. (2013). Usûlî'nin Dilinde Ahengi Sağlayan Unsurlar Üzerine Bir Deneme. İdil Sanat ve Dil Dergisi, 2(06), 122-157.
- Sadinî. M. X. (2011). Feqîyê Teyran Jiyan, Berhem û Helbestên Wî, çapa pençem, Îstanbul: Nûbihar.
- Sadinî. M. X. (2020). Feqîyê Teyran Jiyan, Berhem û Helbestên Wî, çapa pençem, Îstanbul: Nûbihar.
- Savran, Ö. (2007). Ahengi Sağlayan Unsurların Kullanımı Yönüyle Neşatî'nin Şiirleri. Selçuk Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Dergisi, (17), 221-230.
- Saydun, E. (2018). Teşe û Ciwankariyên Wêjeyî di Helbesta Feqîyê Teyran de, Teza Lîsansa Bilind ya Neçapbûyî.
- Sucu, A. Ö. Hâce Muhammed Lütfî Efendî'nin "Hülâsatü'l-Hakâyik" Adlı Eserinde Ses ve Ahenge Dayalı Sanatlar. 2020, sayı 69, 79-117.
- Özbektaş, Ş. Mostarlı Hasan Ziyâî'nin Şiirlerinde Ahenk. Türk Ekini, (8), 1-47.
- Şenyurt, M. Hayâlî Bey'in Gazellerinde Söz Sanatlarına Dayalı Âhenk Unsurları. Uluslararası Afro-Avrasya Araştırmaları Dergisi , 3 (5), 106-116.
- Özen, İ. (2015). Tefvîk Fikretin Şiirinde Hissedilen Musiki. The Journal Of Academic Social Science, (11), 251-262.
- Yıldırım, K. (2014). Dîwan Feqîyê Teyran, çapa yekem, Ankara: Kùltür ve Turizm Bakanlıđı Yayınları.
- Yıldız, S. (2006). Mustafa Seyit Sutüven'in Şiirinde Âhenk Unsurları. Çukurova Üniversitesi Türkoloji Araştırmaları Merkezi.



Melayê Cizîrî

Hin Tişt Derbarê Jîyan û Berhema Wî de

Izedîn Mistefa Resûl,

Ji Soranî Bo Kurmancî: Ziya Avcî,

Lîs, Dîyarbekir 2020,

ISBN 9786057535764

İlyas SUVAĞCI,

Dr. Öğr. Üyesi, Hakkari Üniversitesi, Rektörlük,

Türk Dili Bölümü, ilyascembeli@gmail.com,

ORCID: 0000-0001-6409-1229

Article Type/Makale Türü:

Research Article/Araştırma Makalesi

Received / Makale Geliş Tarihi: 19.09.2023

Accepted / Makale Kabul Tarihi: 02.10.2023

Published / Makale Yayın Tarihi: 20.10.2023

Doi: 10.35859/jms.2023.1362986.

Değerlendirme ve İntihal/Reviewing and Plagiarism:

Bu makale iki taraflı kör hakem sistemine göre en az iki hakem tarafından değerlendirilmiştir.

Makale intihal.net adlı intihal sitesinde

taranmıştır. / This article has been reviewed

by at least two anonym reviewers and scanned

by intihal.net plagiarism website.

Citation/Atf:

Suvağcı, İ. (2023). Melayê Cizîrî Hin Tişt Derbarê Jîyan û Berhema Wî de, Izedîn Mistefa Resûl, Ji Soranî Bo Kurmancî: Ziya Avcî, Lîs, Dîyarbekir 2020, 248 rûpel, ISBN 9786057535764, The Journal of Mesopotamian Studies, Jimara Taybet a Edebiyata Kurdî ya Klasik, rr. 189-193, DOI: 10.35859/jms.2023.1362986.

MELAYÊ CİZİRÎ HIN TIŞT DERBARÊ JÎYAN û BERHEMA WÎ DE

İlyas SUVAĞCI

Di lêkolînên akademîk yên li ser edebiyata kurdî (kurmancî) ya klasîk da li gel xebatên xweser yên li ser helbestkarên kurd, berhemên ji soranî ji bo kurmancî hatine veguhêztin¹ jî balê dikişînin. Yek ji wan berheman jî lêkolîna Izedîn Mistefa Resûl² ya bi navê *Melayê Cizîrî Hin Tişt Derbarê Jîyan û Berhema Wî de* ye. Herçend pisporên edebiyata klasîk dikarin bi riheî vê berhemê bixwînin jî, ji bo kesên nikarin tîpên aramî bixwînin û soranî nizanin kurmancîkirina vê berhemê girîng e. Ji ber vê yekê ev berhem hêjayî nirxandinê ye. Berhem cara ewil di sala 1990an da li Hewlêrê bi navê *Melay Cizîrî Şitek Derbarey Jîyan û Berhemî* hatiye çapkirin. Herçend wek pêşqebûlekê tê zanîn ku nivîsên nirxandinan yan jî rexneya pirtûkan bi taybet li ser berhemên nû hatine çapkirin tîpên kirin jî; ev ji bo akademiya Kurdî ne wisa ye ji ber rewşa kurdî ya pîrzaravayî, ji ber sedemên cuda û ji ber pêşgirtin û derengmayîna akademiya Kurdî. Lewma, herçend çapa wê ya ewil 30 sal berê hatibe kirin jî divê bi nêrîneka rexneyî li ser bê sekinandin û ew bê nirxandin.

¹ Ji ber ku ev kar di navbera zaraveyên kurdî da hatiye kirin bi raya me ji wergerê zêdetir wek veguhêztinê bê binavkirinê dê rasttir bibe.

² Di sala 1934an da li Silêmaniyê ji dayikê bûye. Bi rêzê li mizgeftê li nik babê xwe, li Bexdayê xwendina şerîetê, piştê Xaneya Bilind ya Mamosteyan (1951) dixwîne, li Bakuyê pîleya doktorayê (1963) werdigire. Dema vedigere, li Zanîngeha Bexdayê di beşa kurdî da dixebite. Li ser edebiyata kurdî ya klasîk xwediyê pîrberheman e. Di sala 2019an da li Silêmaniyê miriye.

Berî niha, hîn ku çapa vê berhemê ya kurmancî derneketibû, em nivîseka Zülküf Ergün (2017) ya li ser çapa berhemê ya soranî dibînin. Lê dîsa jî ji ber çend sedeman li ser vê berhemê me hewceyî nivîsandinê dît. Di nav pîvanên nivîsên nîrxandina pirtûkan da mirov nikare behsa rêbazekê bi tenê bike. Ji ber ku ev karekî takekesî ye, di nav xwe da qinyat û boçûnên kesê nîrxandinê dike vedihewîne. Lewma her cure nivîs alîyekî taybet yê pirtûkê derdixe pêş (Gömbeyaz, 2017:1417). Ligel vê yekê nivîsa Z. Ergün li ser çapa berhemê ya soranî hatîye kirin. Lê dema Ziya Avcî berhemê ji soranî vediguhêzîne bo kurmancî êdî em divê behsa çapeka nû ya berhemê bikin. Lewre li vir, rola kesa/ê wergêr yan jî veguhêzer jî giring e û hêjayî nîrxandinê ye. Her wiha ji ber ku yek ji armancên nivîsên nîrxandina pirtûkan ew e ku bi alîkarîya wan heke kêmasî di çapên berê da hebin ew ji bo çapên nû bîn sererastkirin. Lewma nivîsa me bala lêkolîneran dibe ser çapa berhemê ya kurmancî.

Berî ku em derbasî naveroka berhemê bibin divê li ser veguhêztina Ziya Avcî bisekinin. Di serî da Z. Avcî bîyografîya nivîskar, kunyeya berhemên wî daye. Ev yek ji bo xwendevanên ku derbarê I. Mistefa Resûl da xwedan agahî nînin bijartineka baş bûye. Avcî di destpêka berhemê da bi nivîsekê bîr û boçûnên xwe yê kurmancîkirina berhemê vedibêje. Ew zêdebûna xebatên ku bi nêrînen cuda li ser edebîyat, dîrok û zimanê kurdî tînin kirin giring dibîne. Bi raya wî nêzikbûna I. Mistefa Resûl ya li xebatên berîya xwe yê derbarê Cizîrî da bi perspektîfeka cuda û bi çavekî rexnegirî bûye. Bi raya Avcî, wî di xebata xwe da bi şirove û perspektîfên pir cuda M. Cizîrî nîrxandiye. Lewma Avcî xwestîye ku ev berhem bigihê ber destê “kurmancîaxêvan” (r.11). Bi dîtina me gotina “kurmancîaxêv” nerast hatîye bikaranîn, lewma em dixwazin bala xwendevanan bibin li ser gotinê. Di wateya vê gotinê da xala pêşîyê tê bîra me ew e ku “kesên ku kurmancî diaxivin”. Lê, ji ber ku berhem li bakur bi tîpên latînî û kurmancî hatîye çapkirin, mebesta Z. Avcî li vir ew e ku kurmancên nikarin bi tîpên aramî deqeke soranî bixwînin. Lê belê ev binavkirin ji bo kurdên li başûr, yê herêma Bahdînan ku kurmancî diaxivin û di heman demê da bi rihetî bi tîpên aramî dixwînin û soranî jî dizanin jî digire di nav xwe da.

Di heman nivîsa xwe da Z. Avcî dibêje ku “...wisa dixuyê seydayê Izedîn Mistefa Resûl di vê xebatê de nusxeya destnivîs a sala 1355’an k./1936’az v. a bi destxeta Seyîd Tahayê Arvasî esas girtiye” (r.12) û ew dîyar dike ku ev destxeta navborî li ber destê wî tune ye. Herçend ev lêkolîneka akademîk nîne jî divîyabû Z. Avcî ev agahî teyît kiribûya. Ji ber ku bingeha berhema I. Mistefa Resûl li ser kîjan destxetê be pêwîst e Avcî jî lêkolîna xwe li ser wê destxetê berdewam bike û ew girêdayî wê destxetê be, wê ji xwe ra esas bigire. Wek mînak, heke destxeta ku Seyîd Tahayê Arvasî ji bo xwe esas girtiye xeletî yan jî kêmasîyek bihewîne, I. Mistefa Resûl jî li ser heman destxetê şirove kiribe, wê demê Z. Avcî jî dema berhemê vediguhêze kurmancî dê heman xeletiyê bike. Z. Avcî herçend xwe negihandiye destxeta Arvasî, berhema I. Mistefa Resûl ligel nuxseya Mele Ehmedê Zivingî -ku ji aliyê Emîn Narozî ve ji erebî bo kurmancî hatîye wergerandin- daye ber hev. Cudahîyên di navbera wan da destnîşan kirîye. Wê demê jî muşkîleyeka din derdikeve pêşîya me. Z. Avcî dema berhema I. Mistefa Resûl ji soranî bo kurmancî vediguhêzîne berhemeka werger ji xwe ra esas digire. Ji bo veguhêztinekê (yan jî wergerekê) xwe sipartîye wergereka din. Di dûmayîka berhemê da Z. Avcî du beşên bi navê “Jêrenot” û “Fehengok” bi cih kirine. Beşa “Fehengok”ê di berhema I. Mistefa Resûl da tune ye. Ev beş jî bi temamî ji “wergera” E. Narozî hatîye “wergirtin”.

Di beşa “Jêrenot”ê da him çavkanîyên ku I. Mistefa Resûl di berhema xwe da bi kar anîne him jî nîşeyên wî cih digirin. Lewma dema di nav berhemê da nîşeyên I. Mistefa Resûl derbas dibûn Z. Avcî dikarîbû ew di bin heman rûpelê da wek “jêrenot” danîbûna. Ji ber ku dema xwendevan nimereya jêrenotekê dibîne, ji bo ku têbigihe bê ka ew çî dibêje pêwîst e her car biçe rûpelên dawîyê yê pirtûkê binêre. Lewma ev kar dema çend car dubare dibe, xwendevan dibe ku pê biweste. Her wiha çawa ku tê zanîn “jêrenot” û “çavkanî” heman tîşt nînin. Nabe ku ew herdu di bin heman sernavî da bê bicihkirin. Herçend ev wê muşkîleyê çareser neke jî Z. Avcî dikarîbû ew wek “Jêrenot û Çavkanî” binivîsanda. Di veguhêztina Z. Avcî da bi dîtina me muşkîleyeka din jî binavkirina berhemê ya kurmancî ye. Wî dikarîbû cihê *Melayê Cizîrî Hin Tîşt Derbarê Jîyan û Berhema Wî de* gotibûya *Melayê Cizîrî Hin Tîşt*

Derbarê Jîyan û Dîwana Wî de; ji ber ku heta niha ji bilî dîwana M. Cizîrî tu berhemeka wî ya din di destê me da tune ye û mebest bi “berhem”ê dîsa “dîwan” e. Lê ev binavkirin bijartina veguhêzer ya takekesî ye. Lewma ev divê wek kêmasîyekê neyê nixandî.

Heke em derbasî naveroka berhemê bibin, ew ji pêşkêşiyên I. Mistefa Resûl yên li ser Melayê Cizîrî yên li Radyoya Bexdayê pêk hatîye. Ew ji Destpêk û 13 beş û beşa “Jêrenot”ê pêk tê. Wek me berî niha dîyar kir di çapa wê ya kurmancî da Z. Avci di dûmayîka berhemê da jî beşa “Ferhengok”ê lê zêde kirîye.

Bi raya I. Mistefa Resûl heta wê demê çu kitêb yan jî nameyên behsa Melayê Cizîrî dikin nehatine amadekirin û ji bo têgihîştina M. Cizîrî çu çavkanîyên bibin alîkar tune bûne. Ew dixwaze ku ev xebata wî, piştire, ji bo lêkolînên li ser M. Cizîrî tên kirin û berhemeka “temam û fireh” bibe çavkanîyek. Ji vî aliyê ve nivîskar qebûl dike ku xebata wî bi temami berfireh nîne yan jî nehatîye temamkirin û kêmasîyên wê hene. Lê dema ku ew dibêje li berî wî, di vê mijarê da çu kitêb yan jî lêkolîn tune bûne ev wê bibe angaştaka mezin. Ji ber ku dema mirov piştire tê li ser çavkanîyên wî, mirov wê bibîne ku di rastîyê da wisa nebûye. Wek mînak dema ew bi tenê behsa mijara jidayîkbûn û mirina M. Cizîrî dike ji fikir û berhemên Alexandre Jaba, Qanatê Kurdo, Wezîrê Nadir, Celadet Bedirxan, Hacî Qadirê Koyî, Elaeddîn Seccadî, Bletch Chirguh (Wek navê mustear yê Sureyya Bedirxan tê zanîn), Mihemed Emîn Zekî, Mele Ehmedê Botî Zivingî, Şerefxanê Bedlîsî jêgirtinan dike û fikrên wan radigihîne. Ev jî nîşan dide ku berî I. Mistefa Resûl jî li ser M. Cizîrî berhem, lêkolîn û nivîs hebûne.

Yek ji mijarên giring derbarê M. Cizîrî da gengeşiyên li ser jidayîkbûn û mirina wî ye. I. Mistefa Resûl bi tespîteka giring sînore van gengeşiyên dîyar dike. Ew dibêje ku derbarê vê mijarê da lêkolîneran sê rê dane ber xwe; 1) Çavkanîyên berîya xwe esas girtine û ew nixandine, 2) Di nav dîwana wî da li çend îşaretan gerîyane, 3) Xwestine ji navên ku dîwana wî da derbas bûne derbarê mijarê da xwe bigihînin qinyatekê (r.20). I. Mistefa Resûl piştî ku angaştên kesên li jor navên wan derbas bûn dinirxîne, ji navên ku di dîwana wî da derbas dibin digihe qinyatekê û dibêje M. Cizîrî di dawîya sedsala 16an û destpêka sedsala 17an da jîyaye.

Yek ji beşên giring di berhemê da bi raya me beşa bi navê “Şiroveya Çavkanîyên Behsa Melayê Cizîrî” ye. Di vê beşê da I. Mistefa Resûl li ser destxet û çapên dîwana M. Cizîrî disekine. Di vê mijarê da bi rêzê behsa van kesan dike: Seyîd Tahayê Arvasî, Martin Hartmann, Mihemed Şefîq Arvasî, Gîwî Mukrîyanî, Huznîyê Mukrîyanî, Enwer Mayî, Sadiq Bahaedîn Amêdî, Alexandre Jaba, Qanatê Kurdo, Wezîrê Nadir. Nivîskar dîyar dike bê ka van kesan li ku, kîjan çapxaneyê, kengî dîwana M. Cizîrî çap kirîye. Çapa kîjan lêkolînerî ji ya din hatîye girtin, dema ku ew dîwanê çap dikin derbarê çapê da di pêşgotinan da çi destnîşan kirine, dema çapkirinê kê li ser hinek bêjeyan destkarî kirîye, di nav van çapan da ya herî baş kîjan e, ji ber kîjan sedeman ew baş e hwd... I. Mistefa Resûl carinan van çapan dide ber hev, cudahîyên di navbera wan da nîşan dide. Ew dibêje ku mirov dikare behsa gelek destxetên cuda yên dîwana M. Cizîrî bike. Ew di vê mijarê da hişyarî yan jî pêşniyazekê dike, dibêje ku “ji bo kesekî ku bixwaze nusxe yan teksteke rexnegirî ya dîwana Melayê Cizîrî amade bike, divê li welat û di dezgehên rojhilatnasîyê de li pê wan destnivîsan bigere” (r.56). Ji ber ku di navbera sedem û encaman da girêdayînek dîtîye, berawirdkirin kirîye, literatura berîya xwe nihêrîye û di dawîyê da bala me biriye ser giringîya lêgerîna belgeyan; ev beşa berhemê, li gor beşên din pirtir nêzîkî rêbazeka zanistî hatîye nivîsandin.

Di beşa “Çîroka Eşqa Melayê Cizîrî” da nivîskar behsa çavkanîyên eşqa Mela û Selma’yê dike. Fikrên kesên wek E. Seccadî, M. Ehmedê Botî Zivingî, M. Enwerê Mayî, G. Mukrîyanî yên di vê mijarê da radigihîne. I. Mistefa Resûl vê eşqê wek “çîrokeka xeyalî” dinirxîne. Bi raya wî xelkê ew bi xeyala xwe ya fireh ji bo Mela ava kirîye lewma di van çîrokan da “milê wan yê folklorîk ji bûyerên rasteqîn zêdetir e” (r.62) Di dîrokê da mijara evîne di nav folklor, sînema, şano, edebîyat, çand û

hunera hemû gelan da hercar populer bûye. Kesekî wek M. Cizîrî jî ji ber ku di nav civaka xwe da jê pir hatîye hezkirin tiştêkî xwezayî ye ku di nav gel da li ser jîyana wî ya taybet gotegot belav bûbin. Ji ber ku derbarê M. Cizîrî û hezkirina wî ya li ser jinekê çavkanîyeka teqez nîne I. Mistefa Resûl jî ev mijar wek “çîrokeka xeyalî” nirxandîye. Di beşa “Melayê Cizîrî û Eşq” da jî nivîskar li ser helbestên Mela yên di çarçoveya temaya işqê da disekine bê ka ew işqeka beşerî ye yan îlahî ye. Bi raya wî Mela “vê işqê di nav sînore evînîya yar û dilberê de ranagire, belkî wê bi eşqa Xwedê û pêxember ve girê dide” (r.95) Di beşa “Bi Qelemê Wêneyekî Melayê Cizîrî” da behsa gotegotên li ser taybetiyên fizîkî yên M. Cizîrî tê kirin. Wek mînak, ew ji C. Bedîrxan radigihîne ku “..Bejna Melê ne kurt û ne dirêj, lê navîn bû. Rûwê wî girover, spî û sor bû. Çav û birhên wî reş bûn...” (r.68). Ew dibêje ku ji bilî C. Bedîrxan, E. Seccadî û E. Mayî jî ew ji vegotin û gotinên devê xelkê wergirtine û nivîsandine. Bi dîtina me jî bi awayekî kitekit şayesandinên fizîkî yên mirovan bi taybet bi pêşketina cureya pexşanê (roman û çîrokên edebî) derdikeve holê. Lewma dema em tunebûna belgeyên derbarê M. Cizîrî da bînin bîra xwe, wê demê, wek nivîskar dîyar dike, ne pêkan e ku ev şayesandin bi rastî jî rasteqîn bibin.

Di beşa bi navê “Qesîdeya Ellah Sehergaha Ezel û Berhevkerê Fikra Mela da” tê gotin ku di hinek çap û destxetên dîwana M. Cizîrî da ev qesîde tune ye. Lewre nivîskar li ser pîrsa “Gelo ev qesîde ya Mela ye yan na?” disekine. Bi raya wî di qesîdeyê da ji ber behsa tesewifê û merhaleyên wê ev yek mirov ber bi Mela ve bibe jî li rexekî din jî jê dûr dixê. Ji ber ku hemu helbestên Mela wiha yekser ne li ser felsefe û tesewifê ne. M. Cizîrî bi rêyên din tê li ser felsefê û tesewifê. I. Mistefa Resûl vê qesîdeyê di çarçoveya fikrên Pîsagor, Platon, Euklides da rave dike lê zêde pê da naçe. Ew, M. Cizîrî him wek helbestkar him wek feylesof dibîne. Di dîroka ramîyarîyê da li ser mijara “ji kê ra feylesof tê gotin” gengeşî çêbûne. Di dema yewnana antîk da nemaze berî Platon û piştî wî bi taybet bi awayekî sistematîk li ser felsefeyê û mijarên wê yên sereke yên wek ontolojî, epîstemolojî, exlaq, sîyaset, etîk tê sekinandin. Di vê babetê da kesên ku ji heta wê demê cudatir bi nêrîn û vegotîneka nû behsa tiştên nû dikin wek feylesof tînin binavkirin. Lê ev pêvajoya felsefeyê her tim bi awayekî sistematîk wiha berdewam nekirîye. Wek mînak di yewnana antîk da di serdema presokratîk (berîya Sokrat) yan jî serdema feylesofên xwezayê da feylesofên wek Thales, Anaksîmandros, Anaksîmenes, Pythagoras, Parmenîdes, Zenon, Herakleîtos, Empedokles, Anaxagoras li pey şopa Xwedê dikevin bê ka mirov dikare Xwedê di nav kîjan heyberê da bibîne. Van feylesofên navborî carinan ramanên xwe yên felsefîk bi rêya edebîyatê nemaze helbestê vegotîne. Wek van feylesofan di dîroka ramîyarîyê ya Îslamê da jî kesên wek Îbn-i Arabî, Mewlana, Muhammed İkbâl fikrên xwe yên derbarê felsefeyê û ontolojîyê da bi berhemên xwe yên edebî vegotîne û ew jî wek feylesof tînin dîtin. Di vê çarçoveyê da mirov dikare M. Cizîrî jî wek feylesof binirxîne (Gündoğan, 2023).


Di beşên din yên berhemê da ji helbestên wî yên mijarên wek; rêbaza hurûfîyeyê, fikra M. Cizîrî û felekê (stêrnasî), di helbestên Mela da cejn û xerîbî, ji aliyê tesewifê ve nirxandina wan û hinek nimûneyên derbarê stîlê da tînin vegotin. Lê I. Mistefa Resûl van beşan jî bi awayekî serveyî dinivîse, bikitekit behsa wan nake. Di beşa bi navê “Cîhaneke Fireh a Miqeyeseyê”, dijberî sernavê xwe, ne bi awayekî berfireh lê bi awayekî sathî hêmanên hevpar yên di navbera helbestên M. Cizîrî û helbestkarên wek Nalî, Mehwî, Mewlewî, Hemdî, Se’dî, Camî, Mihyedîn Bin Erebbî, Hafîz, Enwerî, Sefwet, Xeyam, Pîremêrd, Seyîd Reşîd, Mela Hemdûn, Ehmed Şewqî, Ibn el-Farîzî, El-Mutebbî, Hacî Qadirê Koyî, Hellac bi kurtî vedibêje; heta carinan bi tenê helbestên wan li pey hev rêz dike. Herçend helbestên wan bikitekit nade ber hev jî, ji ber ku ji helbestên pir helbestkaran mînakan nîşan dide, li gor beşên din ev beş derheqê helbesta M. Cizîrî da dike ku xwendevan bibin xwedî çavdêriyeka biçûk lê ne zêdetir.

Bi awayekî giştî mirov dikare bibêje ku ji bilî beşa şiroveya çavkanîyên M. Cizîrî, hemu beşên din yên berhema I. Mistefa Resûl ji rêbaza zanistê û pîvanên zanistî dûr in. Ev berhem derbarê Mela da tiştên berîya wî hatine gotin dubare dike, xwe nagihîne agahîyeka nû. Ev berhem ji bo dema xwe (salên 1990an) dibe ku bala lêkolîneran bûbe li ser M. Cizîrî û helbestên wî, lê niha pir çavkanîyên

nû li ser M. Cizîrî tîn çapkirin, sempozyum tîn amadekirin, ji aliyên cuda ve helbestên wî, fikrên wî tîn nirxandin; lewma nabe ku ev berhem ji bo dema niha wek çavkanîyeka sereke ya kullîyata M. Cizîrî bê nirxandin. Dîsa jî divê ji aliyê lêkolîneran ve ev berhem neyê piştguhkirin, ji ber ku nivîskar bêyî ku bikeve hûrgilîyan û wek nav jî be kêm zêde çavkanîyên berîya xwe yên derbarê M. Cizîrî da destnîşan dike. Derbarê veguhêztina berhemê bo kurmancî û ji nû ve çapkirina wê da jî mirov dikare bibêje ku divê ev bi tenê wek veguhêztin nemîne; divê berî berhemê bê çapkirin pêşîyê pêşniyazên pisporên edebîyata kurdî ya klasîk bê standin û ji kontrola wan derbas bibe. Bi vî awayî herçend ku ji aliyê nivîskarê berhemê bixwe neyê kirin jî ev wê bibe çapeka berfirehkirî; heman xeletî û kêmasiyên çapa ewil wê neyên dubarekirin.

ÇAVKANÎ

- Ergün, Z. (2017). Melay Cizîrî Şitêk Derbarey Jîyan û Berhemî, Îzedîn Mistefa RESÛL, Hewlêr: Çapxaney Darul Hikme bo Çapkirdin û Billawkirdnewe. *Mukaddime*, 8 (Hejmara Taybet 1), 207-209.
- Gömbeyaz, K. (2017). Kitap Değerlendirmesi Yazım Kılavuzu. *Cumhuriyet İlahiyat Dergisi*, C. 21, Sayı 2, 1415-1420.
- Gündoğan, S. (2023)., Hevpeyvîna Devkî, Dr. Saim Gündoğan, Hakkari Üniversitesi, Dîroka Hevpeyvînê: 02.09.2023.
- Resûl, I. Mistefa. (2020). *Melayê Cizîrî Hin Tîşt Derbarê Jîyan û Berhema Wî de*. Z. Avcî (Vgz). Dîyarbekir: Lîs.



Kürtçe Siyer Yazıcılığı
M. Zahir ERTEKİN
Siyer Akademi, İstanbul 2022,
ISBN 9786258015874

Zafer AÇAR,

Dr. Öğretim Üyesi, Bingöl Üniversitesi, Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı, zafer13acar65@gmail.com, ORCID: 0000-0001-5323-9531

Article Type/Makale Türü:

Research Article/Araştırma Makalesi

Received / Makale Geliş Tarihi: 11.09.2023

Accepted / Makale Kabul Tarihi: 22.10.2023

Published / Makale Yayın Tarihi: 20.10.2023

Doi: 10.35859/jms.2023.1358208

Değerlendirme ve İntihal/Reviewing and Plagiarism:

Bu makale iki taraflı kör hakem sistemine göre en az iki hakem tarafından değerlendirilmiştir. Makale intihal.net adlı intihal sitesinde taranmıştır. / This article has been reviewed by at least two anonym reviewers and scanned by intihal.net plagiarism website.

Citation/Atrf:

Açar, Z. (2023). Kürtçe Siyer Yazıcılığı, M. Zahir Ertekin, Siyer Akademi, İstanbul 2022, 160 rûpel, ISBN 9786258015874, The Journal of Mesopotamian Studies, Jimara Taybet a Edebiyata Kurdî ya Klasîk, rr. 194-197, DOI: 10.35859/jms.2023.1358208.

KÜRTÇE SİYER YAZICILIĞI

Zafer AÇAR

Ev kitêb berhemên kurdî yên li ser jiyana Hz. Pêxember hatine nivîsandin dike mijar. Nivîskarê berhemê M. Zahir Ertekin e û berhem di sala 2022yan de, li bajarê Stenbolê, ji weşanên “Siyer Akademi”yê derketiye û 160 rûpel e. Berhem xêncî pêşgotinê, ji destpêk, çar beş, encam û pêvekan pêk tê. Herwiha di dawîya kitêbê de îndeksek jî cih digire.

Ev berhem li gorî tegerîna me ya lîteraturê û herwiha bi îfadeya nivîskarî bixwe jî, di sehaya xwe de tekane kitêb e ku berhemên sîreta Hz. Pêxember ên kurdî (bi çar zaravayên wî; kurmançî, soranî, zazakî hewramî) vekolaye û wekî xebateke firawan a bibliyografîk ketiye lîteraturê. Loma danasîn û nirxandina vê kitêbê giring e û hêjaye ku bala lêkolîneran li ser bê kişandin. Armanca nivîsandina vê gotarê jî ew e ku bala lêkolîneran bide ser vê xebatê yên ku di sehayên Edebiyata Klasîk a Kurdî û zimannasiyê de dixebitin. Çunkî ev kitêba ku danasîna sîretan dike, dihêle lêkolîner xwe bigihînin wan xebatan û li ser wan lêkolînen xwe bimeşînin.

Wekî ku li jor jî hate diyarkirin nivîskarî berhema xwe li ser hin beşan dabeş kiriye. Di destpêka xebatê de pênasê û nivîskariya sîretê, nivîskariya sîretên kurdî û rêbaza xebatê û vegira wê cih digire.

Berhemên ku jiyana Hz. Muhemmed (sew) dikin mijar di tirkî de wekî *siyer* tên pênasekirin û peyva *siyerê* jî ji aliyê binyadê ve erebî ye. Li gorî Ansiklopediya Îslamê: “Peyva *siyerê* pirjimariya peyva *sîretê* ye, digel maneyên xwe yê ferhengî yê wekî; hal, rewş, reftar, kargêrî, rê, tevger, meş, ew wekî têgeheke fiqhê jî ketiye lîteraturê û navê taybet yê şaxeke ilmê ye ku jiyana Hz. Pêxember bi hûrgilî dike mijar.” (Yaman, 10. 09. 2023). Wekî ku nivîskarê vê kitêbê jî derdibirre berhemên ku jiyana Hz. Pêxember dikin mijar di sehaya Tirkîyeyê de wekî *siyer* tê zanîn. Lê li cem ereb û kurdan şûna vê têgehê zêdetir *sîret* tê tercîhkirin (Ertekin, 2022: 16).

Di mêjûya Îslamê de ji bo ku misliman jiyana Hz. Pêxember wekî tefsîr û pratîka Quranê dibînin, tevî hînbûn û jiberkirina Quranê ew jiyana pêxember jî hîn bûne, hedîsên wî ji ber kirine, sunneta wî îcra kirine. Bi demê re wekî ku Ertekin (2022: 11) jî dibêje: “Jiyana Hz. Pêxember a wekî pusûlayê bûye rêber, ji esrên pêşîn ve hatiye qeydkirin û kiriye ku bi navê “*sîret*”ê şaxeke misteqîl a ilmê derkeve.” Piştî ku berhemên vê sehayê yê erebî tên nivîsandin bi zimanê din jî ev berhem tene nivîsandin. Li gorî tesbîta Ertekin berhema pêşîn a *sîretê* ya erebî ye ku aîdî Îbnî Îshaq e û navê wê jî *Sîretû Îbnî Îshaq* e. Di edebiyata tirkî de; di sedsala XIvan de, Mustafa Darîr bi navê *Sîretu'n-Nebî* û di nav farsan de jî Cemaluddîn Ataullah (m. 1521) bi navê *Rawzatu'l-Ehbab* berhemên pêşîn ên *sîretê* didin. Heçî *sîretên* kurdî ne, ew jî Mewlûda Melayê Bateyî ne tê de, *Rewdu'n-ne'im* a Şêx Evdirrehman Aqtepe (1853-1910) ye.

Ji ber ku xebata nivîskar li ser *sîretên* kurdî ye wî di meşandina xebata xwe de rêbazeke bi vî teherî meşandiye:

Nivîskar berhemên ku bi temamî jiyana Hz. Pêxember kirine mijar û yê tenê aliyekî wî kirine mijar hildaye nava xebata xwe. Lê di berhema xwe de mewlûd neketiye nava berhemên *sîretê* ku nivîskar vê yekê wiha îzah dike (2022: 19):

Me cureya Mewlûdê tevî xebata xwe nekir. Çûnkî di vê derbarê de xebatên misteqîl hene. Li aliyekî din ji ber ku mewlûd ji gelek aliyên ve jî *sîretan* vediqete, me ew wekî cureyê cuda qebûl kir. Lê me wekî pêvek listeyêke mewlûdên kurdî xiste dawîya xebata xwe.

Li vê derê divê bê gotin ku nivîskarê vê berhemê xwedî gelek lêkolîn û berhemên Edebîyata Klasîk a Kurdî ye. Xusûsen menzûmeyên ku ew li ser xebitiye; pendname, eqîdename, qelemname, mewlûd ji xebatên pêşîn ên akademîk in di akademiya kurdî de li sehaya Tirkîyeyê. Li ser mewlûdên kurmançî bo nimûne; “Di Edebîyata Me de Mewlûd û Rûberûkirina Mewlûdên Pêşîn ên Kurdî û Tirkî”, “Mewlûda Kurdî ya Yekem û Bandora wê li ser Mewlûdên Din”, “Mela ‘Eliyê Baqustanî û Mewlûda Wî” hin xebatên wî ne wekî teblîx û gotar hatine weşandin.

Li aliyekî din, di berhemê de *sîretên* kurdî li ser çar diyalektên kurdî hatiye dabeşkirin; bi hewramî du *sîret* hatine tesbîtkirin. *Sîretên* hersê diyalektên din wekî *telîf* û *tercume* (werger) hatine tesnîfkirin û ew wekî kronolojîk hatine nasandin. Di nava *sîretên* telîf de jî ji bo ku *sîretên* menzûm û yê pexşan hene ew di bin sernavên cuda de hatine nirxandin. Lê di kurdî de bi van her çar diyalektan *sîretên* menzûm ên werger nehatine tesbîtkirin.

Nivîskar di kitêba xwe de cih nade biyografiya nivîskar, wergêr û şairên van *sîretan*. Ew berhemên ku xwe gihandiyê ji aliyê ziman, şêwe û naverokê ve dinirxîne lê berhemên ku xwe negihandiyê tenê kunyeya wan didê. Ji bilî vê, nivîskar xwe negihandiyê *sîretên* kurmançî yê sehaya Îran û Sûriyeyê ku ew vê yekê jî wekî kêmasiyekê bi nav dike.

Beşa yekem a xebatê dibe sê binbeş: A) Sîretên Menzûm ên Telîf ên Kurmancî, B) Sîretên Pexşan ên Telîf ên Kurmancî, C) Sîretên Werger ên Kurmancî. Berhem 13 sîretên menzûm ên telîf ên kurmancî, 19 sîretên pexşan ên telîf ên kurmancî û 18 sîretên werger ên kurmancî dide naskirin. Di vê beşa kitêbê de, berhemên lêkolandî bi detay hatine danasîn û xusûsiyet û giringiya wan hatiye destnîşankirin.

Di beşa duyem de vê carê sîretên soranî cih digirin. Ew jî wekî kurmancî bûne sê binbeş; menzûm telîf, pexşan telîf, werger. Di berhemê de 11 sîretên menzûm û 38 sîretên pexşan û 37 sîretên werger cih digirin. Di hersê binbeşan de jî nivîskarî ew sîretên ku bi dest xistiye bi detay behs dike lê yên ku xwe negihandiyê hinek kunyeya wan daye û hinek jî tenê behsa nivîskarê wê kiriye.

Beşa sêyem a kitêbê jî sîretên zazakî re hatiye veqetandin. Di vê beşê de sîretek menzûm, yek pexşan ku hêj nehatiye weşandin û yek jê werger bi tevahî sê berhem hatine nasandin.

Beşa çarem jî du berhemên hewramî dihewîne ku ya yekem tam ne diyar be jî wisa xuya dike ku herdu jî pexşan in.

Di qismê encamê de xebat, li gorî diyalektan, alfabezan, herêman, şêwe û naverokên wan, weşan û çapa wan, dîroka weşandina wan yanî -li gorî kronolojiye- derketina wan, li gorî jimara çapkirinê sîretan dinirxîne. Herwiha sîretên giring yên ku tesîr li berhemên dû xwe kirine, sîreta pêşîn *Rewdu'n-ne'im* a Şêx Ebvirrehman Aqtepi, sîretên giran-hecm bo nimûne *Gulzara* Şêx Tahîrê Şoşî (13 000 malik), *Jiyannameya Pêxemberê Xweda* (742 rûpel) a Tehsîn Îbrahîm Doskî û *Pêxember û Pêxembernasîle Rûwangey Peyamekanî Nûrewê* (3 cild, 1600 rûpel) ya Serdar Yûnis Mûhemmed wekî nimûne tene nîşandan. Dîsa nivîskar balê dikişîne ser sîretên wînda û yên nenas jî ku ew jî sîreke menzûm nimûneyekê dide ku ew jî aliye alimekî Erxeniyê ve hatiye nivîsandin. Ev berhem menzûm e û 600 rûpel e. Dîsa di encamê de nivîskar, danberhevekê di navbera diyalektên kurdî de dike xusûsen jî di navbera kurmancî û soranî de.

Li aliyekî din, Ertekin jî bo lêkolîna xwe ya vê berhemê jî jêderên curedar îstifade kiriye û di dawiyê de bîbliyografiyê firawan pêk hatiye. Wî jî ziman û diyalektên cuda îstifade kiriye, jî jêderên înternetê sîd girtiye ya mihîmtir jî jêderên rastewxo re hevdiînenê telefonî kiriye.

Di dawiya berhemê de jî, nivîskar sê pêvek li berhema xwe zêde kirine: Di pêveka yekem de aniye sîretên kurdî tablo kirine, amarên wan derxistiye; ew li gorî şêwe (menzûm, pexşan, menzûm-pexşan), li gorî diyalektan û li gorî cureya wan (telîf, werger) bi grafîkan nîşan daye. Di pêveka duyem a berhemê de, mewlûd herçend di nava sîretan de nehatibe nirxandin jî, 84 mewlûdên kurdî bi her çar diyalektên wî li gorî telîfbûn û wergerbûna wan ve li ser tabloyê hatiye nîşandan. Di pêveka sêyem de jî berg û resmên hin sîretan hatiye pêşkêşkirin. Û kitêb bi îndeksekê diqede.

Meriv dikare bêje ev awayê xebatê ya berhemê pratîk, hêsan û îlhamdar e. Dabeşkirina berhemê ya sîretan li ser diyalekt, şêwe û cureyên nivîsandinê, dayîna îstatîstîkan, tablokirina wan berheman karê lêkolîneran pir hêsan kiriye jî bo ku ew bikarin xwe bigihînin wan berheman.

Wekî encam; berhema *Kürtçe Sîyer Yazıcılığî* (Nivîsariya Sîretên Kurdî) jî hêlekê ve wekî antolojiyê sîretên kurdî ye, derî li ber lêkolîneran vedike ku agadarî xebatên tîkîlî jiyana Hz. Pêxember bibin, li ser wan lêkolînan bikin, xebatên din yên nedîtî, nekeşfîkirî derxine der û li ser xebatên akademîk bikin. Herwiha ev xebat hişyariyekê dide lêkolînerên sehayên Îran û Sûriyê ku hêj xebat li ser nehatine kirin û pêwendî nehatiye danîn.

Xebat di derbarê hin sîretên kurdî de xusûsen ên kurmancî agahiyên bi detay dide lê gelek berhemên soranî tenê kunyeya wan dide ku nivîskarê xebatê bixwe jî vê wekî kêmasî dinirxîne. Herwiha bi hewramî tenê du sîret hatiye tesbîtkirin û nivîskar di berhemê de digihîje wê qenaetê ku tenê du sîretên hewramî hene. Di lêkolîna xwe de nivîskar hevdiînenê telefonî dike lê em nizanin ka ew li sehaya Îraqê

xusûsen geriyaye yan jî bi rêya xwendevanê xwe lêkolîneke sehayî li pirtûkxane û medreseyan kiriye yan na. Ev jî meriv dikare wekî kêmasiyeke din a berhemê binirxîne. Dîsa xebat çendî mewlûdê wekî cureyeke cuda binirxîne jî hin berhemên ku tenê hêleke jiyana Hz. Pêxember kiriye mijar jî xistiye nava berhemê. Lê di dawiya xebata xwe de hem hemû sîretan hem jî mewlûdan wekî lîste daye ku ev jî rêya li ber lêkolîneran hêsan dike.

Axirî di lîteratura kurdî de bi zimanê kurdî nebe jî ev berhem tekane berhem e ku sîretên kurdî li gorî diyalektên wê û bi kronolojîk vedigire. Çi nivîskar bixwe, çi jî kesekî din be, dikare bi xebateke berfirehtir, heta wekî xebateke komî aliyên kêmayî yên vê berhemê tamam bike û bide ber îstifadeya lêkolînerên ziman û edebiyata kurdî.

Çavkanî

- Ertekin, M. Z. (2011). Di Edebîyata Me de Mewlûd û Rûberûkirina Mewlûdên Pêşîn ên Kurdî û Tirkî. *Uluslararası Kürdoloji Konferansı Bildirileri*, Hakkari Üniversitesi, Hakkari.
- Ertekin, M. Z. (2015). Mela ‘Eliyê Baqustanî û Mewlûda Wî. *Mukaddime*, 6(1), 101-138.
- Ertekin, M. Z., & Ertekin, N. (2017). Kurtedîroka Mewlûdnameyên Kurdî. *Şarkiyat Uluslararası Sosyal Bilimler Kongresi Genişletilmiş Özetler Kitabı*, 149-155.
- Ertekin, M. Z. (2022). *Kürtçe Siyer Yazıcılığı*. İstanbul: Siyer Akademi.
- Yaman A. “Siyer”, *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*. (c. 37, rr. 316-319). İstanbul: DİA.

Yayın İlkeleri

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü tarafından çıkarılan JMS (*The Journal of Mesopotamian Studies*), Kürt, Arap ve Süryani dili kültürü ve edebiyatları alanlarındaki bilimsel nitelikli çalışmalara yer veren hakemli bir dergidir. Bahar (Mart) ve Sonbahar (Eylül) sayıları olmak üzere yılda iki defa yayınlanır. Yayınlanacak yazılarda bilimsel araştırma ölçütlerine uygunluk, alana bir yenilik getirme ve başka yerde yayınlanmamış olma şartı aranır. Bilimsel bir toplantıda sunulmuş bildiriler, yayınlanmamış olmak şartıyla kabul edilebilir.

Yazıların Değerlendirilmesi

Dergimize gönderilen yazılar, öncelikli olarak yayın kurulunca dergi ilkelere uygunluk açısından incelenir. İkelere uygun bulunanlar, iki hakeme gönderilir. Yazarlar, hakemlerin önerilerini dikkate alıp gerekli düzeltmeleri yaparlar; fakat katılmadıkları noktalara itiraz etme hakkına sahiptirler.

Gönderilen telif makaleler, Editör Kurulu tarafından incelendikten sonra değerlendirilmek üzere “kör hakem” yöntemiyle konunun uzmanı iki hakeme gönderilir. İki hakemin görüş ayrılığı durumunda, üçüncü bir hakemin görüşüne başvurulur. Makale, en az iki hakemden olumlu rapor gelmesi halinde yayınlanır. Hakem raporları yazara gönderilerek karar bildirilir.

Hakemlerden biri veya her ikisi, “düzeltmelerden sonra yayınlanabilir” görüşü belirtirse, gerekli düzeltmelerin yapılması için makale yazara gönderilir. Düzeltme yapıldıktan sonra hakemlerin uyarılarının dikkate alınıp alınmadığı hakem veya Editör Kurulu tarafından değerlendirilir. Ayrıca yazarların, hakemler tarafından belirtilen görüşlere itiraz etme hakkı bulunmaktadır. Yapılan itirazlar editör kurulu tarafından görüşülüp uygun bir karar alınır.

Yayınlanmasına karar verilen yazılar, sayfa düzenlemesi yapıldıktan sonra pdf formatında yazarlara gönderilir. Yazar son okumayı yapar ve gerekli düzeltmeleri metin üzerinde işaretleyerek dergiye geri gönderir.

Yayınlanmayan yazılar iade edilmez ve yazılardaki görüşlerin yasal sorumluluğu yazarlarına aittir.

Yayınlanan yazılar için yazardan dergiye veya dergiden yazara herhangi bir ücret ödenmez.

Yayın aşamasında yazılar üzerinde esasa yönelik olmayan küçük düzeltmeler Editör Kurulu tarafından yapılabilir.

Yayınlanan yazıların yayın hakları MAÜ Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü’ne devredilmiş sayılır. Bu devir, sanal ortamı da kapsar.

Makale gönderimi ve değerlendirme süreci Dergipark sistemi üzerinden yürütülür.

Makaleler değerlendirme sürecine alınmadan önce iThentica intihal programı kullanılarak benzerlik analizine tabii tutulur.

Yayın Dili

JMS’nin yayın dili Türkçe, Kürtçe, Arapça, İngilizce ve Süryanicidir. Ancak her sayıda, dergide yer alan çalışmaların en az yarısının Kürtçe ve onun çeşitli lehçelerinde yazılmış olması ilke olarak benimsenmiştir. Dergiye gönderilecek yazıların akademik dil kullanımıyla ilgili her türlü kusura dair arınmış olması gerekir.

Yazım Kuralları ve Sayfa Düzeni

Yazılar A4 boyutunda kâğıda, MS Word veya uyumlu programlarla yazılmalıdır. Yazı karakteri olarak Times New Roman kullanılmalıdır. Yazılar 12 punto ve 1.5 satır aralığıyla yazılmalı, sayfalar numaralandırılmalıdır. Makalelerin uzunluğu en fazla 9.000 sözcük olmalıdır. Özel yazı karakterleri kullanılmamalı, transkripsiyon işaretleri varsa bununla ilgili doku-manlar ulaştırılmalıdır.

Yazarın adı, soyadı, unvanı, görev yaptığı kurum, ORCID numarası ve e-posta adresi mutlaka belirtilmelidir.

Makalenin başlığı içerikle uyumlu olup koyu harflerle yazılmalı ve 15 sözcüğü geçmemelidir.

Makalenin başında, en fazla 150 ile 200 sözcükten oluşan bir öz yer almaktadır. Türkçe dışındaki dillerde yazılan makalelerde öz makalenin orijinal dilinin yanı sıra Türkçe ve İngilizce olarak da yazılmalıdır. İngilizce öz kısmında makalenin ismine de yer verilmelidir. Özlerin altında genelden özele doğru sıralanmış 4 ila 6 sözcükten oluşan anahtar sözcükler bulunmalıdır.

Başlıklar koyu harflerle yazılmalıdır. Uzun yazılarda ara başlıkların kullanılması okuyucu açısından yararlıdır. Ana başlıkların, 1., 2., ara başlıklarınsa, 1.1., 1.2., 2.1., 2.2 şeklinde numaralandırılması tavsiye edilir. Ana ve ara başlıkların tümü (ana bölümler, kaynaklar ve ekler) koyu harflerle yazılmalıdır.

Metin içindeki vurgulanması gereken ifadeler, “tırnak içinde” gösterilir, eğik veya koyu karakter kullanılmaz. Hem “tırnak içinde” hem eğik veya hem koyu hem eğik yazmak gibi çifte vurgulama yapılmaz.

Bölüm ve paragraf başlarında girinti uygulanmaz.

Yazılarda kullanılan çizim, grafik, resim ve benzeri malzemeler JPEG ya da GIF formatında olmalıdır. Görsel malzeme ve ekler gerektiğinde e-posta yoluyla ayrıca ulaştırılmalıdır.

Kaynak Gösterimi

Alıntı yapma ve kaynak göstermede APA yöntemi kabul edilmektedir.

Dipnot ve kaynakların yazımı konusunda, yöntem bakımından kendi içinde tutarlılık şarttır. Uzun yapıt (kitap, dergi, gazete vb.) adları eğik, kısa yapıt (makale, öykü, şiir vb.) adları ise “tırnak içinde” yazılır. Ayrıca dipnotların yalnızca metne alınmayan ek bilgiler için kullanılması önerilir:

Bir yapıtın derleyeni, çevireni, yayına hazırlayanı, editörü varsa künyede mutlaka gösterilmelidir.

Elektronik ortamdaki metinlerin kaynak olarak gösterilmesinde, yazarı, başlığı ve yayın tarihi belirtilmiş olanlar kullanılır. Ayrıca künye bilgilerinde parantez içinde erişim tarihi belirtilmelidir.

Ulaşılabilir kaynaklarda ikincil kaynak kullanımından kaçınılmalıdır.

Atıf yapılmayan çalışmalara Kaynaklar kısmında kesinlikle yer verilmemelidir.

Kaynaklar metnin sonunda, yazarların soyadına göre alfabetik olarak yazılmalıdır. Eserlerin yayınevleri açık şekilde ve makalelerin bulunduğu sayfa aralıkları belirtilmelidir.

Latin harfleri dışındaki alfabelerle yazılmış makalelerde Latin harfleriyle yazılmış başlık, özet, anahtar kelimeler, ve kaynakçaya (referanslar) yer verilmelidir.

Publication Principles

The Journal of Mesopotamia Studies (JMS) is publication of The Institute of Living Language of Mardin Artuklu University. The JMS is a peer-reviewed journal which gives places to scientific researches on Kurdish, Arabic and Syriac culture, language and literature. It is published semi-annually (Spring and Autumn Issues). The articles to be published should bear criteria of scientific researches, be innovative, and also should not be published anywhere else before. If an article has been presented in a scientific meeting, it will be accepted on the condition that it has not been published anywhere before.

The Evaluation of Articles

Articles submitted for publication are firstly examined by editorial board in accordance with the publication principles of the journal. The endorsed ones are sent to two reviewers. The authors corrected the article according to the notes by reviewers; however they have right to object to the points where they do not agree with.

Articles submitted for publication are sent to two experts of the field via method of "blind review" after they examined by Editorial Board. In the case of split in opinion of these two reviewers, the article is sent to another reviewer. The article is published if at least two reviewers express positive opinion. The reports by reviewers are sent to the authors to pronounce the evaluation result.

If one or both reviewers express "it could be published after certain revisions", the article is sent to the author for the required revisions. After revisions are done, they are checked by reviewers or the Editorial Board to evaluate whether they are done in accordance with the remarks. Besides, the authors have right to object to the reviewers opinions. The objections are evaluated and resulted by the editorial board.

The articles that decided to be published are sent to the author in PDF formatted after page adjustment. The author makes the last reading and shows necessary revisions on the text and sent it back.

The unpublished articles are not return back to the rightful owner, furthermore the authors are responsible for the opinions of the articles.

The journal does not demand any fees to publish their articles, and likewise does not pay any fees for publishing articles.

The Editorial Board may make small adjustments those are not on the main stage.

It is accepted that the copyright of the published articles are transferred to The Institute of Living Language of Mardin Artuklu University. This transfer includes virtual platforms.

Article submission and evaluation process is conducted on Der-gipark system.

Before Evaluation process starts, the articles are analyzed via iThentica plagiarism program.

Language(s) of Publication

The JMS gives places to articles in Turkish, Kurdish, Arabic, English and Syriac. However, it accepted as a principle that at least half of the studies in the journal should be in Kurdish and its various dialects. The articles sent to the journal must be free from all kinds of defects related to the use of academic language.

Writing Rules and Page Layout

The articles must be written on MS Word or compatible programs. Times New Roman should be used as typeface. The articles should be written in 12 font size in 1.5 ink line spacing and the pages should bear numbers. The articles should be maximum 9,000 words. The custom typefaces should not be used and if there are transcription signs, their documents should be sent with the article.

The name, surname, title, place of work, ORCID number and e-mail address of the author(s) must be stated.

The title of the article must be in accordance with the content and written in bold face, and also must not be longer than 15 words.

There must be an abstract of maximum 150 to 200 words at the start of the article. For the articles written in languages other than Turkish, the abstract must be written both in the original language of the article and in English. The title of the article must be stated before the abstract as well. There must be maximum 4 to 6 key words that ranked from general to specific at the bottom of the abstract.

The title must be written in bold face. There should be intermediate titles in the long articles. It is recommended that the main titles numbered as 1., 2., and intermediate titles as 1.1, 1.2., 2.1., 2.2. All the main and intermediate titles (main sections, sources and appendices) should be written in bold face.

Expressions highlighted in the text, must be «in quotes», bold or italic faces must not be used. There must not be double highlighting as «in quotes» and bold or italic.

There must not be intents at the start of section and paragraphs.

Illustrations, graphics, images and other materials those used in text must be in JPEG or GIF format. Visual material and attachments must be delivered also via e-mail if required.

References

APA is accepted for citation and references.

Methodically consistency is essential for writing the footnotes and sources. Names of long works (books, magazines, newspapers etc.) should be written in italic face, names of short works (articles, stories, poems and so on) «in quotes». Also, it recommended that to use footnotes only for the additional information that cannot be given in the text.

The compiler, translator, preparer for publication, editor must be shown in the tag if exist.

In case of the citation of the text of electronic media, the name of author, title and date of publication which are specified are used. The date of access should also be noted in parentheses in catalog information.

The secondary sources should be avoided if the primary resources are available.

The works those have not been cited must not be shown in the sources.

The sources should be given at the end of the text in alphabetical order. The publishing houses should be given clearly and the page ranges of the articles should be stated.

Articles written in any alphabets other than Latin alphabet should include the title, abstract, keywords, and references written in Latin.